Bîranînên mamoste Osman Sebrî

Amadekirin: Dîlawer Zengî

Derhêner û çapa dîjîtal
Sîrwan Hecî Berko

Ji weşanên Malpera Amûdê
Hejmar: 29

www.amude.com
info@amude.com

Hemû mafên çapê parastî ne.
© Hoşeng Sebrî û Malpera Amûdê (06/2003)

Bîranînên mamoste Osman Sebrî

(1905-1993)

Amadekirin:
Dîlawer Zengî

E-Pirtûk
www.kurdme.com
www.all-kurd.com
www.kurdefrin.com

Beşê yekê

Şoreş

Dawiya sala 1924an, rojekê ji rojên meha çirriya pêşîn, Ro ji nav ewran derketî, ber berrojkan şîrîn, mehîna min li ber Royê girêdayî seyîs ew tîmar dikir. Hêlekê ji bêkariya gundiyan, ji hêla din heskirina min a hespan hiştibû ku çavdariya karê seyîs bikim. Çavên min digel destê seyîs li ser pişta mehînê diçû û dihatin. Hew min dît xortek li ber min rawestî û vîtikek[1] da destê min.

Vîtik ji apê min Şukrî bû. Tê de ji min dixwest ku digel pismamê xwe Necmedîn wê êvarê bi lez herim gundê wî Arxê. Ev gund bi dwazade kîlmetran ji rohelatê gundê me Narincê diman.

Çi gava li ser kar û tevgerreke eşîrî peyivîn hewce ba, apê min Şukrî dişand pê min û Necmedîn û apê min Nûrî ku li gundê Qeretêtê rûdinişt, em tev li nik xwe dicivandin û me şêwra xwe dikir. Di nav peyayên malnatê de, wek hemî malbatên axan, li ser mezinatiya eşîrê gelek gelş û qirrên çêbûbûn. Ji lewre em bi peyyayên malbatê ên mayî ne bawer bûn, çi şêwr û tevdîra ku hebûya di navbera me herçaran tenê de dibû.

Piştî em wê êvarê gîhan Arxê bi hinekî apê min Nûrî jî hat. Bi gihana wî re bê rawestan civînê dest pê kir; lê me tiştek li ser sebeba vê civînê nedizanî. Ji rewşa apê min Şukrî xuya bû ku wê li ser tiştekî mezin bipeyive. Wek mirovê ku bixwaze mişwarekî dirêj bileze, bêhna xwe girt û got:

-Şêx Seîd bi şûreşeke welatî rabûye û doza serxwebûna Kurdistanê dike. Eger kira wî neçe serî, dê bibe sebebê rijandina gelek xwîn û xerabûna hêleke welêt. Di vê em li ber vê yeka han gavgirtî û destgirêdayî ranewestin. Raya we çiye?

Tevî ku ez hîngê nozde salî bûbûm, bi cendek û mêjûyê xwe ji wî emrî biçûktir bûm. Ji lewre min tiştek ji van gotinan fehm nedikir û ne diket serê min. Eger tevgerreke eşîrî bûya, ezê qenc serwext bibûma, ji ber ku gelek tiştên welê di ser min re derbas bûbûn. Lê rabûna bi şûreşan, şerrê dewletan, tiştekî ji têgihana min bilindtir bû.”Şêx Seîd bi şûreşeke welatî rabûye” ma gelo welat hewceyî şûreşekê bû? Paşê, “doza serxwebûna Kurdistanê dike” ma Kurdistan hewceyî serxwebûnê ye? Ji bo çi û ji kê serxwe bibe? Ma serxwebûna Tirkan ne serxwebûna me ye? Berî pênc salan ji bo serxwebûnê me şerrê gelek dewletan kir. Ji Sitanbolê heya sînorrê Ecem me parast, vê car em şerrê Tirkan bikin!

[1] Vîtik: nivîsana ku ji pênc-şeş xêzan ne pirrtir be.

Ma ku me dê şerrê wan bikira ji bo çi di roja teng de me alîkariya wan kir? Van pirsên han di serê min ê nezan de ji xwe re bersiv nedidîtin.

Xuya bû ku civîna îro ji têgihana min gelekî bilindtir bû, jê tiştek ne diket serê min, bêdeng mam, ka dawî dighê kû. Apê min Nûrî jî di zanîn û bîrbirina xwe de ne li pêş min, heye ku hinekî bi şûnde bû jî. Wî jî wek min pêl pêl di ber xwe de dinêrrî, nedizanî çi bike. Herçî pismamê min Necmedîn, ji me herduyan jîrtir û serwextir bû. Wî di di ber me hersiyan ve got:

-Ezbenî, têgihana tiştên holê ji zanîna me bilindtir e. Paşê, derheqê vê şûreşê û kesên ku pê rabûne de em tiştekî nizanin. Di vî warî de tu ji şêwra me detkewtî nabî. Binêrr tu çawan baş dibînî welê bike; em digel te ne.

Apê min Şukrî jî dizanîn ku gotina Necmedîn raste, tevî wê dîsa li çavên min û Nûrî nêhrrî ka em çi dibêjin. Me herduyan bi serî hejandinê rastiya gotina Necmedîn jê re da zanîn. Hînga ji nûve dest bi gotinê kir:

-Mafir we her tişt di sitûyê min de hîşt divê ez vekirî bipeyivim. Êdî bêbextî û serhişkiya Mistefa Kemal nema tê kişandin. Eger ji her tiştekî re sînorrek hebe, divê ji çavpehniyê re jî sînorrek hebe. Nizanim ev şûreş çiqasî xwe bigehîne serdestiyê; lê divê ev kês ji me neçe û tiştekî bikin. Gava zora Şêx Seîd bibin, ji mêrê Kurd re rûmet namîne. Min divê nameyekê ji Şêx Seîd re bişînim û jê re bidim zanîn ku çi gava Sêwerekê bistîne emê bikarin rabin û alîkariya wî bikin. Hîngê ji me re vegirtina Semsûr (Adiyaman) Meraş, Melatî û Entabê ne dijwar e.

Li vir apê min gotina xwe birrî, herwekî pêleke dirêj beriya rabe, şopa westî ji rûyê wî xuya bû. Piştî ku cîgara xwe nuh kir holê vegerrî ser gotina xwe:

-Hikûmeta Tirk ji mêjve şivîşkan[2] ji me dike. Heya em bikarin bê tirs bixebitin û xebata xwe ji çavên neyar veşêrin, divê ji rûve em xwe ji aliyê hikûmetê bidin xuya kirin. Min divê çend têlgirafan bidim Anqerê ku: "Leşkerê Şêx Seîd nîzîkî me dibe , ji bo em bikarin xwe li pêş wî bigirin û nehêlin şûreş bigehê erdê me, em hêvî dikin ji bo çê kirina alayiyên milîsan di nava welêt de desturê bidin". Ji ber ku leşkerê wan hindike wê destûra me bidin. Hîngê em dê bikarin bê tirs peyayên xwe di qezayên Kexte û Pêtirgeyê de bicivînin. Heye ku hikûmet him çek û posat[3] jî bide me. Çi gava Şêx Seîd Sêwerek sitand, em jî dê rabin. Ez bawerim ku holê em bikarin bi kêrî xwe û welêt bûn û ji bin destê Tirkan derkevin.

[2] Şivîşk: şekî şibhe.
[3] Posat: Fîşekî Çek û pos.

Civîna me bi van gotinan qediya ji ber ku serê meyê ramanê apê min Şukrî tenê bû, berî ku em bicivin, herçiya kirin divya bû dabû ber çavên xwe û ji me re got. Nameyek ji Şêx Seîd re nivîsî, da mela Evdirezaq wê şevê şand. Sê têlgiraf jî ji bo Anqerê nivîsîn. Yek ji Mistefa Kemal re, yek ji Serekwezîr Fethî re û ya din ji xezûrê xwe Hacî Bedir begê re da ku daxwazên wî linik hikûmetê pêk bîne.

Wê şevê têlgirafên me siwarekî birin qezayê û dan, roja sisiyan bersivên wan vegerrîn. Mistefa Kemal û serekwezîr, piştî sipasan ji bo çêkirina milîsan destûra me dabûn. Tenê navê milîsan û kesên ku serdariya wan bikin ji me hatibû xwestin.

Apê min Şukrî dîsa bawer bû ku çi dema şûreş neçe serî, hikûmet dê hemî silehan di welêt de bicivîne. Ji lewre tenê navê çar sed û heştê peyayî nivîsî. Di vî warî de got:" eger hikûmet rojekê van çekan ji me bistîne, bi çar sed û heştê tifingî em ji çek nakevin". Navê xwe ji milîsan re serdar û yê min jî alîkar ravekir û cedawela navan me şande Anqarê. Ji wê rojê de me peyayên xwe yên sere li çend cihan civandin, heya gava hat sekinî em bikarin derba xwe zû û xweş lêdin.

Heya bikarim xwendevanan xweş serwextî vê serpêhatiya han bikim, divê tiştekî serpilekî li ser rewşa eşîr, malbat, raman û têgihana xwe ya hîngê ji wan re bidim zanîn, heya di dayîna hikmê xwe de şaş nebim.

Eşîr

Eşîra me Mirdês perçeyek ji emareta Mirdês e ku sernîveka wê bajarê Egilê bûye. Piştî qelsî û di hevdeketina emaretê mîrekan her yekî aliyekî emaretê bi navê eşîrê xistiye bin destê xwe. Yek ji wan mîrekan ketiye nav koçerên Mirdês ku zivistanan ji bo pez û dewar dadiketin berriya Evdilezîzê û biharan hildikişîn çiyayên kurdistanê. Dema mîrek di nava koçeran de jî zêde bûne, li ser mezinatiyê qirrên û berberî ketiye nava wan. Bi vî awayî koçerên Mirdês bûne sê keriyan.

Birrê pêşîn digel Evdil-Hey begê ji wan qetiye û berê xwe daye deşta Haymanê (navbera Anqere û Qonyê) û li wir bi cih bûye, ku jê re Mirdêsê Evdil-Hey tê gotin.Paşê birrê dudûyan jê veqetiye çûye di çiyayên pişta Diyarbekirê de bi cih bûye ku ji wan re Mirdêsê Têrrikan tê gotin. Dibêjin sebebê veqetîna vî birrî, li ser dema hilkişîna çiyê pev nekirin bû. Lê a

rast, rik û dexsa ku keti bû navbera pismîran û rîspiyên eşîrê ku her hinek li dora birakî dicivîn.

Vî birrî dixwest koçberî wextê berê xwe bidin çiyê û terka berriyê bikin. Mezinê wan mihemed digot gayên me westîne, demên pûk û baranan jî derbas nebûye, ji lewre divê çendakî din li berriyê bimînin. Birayê wî Mistefa digel hin rîspiyên eşîrê dixwest wek birayê biçûk Evdil Hey begê hinekî ji eşîrê bi pê xwe xîne ji lewre qîma xwe bi gotina Mihemed ne anî û wê şevê bar kirin. Sibetirê li wan bû pûk û teyrok. Gelek pez û dewarê wan bi ber lehiyê ket û mir. Zarrokên xwe xistin nav têrran û li ser pişta gan teşt û legan bi ser wan de kirin heya neqefilin. Ji wê rojê de ew birr bi navê mirdêsê Têrrikan bi nav bûye.

Birrê sisiyan ku birrê meztir bû bi navê Mirdêsanê Gawestî hatiye nasîn ku malbata min ji vî birrî ye. Bavkalê min ê mezin Mihemed ku mezinê eşîrê bû, piştî veqetîna herdu biran û nîvê eşîrê jî, nema xwestiye vegerre welatê Egilê û di qirracê Qeregêçiyan de şarge bûye[4].

Mihemed ji koçeriyê bêhêvî bûye, xwestiye erdekî vala bibîne eşîra xwe tê de bi cih bike. Di wê navê de şerrekî xurt di navbera Mirdêsan û Qeregêçan de bûye û tê de gelek mêr mirine. Dema hikûmet ketiye nava wan û li ser dana xwîna kuştiyan li hev anîne, Qeregêçiyan bi şev kuştiyên Mirdêsan ji goristanê dizîne xistine nav kuştiyên xwe û seyên kuştî xistine gorrên Mirdêsan. Çiqas ku hikûmetê ev kira kirêt bîra biriye jî, Mirdêsan nema xwestine tevî Qeregêçiyan li ser erdekî rûnin. Li ser wê bar kirine çûne nîvroyê çiyayê Bêllî (Nemrud) roavayê bajarrê Gergerê bi cih bûne.

Herwekî min ji devê kalan bihîsti bû, hîngê ew çiyana û deşta di ber de hemî rêl, dehl û mêşe bûne û ji wehş û dirrendeyan pêve tiştek tê nedibanî. Ji her tiştî pirtir du celeb dehbe tê hebûn:Beraz û piling. Ji van celeb pilingan re Werşeq dihate gotin ku ji pilingê Efrîqî gelekî mezintir û hartir bû.

Eşîr berê di deşta ber çiyê de bi cih bûye û bîst-sî gund avakiriye. Paşê hêdî hêdî ber bi çiyê hilkişiye. Ji bo bikarîna lingê xwe di wî erdî de bi cih bikirana, divya bû şerrê werşeq û beraz bikin. Eger yê pêşin canê wan dibir yê din çandinî bi wan nedihîştin. Ji bo qelandina riça van herdu celeb dehban divyabû rêl û dehban tev bibirrin heya tê de şarge nebin û xweş, bigengazî bêne kuştin. Ji roja ku rêl û dehl di wan çiyan de sivik kirine bê west zora werşeq birine û tevê wî ji wê êrdimê birrîne. Herçî beraz, kêm caran di wê êrdimê de mirov raste colê wan tê.

[4] Ciyê ku hîngê tê deî arge bûne îro bi navê Xirabê Mirdîsan tê zanîn.

Îro li çiyayên Mirdêsan ji gur, hirç, keftar û berazan pêve dehbe çar nabin. Herçî piling nema tên dîtin.

Malbat

Ji kalê min Mihemed ku tevî eşîra xwe Mirdêsê Gawestî hatiye erdê ku îro bi mirdêsan hatiye nasîn, heya digehê min, em neh bav di wî erdî de rûniştine. Lê kesî ji me, van her neh bavan, di destê hikûmeta Tirk de jîneke xweş ne dîtiye. Ji van her neh bavan sisê bi destê leşkerê Tirk, her yek bi awakî hov hatiye kuştin. Bavê min Sebrî û bavê wî Ebûzer jî her yekî bi awakî fermana wan rabûye û her yek bi ecêbekê ji kuştinê filitiye. Ji ber ku ez ne di warê nivîsandina dîroka malbata xwe de me, min rast nedît ku awa û sebên kuştina sisiyan û filitîna dudiyan ji kuştinê bi ser û ber salixdim.

Herçî ez, her wekî di rûpelên pêşîn de wê bête xuya kirin, çend caran çûne ber darê(‘Idamê) û filitîne. Heya îro em li ser rêya têkoşînê ne, ma kî dizane ku ezê sibe bi destê xwîniyên bav û kalên xwe, kolîdarên welatê xwe neyêm kuştin. Her gav ji min re welê xuya dike ku ew bav û kal hêviyekê ji min dikin, tola wan û welêt, an jî di wê rê de wek wan mirim.

Kama min ji çêla riça eşîr û malbatê ew e ku xwendevan bizane, ka min di warê têkoşînê de xurtiya canê xwe ji ku sitandiye. Ez bawerim ku çawan duh îro za, îro jî sibê dizê; yanê rewşa me ya îro havila rojên borî û tovê pêşende ye. Mirov bi raman û baweriyên xwe wek darekê ye, riçên wê darê çiqas kûr û dirêj bin ew çend xurt dibe. Dema dareke holê qels bû, xuyaye kurm ketine kok û riçên wê, ku nehatin kuştin û paqijkirin, ew dar dimire.

Piştî di hevdeketina emareta Mirdês, peyayên malbata min digel hikûmeta Tirk çawan bûne? Heya îro jî şopên serhildanê her û her di jîna wan de xuya dikin. Yanê ew li ser rik û neyariya hikûmeta Tirk a sitemkar û zorbaz mezin bûne. Yek ji wan ez, ji roja ku hatime dinê heya roja ji welêt derketime, (di navbera nozde salan de) hikûmeta Tirk sê caran li malbata min daye û ji hev belav kiriye.

Cara pêşîn emrê min çil rojî bûye ku malbat li ber lekerê Tirk reviye û xwe avêtiye çiyê. Hîngê ewçend ez bi rê ve giriya me bi min re fitiq[5] çê

[5] Çi bextiyariyeke mezine ku piştî (55) salan ji fitaqa pêşîn dizîndana Mezê de careke din bi min re fitiq çê bû. Başe ku her du caran jî di warê têkoşînê de bûye.

bûye. Cara duduyan, emrê min şeş salî bû ku tiştek ji wan rojên tehl wek xewnan tê bîra min. Wê carê hemî peyayên malbatê ketin zîndanê, malê me talan bû û em ji cihê xwe bi derketin. Cara sisiyan, ew nifşe ku dike bibe hîmê vê nivîsana me, cara ku digel herdu apên xwe hatime girtin, ew bi dar ve bûn û min şeş sal hikmê tekebend xwar.

Mirovekî ku pêleke dirêj ji jîna malbata wî di şerrê sitemkar û zorbazên Tirk de berî be, ne dûre ku ew jî hemî jîna xwe di wê rêya bi rûmet de bibore.

Dikare ji rûpelên wê têkoşîna kevin ji xwe re roniyekê çar bike û pê ji rêya xwe nemîne. Ma gelo! di dinê de biqasî rik û hezkirinê tiştin hene ku mirov bê perwa bi xurtî ber ve armanca wî dehf bidin? Heyîna her yekê ji van di çi dozê de, wek betariya ku bi qiweta xebata xwe tête dagirtin, dikare li ser dirêjiya emir dilê mirov xurt bike û nehêle ku agirê di dil de vemire.

Herçî ez, rika kolîdarên Tirk ên zorbaz, hezkirina welat û gel digel hev min di rêya têkoşînê de dehf didin. Ji lewre eger ez di kir, raman û xebata xwe de qelsiyê rave bikim ji bextereşiya min e.

Bûn û biçûkiya min

Piştî zewaca bavê min bi pênc salan, di 7ê çilleyê pêşîn sala 1905 an de li gundê Narincê ez hatime dinê.

Herwekî min ji diya xwe bihîstiye, çiqs ku ew bav û diyên reben serekî dirêj li bende hatina zarokekî mane jî, di dema hatina min de, wek xelkê bi hatina min şa nebûne. Ewçend ez biçûk û qels hatime ku wek zarokên nîvco ji jiyîna min bi sibehe bûne. Eger berî min ji wan re zarokin hatibûna, heye ku qîma xwe bi xwedîkirina min ne anîna. Lê tinebûn û nehatina zarokan hiştiye ku serê xwe bi xwedîkirina min re biêşînin.

Piştî bûna min bi mehekê navbera xelkê me û hikûmeta Tirk lihev ket, deh rojan najot bû şer. Ji ber dubendiya ku hînga keti bû nava eşîrê dev ji lêdanê û şerr berdan û xwe avêtin çiyê. Wê gavê emrê min çil rojî digel jin û zarokan derketibûm şikeftan, pirrî giriya bûm bi min re fitiq çê bûbû[6]. Bavê min gelekî ji min teng bûbû. Wê çaxê bawer dikirin ku zarokek xwedî bext û bedbext dibe. Ji ber ku bi bûna min re ev bela hatibû serê

[6] Di sala 1919 an de Diktorekî elmanî ji min re dirût.

eşîr û bedbext jimartî bûm. Dibêjin hîngê ewqas ji giriyê min aciz bû, gote yên dora xwe:

-Eger ez ji Xwedê netirsima, min dê ev gedeyê pîs bavêta ber kelemekê. Ji roja bûye, me rihetiya xwe nedît. Niha jî mikûne bi vî giriyê han me têxe nava destê dijmin.

Ev bela ku bi serê malbatê de hatî pirrtirî salekê dom nekir. Pişt re hemî vegerrîn cihê xwe û ji nû ve dest bi jîneke germ û nerm kirin.

Di sala 1910an de, piştî bûna min bi pênc salan, li ser tişine biçûk ket navbera me û hikûmeta Tirk. Dîsa bi alîkariya eşîrên dijmin, hikûmetê zora me bir û eşîr û malbat ji hev belav kirin û malê me talan bû. Hîngê bavê min û pismamekî min ne li nav eşîrê bûn, çûbûn Diyarbekirê, nema hiştin ku vegerrin. Heya şeş mehan li wir girtî man. Apê min Şukrî digel du xalên min hatin girtin û yên mayî derketin çiyê.

Tiştek ji wan rojên reş û tarî tê bîra min; lê bi qasî emrê min yê pênc salî. Çend malên me li Kextê xaniyek girti bûn û digel hev tê de bi cih bûbûn. Xanî gelekî mezin lê em kesên tê de jî pirr bûn. Hergav di navbera me zarokan de şerr bû, bêhna min teng dibûn û ji diya xwe dipirsî: “Ka emê kînga herin mala xwe”. Wê bi dilekî kul li min vedigerrand û digot: “Çi gava Xwedî hezke bavê te li Diyarbekirê vegerre em dê herrin mal”. Ji vê pêve her roj ez diçûm ber derê zîndanê û dîtina ap û xalên xwe, wan jî pere didane min. Heye ku sebebê çûna min a her roj pere bûn. Tê bîra min, gava diçûm, jendirme yên kurd ez dibirim nik wan û min digot: “Apo, xalo ka peran bidin min”. Carekê wan tifaq kiri bû ku ji min bipirsin ka kî ap û xalê min e”. Dema pirsîn gelekî bi bersiva min keniya bûn. Min got:”Kî peran bide min ew ap û xalê min e”.Ji van pêve vegerra nava eşîrê tê bîra min ku şayî, li her derê tifing davêtin, def lêdidan û govend digirtin. Ez jî bi vegerra malê dilxweş bûm û diyariyên ku bavê min li Diyarbekirê bi xwe re anîbû. Vê carê jî bela me zêdeyî salekê dom nekir, bavê min hat, girtiyên me berdan û yên ku xwe dabûn serê çiyan daketin gundan.

Dema heft salî bûm, ez şandim dibistana gund. Çiqas ku hîngê kesma min biçûk bû jî sihet min gelekî baş bû. Bavê min ji bo dilê xwe rihet bike, carcaran jî kesan dora xwe dipirsî û digote wan:

-Ma gelo heye ku Osman jî wek herkesî girs bibe û holê biçûk nemîne?.

Xuyaye ev yeka han gelek caran pirsî bû ku, rîsipiyekî eşîrê lê vegerrand û gotê:

-Sebrî! ez dibînim bûn çend car tu vê yeka han ji kesên dora xwe dipirsî. Ma gelo girsî her tişte? an biçûk bûn kêmiye? Ez bawerim ku Osman ji te biçûktir namîne.

Bavê min got:"Xwedê bike şalê welê be". Lê ji fihêta rûyê wî sor bû; ji ber ku bavê min bi xwe peyakî biçûk bû, ma gava ez biçûk bûma guneh bû?!.. Ev yek bû ku hîşt ew ji gotina xwe şermisar bibe û ji wê rojê de nema çêla biçûkî û ne girsiya min kir.

Li dibistanê ez ji hemî hevalan biçûktir bûm; lê ji hevalên sef gişkan xurtir û jêhatîtir bûm. Di pirraniya dersan de hercar min numra paşîn(10) dibir, ji lewre dilê bavê min, bi heyîna min geş bûbû û hêviyeke mezin ji wê heyînê dikir. Ne wekî dema bûna min bû. Her gav digot guhdarên xwe:'Eger Osman ji Milkiya Şahane (kuliya hiqûq wê gavê)Şehadet xwe ne stîne, ez dê wî ji ûrtê[7] xwe bêpar bikim".

Bê şivîşk, bavê min tevî ku baş nexwendî bû jî, bihayê xwendinê baş dizanî. Her şev heya min dersa xwe baş li pêş wî nexwenda ne dihişt ez razêm. Dema didît ez dersa zû hîn dikim dilê wî xweş dibûn û ew xweşî ji ser çavên wî diyar bû. Gava digel kurrê ku çavdariya min sipartibûnê li dibistanê vedigerrîm me kitêbên xwe datanîn mal û ez dibirim odê cem bavê min. Piştî silavê, eger mêvanên biyanî tinebûna digel bavê xwe rûdiniştim û hin caran henek jî bi min dikirin. Lê gava kesî biyanî heba, dê li ser lingan rawestî bimana heya xewa min dihat. Kêm caran ku li mala me kesî biyanî tineba, hergav ji axan û me'mûrên hikûmetê vala nediman. Kama bavê min di vê yekê de ew bû ku ez hînî hezkirina mêvanan û bi wan re dan sitandinê bibim û fedî nekim. Holê xwe pirr bi min re mijûl dikir, em herdu jî gelekî diwestîn. Nemaze ez, ewçend diwestîn ku jîn û xwendin di çav min de reş bibûn. Biçûkekî heft, heşt salî ewqas ne dihat êşandin. Roja bavê min li malbûna, ne mikûn bû ku nava zarokan bibîn im. Her li odê di nava peyan de, dûyê cigarê li ser wan bilind dibûn. Dengê wan yê box, rûyên wan yê bi rih û simbêl ez aciz kiribûm. Xasma peyivîna wan, an li ser zad û çandiniyê, an li ser şerr û lêdanê bû. Ma gedekî biçûk çi ji van tiştan fehm dike. Ez hewceyî dîtina zarokan, qîrrîn û hol bûm, dengê wan ê zirav rûyê wan ê fêrişteyîn bûn. Ji lewre min qet ne dixwest bavê min li mal ba, em li dibistanê vedigerrîn diçûn nav zarokan û heya êvarê me dilîst. Piştî şîvan me dersên xwe hîn dikirin û radizan, ev bû jîna ku min ji xwe re dixwest.

Çiqas di xwendin û zanîna xwe de pêşve diçûm, bavê min ewçend ez diêşandim. Nedizanî ku zarokek heya kû dikare xwe li ber westeke holê

[7] ?rt: miras, malê ku ji bav dê dimîne. Ji erdên ber malan re jî tê gotin.

mezin bigire. Xweyaye ew bi xwe biçûkayî holê nehati bû êşandin, an ma çawan zarokek bê lîstik û ken bê gelş û qirrên dikare di nav peyan de bijî?. Nizanim bavê min dixwest ji wî gedeyê xwe yê bêmirês çi bi derxista? Ma mikûn bû çi jê derê? Van rojên han tevî west û êşa xwe xweşiyek hebû, ew jî heyîna bavê min; lê vê xweşiya bi west gelekî dom nekir û nexweşiyek kambax tevî gelek zarokan ez bêbav hiştim.

Sala 1915an emrê min giha dehan û ez di sefê sisiyan de bûm ku nexweşiya tîfo ket welêt, em tevde pê ketin. Gelek xelk bi vê nexweşiya malkambax mirin ku bavê min û mamostayê dibistanê di nava yên çûyî de bûn. Vê nexweşiya han ez ji du tiştên zor xoşewîst bêpar kirim, bavê ku gelekî ji min hez dikir û siheta min a xweş. Şopine kûr û kirêt di can û cendekê min de hîştin, ji lewre min divê serpilkî çêla wê bikim.

Hîngê Kurdistana bakur di destê dewleta Osmaniyan de û ew dewlet jî di şerrê cîhanê ê pêşîn de bû. Di welêt de çiqas bijîşk hebûn, tev şandibûn qada şerr, kitkitên ku mabûn jî ne dikarîn li pêş tirpana mirinê ku nexweşiya tîfo bê dilovanî dişixuland rawestin. Ji xwe derman yekcar peyda ne dibûn. Fêda bijîşkan ji me re gelekî hindik bû; piştî ku derman nema bûn, tenê me dikarî ji şîretên wan destkewtî bibin. Wek xwe paqij girtin, parêz û xwe ji hev parastin bû. Tevî ku bê derman mabûn hebûna bijîşkekî di êrdimekê de ji bo xelkê hêviyeke mezin bû. Eşîra me ku nahiyek bû, bi navê Hacî Mihemed bijîşkekî Sûdanî bi para wê ketibû. Ew jî bi hikmê xebata bavê min ku rûmetek mezin jê re hebû. Herçî nahyeyên mayî ji xêrike holê mezin bêpar bûn.

Bijîşkê Sûdanî çenteyekî mezin hebû; lê tê de liba derman nedihatin dîtin. Heya çentê hinekî perçifî bimîne gelek kitêb, xezete û carna hin perçeyên biçûk ji cilên xwe jî dixist navê. Hergav xalê min pir henek dikirin û digot:"Çentê bijîşk ji derman pêve her tişt tê de têtе dîtin. Bi vî awayî û vê tevdîrê em ketibûn himbêza tîfo. Serê her mehê gava bijîşkê reş diçû qezayê ku mehiya xwe bistîne, daîra sihe jêre 1500 heb kinînên zer, 500 heb aspirîn, şûşeyek îspirto û çend pakêt pembo didan. Xwendevan dibînin ku ev dermanên han bi kêrî tîfoyê nayên, digel wê bijîşkê reşik bi anîna wan gelekî dilxweş dibûn.

Berî bavê xwe ez nexweş ketim. Ji ber ku vê nexweşiya han di canê min de şopine kûr û kirêt hîştine, heya îro gelek warên wê tên bîra min. Bavê min digel bijîşkê reş şengiyeke ecêb rave dikirin. Siban heya êvarê li nava gund li ser nexweşan digerrîn, bi şev jî fanos di destê peyakî de li pêş wan diçûn û ew herdu li pê mal bi mal doş dibûn. Bavê min tevî ku axayekî sitemkar bû, hemî dewlemandiya xwe danî bû ber lingên eşîrê.

Lê ne eşîrê, ne dikarî bi kêrî gundê ku tê de bi tenê bê. Ma kînga mirovek dikare bi malê xwe eşîrekê qorrî ke!..

Çar hêstir û du xerbende li rêya çiyê di kunberfan[8] de ji nexweşan re berf tanîn. Her roj çar barên hêstiran berf dihat nava gund û ji nexweşan belav dibûn. Du hêstir û xerbendeyek ji rêya Diyarbekirê ne dihat birrîn wî jî her pênc rojan du bar zebeş û qawim tanîn. Hestirek û xerbendeyek jî li ser rêya Rihaye çay, şekir û hin dermanên ku li nik etaran çar dibin tanîn û ji wan bijîşkê Sûdanî hin derman çêdikirin. Goşt û xwarin û ineyweyê Meletiyê ji kesên ku ji nexweşiyê filitî bûn lê hîn qels bûn ra bê jimar dihate dayîn. Ev giş ji bo gundê me, dîsa nedikarî nîvê hewcebûna wan pêk bîne. Herçî eşîr, ji hêştir guh ne digihayê. Hînga xelkê ev kiribû meselok û digotin:"Ma kînga meriyek dikare eşîrekê bi dayîna xwe têr ke". A rast jî ne dikarî gundê xwe yê sed malî têr bike, ma eşîra mezin li kû diman!

Piştî nexweşî kete welêt, dibistanê derê xwe dada, bavê min jî digel wî bijîşkê Sşdanî bi derdê gundiyan de ket û bi carekê dev ji min berda. Ji birbangê heya êvarê digel zarokên ku nexweş neketi bûn me dilîst. Gava min got diya xwe û wê dest da ser eniya min, got :"Mala min şewitî, tu jî nexweş bûye. Serê te wek agir dişewite". Ez xistim himbêza xwe û ji xwe çûme. Piştî çil rojî min çavên xwe vekirin, sitûyê min hişk bûbû, min nedikarî xwe tevbidim. Bavê min jî keti bû nivînê gelekî nexweş bû. Bijîşkê reş bi hin dermanên ku li ser destê xwe çê kirin di nava mehekê de sitûyê min rihet kir; lê pê nebû ku devê mirinê li ser bavê min bide alî. Di meha avdarê(mart) piştî mamostayê min bi çend rojan çû rehma Xwedê. Di nava mehekê de du kesên ku min jê hez dikirin û wan jî hîn pirrtir ji min hez dikirin bi nexweşiyek kambax çûn. Wek her zarrokekî biçûk, deh salî, min xeyda xwe ya li ser herdu miriyan zû ji bîra kir. Lê şopa ku nexweşiyê di cendekê min de hiştî, û ji cendek derbasî can bûyî serekî dirêj ji bîra min neçû. Eger vê qelsiya han ez ji kêf û xweşiya zarotiyê bêpar kirim jî, paşê ez berve kirine mezin dehfdam.

Şopa ku nexweşiyê di can û cendekê min de hişt

[8] Kunberf: qeftîş û şikeftên ku berf di serriyan de dirêjiya salê jê qut mabeê

Gava ez bixwazim di vî warî de bipeyivim nizanim çawan dest pê bikim. Zarokên welêt hemî bi wê nexweşiya malkambax ketim. Hin pê mirin çûn, ên mayî piştî demeke kurt wek berê xurt bûn. Ez tenê ne welê bûm; ez nemirim, lê ne wek zarokên mayî lixwe vegerrîm jî. Mayîneke bêxêr, mayîneke mirî...

Min di birrê berî vî de goti bû ku dema bûnê ez gelekî biçûk, qels û çîvirr hati bûm. Lê demek neçû ez xurt, heye ku pirrtirî hemî zarokan xurt bûbûm. Tenê geda min ji emrê min biçûktir mabû; ev bû dihişt bavê min ji yên dora xwe bipirse û bêje:"Ma gelo heye ku Osman jî wek zarokên mayî girs bibe"?. Raste cendekê min biçûk; lê siheta min gelekî baş bû. Vê carê bi wê nexweçiyê min ew sihet jî winda kir. Bi qasî ku çîvirr bûbûm, ewçend jî qels bûbûm. Bi her awayî ez ji hemî zarokan kêmtir bûm.

Di lîstikan de her gav dewrên pîsik ji min re dihatin dayîn. Ji ber ku hêlê min tine bûn û bez bi min nediket. Vê yekê hîşt ku ez xwe di nav zarokan de kêm bibînim. Ji lewre dema şayî dibûn û def lê diket û zarok diketin govendê ez ne diketim nav wan, ji ber ku min xwe wekî wan ne didît. Çi gava min kês bi dîta ku ji çavan nediyarim ez diketim mesela diya xwe, li ber neynikê xwe şilf û tazî dikir û li cendekê xwe dinêrrîm; ka tiştek jê zêde bûye, an na! Hergav durvê ku min xwe tê de didît ev bû: Seriyekî mezin, du çavin bel, rûyekî çîvirr, sitûyekî zirav, zend û ranên min bê goşt, heya bi çermê min di rengê ariyê de, bi tevayî cendekê min tiştekî kirêt bû.

Vê qelsî û kirêtiya han di nefsa min hinde kar kiri bû ku kêm caran rûyê min dikenî. Ji xwe boblata[9] mezin ew bû ku ez bikenîma, kirêtiya ser û çavên min bi tevayî dixewinî, wek miriyek bikene. Ji ber vê ez ji hemî xweşî û şayîyan bêpar bûm.

Piştî mirina bavê min û nemaze mayîna min holê qels, dilê diya min jî gelekî êşandi bû. Dermanek nema bi min da xwarin û vexwarin. Çi bijîşkek me çav pêketa dê ser û bin li cendekê min bi nêrriya. Ji qelsiyê pêve tiştek di cendekê min ne didîtin û dermanê ku ji bo wê didan jî qet bi kêr nedihatin. Bi qasî ku ez raveyî bijîşkan dikirin, çar ewqas jî pêşberî şêx û melan dibûn. Wan jî her yekî tiştek digot û niviştek ji min re dikir. Her niviştek ji van bi alîkî cendekê min ve bi ser cilan ve dihate dirûtin. Li

[9] Boblat: misîbetî bela mezintirê

gelekî hatibûm guhartin. Ji nûve ez xistim bin çavdariya hin peyayên bîrbir û vegerrandin ser rêya berê.

Bav û mamostayên min di bihara 1915an de çûn rehma Xwedê. Ne wê salê û ne jî sala pê wê hikûmetê ji gundê me re tu Mamoste neşandin. Ji lewre du sal xwendin ji min çûn. Ev dema hêja ji emrê xwe min bi siwarî, avêtina tifingê û nêçîra tajiyan derbas kir. Di siwarî û tifingê de ez gelekî pêşve çûm.

Dawî sala 1917an mamostayek ji me re hat û wê salê min şehadeta îbtîdaî istend. Sala din apê min ez şandim Kextê dibistana Rişdiyê. Di nava sê salan de min şehadeta xwe li wir jî sitand. Ji ber ku bav û birayên min tine bûn, apê min û li piştwî diya min û xelkê malbatê xwestin ji min re jin bînin da ku zarok ji min re bên. Bi vê ramana xar û çepel berê min ji xwendinê badan. Ji xwe hîngê min bihayê xwendinê bîra nedibir, ji lewre min serê xwe ji daxaza wan ya kirêt û bê rê re danî.

Sala 1920an de min şehadeta xwe ji Rişdiyê bir û vegerrîm çûm mal da ku hînî rê û rêzanên eşîrê bibim. Dîsa vegerrîm gund, jîna eşîrî, siwariya hespan û hilgirtina tifingê. Gava şerrên eşîrî dibûn ji bo hîn bûn û awayê gerrandina şerr ez digel şerrevaniyekî sere dişandim şer. Hin tişt ji dîroka malbatê û têkoşîna wê digel hikûmeta Tirk ji bo parastina giyanê xwe, kir û bûyerên mêrxasên malbatê ku ji roja dev ji koçeriyê berdane û di wî erdî de binecî bûne yeka yek ji min re digotin. Bi vî awayî dixwestin min ji bona serekitiya eşîrê pêk bînin. Ji xwe apê min Şukrî çi dema ji nava eşîrê bi derketa biçûya ciyekî, rakirin û danîn, girtin û berdan bi destê min ve berdida. Ji ber ku hîngê min nedikarî hikmine rast bidim, pismamê min Necmedîn alîkariya min dikir. Salên 1921 û 1922 an holê di ser min re borîn.

Sala 1922an payîzê ez hevde salî bûm ku ji min re jin anîn. Piştî salekê ji min re lawek bû (kurrê min Welato) û bi vî awayî û wî cendekê xwe yê qels ji sefê zarokan derketim û ketim sefê peyan; lê peyakî qels û kijmirî. Hîn baş tê bîra min roja ji min re jin anîn, tevî ku ez gihabûm dawiya hevde salê geda min bi qasî ya zarokekî sêzde -çarde salî bû. Dema cilên zavatiyê li min kirin yên dora min gelek di ber xwe de dikenîn. Lê van tiştan giştikan nedikarîn bikevin pêşiya daxwazên Dê û apê min, ku ya pêşîn dixwest berî rojekê zarokên min bibîne û yê paşîn di rex xwe de peyakî ku xwe bispêre peyada ke. Gelek mixabin ku hîngê ne min dikarî bibim bavekî wek bavan, ne jî peyakî wek camêran. Eger cewherê minbaş bûbe jî, durvê min yê hingê bi kêrî van herdu tiştan jî ne dihat.

nik min ewçend niviştgîhan hev ku ji nîşanên wezîrê Hîtler Gorîng ne kêmtir bûn[10].

Çawan ku min ji niviştên şêx û melan xêr ne dît, ji derman û şîretên bijîşkan jî karek nekir û wek xwe man. Di vê navberê de du tişt ji min re bûbûn meraq ku herdu jî ne hewceyî xurtbûna cendek bûn. Yek ji van siwariya hespan û ya din avêtina tifingê. Ji ber ku di hemî listik û tevgerran de ez ji zarokan gişkan qelstir bûm, di van herdu meraqan de ez ketim pêşiya biçûk û mezinan. Di siwariyê de min di wî welatî hemî de pêşî bir. Her çî di avêtina tifingê de ez di nava eşîrê de pêşî dihatim. Bi pêşveçûna di van herdu meraqan de hinekî min xwe dît û di wî durvê reben de derketim.

Di vê koça jîna xwe de çiqas ku min xwe qels nedidît, xelkê jî qîma xwe bi xurtiya min netanîn, ji ber ku hikmê xwe li ser cendekê min didan û cendek qels û bêmirês bû. Vê yeka han dihîşt ez xwe hîn pirrtir çak bikim, an berve çakiyê xwe dehf dim. Bi vî awayî xortên heval û hogir ku xelkê ew xurt didîtin, bi wê texmîna xelkê xapîn û di cihê xwe de man. Her çî ez, ku min baş dizanî, cendekê min yê qels çavê kesî tijî nake, her û her min xwe pêşve dehf didan û bi xêra wê qelsiyê ez ketim pêş heval û hogirên xwe.

Li dinê tiştek bi xweşî û rihetî nakeve destê mirov. Jîn tiştekî welêye ku hergav rihetiyê dixwaze. Xebat bê west û dijwarî nabe. Heya mirov xwe li erdê nebîne, hêzî xwe nake rana be; heya xwe li pê hemiyan nebîne nabeze û nakeve pêşiyê. Pîs ew e ku xwe qels û pîs bibîne, û texmîna xelkê derheqê xwe de rast bizane.

Berve xortaniyê

Piştî mirina bavê xwe ez ketim bin ser û suhna apê xwe Şukrî. Çiqas ku apê min li min hez dikir û digel min baş bû ji ber ku kêm caran dihat gundê me nedikarî kêmasiyên min bibîne. Bi vî awayî ez mabûm di ber destê diya xwe de. Bi qasî ku bavê min ji bo xwendin û terbiyê ez diwestandim, diya min ewçend ez serberdayî hiştibûm. Vê yeka han hinekî ez ji rêya rast şemirandim. Heya apê min agahî rewşa min bû ez

[10] Heya ez sêzde salî bûm ev niviştgîhan tev bi ser, pişt, sîng û gurmikên min ve girêdayî bûn. Paşê min rojekê hemî ji xwe jê kirin û avêtin agir û şewitandin.

Berê, vê yeka han, pêşdetir, piştî apê xwe serekitiya eşîrê kirin, dilê min geş dikir. Di her kir û tevgerrên xwe de min dixwest wek bavê xwe û apê xwe bim. Hemî rê û rêzanên eşîrî hîn dikirin û di demeke gelekî biçûk- wek du-sê salan- de min bi kêrhatina xwe rave kiri bû. Apê min gelekî hez ji min dikir û bawer bû ku ezê cihê wî û bavê xwe tije bikim. Lê paşê, bûyerekê bêhemd rêya li ber min di çavên min de reş kir, mezinatiya eşîrê ku min ji xwe re kiri bû armanc di çav min de xist . Êdî ne tenê min ne dixwest berê xwe bidim wê rê, lê belê min rika xwe didan rêwiyên wê rê jî.

Sebebê vê guherrîna han bi navê Ismaîl efendî mamostayek bû. Vî camêrê han çavên min li ser kirêtiya rêzana[11] Derebegîtiyê vekir.

Ev camêrê ku karî di dilê min de cîkî hêja bigire û rê û rêzaên ku serekî dirêj bav û kalên min li ser çûne di çav min de bêxe kî bû û ji kû û çawan hat gundê me?...

Ismaîl efendî ji xelkê Mîrûnê mamostayekî dibistana 'îdadî bû. Di sala 1923an de ji ber hin ramanên wî yên siyasî, ji dibistana îdadî avêtin dibistana gundê me. Wî ev yeka han ji kesî re nedigot û ev cezayê ha ji xwe re xêr dizanî. Dema baweriya wî bi min hat, hêdî hêdî dilê xwe ji min re vekir, û ji ramanên xwe yên siyasî dixwest di hinekî bi awakî nebîr têxe serê min.

Bê şivîşk Ismaîl efendî baş ez nasîbûm. Wî dizanîn ku serê min hiş û dilê min paqij e, dizanî ku wê bi nermkirina serê min re gelekî biweste. Heye ku hîngê li wî gundê dûrî alemê li ber xwe karekî hêja ne didît ku bi min re xwe westandin dida ber çavên xwe. Ji bo bikare min baş serwextî ramana xwe bike, divyabû gunehên rêzana kevnar û kirêtiyên wê yeka yek bêje min. Gotinan bi hêsanî li min kar ne dikir, ez bi can û cendekê xwe bûbûm perçeyek ji rêzana derebegîyê ya kevnar. Divya bû ew berî her tiştî hînê rêzana kevin di serê min de hilweşîne, heya bikare hînekî nuh deyne. Di hilweşandinê de gelekî jîr û bêhn fireh bû. Bi awakî pirr xweş ez serwextî 'eybî û kêmiyên wê rêzana teres kirim. Ew tiştên ku min berê mêranî û rûmet didîtin , paşê ew tişt di çav min de bûn bêbavî û şermisarî. Ne tenê ez ji rêzana kevin aciz bûbûm; lê ez jê re bûbûm neyarekî bê eman.

Çi dema mirov bibîne ku bi ramanekê hatiye xapandin û ketiye ser rêya şaş ne tenê dev jê berdide, lê jê îkrah jî dike. Bi min re jî welê bû, dema min dît ez bi rêzana kevin hatime xapandin, ez ji rêya rast û

[11] Rêzan: Nîzam.

ramana durist diketim û bê awa min neyariya wê rê û rêwiyên wê yên ehmeq û sitemkar dixist dilê xwe.

Berî ku Ismaîl efendî karê xwe temam bike çû. Midîrê mearif careke din ew vegerrand ser karê wî yê berê. Lê serê min yê ku ji qirrêja rêzana kevin vala kir, kês nedît ku bitiştekî hêja dagire, welê ji min bi dûrket çû. Di vê koça jîna xwe de ez gelekî westîm. Ez bê armanc mabûm, wek deryavaniya ku di nava deryayê de pûsela wî winda be û nizane berê wî bi kûda ye. Wê serê, holê bi koranî, di rêya jînê de bê armanc û rêber ez diçim.

Felişîna Şûreşê

Zanîn û têgihana min di warekî holê de bû ku şûreşa Şêx Seîd dest pê kir; lê ji ber pêknehatina gelê Kurd ji karekî holê mezin re ne çû serî. Kesên ku hîngê li dora Şêx Seîd nedikarîn û ne jî dizanîn rê û rêzanên şûreşan bigerrînin. Ew çend şêx, beg û axayên ku xwe li dora rehmetî dabûn hev, bi qasî hilgirtina ramaneke welê mezin ne serwext û têgihaştî bûn. Ji lewre Şêx seîd tevî birrek leşkerê şûreşê hat li ber sûra Diyarbekirê rawestî û rojen xweyên hêja li dora bajêrr derbas kirin. Birrek ji leşkerê şûreşê tevî çend şêxên mezin berê xwe dan bajarrê Xarpîtê. Bajêrr dergehê xwe bi dilxweşî ji wan re vekir û hatin pêrgîna wan; lê mirîdên wan şêxan destavêtin talankirina bajêrr. Bajarriyan ji bo parastina mal û canên xwe dest avêtin darê tifingê û ew talankerên han ji nava bajêrr avêtin der û li serê çiyan vegerrandin.

Herçî ji aliyê me ve pêşiya leşkerê şûreşê xwe gihand serhêla bajarrê Sêwerekê . Hikûmeta Tirk leşkerekî xurt tîne bo ku li pêş pêla şûreşê rawestiya. Ji lewre pişta xwe didan alîkariya axayên bêbav. Ew axayên ku her tiştên xwe bi dostaniya hikûmetê difirotin. Mihemed Emîn, Evdilqadirê Dirê'î û Haco axa[12] yê Hevêrikî tevî peyayên xwe li ber gundê Qere baxçe ketin pêşiya leşkerê şûreşê û şikandin.

Pêşiya şûreşvanan holê xwe gihand serhêla Sêwerekê, piştî şerrekî xurt li Qerebaxçe ji hev belav bûn. Emên ku li benda hatina leşkerê şûreşê bûn, me li her awayî xwe pêkanîbû û peyayên xwe di sê cihan de

[12] Sala 1930 ez digel Evdilqadirê Dirê'î bûm. Katibê wî Mihemed ji min re salixa şerê Qere baxçe kir û got:"Haco kurê xwe Çaçan bi xwe re anî bû". Sala 1931an gava min Çaçan li Şamê dît û jê pirsî înkar nekir. Haco jî paşê li ser vî şerrî ji min re goti bû ku sebeb, nezanîna wan ya armancên şûreşê bû.

civandibûn ser hev. Wê gavê hin neyarên me yên eşîrî li qeza Pêtirgê tevdîr û tevgerra me bi ser û ber ji hikûmeta Anqerê re dan zanîn. Bi têlgiraf alîkariya hikûmetê dixwestin ku pê şerrê me bikin. Ev yeka han, tevdîra ku hin me'mûrên mezin dixistin pêşneyarên me, li ber vê yeka han divyabû me tevdîra xwe baştir bigirta; lê mixabin ku ji destê me filitî. Cihê ku me bi qencî rêya xirabiyê ji ber neyarên xwe bigirta, me bi ser wan de girt û di nava sê-çar rojan de ji hev tarr û marr kirin.Mezinên wan ji welêt sêser bûn û tevî zarrokên xwe revîn wîlayetên rex me. Ev kira han ji me nîşana xwe şaş kirinê bû, paşê me cezayê wê tevgerra xav çarta da.

Di demeke ku hikûmeta Tirk bi vemirandina agirê şûreşê mijûl bû, ne dixwest dest bavêje me. Di hemî kir û gotinên xwe de dixwest ji me re bide zanîn ku baweriya wî bi me heye. Bi vî awayî, wek kêvroşkê ku bawere bi nedîna nêçîrvanê ku dorê re doş dibe, me xwe xapand heya dora me hat û wî dest avête me.

Piştî ku leşkerê şûreşê ji Xarpîtê bi derket, serekî Diyarbekir di bin hesarê de ma. Heya şevekê pirrtirî sed peyayî bûn. Ji ber ku alîkarî ji kesên ku xwe hevalên Şêx Seîd dizanîn nedîtin, bi sibê re ji bajêrr derketin. Di vê navberê de Mistefa Kemal hemî leşkerê xwe yê li Anadolê gihande ser hev, bi carekê pê dora êrdima şûreşê girt û bê dilovanî li wan da.

Leşkerên şûreşê ku ji mehekê de li dora sûra Diyarbekirê diçûn û dihatin, ne tiştek ji welatîniyê û ne jî ji awa û armancên şûreşê dizanîn. Tenê ji wan re hatibû gotin ku Mistefa Kemal ji dîn bi derketiye, çek û posatên wan jî ne tikûz bûn. Bi vê rewşê gava çav bi leşkerekî xurt û têr çek ketin revîn û terka Şêx Seîd kirin.

Çiqas ku min dixwest ûştên[13] felişîna şûreşê bihêlin ji camêrin qenc serwextî wan ûştan, heya di salixdanê de nekevim şaşiyan. Lê li vir ûştek ji wan heye ku jêderbas bûn teqez[14] gunehkariye, ji lewre dinivîsim. Ma gelo ji bo çi Şêx Seîd li ber sûra bajarrê Diyarbekirê rawestî û pêşve neçû? Dîsa ma gelo ne mikûn bû ku Diyarbekir di bin hesarê de bihişta û berê xwe bida sitandina bajarrên Kurdistanê yên mayî? ma ji bo çi ev yek nekir?

Ji bo em bikarin bersiva van her sê pirrsan bidin, divê serpilkî çêla roja pêşîn ji şûreşê, kira Şêx Evdirrehîm birayê Şêx Seîd û bihîstina Şêxê mezin şîretên Mistefa begê Hênî ji xwendevanan re bikim. Her wekî hemî

[13] ?şt: Sebeb.
[14] Teqez: Miheqeq.

kesên bi şûreşa Şêx Seîd re bendewar bûne qenc dizanin ku "Şûreş bê hemdî Şêx Seîd û berî dema wê çê bû". Gava li gundê Pîranê deng bi tifingê ket, çiqas ev yeka han ne bi dilê Şêx Seîd bû lê ne dizanî ku serhişkiya birayê wî Şêx Evdirrehîm kêsa pêrabûna şûreşeke sorbûyî ji gelê Kurd bir. Ev çîrroka ûşta bûyîna şûreşê herwekî ji min re hatiye gotin.

Piştî ku hikûmeta Tirk Xalid begê Cibrî û hevalê wî Ilyas beg girtin, Xalid begê ji Şêx Seîd re xeber şand ku rê nedin tu lihevxistinan. Hîngê Şêx derketibû nav eşîrên Zazan îrşadê. Kûde biçûya ne kêmî du sed siwar digel bû. Dema gihan gundê Pîranê sê peyayên mehkûm ku li pêş bîst jendirmeyan û zabitekî dirrevîn xwe avêtin nav gund. Li ser rê û rêzanên eşîrî divya bû zabitê Tirk li pey wan neçe gund û wan bide xatirê Şêx Seîd ku mêvanê Pîranê bû. Lê zabitê Tirk welê nekir, hat ber gund û dana wan hersê peyan xwest. Şêx Seîd herwekî adetê peyayekî xwe şande nik zabit û jê hêvî kir da wan wê carê bide xatirê wî. Lê zabitê Tirk hêviya Şêx qebûl nekir û bi dilgermî hersê peya xwestin. Hînga Şêx Seîd gote birayê xwe Evdirrehman:

-Herre wan hersê peyan bide dest zabit. Em naxwazin li ser tiştekî holê biçûk keysa neqenciyê bidin destê hikûmetê.

Şêx Evdirrehîm bi qasî ku tiştên holê bîra bibira ne peyakî jîr bû. Gelekî jê re giran hat ku zabitê jendirman gotina Şêx Seîd nebihîst. Cihê ku gotina Şêx bîne cî û hersê peyan bide destê zabit, çû hin gazinên hişk û giran jê kirin. Zabit jî nedizanîn ku ew birayê Şêx Seîd e, hin gotinên kirêt gotinê, hînga Evdirrehîm lêda ew kuşt û peyayên digel Evdirrehîm jî hemî jendirme kuştin. Şûreşê holê dest pêkir.

Holê serê ben ji destê Şêx Seîd derket, bêhemdê wî agirê şûreşê bi destê birayê wî Evdirrehîm hat dadan. Li ber vê yeka han du rê li pêşiya Şêx Seîd mabûn. An divyabû birayê xwe tevî çil- pêncî zilamên Zaza ku digel Evdirrehîm jenderme kuştin teslîmî hikûmetê bikira, ku va ne mikûn bû. Eger Şêx Seîd ev rê bida ber xwe nedikarî bike. Êdî milet bi çavê lehengekî li evdirehîm dinêrîn, eger Şêx ji dil bixwasta jî ne dikarî tiştekî holê bike. An jî tevî birayê xwe ji welêt bi derkeve, ku rêya rasttir ev bû û Şêx jî berê xwe dabû vê rê. Ji xwe daxwaza Xalid begê jî ew bû ku Şêx ji welêt bi derketa. Piştî ku Evdirrehîm ew şaşî kir divya bû bê dudilî di welêt de li derketa. Lê hatina Salih begê Hênê û birayê wî Mistefa begê ya Pîranê rê li pêş Şêx Seîd guhast.

Roja ku li Pîranê tifing teqî tiştek ji ramanên şûreşî di bala Şêx de tinebû, wî çav ji derketina ji welêt bû. Heya Xalid begê jê re çûna Îranê

leşkerê Mistefa Kemal ê têrçek tevî giraniyên xwe giha axa Kurdistanê Leşkerê Şêx yê bê çek li dor sûra bajêrr hêviya xwe ji serdestiyê birrî bû. Bi hatina leşkerê Tirk pirr xurt re, kesên ku ji bo şûreşê xwe li dora Şêx dabûn hev birr bi birr, eşîr bi eşîr jê qetîn û Şêx bê heval hîştin.

Gava Şêx dora xwe ji şûreşvanan vala dît, digel çend siwarên ku pê re mabûn berê xwe da welatê Serhedê. Di vê rêya han de, birayê wî Evdirrehîm, ku bûbû sebebê vekêtina agirê şûreşê jî ne heval bû. Bi rê ve siwarên ku bi Şêx re rojê hinek jê veqetîn, heya Çasim begê Cibrî ew bi gengazî girt û da destê leşkerê Tirk.

Paşê bi darvebûna Şêx Seîd rehmetî digel 49 peyan li Diyarbekirê hemî xwendevan. dizanin. Eger Şêx hat bi darvekirin jî, şûreşa ku wî sazkirî ji bo têkoşîna gelê Kurd bû bingehekî çak.

Dûmahîka Şûreşê

Çiqas ku Tirkan Şêx Seîd tevî gelek hevalên wî yên hêja bi darve kirin jî, agirê şûreşê venemirî. Ji alîkî kesên ji hikûmetê nexweş cih cih, yek li pê yê din radibûn, ji aliyê din Mistefa Kemak dabû çav xwe ku di axa Kurdistanê de seriyekî xurt nehêle. Çi kesê çar peya li dorê bicivîna divyabû di welatê kurdan de nemîne. Li ser vê siyaseta han bi dor dest avêtin hemî malmezinên kurdan, û peyayên sere. Ji van herçî kesên pirr hindik xwe tev da bûn, didan mehkema Isteqlalê. Yên bi carekê xwe tev neda bûn bêdeng dişandin surgûnê, da careke din li axa welêt venegerrin. Pêla wê surgûnê xwe gihand kesên ku berî şûreşê mehkûm bûye jî.

Piştî darvekirina Şêx Seîd bi çar, pênc mehan dor hat malbata me jî. Rojekê ji rojên peyîza 1925an ser êvarê têlgirafek ji Mehkema Isteqlalê hat, apê min Şukrî digel 480 milîsên ku me navên wan dabû hikûmetê dixwestin mehkemê. Ez û gelek peyayên malbatê di nava yên hatî xwestin de bûn. Piştî civîneke malbatê me qîma xwe bi çûna apê min Şukrî û Xalê min Hacî anî. Bi şertê ku em ên mayî tev de neçin û çavnêrriya dawiya mehkemê bikin.

Apê min Şukrî digel xalê min Hacî heya Melatiyê serbest birin; li wir bi şûnde girtî gîhandin Xarpîtê. Piştî ku gelek kurd li Diyarbekirê bi darvekirin mehkema Istiqlalê hatibû Xarpitê. Herdu girtiyên me li wir mehkeme kirin. Serekî kin em ên mayî (480) kes xwestin; lê paşê dev ji

baş dîtibû. Lê gava Salih begê Hênî digel birayê xwe Mistefa beg hatin Pîranê û hevrûyî[15] Şêx bûn, qîma wî bi lêdana hikûmetê anîn.

Li vir mikûne xwendevan bipirsin û bêjin: Ma gelo Salih begê Hênî ku evqas li nik Şêx Seîd bi rûmet bû kî ye? di vê em serpilkî ji xwendevanên xwe re salixdin.

Salih beg ji malmezinên Hênî ye. Goreyî ji min re hatiye gotin, di nav tebeqa xwe- beg û axa- an de peyakî jîr zana û serwext bûye[16]. Lê berberên wî di nava Hênî de zora wî biribûn û aliyê hikûmetê jê sitandi bûn. Ji lewre wî jî xwe da bû aliyê neyarên hikûmetê. Hîngê li Kurdistanê li nav her eşîrê û her bajarrî berberî hebû ku îro jî welê ye. Çi kesê bikariya xwe bida hêla hikûmetê û biba xulamê wê, berberê wî mirovî dibûn dijminê hikûmetê. Salih begê Hênî jî welê lê hati bû, berberê wî hevalbendê hikûmetê û ew jî bûbû dijminê wê. Ji vê pêva Salih beg mirovekî gelekî dîndar û zana bû, vê yekê benê dostaniyê di navbera wî û Şêx Seîd de xurt kiri bû. Ji lewre baweriya Şêx Seîd pê gelek bû û gotinên wî baş dibihîstin. Salih begê di dsetê berberê xwe û hikûmetê de gelekî tehlî didît. Çi kesê tehl bibe dijwariyan hêsanî dibûne, tenê dixwaze ji halê ku tê de bi derkeve. Welê bawer dibe ku ji halê wî xirabtir nema dibe. Salih beg jî di rewşeke holê de bû ku tifing li Pîranê teqî û xwest wê bûyerê ji derdê xwe re bike derman;lê bû dermanekî bi jehr, ne ji bo wî tenê, ji bo hemî Kurdan.

Piştî ku Salih beg digel birayê xwe Mistefa beg du şevan li Pîranê man qîma Şêx bi rabûna şûreşê anîn û roja dûtirê digel hin eşîrên Zaza ajotin ser Diyarbekirê. Çiqas ku leşkerên Tirk di bajêrr de pirr tinebûn jî, sûra dor bajêrr rê neda şûreşvana ku derbasî nav bajêr bin. Berî ku hikumeta Anqarê leşkerên xwe ji çarmedorê welêt bicivîne ser hev, Şêx Seîd dikarî hemî bajarrên Kurdistanê bê dijwarî bistîne. Lê ji ber ûşteke bêvac[17] hemî leşkerê şûreşê li ber sûra Diyarbekirê rawestîn, heya leşkerê Tirk xwe gihande ser wan. ?şta ku leşkerê Şêx Seîd li ber sûra Diyarbekirê hîşt ev bû:"Kurrê Mistefa begê Hênî mehmûd beg di zîndana bajêrr de bû, ditirsîn eger hesar li ser bajêrr hildan, Tirk wî bikujin ". Holê ji bo xilaskirina mirovekî dev ji welatekî berdan. Dawî Tirkan ew mirov (Mehmûd beg) digel bav û apê wî tev Şêx Seîd di rojekê de bidarvekirin.

Heya leşkerê Tirk li Romêlî û Anadolê gîhan serhev pirrtirî mehekê ajot. Ev dema han ya hêja tev li ber sûra Diyarbekirê bê fêde borî. dema

[15] Hevrû: Miqabele, hevdîtin.

[16] Min herdu kurrên wî Seîd û Emer li zîndana Diyarbekirê û birayê wan yê biçûk Hesen li zîndana Edenê dîtin. Ji terbiya wan serwextiya bavê wan xweû xuya dikir.

[17] Bêvac: Bêmentiq.

me berdan û nediyar[18] mehkema me kirin. Her wekî ne adet bû, mehkema apê min 6-7 celsan ajot.

Heya hîngê ji mehkema Şêx Seîd pêve tu mehkeman pirtirî du celsan ne ajoti bû. Sebebê vê yeka han, Ismet Paşa ku hîngê serekwezîr bû, xwe xisti bû nava çîrrokê. Wî ji ber du ûştan ne dixwest ku hikim bidin apê min:

?şta pêşîn: Ismet ne dixwest navê wîlayeta Melatiyê bikeve nava wîlayetên rohelat ku bi hin qanûnên xas wê bihatana gerrandin.

?şta din: Koma mehkemê di parlimana Tirkî de ji xêrnexwazên Ismet bûn, û neyarê Hacî Bedir beg şandiyê Melatiyê, û yarê neyarên me bûn; ji lewre dixwestin apê min bi darvekin.

Li ser mehkema apê min şerrekî xurt ket navbera Ismet û Koma mehkemê. Dawî çiqas ku hîngê berçiya di navbera Ismet û Koma mehkemê de dibûn her hefte Hacî Bedir begê haya me dikir. Mehkemê nedikarî apê min bi darvekirina jî, her wekî Ismet xwestî berat jî nekirin. Jê re panzde sal hikim dan û emên mayî berat kirin.

Ji xwe sebebê ku mehkema me 480 mêrî nediyar bû, têkiliya Ismet bû. Gava apê min panzde salan hikim kirin Ismet gelekî tehil bû û bê dilovanî dixwest koma mehkemê biêşîne. Hînga Hacî Bedir begê li ser vê yekê ji min re nameyek şandibû. Têde digot:"Hikmê ku ji apê te re hate dayîn, ji bo rika min û Ismet paşa bû. Piştî hikim min Ismet dît, gelekî tehil bûye. Me hemî tertîbat girtine, wê apê te bînin Edenê û li wir çend rojan bihêlin. Di van çend rojên pêş me de Xazî paşa diçe Edenê û Mersînê. Ez û Ismet dê digel wî bin. Dema bên Edenê li ser zimanê apê te emê nameyekê bidin Xazî paşa ku Sitemkarekî lê bûye. Di destê me de delîl hene ku koma mehkema Istîqlalê di hin meselan de gelek pere xwarine. Ev wesaîq linik Ismet paşa ne. Me tifaq kiriye ku apê te ji nû ve bidin mehkema Istîqlal ya Anqerê û pê bidin beraet kirin. Hîngê kêsa me tê ku em koma mehkema Istîqlal ya rohelat bi tevayî bidin mehkema Istîqlal ya Anqerê û têxin zîndanê. Di vê ji apê te pêve kes vê yekê nizanibe heya em derba xwe lê didin...".

Kesên ku rûmeta Hacî Bedir li nik mistefa kemal û Ismet dinasim vê yeka han jê re zêde nabînim.

Dema apê min Şukrî li Xarpîtê li ber mehkemê bû, ji bo pêşendeyê Kurdistanê û sazkirina şûreşê digel hin Kurdên mezin dizîndanê de

[18] Ne diyar: Ne xuya. Xaib.

peyivî bû. Ji van camerên han îro tenê navê Hesen Xeyrî[19] yê Dêrsimî di bîra min de maye. Li ser vê yekê gotina wan bûbû yek:

"Çi kesê ji wan ji darvekirinê bifilite, bi çi awayî be divê di nav lepên hikûmetê de birreve û agirê şûreşê xurt bike heya Kurd serxwe bibin. Ew mêr bi rûmeta xwe sond dixwin ku bi xweşî ji erdê Kurdistanê neçin der û serên xwe ji hikûmeta Tirk re daneynin".

Li ser vê gotinê sondina mezin xwaribûn, ne mikûn bû ku li gotina xwe vegerriyana. Dema apê min hikim bû digel xalê min Hacî xeber şand ku bi çi awayî be ji Kurdistanê dernekeve. Paşê tifaqa di navbera wî û Hesen Xeyrî de ji min re salix da û got: Çi gava ew têlgirafê bide û ji te du sed zêr bixwaze, divê tu herrî wî ji nav lepê jendirman bi derxî.

Hîngê apê min li Xarpîtê û demsal[20] zivistan û çiya bi berf bûn. Gava bixwastana wî bişînin Muxlê jê re du rê hebûn: Yek jê, Melatiye- Sêwas-Anqere. Ya dî, Diyarbekir- Riha - Edene bûn. Ji ber ku dinê zivistan û çiya bi berf bûn, berê wî dan ser rêya paşîn. Diyarbekir-Riha-Edene.

Ji bo ku ji apê min re di êrdima wî de rûmetek mezin hebû û ji hêla dî bendewariya ku Ismet paşa jê re rave kirî hiştin ku mehkeme ji bo çûna wî ya rê, hin gengaziyan nîşan bide. Ew gengazî, li ser hesabê xwe wê li Xarpîtê bi rêketa û wîlayet bi wîlayet biçûya Muxlê. Zabitek û du jendirme li ser dirêjiya rê wê pê re biçûna, ji wilayetekê heya wîlayeta dî du jendirme, ku temamê wan çar jendirme û zabitek; ji bo siwarbûna wan du otomobêl girtin. Yekê apê min zabit û pismamê min Necmedîn ku ji bo xismeta wî pê diçû; ya dî wê her çar jendirme lê siwar bûna. Mesrefa wan ya rê çûn û hatin hemî li ser apê min bû. Ev bî gengaziya ku mehkemê jê re nîşan da bû û bi vî awayî revandina wî gelekî hêzanî bûbû.

Rojekê ji rojên sibata 1926 an dinê rojî, ser êvarê têlxirafa apê min hat, dixwest ku jê re du sed zêr bişînim Rihayê. Ji roja ku xalê min li Xarpîtê vegerrîn min xwe ji bo çûnê kar kiri bû. Sibatirê min şeş siwarên xwe girtin û li xar berê xwe da Rihayê. Navbera min û armancê sed kîlomatir bû; lê divyabû ez wê rojê bighamayê. Heye ku bi pêş min keta û kêsa sitandina wî ji zabit ji min biçûya. Ji lewre min hevalên xwe tevî hespan gelekî westandin. Berê roava li du saeta em gîhan Rihayê, me ji garacê pirsî hîn nehati bû. Min peyayên xwe digel hespan di xanekê de bi cih kirin û mam li benda hatina wî.

[19] Hesen Xêrî piştî ku min apê xwe revand tevî hevaline xwe hat li darvekirin û rêya xebatê ne ketê.

[20] Demsal: mewsim, dema salê.

Em kesên eşîrî hînî kirina tiştên veşartî nebûbûn, ji lrewre dema ez ji nav eşîrê bi derketim, çend kesan dizanîn ku ez ji bo çi diçim. Gotinek me Kurdan heye dibêjin:"Çi gotina ji nava du mirovan derkeve nema tê veşartin". Ji vê pêve em qenc bawer bûn ku heya du sê rojan kes nabihîse, di vê navê de em ê wî xilas kin. Lê her wekî me ji xwe re hesab kirî ne bû, dema gîha Diyarbekirê baraneke xurt hat, pênc rojan venekir. Hîngê rê ne wek îro baş bûn, dema baraneke xurt bihata, du rojan otomobêl nedişuxulîn. Vêcarê pênc rojan baran hat û ew heft rojan li Diyarbekirê man. Di vê navberê de neyarên me yên ku bihîstin ez çûme apê xwe birrevînim, zûka haya hikûmetê kirin û xeber gîha zabitê digel wî. Li ser vê îxbarê roja dudiyan li Diyarbekirê apê min li mêvanxanê rakirin birin hepsê û li Rihayê birrek casûs û polîs berra pê min dan. Eger me bi alîkariya rasthaineke baş bûya min nedikarî apê xwe birrevînim û ezê biketama nava lepên polîs û guhbelan. Heya rasthatinê kiri bin ku roja paşîn ez bi sed belayî ji destê guhbelekî[21] tevî peyayên xwe filitîm. Ev e ya ku li min qewimî.

Heft rojan
Polîs li ser şopa min

Dema ez gîham Rihayê û min dît apê min nehatiye, hinekî dilê min rihet bû. Me digel hespên xwe dikarî hinekî vehêzin. Kesên ku siwariyê dinasin, dizanin ku di rojekê de sed kîlometir çûyîn çiqas hespan û siwaran diwestîne. Nemaze di vegerrê de jî me dê ew sed kîlometir di rojekê de, an kêmtir, bibirrîna. Ji lewre em hewceyî rihetiya rojekê an didiyan bûn. Vê şevê baranê dest pê kir û yekser barî. Dilê min hîn pirrtir rihet bû, mana xwe emê pirrtirî rojekê rihet bimana. Lê gava sibetirê û şeva din û li pê wê roja din baranê venekir , tirs kete dilê min.Ji ber ku tevdîra me ne ewçend veşartî bû, ne dûr bû ku hikûmet bibihîse. Li ser vê ramanê min çavên xwe vekirin û xwe ji her texmînê re pêkanî.

Berî her tiştî min nehîşt peyayên min bi derkevin nava bajêrr. Min ew di xanekî qatê banî de veşartin, siban êvaran xwarin vexwarin û cigarên wan diçûn cem wan. Paşê min cihê xwe guhart û du şevan li cihekî ranezam. Cihê ku ez berê lê mêvan bûm temî kir çi dema polîs pirsa min bike, bêje:"hat û piştî du rojan çû mal". û zûka haya min bike. Piştî min ev tevdîra girt bi 24 saetan polîs pirsa min kir. Jê re hat gotin ku: hat û çû, zûka haya min kirin. Di nava bajêrr de gelekî bi hişyarî digerîm. Tevî

[21] Guhbel: Casûs.

ku polîs ez ne dinasîm, min durvê xwe bi carekê guhartibû. Her êvar ez diçûm du cihan. Yek garac, ka apê min hatiye an na. Yek jî diçûm xanê ka peyayên min hewceyî tiştekî ne an na.

Her roj pirsiyariya polîs li ser min pirrtir dibû. Jê xirabtir rojên çaran û pêncan gelek kurmancan jî pirsa min dikirin û her yekî bi hincetekê dixwest ez bidîtama. Biqasî wan jî nas û dostan pirsa min dikirin, min jî ewçend xwe vedişart û ewçend jî hêviya min ji xilas kirina apê min hindik dibûn. Mafir ku evqas dabûn pey min, bê şik çavdariya ser apê min jî zêde kiri bûn. Mana xwe kira ku min girti bû ser xwe gelekî dijwar bûbû.

Bi şev gava ez diketim nav nivînê rêya xewê bi çavên min ne diket. Roj bi roj hêviya min bi xilaskirina apê min qels dibû, dawî gava ez destvala vegerrîma mal yar û neyaran dê çi bigotana? Paşê hikûmetê dev ji min bernedida, bê ku bikarim tiştekî bikim wê ez bavêtama zîndanê. Ji van hemiyan tehiltir û dijwartir ku apê min nema careke din bi karîna min bawer dibû û karine hêja dispartine min. Ev bû ya ku dilê min dêşand. Çiqas min dida berhev, dida serhev, bê xwe sipartina Xwedê min rêyek li ber xwe ne didît. Dema min xwe dispart Xewdê, dilê min hinekî rûdinişt û ez di xew va diçûm, bê şik xewneke xilxilî û ne rihet.

Siban gava min çavên xwe vedikir ji pirsiyariya polîs û guhbelan pêve tiştek ne dibihîst. Vê jî roj bi roj, bi awakî ecêb zêde dikir.

Roja pêncan baran sekinî, rojên şeşan, heftan û heştan çûn apê min nehat. Ez ditirsîm ku wî vegerrînin ser rêya çîyan; Melatiya- Sêwas-Anqere. Gava wa bikirana, min nedikarî daxwaza apê xwe bînim cih û dirêjiya emrê xwe li pêş wî şermisar bimama. Roja nehan heya ser êvarê min bê hêvî û bi dilekî şikestî derbas kir. Hin ji vê xirabtir, wê rojê dilê min hêviya xebereke ne baş jî dikir. Mafir hêviya xilaskirina apê min qels bûbû, çiya nebaş bibûna wek hev bû. Mirin bi xwe di çav min de xweş bûbû; lê ka mirin? Ma ji mayîna destvala vegerrîm hezar qatî ne çêtir bû?....

Erê, roja nehan ser êvarê bû, ez çûm xanê ku li halê peyayên xwe bipirsim û li wir jî herrim garacê. Li ber derê Xanê min tîra xebera nebaş di serçavê guhbelekî teres de dît. Guhbelek bi ser şopa me ve bûbû, lê hîn xeber ne da bû kesî. Berî ez werim bi du deqîqan ji peyayên min yek ku navê wî Heyderê Mihacir bû, cigare jê xilas dibin û dadikeve jêr ku ji xwe re cigaran bikirre. Yek ji guhbelan ku baş Heyder dinasî di wê gavê de li ber derê xanê bû. Wî qenc dizanîn ku Heyder peyayê me yê tifingê ye. Bê dudilî dest davêje pîsîra Heyder û digire. Xwediyê xanê ku yarê me bû û mêrekî xurt bû xwe digehîne wan û jê dixwaze?

-Tu çi ji wî dixwazî?

Bê ku yê guhbel rûyê xwe biêşîne lê vedigerîne:

-Berî şeş salan vî mirovî ez li vilan cihî şêlandim. Bergîra min, tifinga min û pêncî zêrrên zer ji min sitand. Yan niha ew tiştên min dide û yan jî ezê wî bidim destê polîs.

Di wê demê de ez gîham ber derê xanê, pêsîra Heyder di destê wî guhbelê teres de û milê wî jî di destê xudiyê xanê Şukrî de. Ev bû bela ku ji dilê min re xuya bûbû, ma ji vê xirabtir çi dibû?

Bêhemd min xwe avêt pêş û bi xeya gotê:

-Tu derewan dikiye, wî kes di emrê xwe de ne şêlandiye. Ma tu wî nas dikî?

Bi xwînsarî li min vegerrand:

-Erê, ez wî dinasim, navê wî Heyderê Mihacir e, eger ez ne şaşbim tu jî Osman Sebrî yî.

Piştî ku hinekî sekinî bi ser ve kir.

-Tu dibînî ez her tiştî dizanim, ma tu yê perê min ne dî?

Vêcarê raste rast berê xwe dabû min. Dixwest berî me bide destê polîs tiştekî xwe ji me bistîne. Em di vî helî de, min dît ev e Necmedîn hat derbasî xanê bû. Piştî ku guhbelekî em bi cî kirin apê min hat. Divya bû bi çI awayî be em wî bidin rawestandin, heya haya polîs neke. Eger me pere bidanayê dê haya polîs bikira. Him pere dibirin û him jî xizmeta polîs dikir. Lê gava me jê re bigota ezê sibe bidim te, heya pere ji me nebirana haya polîs nedikir. Paşê wî baş dizanî ku ez li bende hatina apê xwe me, tenê wî ne dizanî ku apê min wê gavê hat gîha Rihayê.

Min bê dudilî û tirs gotê:

-Tu baş dizanî ku Heyder kesî naşelîne. Polîs tu berra pey min dane ku cihê min raveyî wan bikî û ew jî hemberê xebata te tiştekî bidin te. Were ez û tu bibin dost û ezê perê te bi temamî bidim tu jî devê xwe bigre, baş e?

-Baş e. Perê min bide, devê min venabe.

-Gelek baş, perê te pêncî zêrr, bergîra te deh zêrr.

-Na heqê bergîra min bîst û du zêrr bûn, bila ji bo xatirê te bîst zêrr bin.

-Baş e, bergîr jî bîst zêr bûn heftê zêr, tifing jî deh zêrr bûn heştê zêrr. Sibe di saet dehan de were vir, ezê heştê zêrrî bidim te.

-Na divê tu niha bidî min, an na ezê haya polîs bikim.

-Tu haya polîs bikî ez tiştekî nadim; lê dema bihêlî sibê ezê heştê zêrrî bidim te.

Piştî serekî fikirî got:

-Eger Şukriyê xancî dibe kefîl ezê sebir bikim.

Şukriyê xancî got dibe kefîlê min. Welê guhbel dev ji min berda ku sibê were him peran bistîne û him jî haya polîs bike. Li ser vê dev ji me berda û çû bi hêviya ku sibetirê heştê zêrrî bistîne. Me jî ew ji rûyê xwe kir bi hêviya ku wê şevê karê xwe biqedînin û apê xwe ji destê hikûmetê bi derxim.

Piştî çûna guhbel min ji Heyderê Mihacir zanî ku wî guhbelî Heyder berî salekê li mala Seîd begê Badillî nas kiriye. Me her tişt nas kir û zanî ku kî guhbelên Kurd berra pê me didiye. Paşê ez çûn cem Necmedîn û em li ser şûxulê ku ez pê hatî peyivîn.

Necmedîn ji min re da zanîn ku çawa îxbara hatî dayîn li Diyarbekirê gihaye wan, û çawan apê min li mêvanxanê birine zîndanê û paşê çawan li Sêwerekê dilê zabit xistine cî û careke din li ser berpirsiyariya xwe apê min biriye mêvanxanê, bi ser û ber salixda. Bi ser ve got:"Niha apê me tevî zabit û du jendirman li mêvanxanê ne; lê zabit ji bo şikê dike. Heya qîma xwe bi min nîne û divê ez bi şev dûrî apê xwe bimînim".

Min ji Necmedîn re nameya Hacî Bedir begê xwend û jê re jimara rojnama Cimhûriyet ya berî rojekê da ku tê de ev nûçe hebû:

"Di nava sê-çar rojên pêş me de Xazî paşa berve Qonye-Edene û Mêrsînê bi seyahetekê radibe. Di vê Seyaheta han de serekwezîr Ismet, tevî wezîrên Daxiliyê û Zîraetê, hin şandî û rojnamevan hevaliya wî dikin. Piştî ku heftekê li van her sê bajarran bibore dê vegerre Anqerê".

Min gote Necmedîn: ji apê me re têxistiyên nameya Hacî Bedir begê bêje û jê re vê jimara rojnamê jî bide, piştî wê çi dixwaze em dê welê bikin. Paşê tu rewşa me dibînî ku çawan cih li me teng bûye, eger hûn îro nehatana, em îşev ji bajêrr derdiketin. Te dît ku guhbel çawan em bi cih kirin û min çawa ew xapand. Bi lez daxwaza apê me bighîne min, heya bizanim ezê çI bikim.

Min xwest digel Necmedîn herim mêvanxanê, nehîşt ez herrim, got wê piştî du saetan vegerre nik me. Di vê navberê de me êmê hespan dayê û siwaran jî şîv xwar. Hin du saet temam nebûbûn ku Necmedîn hat, daxwaza apê me holê gote min:

-"Min her tişt jê re da zanîn. Ew naxwaze hêviya qenciyê ji hikûmeta Tirk bike û naxwaze ji erdê Kurdistanê jî derkeve. Divê tu siwarên xwe bigirî di saet nehan de herrî derî bajêrr qesra Hacî Bedir begê û li wir li benda me bimînî heya sihoran. Eger heya hîngê nehat negiha te, divê derkevî ser rêya Ordiyê(Sirûc), hespan dûrî rê veşêrî û di ber pirê de li bende hatina otomobêlên me bî. Dema tên ser pirê li otomobêla paşîn xin, Çar jendirme tê de ne, herçî ya pêşîn apo li xwe digire, we şeşarê ji

zabit bistîne û her tişt diqede. Na gava berî sihorê hat hewceyî van tiştan yekî nîne".

-Ma hêviya hatina wî berî sihorê heye?.

-"Erê, pişti tu digel siwarên xwe herrî qesra Hacî Bedir begê, ezê digel Şukriyê xancî peyakî binînim û têxim şûna pandiyê[22] otêlê, eger zabit raza û karibû xwe ji jendirmeyên nobedar xilas ke, ew peya dê apo di rêne nependî re bîne cem te".

-Lê tu, dê li kû bimînî?

-"Piştî ku peyakî têxim şûna pandiyê mêvanxanê dê bême cem te. Gava heya sihoran nehat, mana xwe nema dikare li mêvanxanê birreve. Hînga tuyê digel siwarên xwe herrî ser rê û ez jî bi rohelat re herr im mêvanxanê da ku digel wan biçim. Nebî ji bîra nekî otomobêla pêşîn em tê de ne lê nedin".

Necmedîn ji me qetî ku digel Şukriyê xancî peyakî têxe şûna pandiyê otêlê. Di saet nehan de min siwarên xwe birin qesra Hacî Bedir begê derî bajêrr. Di saet yanzdehan de Necmedîn hat, kêfa wî baş bû. Min jê zanî ku bi bîst zêran pandiyê mêvanxanê razî kirine û cihê xwe daye peyakî me. Tê dûre ku berî sihoran apê me bê şerr û xwîn rijandin ji destê wan bifilite.

Necmedîn peyakî aşîtîxwaz bû ji rijandina xwînê hez nedikir. Gava dît mikûne bê lêdan û kuştin dê apê me bifilite, zehif dilxweş bû. Me nedikarî rakeve, ez ne bawer bûm ku apê min kêsa revê bibîne, an dilê min dixwest ku em bi zor ji nav destê zabit û jendirman biderxin. Ji lewre dirêjiya şevê min rê û tevgerra sibetirê di ber çavên xwe re dibir û tanî. Şev dirêj bûbû, saet wek rojan dirêj bûbûn, min dixwest zû apê xwe bibînim.

Gava saet bû dudu û nîv min siwarên xwe hişyar kirin, çavên xwe şûştin û çûn ku hespan zînkin û lîwanan bi ser xin. Hîn ji pêkanîna hespan xilas nebûbûn ku topa sihorê hat avêtin. Min zûka Necmedîn hişyar kir ku jê biqetim. Dema ku ji bo reva apê min hatibû nîşandan topa sihorê bû, gava heya hîngê ne revî, nema dikarî li bajêrr birreve. Hîn Necmedîn ji nivînê bi dûr neketibû ku di nava bajêrr de deng bi tifingê ket, wek şerr bibe ji her alî bajêrr dengê tifingan dihat. Ji me re hêviyek çê bû ku apê me xilas bûbe, ji lewre me da çav xwe ku nîv saeteke din xwe ragirin. Navbera me û mêvanxanê bîst deqîqe tine bûn. Çiqas qesir derî bajêrr bû; lê ne dûr bû. Panzde deqîqe çûn me dît peyayê ku Necmedîn xistî şûna pandî hat, mizgîn da me û got:

[22] Pandî:bekcî, haris, yê dipê.

-Apê we li derve li benda we ye, bi me hesiyan, bikin lez zû siwar bin.

Bi lez me xwe avêt derve, hesp lîwankirî hazir bûn. Zûka me xwe gîhande apê min û siwar bûn û bi xar me berê xwe da bakur û me ajot.

Ji bo em bikarin xwendevanan serwextî awayê revê bikin divê em guh bidin salixdana apê min:

-"Piştî ku têlxirag giha zabit ku Osman derketiye pêşiya apê xwe ji bo birrevîne li Diyarbekirê ez ji mêvanxanê birim zîndanê. dema ez anîm Sêwerekê bi alikariya hin dost me bawerî dayê ku ev îxbara han derewe û kama dijminan ji îxbarê rihetiya min revandine. Li ser vê qîma xwe anî ku min nebe zîndanê lê gelekî hişyar ma. Tu ku û tevgerrên min ji ber çavên wî nedifilitîn. Li Rihayê ev hişyarî çarqat bû. Min ne dikarî xwe tevdim , zûka destê zabit diçû ser şeşarê. Digot: Mafir dilê te û revê nîne dilê xwe ji van kirên min negire, ev ji hişyarî ye. Min qîma xwe bi gotin û ramana wî tanîn digot: nexeme. Êvarê me şîv xwar û piştî hinekî ez ketim nav nivînê; lê zabit ne cilên xwe xistin û ne jî raza. Serekî dirêj min çavên xwe girtin, heye ku ew jî razê; lê bêfêde bû, ranediza û şeşar di nava destê wî de bû. Holê saet bû yek, yek û nîv, dudu; hê ew hişyar bû. Êdî hêviya min ji reva nava bajêrr qut bû, piştî hinekî dê topa sihorê bavêtana. Saet di sisê kêm çarîk de ket xew û şeşar di nava destê wî de ket nava ciyan. Bi lez min cilên xwe wergirtin; li pêş min jendirmeyê ber derê oda mabû. Ji bo wî min dabû çav xwe ku ji ber derî rakim û tevî tifingê bavêjim jêr[23]. Dema derketim ber derî, min dît jendirme raza bû û tifinga xwe siparti bû dîwêr. Bêdeng ji mêvanxanê derketim ber derî, peyayê ku xistibûn şûna bekcî kete pêş min û bi rê ketim. Hîn me deh gav navêti bûn ku topa sihorê hate avêtin. Xuyaye zabit bi dengê topê re hişyar bû, gava ez di nav nivînê de ne dîtim şeşara xwe di pencerê re vala kir. Piştî dengê şeşara wî bi hinekî ji her alî bajêrr deng bi tifingan ket. Hînga me ji lezê da bezê, di zikakên teng û nependî re em ji bajêrr derketin û hatin qesra Hacî Bedir begê cem Osmên".

Ev tiştê ku apê min li ser awayê reva xwe serbilkî gotî.

Rêya di navbera Rihayê û welatê me rast bû ango hemî deşt bû. Ji bextê çê hîngê li nik polîs û jendirmê Tirk otomobêl tine bûn ku pê bidin ser şopa me. Tenê zabitê digel apê min du otomobêlên bilûk hebûn. Piştî dan sitandineke dirêj jê re deh jendirme dabûn û bi wan her du otomobêlan dabû ser şopa me. Ma kînga dikarî bi deh an pêncî jendirmeyî li me herde[24] be. Xuya ye şofêr û jendirmeyên digel zabit jî ne

[23] Apê min Şukrî bi qasî ku peyakî welê bêdeng bigire û bavêje û xurt û bi hêle bû.

[24] Herde:xuya, eşkere.

dixwestin xwe bigehînin me, an na dikarîn piştî rohelat li deşta Bozhewayê bigehên me.

Wê rojê piştî nîvro bi du saetan em gihan nav eşîra xwe. Kêfxweşiya xelkê me bi reva apê min gelekî mezin bû; lê nizanim vê xweşiyê heya çi gavê dikarî domke..

Ramana bê havil!

Eger bi şûreşeke nû fikirîn ne ewçend dijwar be jî, lê pê rabûn ne tiştekî hêzaniye. Jê rejîrî, hişyarî, fedakarî û mêraniyeke mezin divê.

Çi kesê ji van rûçikan yekî bêpar nikare bi şûreşeke hêja rabe. Na gava pê rabe dê bikeve û digel heval û hogirên xwe tê herre, herwekî apê min Şukrî tevî malbat û hin dost û hevalên xwe tê çû.

Çiqas ku apê min qîma xwe li şûreşeke nûh anîbû jî; zanîn û ramana wî di vî warî de gelekî hovber û qels bû. Heyekî ku heya gîha nava eşîrê di vî warî de tiştekî hêja nefikirî bû. Roja em gîhan nava eşîrê, êvarî ji bo şewrê em li mala wî gîhan hev. Di pêşiya civînê de şopa nefikirîneke fireh ji peyva wî dihat, an hatibû xapandin. Dirêjiya emrê xwe, wî ji bo kirine biçûk jî sê-çar guman didan ber çavên xwe. Tenê di vê kira han de, ku ji mezintirîn kirên ku di ser wî re dibarî bû, bi gûmanekê mabû! gumaneke qels û bêvac... Gava min jê pirsî, ka ji bo şûreşê çi daye ber xwe? bi zaravayekî sar li min vegerand:

-Divê hemî dostê me digel me rabin. Emê ji hemî serekeşîrên dor xwe re binivsin, hemî ji hikûmetê nexweşin wê alîkariya me bikin.

Çawan vîna apê min hatibû guhartin, dengê wî jî ne dengê berê bû. Ez ecêb mabûm, ew apê ku berî rojekê digot eger we nikari bû min ji destê

Tirkan bi derxin, bê dudilî min bikujin. Bila xweşê min neçe Tirkiyê û cendekê min ji Kurdistanê dernekeve. Îro ji bo şûreşê xwe bi hêviya alîkariya serekeşîrên dost dihîşt!.. Min gotê:

-Eger serekeşîrên dost nexwestin bi me re rabin, emê çi bikin?

Herwekî apê min ev guman nedabe ber çavên xwe ku got:

-Divê bi me re rabin, ma welat ne yê hemiyan e? Hemî jî ji hikmê Mistefa Kemal ne xweşin, divê rabin.

Hîngê min bi zaravakî xurt gotê, ku berê holê ez li pêş apê xwe pê ne peyivî bûm:

-Gava ne xwestin digel me rabin, divê em eşîrên wan digel xwe rakin. Hînga ew bê dilê xwe dê li pê me bên. Bi şertê m bikin lez û nehêlin germiya di dilê xelkê de sar bibe.

Herwekî apê min ev gotina min ne bihîstibe jê re bersiv neda. Me ji serekên eşîrên dorhêla xwe re yek name nivîsîn û ji wan xwest ku di nava çend rojan de xwe ji bo şûreşê pêk bînin. Di nava sê rojan de bersivên hemî nameyên me hatin, tê de digotin:" Ji alîkariya me bi şûnde namînin, gava em hewceyî wê alîkariyê bibin". Herçî Bedirê kurrê Osman paşa yê Gevozî bi xwe hat û wî jî wek wan bi gotinan dilê me xweş dikir. Roja sisiyan bû ku min gote apê xwe:

-Her rojek bê rabûn ji me diçe hêlekê ji hêviya me dikuje. Tenê bi rabûna xwe em dikarin serekeşîrên dor xwe bi hevalê xwe kin. Bi gotinên wan bawer bûnê em dibin hevalên wan, yanê wek wan dibin. Ma gelo raste em bi gotinên wan bawer bin û kêsê ji xwe biborin?

Dîsa apê min bersiva vê gotina min neda. Êdî min bawer dikir, an ez tê nagihême, an jî ên mayî hemî . Gava min xwe û hemî didan berhev, qîma min bi şaşiya min dihat ne bi şaşiya hemiyan.

Ji bo em likarin xwendevanan baş serwext bikin qasa şerrevanên eşîra xwe û eşîrên dost û hevalbend li vir bidin zanîn, heya bizanin ka heya kîjan derê me dikarî bi şûreşekê rabe. Eşîra me Mirdês, Canbengê deştê dibin hikmê me de bûn, li qeza Pêtirgê Dirêjan , Horiyan, Gergeran tevî hin gundên Zazan hevalbendên me bûn. Herçî li qeza Kextê eşîrên Reşûyan, Kawan û Gevozan hevalbendên me bûn. Çiqas ku eşîra Gevoz di bin destê lawê Osman paşa de dihat zanîn, a rast, ew eşîr ji çend salan de me kiribû sê çar perçan û her perçeyek dabû destê rîsipîyekî eşîrê û bi me ve girêdayî bû. Carekê roj hat ku me lawê Osman paşa ji nav eşîra wî derxist û piştî çend salan hîşt ku vegerre. Sebebê vê yekê neyariya ku di navbera bavê min û Osman paşayê Gevozî de çêbû û bi bindestiya paşê rawestî. Ji wê rojê de neyarî di navbera me û mala

Osman paşa de wek agirê bin ariyê bû, di rûve ne dixewinî û di bin ve venedimirî.

Gava em dibêjin hevalbend, neyê bîra kesî ku di rê û rêzanên eşîrî de kesî dikarî xwe ji hevalbendê xwe biqetîne. Heke yekî welê bikira bi destê xwe xwe dikuşt. Paşê di nava eşîrên hevalbend de ji bo malbata me rûmetek xweser hebû, ku sebebê wê: bext û mêraniya ku peyayên vê malbatê pê hati bûn nasîn. Çawan ku me bextê xwe tu caran xirab nekiri bû, kesî ji eşîrên din jî nedikarî ew bext xira kira. Wek, çi dema du neyar di ber hev ketana û yekî cih ji yê dî teng bikira jê teslîm bûn bixwasta, bextê yekî ji mezinên malbata me jê dixwest, gava bidayê nema dikarî pê re bêbextiyê bike. Dema kesekî holê bi vî awayî bextê me xira bikirana, bê şivîşk mirin li ber derê xwe didîtin. Di vî warî de hemî eşîrên dor me rûmeta bextê me digirtin, eger neyarî jî di navbera me de heba. Di nava van eşîrên han de pirrtirî bîst jezar çekhilgir, û heşt hezar şerrevanê hebû. Gava em dibêjin çekhilgir ew kesê ku tifinga wî hebû, lê dema dibêjin şerrevanî, ew kesê ku dizanî çawan wê tifingê bişixulîne. Evqas şerrevanî bi koza dilê xwe bi apê min Şukrî ve girêdayî bûn; gava bixwasta dikarî wan li pê xwe bajo ser mirinê; lê di dema wê de.

Min ji bîra kir ku hinekî mîrê ku apê min xwestî tê de bi şûreşê rabe ji xwendevanan re salixdim. Geloew mîr, ji bo ku mirov di Kurdistanê de bi şûreşekê rabe, bi kêr dihan an na?

Ez qenc bawerim, tiştê ku hîşt apê min rabûna bi şûreşeke nuh bîne bîra xwe û di wî warî de bi camêrên wek Hesen Xeyrî re bipeyive, ew mîr bû. Heye ku mîrekî wek wî ji minasib di sed salî de carekê çar nabe. Ev e baş vekirî didim ber çavên xwendevanên delal.

Piştî darvekirina Şêx Seîd û gelek peyayên hêja ji Kurdan û Tirkan Mistefa Kemal bawer bû ku nema kes dikare serê xwe li pêş wî hilde. Ji lewre dixwest di wî devê bi tirs de, him tiştên ku kirina wan ji mêjva dabû ber çavên xwe, bê dudilî bike. Yek ji wan tiştan bi zor wergirtindayîna şepqê, ku şopeke kambax di canê xelkê de hişti bû. Xelkê welêt yên olparêz bi wergirtindayîna şepqê gelek êşiya bûn. Çi kesê di wê demê de bi şûreşeke jîr û bi rêzan rabûya, dê teqez nîvê kurdistanê digel xwe bidîta. Apê min ev yeka han baş bîra biribû; lê Necmedînê tirsok nehîşt ku apê wî bigehê wê rûmeta mezin.

Apê min xwest gotinên serek-eşîrên dost bawer bike û li bende alîkariya wan bimîne. Tevî eqilê xwe yê biçûk min ev baweriya apê xwe şaş didît. Ezê ku tu caran li pêş apê xwe serbest ne peyivî bûm, min digot:”Bi gotinên axan bawerî xwe xapandine. Di em rêya şêwra xwe bi wan nexin, çi gava em bi şûreşê rabin; ew dê bêhemdê xwe li pey me

bên mafir millet bi me re ye”. Apê min ne dixwest guh bide şîreta min. Xuya bû hinekan berê wî ji rûya rast badida, ew yek jî ji Necmedîn, kurapê min yê ku ji şerr û kuştinê hez nedikir pêve ne kesî din bû. Rojên me holê bê fêde, di nav hêvî û ramanên şaş de diçûn û keyseke zêrrîn di nav xwe de ji me, rê li ber windan, dibirin.

Deh roj holê bi hêviya alîkariya serek eşîrên dost ji me çûn. Di vê navê de baweriya xelkê ya bi me roj bi roj kêm dibûn. Hîn jî apê min dixwest bawer be ku ew serekeşîr ji dil dixwazin alî me bikin!.. Ew apê ku tu caran xwe nedispart serekeşîrên dost. Roja diwanzdehan pêşiya leşkerê Tirk giha sînorrê qezê. Wan dudiliya me bi wasîta hin guhbelên xwe nasî bû. Ji lewre gelekî hêdî hêdî dihatin. Rojê ji panzde kîlometran pirrtir ne dihatin. Di hatina xwe de bi rê ve qencî bi xelkê dikirin û kes nediêşandin. Vêyeka han germiya di dilê xelkê de sar dikir. Hew me dît du parên eşîra me jî rû li me bada. Ew kesên ku berî diwazde rojan şûreş baş û qenc didîtin, piştî diwanzde rojan rabûna kireke holê ehmeqî û bê rêyî dizanîn. Bê şik apê min li ser vê yeka han ber pirsiyar bû. Dema leşkerê Tirk gîha sînorê eşîrê ji çend peyayên camêr pêve kesek bi me ve nema. Ya ku hîngê me bikariya bikira ew bû ku, em derkevin serê çiyê birrevin. Bi xêra şîretên Necmedîn û hêviya ku me ji axan kir, ji vê kirê pê ve di destê me de tiştek nema, û me jî welê kir!..

Berî em derkevin serê çiyan bi rojekê, apê min xwest kulfetên me (zar û zêc) bişîne malên hin serekeşîrên ku me hêviya alîkariyê jê kiri bû. Hîngê min bi lalijîn gotê:” Di lêdanê de me kês ji xwe bir, qene di revê de em kulfetê xwe bigirin herrin Sûriyê. Eger me her tişt wenda kir, bila em te winda nekin, heyîna te ji me re hêviyek mezin e”

Vê gotinê hinekî di serê apê min de cih girt, lê ji bo bêhnekê bes. Bersiva min da û got:”Raste, ez şaş bûm ku rojapêşîn min lê neda û bawerî bi gotinên serek eşîran anî; lê ew kês çû. Herçî çûna Sûriyê, ango ji welêt bi derketin, çi gavê em bixwazin di destê me de ye”. Min lê vegerrand û got:”Ma ne mikûne ku kês wê çûnê jî ji destê me herre”? got:”Na”. Holê me ew kês jî ji xwe bir. Bi vî eqilê şaş û wê hêviya mirî me kulfetê xwe sipart dostên qels û ji bo veşaryinê me xwe avêt serê çiyan!..

Ma gelo, apê min, ji bo ku di serê çiyan de veşire li hepsê revî?.. Ew gotinên ku bi camêran re kirin, ew armanca ku dixwest bi şûreşê rabe li ku ma? Gava wê nikariba bi şûreşê rabe, ma rev ji bo çi bû? Ev pirsên han çi dema kês dihat min jê dikirin. Hergav nedikarî bersiveke hêja bide. Tenê ya ku pê re bi derdiket ev bû:”Gava Xwedê dixwaze yekî bêxe eqil jê distîne, êdî nema dizane çi bike”. Ji vê gotina wî xuya bû ku şaşiya xwe bîra dike; lê nizane çi bike.

Pişti min rewşa apê xwe di pê revê re tevî dudiliya ku pê re çar bûbû salix da, dikarim bêjim ku apê min ne peyakî ewçend dûrî eqil bî. Heye ku di wê êrdimê de peyakî wek wî jîr û serwext tine bû. Lê ji bo çi di roja pêşîn de bi şûreşê ranebû û çima hinde xwe şaş kir?

Bersiva vê pirsê tecriba sî û pênc salan, di warê xebata welêt de, ji min re da zanîn, bersiveke gelekî kurt:"Ji ber ku axa bû".

Ma gelo axa bûn kêmî û gunehkarî ye? Divê em di dana bersiva vê pirsê de jîr û xwedî bext bin.

Heya danîna mezinan di nav Kurdan de bi destê milet bû, axatî jî serbilindî û rûmet bû. Lê dema rakirin û danîna wan ket destê hikûmeta Tirk, axatî goreyî war û nîr gelek reng digirtin, wek: Xulamî, qeşmerî, xinizî, bêbavî û di hin waran de dadiket heya digeha guhbeliyê jî.

Reva bê armanc

Dema me mal û kulfetên xwe sipartin dostan û bi serê çiyan ketin, hemî kesên jîr hêviya xwe ji me birrîn. Gava me ev ji xelkê didît, hêviya me jji me nedima. Di serê çiyan de veşirînê tiştek ji me re saz nedikir û hikûmet jî ne diwestand. Ma heya çi gavê me dikarî li serê çiyan biqedîne? Berê şik ev jî ji me re nediqedî, ji ber ku roj bi roj yar û hevalên me kêm dibûn. Hîngê me xwe ji dostên qels û tirsok dixeyidand, bê ku em tirs û qelsiya xwe bîra bibin. Kesê ji ber neyarê xwe bireve ma dê çi rûmeta wî hebe? Em ji ber hikûmetê dirrevîn û yaran jî rû li me diguhart, tiştekî gelekî rast.

Pişti em derketin çiyan, êdî apê min ji bo tiştekî şêwra xwe bi min nekir. Xuya bû ji ramanên min ên dererê kiz[25] bûbû. Nizîka du mehan em wa bê armanc û raman li çiyan gerrîn. Di vê navberê de hikûmetê her tişt li ser me hîn kiri bû, kulfetê me li kû ne, malê me li kû hatiye vaşartin, sinçî, xurtî û jîriya heryekî ji me. Bi ser van hemiyan de bi beg û axayên ku hevalbendê me bûn re bûbû dost. Ev giş bi nermî û sihetî xist destê xwe. Pişti vê hînga bi xurtî da ser pişta me em pengiyandin. Di vê navê

[25]Kiz: Aciz, Jê çûn, Jê teng bûn.

de yekî gundî bi qirûşekî ne da zirarê, tenê malê herdu apên min û yê min dest dane ser.

Fermandarê ku girtina me jê re hatibû sipartin gelekî jîr bû. Di demeke hindik de fikreke baş li ser hikûmetê da gundiyan û bi hemî serekeşîran re bû dost, û hinek jê kirin peydayên xwe. Ya ku wî da bû çav xwe ew bû ku ji me re dostan nehêle, hemiyan bi alî xwe xîne, heya em bê şerr û teqîn têkevin destê wî. Ji bodil û rehên me sist bike hercar digot kesên dora xwe, ne maze dostên me:

"Ma ji bo çi Şukrî xwe holê sêser kir?! Hikûmetê rûmeta wî zehf digirt, ji xwe îro jî tiştek ne bûye. Heye ku ji bo reva han careke din bête mehkeme kirin".

Bi gotinên holê rehên dostan û paşê yê apê min sist kirin. Vê siyaseta nerm û jîr hemî dost ji me bi dûrxistin û em jî ji ramanên çak û şûreşîn bi şûnde dan. Piştî ku eşîr dost ji me bi dûr xistin, bi destê hin bêbavên ku xwe nêzîkê dikirin destê xwe dirêjî me kir da me di ber hev de bêxe.

Berê xeber ji min re şand ku: eger ez xwe teslîm bikim wê gelek qencî bi min bike. Min bi bersiveke hişk mirovê wî lê vegerrand. Piştî min ji Necmedîn re û paşê ji her du apên min re dişand. Wî dizanîn ku gotinên ku bi dostan re kirine digehên me, bi ser de peyayên xwe ji hev kêm ne dibûn. Vê yekê bi carekê em ji çek kirin û vîna me kuşt. Ji alîkî erd li me teng dikir, û ji aliyê din rêya xwe sipartinê dida ber me.

?şta vê nermiya fermandarê Tirk ma paşê zanî. Hîngê ji çar êrdimên Kurdistanê yên din tevgerrên şûreşî hebûn. Eger em roja pêşîn bê dudilî bi şûreşê rabûna bê şik em dê bigehêştana serdestiyê. Lê kînga yekî axa bi eqil û ramanê axatî dikarî bi şûreşeke hêja rabe. Heya wê çaxê çi kir û tevgerrên ji axan bi derketi bûn tev ji bo parastina can û giyanê wan bû.

Zar û zêçên me hinek li nik Zeynel beg serekê Reşûyan û hinek li nik Bedir axa serekê Gevozan bûn. Dema fermandarê Tirk ji ber hev de ketina me bêhêvî ma heya herdu serekeşîran kir ku; hikûmet dizane zar û zêçên me li nik wan in. Çi gava yek ji wan zar û zêçan winda be-yanê bighê me- dê zarokên wan li şûnê sirgûn bike . Gava haya me li vê gotinê bû li pêş me du rê diman:Yek jê, zar û zêçên xwe ji malên herdu serekeşîran bi zor derxistin û ji welêt derketin, ya dî xwe sipartina hikûmetê bî.

Sê rojan, ji bo dayîna ser rêyekê ji van em digel hev peyivîn. Min û apê xwe Nûrî rêya pêşîn, yanê ji welêt derketin dixwest. Necmedîn rêya paşîn, xwe sipartina hikûmetê rast didît. Herçî apê min ê mezin Şukrî di

navbera herdû rêyan de dudil mabû. Roja sisiya wî jî xwe da ser rêya me û qîma xwe bi derketina ji welêt anî.

Ji bo me bikariya bida ser vê rê divya bû em birrek hesp û hêstir bînin. Êxliyê[26] me hinekî dûre dest bû. Ji bo anîna dewarên hewce min çend peya girtin û ji apê xwe qetiyam. Piştî sê rojan ezê bihatama gundê Honiyê û li wir me dê hev bidîta. Gava ez vegerrîm, min ji apê xwe Nûrî û çend peyan pêve kesek ne dît. Bi dilekî kul gote min:

-Piştî çûna te, Necmedîn careke din rêya qirrênê[27] li pêş me vekir û apê te xapand, xiste serê wî ku xwe sipartina hikûmetê ji welêt bi derketinê gelekî bi xêrtir e. Şukrî bi ya wî kir, duh çû ku xwe bispêre fermandarê Tirk. Ji min re got:

"Gava Osman tê tev werin dora Narincê (gundê me) ku min ji te re şand tu jî were xwe bispêrê".

Min jê pirsî:

-Lê Necmedîn çi pê hat?

-Piştî apê xwe xapand, ji me qetî ku xwe bi tenê veşêre.

-Ma te ne dikarî bihêlî heya ez xwe bigehînim ser.

-Bi ya min nekir. Ne dixwest te bibîne, û berî tu vegerrî çû.

Hêviya min bi carekê şikest, û destên min bi ber min de hatin berdan, nema min dizanî çi bikim. Ya min ji apê xwe Nûrî zanî, piştî çûna min dîsa li ser ji welêt bi derketinê peyivî bûn. Necmedîn goti bû apê xwe:

-"Piştî hikûmetê Zeynel û Bedir bi nefiya zarokên wan tirsandin, bi rihetî zar û zêçê me nadin. Vê carê ji bo sitandina kulfet divê em li wan xin. Ma tu qîma xwe bi vê tînî"?

Apê min li ber vê yekê qels bûbû û rêya xwe sipartinê girti bû. Hîga xeber dabû fermandarê Tirk ku dikare tevî birayê xwe Nûrî xwe bispêre wî bi şertê ku dev ji girtina min ber de. Fermandarê Tirk ev bazar qebûl kiri bû, ew jî berî ku bên çûbû xwe siparti bû leşkerê Tirk.

Bi sed ax û hesret em çûn nîzîkî Narincê. Me bihîst piştî çûnê apê min serbest hêlaye bê pamdî di nava wan de digerre. Dema bihîst em nîzîkî Narincê bûne, şande pê Nûrî ew jî bir, welê ez digel peyayên xwe mam li çiyê.

Piştî çûna apê min Nûrî bi du rojan leşkerê Tirk ji welêt bi derket. Gava min dît bi rastî dev ji min berdane, ez hatim gund û ji nûva me zar û zêç gihande ser hev û di gund de bi cih kir.

[26] Êxlî: birrê hesp û hestiran dema derdixin çêrê.
[27] Qirrên: minaqeşe, gelş, li ser tiştekî peyivîn.

Tevî eqilê min yê ne pijî, min dida bala xwe, ma ji bo çi em rabûn û ji bo çi me tifing neteqand. Ma gelo hewce bû em xwe holê şerpeze bikin? Min hîngê ji vê pirsê re bersivek rast û durist ne didît; lê niha, bersiva wê pirsê ji kesî ne nediyare. Miletê ku axayên qels û şêxên nezan jêre bûbûn pêşewa, dê dongiya wî bin destî bûya, her wekî li me qewimî.

Mehkema Istiqlalê û Xiniziya Bedirê paşê

Piştî herdu apên min xwe sipartin fermandarê Tirk, raste kesek ji malbat û eşîra me negirt;lê Zeynel beg serekê Reşûyan tevî Bedir axa kurrê Osman paşa ji bo ku zar û zêçên me veşarti bûn berî xwe sipartina apê min bi çend rojan girtibûn. Dema ev herdu axa şandibûn Melatiyê, Bedir axa paşê bi rêve vegerrandin nik fermandarê Tirk û piştî rûbarî wî kirin berdan. Hîngê Bedir axa hemî sirrên me, herwekî dizanîn goti bûn. Dema herdu apên min tevî ewraqên xwe gîhan mehkema îstîqlalê xalê min Hacî, pismamê min Necmedîn, yanze kes ji eşîra me û ez, ji nûve xwestin mehkemê.

Ji me pêve Cewherî zade Hacî Emer jî ji Rihayê girti bûn. Sebebê girtina vî camêrî, roja apê min giha bû Rihayê, Hacî Emer hati bû mêvanxanê cem wî. Ji bo wê dîtinê, ew jî bi revandina apê min îttîham kiri bûn.

Gava em xwestin mehkemê, ji bo neçûnê sebebek nema bû; ji lewre em çûn. Heya Melatiyê em serbest birin, lê ji wir bi şûnde em gelekî tehl kirin. Nemaze di navbera Melatî û Xarpîtê de otomobêla ku min bi perê xwe girti bû bi rêve li Qadiyan ji me sitandin û peya berê me dan Xarpîtê. Kelepçeyên ku liMelatiyê xistin destên me, piştî çil û heşt saetan li xarpîtê bi derxistin. Roja din bi wî halî em li kemyoneke pîsik siwar kirin û birin Diyarbekirê.

Berî roava bi hinekî em gîhan ber zîndanê, lê em nexistin hundur . Raste rê em birin cem îfadê. Lê wê rojê naîban nehati bû, piştî em heya şev reş bû li pêş daîra wî hiştin, ji nûve em vegerrandin zîndanê. Ji ber ku îfada me nehati bû girtin em xistin nezaretê. Di nezaretê de heft peya berî me hebûn. Hinek razayî û hinek jî rûniştî çîrrok digotin. Yek jî li ser piştê vezeliyayî, bi dengekî nizim dinehwirandin..

Pişti me silav kir û rûniştin, yekî ji wan pirsî:”Gelê pismaman hûn ji kû ne û ji bo çi hatine girtin”?. Yekî ji me serpilkî jê re got, û ji yekî wan pirsî, ka ew ji bo çi girine û kîngа anîne? Bi xwînsarî li hevalê me vegerrand ku:”Ji bo şûreşê hatine girtin, mehkeme bûne û dê wê şevê bêne darvekirin”.

Gotina wî em veciniqandin. Heya wê hîngê, me hemiyan kesî mehkûmî îdamê ne dîtibûn.

Paşê, ma ji bo çI em xisti bûn nava îdaman? Vê ramanê serê hinekan ji me westand, heya ku heya sibê ji ber şayîşan[28] ranezan.

Dema min zanî ew camêr dê bêne darvekirin, min hezkir hinekî digel wan bipeyivim. Hînga min berê xwe da mezintirê wan bi emir, ku bi ser sed salî keti bû. Nema dikarî bê alîkarî rabe ser xwe, an rûne.

-Apo tu ji bo çI xisine nava îdaman? Gunehê xistine sitûyê te çî ye?

Berê kalo dengê min baş seh nekir, xuya bû hinekî guhên wî giran bûn. Dema hevalekî wî bi dengekî bilind ew serwextî pirsa min kir, bi rûgeşî li min vegerrand û got:

-Emrê min sed û bîst sal in. Gunehê ku xistine sitûyê min fermandariya şûreşê di êrdima me de, ma fermandarî bi yên wek min dibe? Lê Xwedê xwestiye ku bi destê zaliman bême kuştin. Mala Xwedê ava.

Heya gotina xwe qedand şopa westê ji rûyê wî diyar bû. Paşê hêdî rûyê wî geş bû û vegerrî ser kişandina tizbiya xwe.

Bi rê ve wê rojê ez gelekî westiya bûm. Jê pêve li ber daîra naîb’am pirtirî du saetan em li ser lingan rawestiya bûn. Min dixwest ku bêhnekê razêm; lê neket destê min. Apê min Şukrî hatina me bihêsti bû. Nizam bi çi awayî , pandî sazî kiri bû ku xwe gihande me û serekî digel me peyivî, Berê, rewşa welêt ji me pirsî, paşê ji me re da zanîn ka emê çawan îfada xwe bidin. Piştî apê min çû, bêhemd ez ketim xew.

Sibê zû, gava ji xewê hişyar bûm di nezaretê de ji me pêve kes tine bû. Şêx Emîn digel her şeş hevalên wî berî şefeqê biri bûn. Diduyan ji hevalên me çûna wan dîtibûn. Wek mêran bê tirs û perwa çûbûn ber darê.

Sê çar rojên me di nezaretê de borîn, kesî em nexwestin îfadê. Xuya bû ku bi îfada me ya Melatiyê têr kiri bû ku em ji nezaretê derxistin kirin zîndanê. Ji xwe mehkema îstîqlalê ne hewceyî îfade, şahîd û delîlan bû. Hebûna zebtekê ji alî mê’mûrekî biçûk têr dikir ku pê deh Kurdan bidarveke.

[28] Şayîş:Fikra xwe bi tiştekî zêde mijûl kirin, endîşe.

Gava min got îfadeya me ya li Melatiyê, heye ku bêbîra xwendevanan, ka bi rastî îfada me hatiye girtin. Na kesî her wekî adete îfada min negirt.

Li Melatiyê serdarê lîwa ez xwestim nik xwe. Zebta min çêkirî hazir bû. dema ez rûbarî wî bûm, ji min pirsî.

-Ma tu dikarî înkar bikî ku te apê xwe Şukrî nerevand û digel wî li çiyan negerrî?

Min gotê:

-Na ez înkar nakim.

Hînga gote min;

-Mafir welêye were vê zebta han îmza bike.

Holê min jêre zebit îmza kir û ev bû îfada min ya ku li Melatiyê hati bû girtin. Ez ku bi gunehekî mezin hati bûm îttîham kirin, holê bi du gotinan îfada min girt û zebit bi min da îmza kirin. Ev bû rêzana mehkemên îstîqlalê li Kurdistanê û ji bo Kurdan.

Mehekê li zîndana Diyarbekirê

Eger ez ne şaş bim, em di 12ê gulanê de gîha bûn zîndana Diyarbekirê. Çar rojan em di nezaretê de hiştin û di şanzdehê hizêranê de hikim kirin, xuyaye em mehekê serbest di nava girtiyan de mane. Hîngê ez gundîyekî çavgirtî bûm. Yekî çavekirî di vê mehê de dikarî gelek milaheze bistîne. Lê eqilê min yê ne pijî hîngê kêseke zor mezin ji min bir.

Dema em gîhan Diyarbekirê bi qasî panzde rojan mehkeme ji xebatê sekinî bû. Di serê meha hizêranê de dest bi xebatê kir. Her roj hikmine ecêb û sitemkar didan. Ji wan, du mehkeme ewçend dûrî heqiyê bûn ku heya niha ji bîra min neçûne. Ji van yek mehkema Cemîlê Çeto, yek jî ya Uzêr axayê Silopî ye. Ez bawerim ku ev herdu mehkeme hêjayî nivîsandinê ne. Hêja bûna van herdu mehkeman ne ji ber bilindiya caha wan kesan;lê belê ji ber xeribiya hikmê ku hatiye dayîn. Gava em ji xwendevanan re çêla van herdu mehkeman bikin, dê bizanin ka Tirkan çilo Kurd mehkeme dikirin.

Mehkema Uzêr axa

Çîrroka ku pê Uzêr axa dane mehkemê ev e:” Sala 1919an qaymeqamê Cizîra Botan raporek şandiye Anqerê ku (Uzêr axa yê Silopî, biraziyê wî Mihemed, Evdilkerîm Mela Sadiq, apê wî ..... Xulamê wî Zekî digel şeş peyayên xwe bi zabitê îngilîzan yê li Musilê re bi nameyan dane û sitandine). Li ser vê gotina wî ne delîl û ne jî şahid hene. Hîngê hikûmeta Anqerê tu qîmet ne da bû wê raporê. Ew qaymeqam li Cizîrê çû bû, yê li pê wî jî çû bû, yê sisiyan, di sala 1926an de ji van mirovan xeyidî bû. Di nava dosiya wan de sûretê wê raporê derxisti bû û digel zebtekê ew pê şandi bûn mehkema îstîqlalê.

Ji van yanzdehan sê kes ku peyayên Uzêr axa bûn, berî çar salan bi tuhmeta kuştina mêrekî ketibûn zîndana Sêrtê û bi deh salan mehkûm bûbûn. Herçî Zekî, peyayê Evdilkerîm mela Sadiq di sala 1926an de û 16 salî bû.

Zekî bi dilekî xurt gote serekê mehkemê:”Ezbenî, her wekî ji nifûsa min xuyaye û rapora diktorê hikûmetê jî qeyda nifûsê raste dibîne, gava qaymeqam rapora xwe nivîsîye ez neh salî bûme. Ma gelo,bicûkekî neh salî dikare bi siyasetê mijûl be û bi dewletên biyanî re bide û bistîne”?.

Li pêş vê gotina ku mirovekî xwedî wîcdan nikare tiştekî bêje, serekê mehkema îstîqlalê hey kirê û dengê wî da birrîn. Xuya bû serek ne dixwest qaymeqamê Tirk derewîn derkeve. Dema hikim da Zekî digel heşt mirovan bi îdam hikim bûbû. Lêji ber ku emrê wî biçûk bû jê re daxist panzde salan. Hersê peyayên Uzêr axa ku li zîndana Sêrtê bûn û nediyar hikim bûbûn li Sêrtê hatine darvekirin.

Heşt mirov bê şahid û îsbat tenê li ser rapora qaymeqamekî hatin kuştin! Sisiyan ji wan nedizanîn ku mehkema wan li Diyarbekirê dibe, rojekê têlxiraf çû Sêrtê ku îdam bûne, bê gotin bi darvekirin! Ev bû yek ji herdu mehkemeyên ku min gelekî dererê dîti bûn.

Mehkema Cemîlê Çeto

Cemîlê Çeto yek ji axayên ku hevalbendiya hikûmeta Tirk kiri bû. Lê nizam ji ber çi ûştê hikûmetê ew tevî herçar lawên wî Evdê, Feremez, Izedîn û Naîf girtin û dan mehkema îstîqlalê. Bi vê jî têr nekir ku jin û zarokên wî jî girtin anîn Diyarbekirê û di qişla leşker de girtî hiştin.

Digel Cemîlê Çeto bi navê Qadirê Bêndûr axayek û sed pêncî zilam hebûn. Herçî Qadir ne tê;lê Cemîl di kurdistana bakurr de axakî bi nav û nas bû. Çi kesê ev herdu axa bidîtana û eqilê wan binasiya, dê baş bizaniya ku welatê Kurdan di nav lepên çi celeb mirov de maye û wê

dongiya wî milletê reben çi be. Cemîl dirêjiya rojê eynik û mûçink di dest de mûyên ser çavên xwe dikişandin; herwekî jê pêve tu bar û raman jê re tine bin. Herçî Qadir, pirtaline kevnik wergirtî bûn heya mehkeme wî reben bibûne û dev jê berde. Herdu axayên Xerzan û Pencînaran bi vî eqilê kurt û kêmber ketibûn ber lepên mehkema îstîqlalê.

Her wekî mehkeme di avahiya sînemayê de hati bû danîn, hemî kursiyên wê jimar kirî bûn. Jimara yekê di ber depê bilind ku mehkeme li ser rûdinişt de dest pê dikir. Dema ew biribûn mehkemê, Cemîlê Çeto li ser kursî jimar yek, û Qadirê Bendûs li ser jimara dudu rûnişti bûn. Yên mayî rasthat li pê hev rûnişti bûn. Van kesên han hemiyan bi tirkî nedizanîn, ji lewre hemî hewceyê terciman bûn. Yanê çi pirsan bersiva ku bihata wê du caran bihata gotin; carekê bi tirkî û carekê bi Kurmancî. Tevî vê mehkema wan bi du celsan qediya, her celseyekî ji pênc saetan pirrtir dûm nekir.

Herwekî adete di hemî mehkeman de hin pirsên teqlîdî hene ku ji mitehim têne pirsîn, wek:

-Navê te çiye?.

-Navê bavê te çiye?.

-Ji kûyî û çend salîyî?

-Te jin û zarrok hene?

-Bi çi karî mijûl dibî?

-Ev tihmeta ku ketiye sitûyê te raste an na? heke ne raste delîlê te çiye?

Ev her şeş pirsên han yek bi yek ji her girtiyekî ku diçû pêş mehkemê dibûn. Xwendevan bawer dikin ku ev her şeş pirs û bersivên wan bi du zimanan 150 carî bêne pirsîn û gotin, celseyek bi zor têra wan bike. Celsa din têra pirsên serek û bersivên mittehiman nake. Ka mirafe’a naîb’am û xwe paristina mittehiman?! Ma gelo jê re çiqas wext divê?..

Ev giş bi du celsan qediya. Dema serekê mehkemê hikim da li ser jimara kursiyan hat. Piştî hissiyatên hikim, serekê mehkemê got:”..... jimar yek û dudu îdam, heya jimara nodî 15 sal, jê pêve ne berpirsiyar..”. Ev bû hikmê ku ji wan re hat dayîn. Ez bawerim ku çi mehkemeyeke sitemkar heya îro hikim li ser jimara kursiyan nedaye.

Sibatira mehkema Cemîl em birin mehkemê . Cendekên Cemîl û Qadirê Bêndûs hê danexistibûn, em di ber sehpa wan re derbas bûn. Ya ecêb, dilê me bi wan herdu mêran neêşî. Di nava hemî girtiyan de kesî bi çavekî baş li wan nedinihêrrî. Tê bîra min, berî mehkema Cemîl bi çend rojan Emrê Temir îdam bûbû. Dema li mehkemê vegerrî, Cemîlê Çeto bi

girî xwe avête himbêza wî. Emer bi xeyd Cemîl li ser sînga xwe dehf da û bi zarekî tehl gotê:

-"Cemîl! ez ne yê girî me ku tu bi ser min de bigirî. Min dilê xwe ji Tirkan rihet kir û ya ku ji min hat, min neda paş. Lê reben! yê ku ji neyaran re bû alîkar tu bû, îro jî dikin te bikujin. Giriyê xwe ji xwe re bihêle, hêjaye tu bigirî; lê bi ser xwe de".

Cemîl ji xwe sar bû, nema dizanî çi bike . Wê rojê min dît, kesê dibe dest û hevalbendê dijmin çiqas î kêm û şikestiye. Jê pêve, yên welatparêz bi tena xwe hatibûn girtin; lê Cemîlê Çeto tevî jin û zarokên xwe hatibû girtin. Xuya bû destekî veşartî ev sîle li ser çavên Cemîl dabû ku ew dest ji gelê Kurd ne î biyanî bû.

Mehkema me

Roja 15ê cehzeran (hizêran) em şanzde kes birin mehkemê. Ew mehkema ku Mistefa Kemal dixwest pê çavên gelê Kurd bitirsîne.

Dema em ji dergehê zîndanê yê mezin derxistin di navbera 40-50 leşkerên çekhilgirtî, li ber derî, li bende derketina me bûn. Em di nav wan de destgirêdayî birin mehkemê. Li ser rêya me, nîzîkî dergehê mehkemê, cendekên Cemîlê Çeto û Qadirê Bêndûr bi sehpayê ve li ba dibûn. Çiqas ku herdu axayên neyarhewîn[29] hêjayî dongiyek[30] holê kirêt bûn jî, çavên min bar nebûn ku li wan binêrrim. Bi darvebûna kurdan di welatê wan de, bi destên biyanî gelekî ji min re giran û dijwar dihat. Ji lewre dema hevalan got:" ha ev in cendekên herdu axayên neyarhewîn, min rûyê xwe zivirrand aliyê din.

Saet heşt û nîvan em gîhan avahiya mehkemê. Koma mehkemê wê di saet dehan de bihata. Zabitê ku em birin mehkemê bi navê Osman beg yuzbaşiyekî Merdînî bû. Me şand ji me re nan, penêr û zebeş anîn, me xurîniya xwe kir. Serekî xortan qaşikên zebeşan avêtin hev. Bi vî awayî dixwestin bidin zanîn ku neketine bin suhna mehkemê. Hîngê min bala xwe dayê Osman begê gelekî bêhna xwe fireh digirt. Wî baş dizanîn ku em bê gorî ji mehkemê dernakevin. Ji lewre nexwest dilê me bihêle û kêfa me bişkêne. Me jî dongiya xwe nasî bû; lê me dixwest bi ken û tinaz herrin ber derê mirinê.

Berî hatina koma mehkemê, me gemara qaşikên zebeşan ji salûna mehkemê derxist. Di saet 9,50 de koma mehkemê hat. Serek, du lebat û

[29] Neyarhewîn:yên ku dibe yarê neyar.
[30] Dongî;dawî, aqîbet.

maîb'an bûn. Serekê mehkemê Hacim Mihyeddîn bi serê xwe yê girs, rûyê xwe yê xurt suhveke ecêb hebû. Lebat Elî Saîb[31] wek yê ku ji diya xwe re gewadiyê bike şermisar li dora xwe dinêrrî. Lebatê din navê wî baş nayê bîra min, heye ku Ewnî be, wek zarrokekî fediyok bi ber xwe de dinêrrî. Herçî naîb'am Sureyya bi rûyê xwe yê pelte zer û mirrûzê xwe yê tirş durvê celladekî rave dikir.

Koma mehkemê rûniştû em li ser du qorran, li pêş xwe dan rûniştandin. Du leşker derxistin ber derê mehkemê, bi dengê bilind xelk vedixwend guhdariya mehkemê. Pirr ne çû cihê guhdaran ji mêr û jin hate dagirtin. Di nava guhdaran de rûne bendewar jî hebûn. Dema gotineke çak an xurt ji yekî me derdiket, ew rûyên yar dikenîn.

Mehkemê bi pirsên teqlîdî dest pê kir. Piştî ku serek hinekî li ser reva apê min û kama wî di wê revê de, çend gotin kirin, dosya me vekir û rapora fermandarê ku hatibû ser me da destê katib û xwend. Rapor nîzîkî sî rûpelî bû, tê de çawa fikra revê bi apê min re di zîndana Xarpîtê de çê bûye û çawan bi destê min hatiye revandin û çawa hevalên wî yên axa ew xapandine û kêsa rabûnê jê birine, nemaze dewra kurrê Osman paşa Bedir ku çawan her tişt ji fermandar re gotiye bi ser û ber got. Paşê li ser xurtbûna nifûza apê min di nava eşîran de dûr û dirêj peyivî û got:

"Divê ev kesê ku di nava hikûmetê de ji xwe re hikûmetek aniye pêberî rojekê tevî hikûmeta xwe ya axatî bibe tîne. Heya ev celeb mirov hebin, em nikarin bêjin ku di welêt de dewletek heye; hînga rastire ku bê gotin di welêt de dewletin hene". Pişt re vegerrî berê xwe da apê min û gotê:

-Tu dibînî, Şukrî axa! piştî li Xarpîtê te hikim xwar heya niha te çi kiriye bi ser û ber di vê raporrê de hatiye nivîsîn. Ma tu dikarî gotinekê ji van gotinan înkar bikî?

Têxistiyên raporra fermandar tev de rast bûn. Hemî ji devê Bedirê paşê hati bû girtin, apê min çi jê re goti bû wî jî bê kêmayî xistibû destê fermandar. Tenê hin navên wek Hesen Xeyrî ji bîra kiri bû. Tevî vê apê min ji dana bersiva xwe bi şûnde nema û got:

-Ez dibînim fermandarê ku ev rapor nivîsî ji serdarekî pirrtir edîbekî çîrokbêj e. Ma gelo ji koma mehkemê pêve kesek nedît ku bi xeyala xwe ya fireh mijûl bike?. Divê ji koma mehkemeyek holê mezin re rastî têtenivîsandin. Min ji fermandar re goti bû ku di navbera min û kurrê Osman paşa de neyariyek kevin heye. Wî bi xwe jî ew rastî ji fermandar re gotiye. Piştî zanîna vê rastiyê ma durist bû ku gotinên wî ji raporra xwe re bike bingeh? Ma tu jî di vê kira wî de şaşiyê nabînî?..

[31] Elî Saîb kurd bû. Paşê M.Kemal ew ji nav peyayên xwe avêt û xist zîndanê.

Serek li apê min venegerrand zivirrî ser min û pirsî:

-Apê te di îfada xwe de gotiye: dilê min û revê tine bû; Osman bê haya min hat û bi zor ez revandim, ma gelo raste?

-Erê rast dibêje. Bê haya wî ez bi vê kirê rabûm.

Kama me di vê gotinê de ew bû ku apê min ji tihmeta fikra rabûna şûreşekê bi dûrxin; lê me ne dizanîn em ê çawan bikin û gotina min dûrî eqil bû. Ji lewre serek got:

-Eger te bi rê ve, bizor ji destê leşker derxista,(herwekî te da bû ber çavên xwe) hînga te dikarî bêje, min bê haya wî ev tişt kir. Lê gava li mêvanxanê derket û hat qesra Hacî Bedir gîha te, ma te lingên wî bi zor dilivandin.

-Min bê dilê wî ew revand.

-Başe, hîmê şûreşê digel Hesen Xeyrî li zîndana Xarpîtê, û li Melatiyê jî digel serekeşîran dîsa te danî?

Li vir, nema min zanî ez çi bêjim. Hîngê apê min xwest lê vegerrîne serek nehîşt û birrek raporrên ku me'mûrên qezayê li ser me dabûn xwendin. Ew raporên han jî wek ya fermandar apê min bi ramana şûreşê îttîham dikirin. Piştî xwendina raporan careke din berê xwe da min û pirsî:

-Tu dibêjî ku her tişt te kiriye. Başe, gava te ev tişt kirin, ma te nnedizanîn ku di welêt de hikûmetek heye, û wê hikûmetê jî qanûn heye?.

-Belê min dizanî ku qanûn ji bo alîkariya reva apê, min berpirsiyar neke.

-Ma tu qanûnê baş dizanî?

-Belê dizanim, ma zanîna qanûnê gunehkariye?

-Dê niha ezê qanûnê raveyî te bikim.

Vegerrî ser hevalên mayî her yekî du sê pirs jê kirin, paşê mehkema me hiştin sibê.

Sibetirê dîsa wek roja pêşîn di saet heşt û nîvan de em birin mehkemê. Wê rojê koma mehkemê hinekî zûtir hat. Naîb'am mirafe'eke dûr û dirêj xwend. Çiqas ku ji raporra fermandar hatibû girtin, lê ji alî tehlîlê gelekî dirêj me kiri bû. Dawî ji bo herdu apên min Şukrî û Nûrî îdam û ji bo me yên mayî, li ser qanûna nuh ku piştî wê bi çarde rojan dê bihata tetbîq kirin hepsa tekebend[32] xwest.

Di pêşgotinka qanûna nuh de bê veşartin dibêje:"Ev qanûn di serê meha gelawêj(temûz) sala 1926an de pê emel dibe". Tevî vê yekê ji bo

[32] Tekbend:Tekgirtin, minferîde.

cezayê me xurt bike berî demê bi çarde rojan qanûna nuh li ser me tetbq kir. Eger bi qanûna kevin em mehkeme bibûna apê min Şukrî sê salan hikim dibûn ji bo ku reviye û em ên mayî dihatin berdan. Lê heqê kesî ku li pêş mehkemê bêje"çima" tine bû.

Piştî mirafe'a naîb'am, serek gote apê min Şukrî:

-Te mirafe'a naîb'am bihîst. Li ser tihmetên ku dibêje te kirine, tu çi dibêjî? mehkeme gudarê gotina teye.

Ez tu caran ji mêranî û xurtiya dilê apê xwe neketibûm şikê. Lê ya ku wê rojê min dît, di ser hemî mêraniyan re bû. Geşiyê rûyê wî berneda bû, rûliken serê xwe hilda û bi dengekî xurt û bilind got:

-Gotinên Sureyya (naîb'am) beg hemî dererê û dûrî sihê qanûn in. Ez di wî de, ji mimesilê qanûnê pirrtir neyarekî dilreş dibînim. Tevî min qanûn ne xwendiye, ez bawerim ku Sureyya begê di mirafe'a xwe de rêya xwe bi qanûnê nexist. Paşê, qanûna nuh ku hîn dema wê nehatiye û jê re çarede roj mane, li ser wê ceza me dixwaze. Sureyya beg digel min neyariyê dike û gotin têra neyariyê nakin.

serek gelekî tehl bû û bi dengekî bilind qîrr kir û got:

-Hê Şukrî axa! tu ne li serê çiyayên Mirdêsî. Vir mehkema îstîqlalê ye, çavên xwe veke û ber xwe baş bibîne.

-Çavên min vekirî; lê destên min valane. Ne xeme we çi divê bikin.

Hevoka paşîn bi awakî ecêb ji devê apê min bi derket. Bi gotina xwe re, bê ku li hêviya emra serekê mehkemê bimîne rûnişt. Her wekî bêje, vaye min dev ji berxwedanê berda, ma we tiştekî din jî divê?!..

Naîb'am wek gurê ku diranên xwe qîç dike tûj tûj berê liapê min û paşê li me hemiyan nihêrî û da pey koma mehkemê û çû oda mizakerê. Her wekî bêje, niha ezê şanî we bidim.

Piştî nîv saetê gava vegerrîn, û serek qerara hikim xwend, em holê ceza kiri bûn: Her du apên min, îdam, em ên mayî her yek bi şeş sal hepsa tekebend hikim bûn.

Di wê bîstê de, her apekî min çar-pênc leşkeran xwe gîhandê û destên wan li paş piştê kelepçe kirin û berê me dan zîndanê.

Min gelekî ji apê xwe hez dikir, heye ku biraziyekî, wekî min ji apê xwe hez nekiribe. dema min dît ez bi kêrî wî nayêm û nikarim jê re tiştekî bikim, giriyekî xurt û bêdeng ez girtim hêstir bi kulman ji çavên min dadiketin û li pey herdu apên destgirêdayî dimeşiyan.

Gava em gîhan hepsê, herdu apên min xistin nezaretê, cihê ku mehkûmên îdamê dixistinê. Osman beg, midîrê girtiyên siyasî got jendermeyê ku pandiyê nezaretê ye:

“Bihêlin ev xort hercar derbasî cem apên xwe bibe, kes destê xwe medin ber”.

Bi gotinê re, bi destê min girt û ez derbasî cem wan kirim.

Mirov çi ecêbin, û çiqas ji xwe hezkirî ne! Heya berî saetekê min bi çavekî ne baş li Osman begê dinêrrîn û tê de celadê gelê Kurd didît. Gava qenciyeke biçûk ji min re kir, gunehên wî yên mezin di çavên min de biçûk dibûn, an min dixwest tiştekî baş tê de bibînim!....

Wesiyet

Piştî Osman begê destûra min da ku linik apê xwe bimînim, ji saet dudiyan heya saet nehên şevê kes têkilî min nebû. Pirr neçû kurrê apê min Şukrî Qadir jî hat zîndanê. Ew ji sê rojan de hati bû Diyarbekirê ka çl dikare ji bavê xwe re bike. Qadir sê salan ji min biçûktir bû û em di nav malekê de mezin bûbûn.

Herdu rojên mehkema me Qadir dihat di nav guhdaran de rûdinişt. Roha paşin dema bavê wî bi îdam bikin bû, hat zindanê ku ji bo cara paşin bavê xwe bibîne û wesiyeta wî bizane. Gava Qadir hat nezaretê, aoê min wesyeta xwe dida nivîsandin. Ji ber ku mehkemê ji herdu biran re sê roj (heq heyat) neda bû dê wê şevê bihatana darvekirin. Qêdir xwe avêt himbêza bavê xwe, bavê serê wî da ser dilê xwe bêdeng û fermîsk[33] guvaşt. Êdî nema min xwe girt, ji koza dil ez giriyam. Dema apê min dît, wê meşhedê, ez bi girî kirim; zûka kurrê xwe dehf da û vegerrî ser min û bi dengekî hişk got:

-Çi li te qewimî Osman? qey tu dixazî li vir şînekê deynî!.. Ez ji te hêvîne mezin dikime û tu wek jinan digiriye! Lawê min, ez dikim karine mezin bidim ber te, girî ji jinan re bihêle. Hîngê min ji kira xwe fihêt kir û da ber dilê xwe nema wek wê carê qelsiyê ravekim. Piştî ku nivîsevan ji nivîsandina wesyetê xilas bû apê min ew da kurrê xwe û gotê:

-Ev e wesiyeta min ji bo malê û xwîşk û birayên te. Lê herçî ji bo tola min û armanca min (vegerrî ser min û çêla min kir) kurrê min û piştmêrê ev e. (Bi çavekî ku hezkirin jê dibare) ji min pirsî: Ma ne welê ye ?

Min gotê: -Belê ezbenî.

Dîsa welê bi geşî got:

[33] Fermîsk: hêstirên çavan.

-”Min ne vala hêviya xwe bi te ve girê dabû. Ez bawer bûm ku tu peyayê malbatê yê roja tengî. Mêr be, rast be, qenc be, dê her gav Xwedê li pişt xwe bibînî”.

Hinekî bêhna xwe girt û got:

-”Li pêş te du kir hene, yek sitandina tola min, ya dî, rêya ku min xwest pê de herrim û ez ne rêwiyê wê rê bûm, tê de çûn bi min ne bû; divê tu jê nemînî. Di roja pêşîn de xuya bû, ku tu yek ji rêwiyên wê rêya mezin û bi rûmetî. Berê min xweş tu nenasî; lê paşê min dît ku Xwedê çira malbata min li ser serê te vêxistiye. Eger tu berê xwe ji qenciyê nedî alî, heye ku bilî hêviya milletê xwe jî”.

Gotina xwe birrî, bi nêhrrîneke tûj li navçava min dinhêrrîn ka çiqas der gotina wî li min kar kiriye. Min ji çavên wî dizanî, gotinek ji min dixwst.

-Ezbenî tola te wê bê sitandin, hercî rêya din (armanc) min jê hez kiriye û dê pê de herrim. Lê ji ber ku nezan im dê nikaribim bi dewreke camêr rabim.

-”Na lawê min, bila çavên te ji vê yekê netirsin. Dinê mêran xwariye, rûmet mêran hilgirtiye û serê neyar jî mêr dişkênin ne zana. Mêr be, rast be, qenc be, dê hemî dergeh li pêş te vebin; eger ne bi gengazî bû bila bi dijwarî be. Xwedê seriyekî mezin daye te, heke bixwazî ji îro bi şûnde jî dikarî gelek tişt tê de bicivînî. Bê perwa bi baweriyeke xurt li rêya xwe de here, dê her gav alikariya Xwedê li pêş xwe bibînî”.

-Tola te dê ji kê bête sitandin?

Berî bersiva vê pirsê bide hinekî fikirî. Berê sê nav dane min. Paşê ji gotina xwe vegerrî û got:

-”Na dev ji dudiyên wan berde, tenê Bedirê Kurrê Osman paşa, divê ew bê kuştin, heya xelk bizane ku mala Heyder axa xwîna xwe li erdê nahêlin. Divê tu qenc bizanî, eger tu wî bi destê xelkê bidî kuştin, dê bi destine biyanî bêyî kuştin. Eger bi bêbextî lêdî, dê bi bêbextî bêyî kuştin. Wek mêran di pêş re herrê, berî ku lêxî deng lêke. Binêrr tu çawan hez dikî bêyî kuştin, welê lêxe.

“Renê vê bizane ku ez di gorrê de serê xwe sihet danaynim, dê her û her guhdarê dengê te bim. Çi gava tu Bedirê paşê dikujî hilkişe ser girekî bilind, berê xwe bide hêla Diyarbekirê û bi dengekî bilind gazî min ke û bêje: (apo min tola te sitand). Dê hînga bikarim serê xwe bi rihetî deynim û razêm”.

Dema apê min gîha vir hinekî rawestî, şûpa westeke xurt ji rûyê wî diyar bû. Her wekî digel min da ser wê rêya dirêj û dihwar û barê ku hilda

-Heye ku.....

-Holê min şîreta wî nehewand, rabû bi xeyd ji cem min derket, heya du rojan nehat cem min. Gava dît ez bi ya xwe dikim, wî dev ji xeyda xwe berda û dîsa hat nik min.

Li Rêya Sirgûnê

Piştî min dilê Necmedîn hişt bi du saetan Qadir hat zîndanê. Herdu cendek binax kiribûn û dixwest zû herre mal. Dema hikim dan me em çarde kes her yek dan bajarrekî Anadolê. Cihê min Denzilî û yê Necmedîn Antaliye bû. Me ne dizanîn ka wê kînga me bi rêxin. Qadir çû ku kara me û rê bike. Piştî pênc rojan ji me re dirav şandin, êdî em ji bo rê pêkhatî bûn.

Kesên çûbûn sirgûnê gelek bûn, lê yên jê vegerrî tine bûn. Ji lewre derheqê yên çûyî de tiştine kêm û zêde dihatin gotin; nemaze ji bo yên zîndanbend!... Yek ji van gotinan: ku li Adenê hemî pereyên wan jê distînin. Ev yeka han ji me re gelekî dijwar dihat. piştî ku mal û milkê me tev sitandin, me ne dixwest birçî bimînin. Ji bo ku pismamê min bizane ka ev gotin raste an derewe, min digel wî tifaq kir: Eger pereyên me her wekî dibêjin bistandana min ê di reşbelekên xwe de navê xwe her wekî di nifûsê de ye (Osman Nûrî) danîna. Na eger derew ba, her wekî xelkê me min bi nav dikin, min dê (Osman Sebrî) danîna. Dema em gîhabûn Adenê kesî perê me nebirin, min jî navê xwe (Osman Sebrî) danî û ji wê rojê de welê hîşt.

Roja 24ê cehzeran, heştekê piştî mehkema me, qefleyek ji me 48 mêran pêk anîn. Wê di nava 12 otomobêlan de em bibirana, herçar mehkûm û jendirmeyek di yekê de. Heqê rê me ji kîsê xwe da û otomobêl ji Diyarbekirê heya Entabê dê em bibirana. Çûna me ne bi rojekê, lê dê bi koç, Diyarbekir, Sêwerek, Riha, Birecik û Entab, bûna.

Her diwazde otomobîl, yazde jenderme û zabitek hatin li ber dergehê zîndanê rawestin. Her otomobêlekê jendirmeye û çar mehkûm lê ziwar bibûna. Em teka tek kelepçe kirin û derxistin derve. Ez berî hemiyan derketim çûm ber otomobêla baştir rawestîm, sê hevalên min jî hatin rex min. Em bi siwariya wê otomobêla baş û nuh dilxweş bûn. Pirr neçû zabitê jendirman hat û li otomobêla me siwar bû. Hîng ez poşman bûm

ser millên min bi destê xwe palmisand[34] û giraniya wî barî nasî. Hînga hezrîngek kişand û got:

-"Dizanim ku min ji te û xortaniya te re tiştek ne hîşt û barê te gelekî giran kir. Ma ne welê ye"?.

-Na ezbenî, tu hîn dikarî hêjî, pişta min xurt e, divê barê min giran be.

-Erê lawê min, ez xurtiya te dizanim. Ew tiştên ku min berê nedizanîn jî, vê carê min hîn kirin. Îro ez tenê bivê zanîna han bextiyarim.

Dengê jendirman ez ji demê hişyar kirim. Saet neh bûbûn, ez bi lez çûm destê herdu apên xwe ku ji dergehê nezaretê bi derkevin, careke din min li pişt xwe nihêrrî, dengê apê min di bi rêxistinê de holê hat:

-"Mêr be, rast be, qenc be, dê bi serdestî û serfirazî bighê dawiya rê".

Ez ji nezaretê derketim rast çûm ser nivîna xwe nivistim. Derba li min ketî gelekî mezin û giran bû. Hikûmeta Tirk dest da ser mal û milkê me, niha jî herdu apên min dikuştin. Tevî ku ez ji rêberekî welê bêpar hiştim, li şûn wan ji min re şanzde keç û kurr hîştin ku hewceyî biratiya min bûn. Dema bavê min berî wê bi deh salan mir, apê min nehîşt ez sêwîbûna xwe bîra bibim. Ma gelo ezê bikarim ji zarrokên apê xwe re wê qenciyê bikim? Dibim giraniya vê ramanê de ez di xew ve çûm.

Sibetirê ro hilati bû gava ez ji xew rabûm. Ji şopa xeyd û westa şeva berê tiştek li ser min nemabû.

Mafir min dixwest, an apê min xwesti bû ku xwe ji tiştine mezin re pêk bînim, divê ez xurt bim. Ma ne wî goti bû min: Mêr be, rast be, qenc be, divyabû ez welê bim.

Piştî rûyê xwe şuşt min şande pê berber, hat rûyê min kurrkir. Hîn ez di nav destên berber de bûm ku pismamê min Necmedîn hat. Gava ez di nav lepên berber de dîtim, bê deng rûnişt, min dizanî dilê wî ji vê kira min çiqas êşiye. Dema berber çû, wî bi xeyd gote min:

-Ma tu yê bi vî eqilî tola apê xwe histînî?.

-Te çi divê?

-Hê cendekê apê te ji dar nehatiye xarê, çawan tu rûyê xwe kurr dikî?

-Ma ezê tolê bi rûyê xwe, an bi dilê xwe bistînim?.

-Ma tu zanî xelkê çi bêje?

-Kê gote te ez bi ya xelkê dikim?.

Necmedîn ji gotinên min mat ma. Heya wê gavê min şîretên wî nedavêtin, ma çI qewimî bû ku îro min gotina hişk dida rûya. Nema dizanî çi bêje ku got:

-Heye tu dîn bûye!...

[34] Palmisandin: Bi destan, di tariyê de, girtin û nazîna tiştekî.

ku çûme ber otomobêla nuh.Zabit yuzbaşiyekî rûhişk û jehr ji rûyê wî dibarî. Eger yê digel me jendirmeye bûya, heye ku hinekî digel me nerm biliviya. Lê zabitek, nemaze ev zabitê rûhişk!...

Otomobêla me di pêşiyê de, yên mayî li pê wê, em li nav bajêrr derketin û hêdî ji s'ra bajêrr nediyar bûn. Min û hevalên xwe nedixwest rûyê wî zabitî yê tirş û kirêt bibînim. Lê wî li pişt xwe nihêrrî û ji min pirsî:

-Tu ji kûyî xort?

-Em ji wîlayeta Melatiyê ne.

-Ji kîjan qezayê?

-Ji qeza Kextê.

-Kes ji we Hacî Bedir begê dixwaze?

-Erê, ew xalê diya min e.

-Xalê diya te?....

Bi gotinê re yekcar zivirrî û berê xwe da me û bi ser ve got:

-Ma hûn dizanin Hacî Bedir welî nî'metê min e? Eger ez îro di welatê xwe de ji rûmet neketime, ew jî bi xêra wî camêriye. Ev bûn du sal ez dixwazim yekî ji xelkê wî bibînim, da xizmetekê jê re bikim. Gelek sipas ji Xwedê re ez îro xwarziyekî wî[35] di destê xwe de dibînim. Heye ku bikarim çiçkekî xizmeta wî bikim.

Xwedê bi rehma xwe şake, Hacî Bedir ji axayên mêr û çak û hêja bû. Heye ku di nav tebeqa axan de peyakî holê xêrxwaz û bi rûmet ra ne bûbe û rane be. Ji qenciyê pêve kesî, heya bi neyaran, tiştek jê ne dîtibû; eger me jî îro qencî jê dît ne pirr bû. Ji xal û xarzitiyê pêve di navbera wî û bavê min de gelek hezkirin hebû. Piştî ku bavê min mir, hemî hezkirina xwe dabû min.

Otomobêlên digel me hinek gelekî kevin bûn, her deh kîlometran carekê disekinîn. Hemiyan xwe li hev radigirtin, dema yek disekinî yên mayî tev disekinîn. Berî nîvro em di navbera Diyarbekir û Sêwerekê de gîhan cîkî bi av û çîmen. Zabitê me li wir sekinî û destê me her çaran ji kelepçê vekir û got:"nema careke din dixe destê me. Ji bo ku bikare me her çaran destvekirî bihêle divya bû destên yên mayî jî veke. Dema hemî hatin ser hev destê hemiyan vekir û gote wan:

-"Gelê mehkûman! Ez xalê vî xortî dinasim, gelekî qencî bi min kiriye. Ji bo wî ezê destê we hemiyan vekim û nema girêdidim. Mana xwe, di rêya sirgûnê de nema destên we tên girêdan. Dizanim ku pirraniya we bi

[35] Hacî Bedir ne xalê diya min, lê ji xalanê wê ye. Hacî Bedir ji mala Osman begê, dapîra min keça Mamûd begê ye ku herdu pismamên hev in.

panzde salan mehkûm in, lê hêvîkarim ku bi reva xwe min şermisar nekin".

Piştî vê gotina kurt emir da jendirman, destê hemiyan vekirin. Mehkûmên me ji bo destmêj û nimêjê li dora avê û çîmen belav bûn, zabit digel min rûnişt ku çîrroka xwe û Hacî Bedir begê bêje. Berî em çîrroka zabit bêjin, divê em Hacî Bedir ji xwendevanan re hinekî bidin nasîn.

Hacî Bedir beg serekê eşîra Reşiyan û şandiyê[36] qeza Kextê bû. Di şerrê Firansizan de li Entabê zor mêranî û fedakarî kiribû. Li nik hikûmeta Anqerê, nemaze Mistefa Kemak û Ismet gelekî bi rûmet bû. Bi ser vê rûmeta han de, hin rûçikên wî hene ku, bi hev re linik kêm mirovan peyda dibûn. Wek mêranî, comerdî û xêrxwazî. Nemaze di xêrxwaziyê de ewçend pêş ve çûbû ku ferq nedixist nava yar û neyar. Di dilê wî de bi navê rikê tiştek tinebû, tenê dizanî qenciyê bike. Dilê wî zîz, canê wî çak û paqij û ramanên wî dilovan bûn. Ev e bi kurtî salixdana Hacî Bedir beg.

Zabitê Tirk ku navê wî di bîra min de nemaye, holê dest bi çîrroka xwe kir:

"Berî pênc salan ez jî wekî her zabitekî Tirk; xort, xwedî hêvî, bi dilekî geş û gavine bawermend ber ve pêşende diçûm. Tucaran rojên geş bê ewrên reş û tarî naborin. Yê min jî, di dur vê bînbaşiyekî de, ewrekî reş û tarî di ezmanê jîna min re borî. Di navbera min û wî bînbaşî de tehlî gîha warekî ku min ew kuşt û ketim hepsê. Hemî zabitên heval û serekên min, tev xwe dan aliyê min. Piştî ku mehkemê salekê dirêj kir, salek hikim dane min û ez ji ordiyê hatim avêtin".

"Di destê min de ne mal û ne jî kar hebû ku pê debara xwe bikim. Hin hevalên zabit ji bo demekê alîkariya min kirin, lê vê yekê heya bi heya dom ne dikir. Ji lewre min pêş xwe tarî didît. Min berê xwe da kîjan dergehê dewletê, li pêş xwe girtî didît. Ji xwe kuştinê pêve min li pêş xwe rêyek ne didît. Rojekê ez li qehwê rûniştî bi xwe kuştinê difikirîm ku nasekî kevin hat û di rex min de rûnişt. Piştî ku serwextî rewşa min bû, ji min re got:

-Li Anqerê bi navê Hacî Bedir beg şandiyek heye, jê pêve kes nikare birîna te derman ke.

Min ev nav ne bihîsti bû, ma ji min re çi dikarî bike? Wek mirovê ku hêviya xwe ji dinê nema be, min gotê:

[36] Şandî: meb'ûs, naîb.

-Ev Hacî Bedir kî ye, û çi dikare bike? Tu baş dizanî ku ez ji ordiyê hatine avêtin.

-Tu nizanî Hacî Bedir kî ye, ji lewre dikarî holê bêjî. Lê ew dikare te vegerrîne ordiyê û bes.

-Çawan dikare?

-Xazî paşa, Ismet, fewzî gotina wî naşkênin.

-Em bawer bin ku welê ye, ez wî nas nakim.

-Ne hewceyî nasînê ye, kî herre nik wî xwe pê re diwestîne.

-Bese lo! tu bi koranî dipeyivî. Hinekan ji te re zêde salix daye û tu jî welê bawer bûye. Tenê bizane ku em ne di dewra Sehaban da ne.

-Dilê te ye, jê pêve kes nikare birîna te derman ke. Eger tu şîreta min negirî ji bextê te yê reş e.

Dostê min gotina xwe holê birrî û piştî bîstekê ji qehwê çû. Bi çûna wî re min jî Hacî Bedir û rûmeta wî ya li nik hikûmetê ji bîra kirin, û dîsa vegerriyam ser ramana xwe ya reş û tarî.

Ez kurrê mirovekî feqîr bûm. Bavê min bi sed bela û destengî ez dame xwendin û bûm yuzbaşiyekî paşê min mêrek, zabitekî ji xwe mezintir kuşt û ji ordiyê hatim avêtin. Malê min nîne, dergehên dewletê li ber min dadayî ne, karek din jî nizanim bikim. Ma ji mirinê pêve çi li pêş min diman?!

Piştî çend rojan, dîsa li wê qehwê û di wî quncikê berê de rûniştî bûm ku dostê min hat. Piştî silavê di rex min de rûnişt û li halê min pirsî:

-Çawayî? ma te hîn ji xwe re karek ne dît? ez ne bawerim ji Hacî Bedir pêve kes bibe dermanê derdê te. Carekê xwe biceribîne, ma tiştekî xisar nakî, mêr be.

-Xisar nîne; lê ne wî nas dikim û ne jî mala wî dizanim.

-Ez jî wî nas nakim; lê gava bixwazî herrî dikarim mala wî ji te re salixdim.

Dirêjiya rojên min li qehwê û gerra nav bajêrr vala diçûn. Ma çi dibûn ku ez herrim cem wî camêrî, ma ew jî ne dergehek bû?... Min qîma xwe bi şîreta wî anî. Roja din sibê zû ez gîhandim ber derê Hacî Bedir begê û gote min:

-Fedî meke, ev camêr dikare barê te rake. Di vê tu bi vê baweriyê herrî cem.

Tevî ku baweriya min ne bi qasî ya dostê min bû, êdî gîhabûm ber derî, divya bû xwe endim paş. Min li derî da, kurdekî ser bi pûşî derî vekir û ez derbasî hundurr kirim. Pirr neçû, peyayekî girs hat, silav li min kir û got:

-Tu kî yî? ez çi dikarim ji te re bikim?

Min jê re çîrroka xwe bi ser û ber got. Min qet bawer ne dikir ku mirovek dikare xwe bi yekî biyanî re ewçend bendewar bibe. Bi rûyekî geş û baweriyeke xurt got:

-Di vê zabitek holê bêkar birçî nemîne. Yan divê rêyeke debarê bidin ber te, yan jî te bikujin. Ezê niha digel te bûm cem Fewzî paşa, divê te vegerrîne ordiyê.

Piştî me qehwe vexwar, ez digel xwe birim daîra erkanê. Xuya bû gelekî bi rûmet bû, dema yawerê Fewzî ew dît, revî pergîna wî û jê pirsî ka dixwaze paşê bibîne. Gava got erê, bi lez çû haya Fewzî paşa kir. Hat gotê:

-Fermû paşa li bende çûna te dimîne.

Bê ku kêsa gotinekê bide min, rahişt destê min û ez li pey xwe rakişandim. Min gotê:

--Zabitekî wek min biçûk nikare bê cem paşê.

Wî bi dilê xwe yê mezin got:

-Paşa jî wekî min û te welatiyeke. Ji bîra meke ku berî çend salan ew jî zabitekî biçûk bû. Were dê bibînî mirovekî baş e.

Bê hemdê min ez digel xwe birim hundurr. Paşa rabû û qedreke ecêb jê re girt, tevî wê rûnişt û gotê:

-Ez ne ji bo rûniştinê; lê ji bo şuxulekî hatime. Eger te hêviya min qebûl kir ezê rûnim, an na rûniştin ji bo çi?

Hê re serpilkî rewşa min da zanîn û gotê:"Divê tu wî vegerrînî ordiyê". Fewzî paşa gotê:

-Zabitê ku ji ordiyê bête avêtin nema careke din tê vegerrandin.

Hînga Hacî Bedir tehl bû û got:

-Mafir nayê vegerrandin bikuje. Ji dewletê re jî, ji wî re jî ev bixêrtir e. Ma ji îro bi şûnde dikare çi karî bike?

-Qanûn rê nade ku ez zabitekî metrûd vegerrînim ordiyê.

-Ji bîra meke ku li ser pişta van şêran me welat parast û bi destên wan neyar şikand. Îro tu dixwazî vê rastiyê ji bîra bikî. Eger tu hêviya min qebûl nekî dê herrim nik Xazî paşa, heye ku wî hîn bihayê zabitan ji bîra ne kiri be.

Fewzî paşa ji vê gotinê fedî kir û bi nermî gotê:

-Heqê te heye, divê em mêraniya zabitên xwe ji bîra nekin. Fermû rûne, hele binêrrim ka em çi dikarin jê re bikin.

Hînga Fewzî paşa gazî alîkarê xwe kir û bîstekê li ser lingan digel wî peyivî. Paşê vegerrî ser Hacî Bedir begê û gotê:

-Ordiyê em nikarin vegerrînin; lê ji bo te ez qîma xwe tînim ku wî bikin zabitekî jendirman. Serdarê jendirman dostê te ye, ev e ez jê re dinivîsim ku em qîma xwe bi tay'ineke holê tînin.

Hînga Hacî Bedir begê berê xwe da min û pirsî:

-Tu hezdikî bibî zabitê jendirman?

-Erê, ne xeme.

Hînga rabû digel min çû cem serdarê jendirman. Piştî du saeta ez bûbûm yuzbaşiyekî jendirman! Ev giş bi camêriya Hacî Bedir begê. Min ji Xwedê dixwest ez hinekan ji xelkê wî bibînim û xizmeta wan bikim. Ev e îro hûn ketin destê min"[37].

Piştî min çîrroka zabit bihîst, dilê min bi kira Hacî Bedir begê gelekî geş bû. Kirên wî yên çak ewçend pirr bûn ku, me berê xwe kû de dizivirrand, şopa kir û qencîne wî didîtin. Rehma Xwedê lê be.

Mehkûmên me li ser çîmen û dora avê kom kom rûnişti bûn. Min zabit berda û çûm nava wan, min hêvî kir ku bi reva xwe min li pêş camêr fedîkar nekin. Min di wê demê de şopa qencîzaniyê di çavên hemî hevalan de didît. Ma ne bi vê dilçakiyê bû ku kurdan heya îro bi çavên biran li kolîsarên xwe dinhêrrîn?!...

Wê rojê em gihan Sewrekê, wê şevê di zîndana wê de man ûsibetirê em birin Rihayê. Zabitê me dê li wir vegerriya Diyarbekirê. Berî me derbasî zîndanê bikin bi xatirxwaziyî ji me qetî. Ji ber ku em destberdayî sipartin jendirmeyên Rihayê, heya ku tiştekî bê rê di me de ne dîtana wê heya taliya re destberdayî bibirana. Ev qenciya han ewçend ji me re hêja bû ku heya îro ji bîra min naçe. Li Rihayê em birin Bîrecikê û li wir birin Entabê. Koça pêşîn ji çûna me li wir qediya, divya bû ji nû ve em otomobêline din bigirin ku me bigehînin Kellerê rawesteka tirênê.Piştî em panzde rojan li zîndana Entabê man, em birin zîndana Edenê.

Berî em bigehên Kellerê rûya me nîzîkî sînorê Sûriyê bûbû. Şev reş otomobêl ji hev bi dûr ketibûn. Kê ji me bixwasta birreve dikarî jendirmeyê xwe ji çek bike girêde û berê xwe bide Sûriyê. Di navbera Entab û Kellerê de sê zarrokên Cemîlê Çeto digel min siwar bûn. Dema rêya me nîzîkî çiyan bû, gotine min, eger tu qîma xwe bînî, emê birrevin. Wê şevê rev gelekî hêsanî bû; lê ne baweriya min bi wan hebûn û ne jî bi nefsa min. Em herdu serî gelekî mezin bûn. Ji me re gelek tecribe dixwest ku bikarin li ser lingên xwe rawestin. Ji lewre ez razî nebûm û serekî dirêj wan lewm ji min dikirin.

[37] Piştî vê bi du mehan rehmetî Hacî Bedir beg, ji bo serxweşiya apê min hat zîndana Edenê cem min. Min jê re çîrroka zabit got, baş ne dihat bîra wî. Xuyabû qencî bi qelek zabitan kiri bû, nema dizanîn kî ye.

Berî nîvşev em gîhan Kellerê. Em 48 mêr tevî diwazde kesên din ango 60 peya xistin fargoneke pirtal. Heya roja din nîvro tirên hat û em gîhandin Edenê, em wek serdînan di ser hev de man. Heya em gîhane Edenê tengiya me dîtîye nayê salixdan. Av nedidan me, nedihîştin kes derkeve derve; ji german û hilma peyan ji asraqên[38] fargonê xwîydan di çilkîn. Bi vî halî em berî êvarê gîhan Edenê û berê me dan zîndanê.

Heftê û sê rojan li Zîndana Edenê

Berî hemî hevalan ez derbasî hewşa zîndanê bûm. Girtiyên wir wek heleqekê di nîvê hewşê de rawestî bûn dixwestin girtiyên nuh bînin. Min bi dengekî bilind silav li wan kir, gelekan silava min vegerand. Di nava wan de kale mêrek bi derket û hat ber min pirsî:

-Çend sal hikim dane te?

-Şeş sal tekebend.

Bi gotina min re kalemêr li ser piştê (paşpê) şeş gavan vegerî. Ev tevgerra wî ji min re xweş nehat ji ber ku bêhna tirsê jê dihar. Min biken gotê:

-Yê hikim xwarî ez im, ma tu ji bo çi ditirsî?

Bi vê gotina min re peyayekî dirêj, gewr û çûrr ji nav wan derket, hat ez himbêz kirim û ramûsam. Bi zaravayê xelkê Serhedê got:

-Tu mêvanê min î, divê tu hêviya min qebûl bikî.

Bê ku kêsa gotinekê bide min, wek zarrokekî ez di himbêza xwe de girtim birim. Bi sed lavayî min xwe ji himbêza wî xilas kir û digel wî çûm qatê jor oda wî. Ev camêr Husên Hilmî Atîk qaymeqamê qeza Cebaxçûrê û yek ji hevalên Şêx Seîd ku jê re hikmê îdam hatibû dayîn. Ji ber ku di şerrê firansizan de mêraniyeke mezin rave kiribû, jê re daxistin panzde salan. Ew ji çerkesên Kurdistanê bû; lê ji kurdekî pirrtir bi doza kurdîtiyê girti bû. Dikarim bêjim ku, min dersên heskirina welêt ên pêşîn ji wî camêrî hîn kirin.

Du meh û êszde rojan li zîndana Edenê digel Husên Hilmî Atîk mam. Hesen beg kurrê Salih begê Hênê jî tevî wî rûdinişt. Me bi hev re roine geş derbas kirin. Hîngê kurrê pismamê Hesen begê Behrî jî li zîndana Edenê bû, lê ji ber ku nexweş bû biribûn xestexanê, min ew nedît.

[38] Asarq:Bin ban.

Li zîndana Edenê Hacî Bedir beg tevî pênc-şeş axayên welêt hatibûn dîtin û serxweşiya min. Bedirê kurrê Osman paşa jî digel xwe anîbû. Vê yeka han gelekî ez xeyidandim. Hacî Bedir beg rehmetî tehil bûna min bîra bir. Zûka gote wan:"Gelê axan hûn herrin mêvanxanê, heya behnekê li nik xwarzê bim". Dema ez û wî tenê man min bi gazin gotê:

-Xalo! çawan Bedirê paşê digel xwe aniye? ma tu nizanî ku wî çi bêbavî bi me re kir?

-Belê ez dizanim wî çi kiriye. Lê ne bi we, tenê bi xwe kiriye, divê holê bawer bî. Tevî ku dizanim ew tiştekî ji qenciyê bîra nabe, dîsa dixwazim bawer bim ku gava yek bixwaze qenc be rê li pêş vekiriye. Hûn mala Heyder axa di rik û neyariya xwe de hişkin. Zeynel (birayê wî ku tevî me hikim bû) ji min re wesiyeta apê te gotibû!.. Xwezî welê nekira û ew bisparta şûrê Xwedê...

-Ma çi xeme ku destê min şûrê Xwedê be!...

-Na min nedixwest holê be; lê apê te rehmetî rêyeke dijwar da ber te. Ez baş dizanim ku gelekî ji te hezdikir, ma nedikarî barê te hinekî siviktir bike?

-Ji bo ku ji min hezdikir, hin kirên hêja sipartin min. Ma ji min pêştir kî wî hebû?

-Bi ya min ba, wê tu bihîşta ji bo rêberiya malbat û eşîrê.

-Rêya han, ji malbat û eşîrê pêştir û hêjatir e. Ji îro bi şûnde rêya me dê ew be.

Dema dît ez naxwazim ji ramana xwe vegerrim, nema çêla wesiyeta apê min anî, em wekî din hinekî nijûl bûn û xatir xwest û çû. Berî çûnê ji min xwest ku hergav rewşa xwe bi nivîsanê jê re bidim zanîn.

Du meh û sêzde rojên ku min linik Husên Hilmî Atîk derbas kirin gelek tişt bi min dane zanîn. Gava ez ji zîndana Edenê bi rê ketim teqez ne ew xortê ku berî 73 rojan hatî wir, heye ku bûbûm peyakî xwedî raman û xweser. Ji zîndana Edenê em birin zîndana Qonyê û ji 48 peyan em deh kes digel hev mabûn. Çar em Mirdêsan, çar kurrên Çemîlê Çeto û du peya Silîvî. Herçî hevalên me yên mayî, li Edenê ji hev belavkirin û her kes şandi bûn cihê wî.

Eger ez ji zîndana Edenê çûm jî dilê min bi husên Hilmî Atîk ve hatibû girêdan. Girêdaneke welê ku, dûrbûnê ne dikarî hez kirina wî ji dilê min derxe, an jê kêm bike. Ji bo cara pêşin bû ku min didît Kurdsitanîkî ne Kurd bi dilpaqijî ji kurdan û Kurdistanê hez dike.

Di demeke welê de ku ew hezkirin bi dana can, an derdana pêşende dibûn mal...

Heyf ku piştî wê bi deh salan Husên Hilmî Atîk hatibû Sûriyê, lê ez ne li wir bûm, firansizan ji bo hin kam ez ji welêt derxistim. Heya ez vegerrîm Sûriyê ew camêr çûbû rehma Xewdê, bê ku careke din wî bibînim.

Sê mehan li zîndana Qonyê

Dema yek girtî be û wîbibin zîndana Qonyê, bê şivîş ew ji bextê wî yê çak e. Zîndan mezin, û rêzana wê jî gelekî baş bû. Zîndan bixwe du birr bûn: Keleha hundurr, û keleha der, her wekî ew dibêjin. Herçî keleha hundurr ji zîndanên Tirkiyê yên kevintir bû ku ji tu zîndanên din ne çaktir bû. Lê keleha der, gelekî fereh, heye ku jê xweştir û firehtir zîndanek tinebe. Hemî panker[39] xwenda û xwedî rûmet di keleha der de rûdinin. Gava em gihabûn wir, hê nuh çend odeyên biçûk çêkiri bûn. Jê yek dabûn du axayên Reşûyan yê Haymanê û yek dabûn axayekî Canbegî, ew jî ji Kurdên Haymanê bû. Du ode ji wan hê kes ne ketibûyê û xwestin yekê jê bida min her wekî dê li jêr bêjim. Aveke baş dihat nava zîndanê ku pê erdekî fireh av didan û ew erd di navbera girtiyan de par ve kiribûn. Her girtiyekî goreyî daxwaza xwe tê de keskayî diçand, Herçî kesê panker, dikarî di keleha der de ji xwe re dikankê veke û bi panê xwe mijûl be. Keleha der, ewçend fireh û xweş bû ku mirov xwe tê de girtî ne dizanîn.

Piştî em gîhan zîndana Qonyê bi çend rojan min têlxirafek da Hacî Bedir begê, da li Anqerê bixebite heye ku bikare min û her sê hevalên digel min mayî li wir bide sekinandin. Hevalên me yên mayî hin li Diyarbekirê, hin li Edenê ji me veqetandibûn. Emên mayî jî, dê li Qonyê ji hev veqetandana. Me dixwest ev herçarên mayî li zîndana Qonyê digel hev bimînin. Gava mirîrê zîndanê çav bi nivîsîna min dikeve, gelekî kêfa wî jê re tê û diçîne pêy min. Kêla ez bi diyarî wî ketim, gelekî rûmeta min girt û kêfa xwe ji min re anî. Piştî ku em serekî mijûl bûn û gelek tişt li ser rewşa me zanîn, gote min:

-Ez dibînim gelekî kêfa te ji zîndana me re hatiye. Ev e tu ji Xalê xwe re dinivîsî da bixebite ku te li vir bihêlin. Em midîrê zîndanan jî, tiştekî biçûk ji destê me tê, dema em bixazin dikarin girtiyekî kêleke dirêj linik xwe bihêlin. Mafir tu dixwazî li vir bimînî, ezê te bihêlim û odeyek biçûk

[39] Panker: Xwedî sen'et e, pan; sen'et e.

bidim te.Eger Anqere ji bo mayîna te ya li vir razî ne be jî em dikarin te neşînin û dê li vir bimînî. Hemberê vê ez tiştekî ji te dixwazim.

-Fermû bêje.

-Li nik min girtiyekî Mixribî heye, wî girtî jî Hemiliyek heye û têde lavelav[40] ne hêja hene. Nivîsana lê gelekî xweş e, divê tu ji min re jimarekî li ber wê binivîsî.

-Ev tişt gelek hêzaniye, ez bê hember dikarim ji te re bikim.

Zûka gote serxardiyan ku ji min re odeyekê ji odeyên nuh veqetîne. Lê hevalên min dilê xwe hîştin, ne xwestin ku ez wan berdim. Ji lewre min gote midîr:

-Ez niha naxwazim terka hevalên xwe bikim. Çi gava ew li vir çûn, dê bêne oda ku îro didî min.

Li ser vê yekê min dest pêkir hemîliya wî jê re nivîsî. Di nava du heftan de min xilas kir û dayê.

Heya wê hêngê têkiliya min bi kurrên Cemîlê Çeto re gelekî hindik bû. Bi her awayî em dûrî hev bûn. Lê tiştekî bê dilê min, ez bi wan ve girêda bûm, ew jî ku kurd bûn. Ji lewre min xwe li ser wan berpirsiyar didît.

Dema em gihan zîndana Qonyê tê de hin girtiyên kurd hebûn. Yek ji wan Heyderî bû û digot biraziyê Husên paşayê Kor e. Ew xort gelekî dihat nik kurrên Cemîlê Çeto. Rojekê min got Felemezê Cemîl:"Bira, dibînim ev xort hergav li ser cihê we ye. Ez di çavên wî de neqenciyê dibînim. Eger hûn bi ya min bikin ewqas rû medinê".

Felemez xwe pirr xeyidand, ji ber ku ew xort pismamê jina wî bû, yanê keça Husên Paşa jina Felemez bû. Ji lewre got:"Her roj bi dehan kes tên cem te, em ji te re çavnebariya nakin; lê ev xort tenê tê cem min çavên te bar nabin".

Çiqas min xwest dilê wî xweş bikim, xwe pirrtir xeyidand. Min dev jê berda û nema guh dayê. Çar roj bi nav neketin, wî xortî du hezar lîreyên kurrên Cemîl ji sendoqa wan dizî. Hînga Felemez hat cem min û alîkariya min xwest. Bê ku gotinên wî yên sar bidim ber çavên wî, min xwe xist nav gelşa wan. Berê min haya midîr kir û xort girtin kirin cihekî pîs û lê zor kirin. Ji aliyê din, min axayên Kurdên Haymanê berdan gewriya wî. Piştî ku wan jî pê xistin pişta wî got wî birine û wê bide, tenê sed lîre jê xwariye. Min gote, ne xeme, bila ên mayî bide em giliyê wî nakin. Li ser vê yekê min gote midîr xort berdan û ez jî hatim min haya kurrên Cemîl kir ku xwe tev nedin. Lê cihê ku şîreta min bigirin, dirêjî xort kirin,(eger ez ne şaş bim navê xort Zibêr bû) lê dan û serê wî şikandin.

[40] Lavelav: ji lavekirinê tê, di'a.

Zibêr jî got:"Mafir wan serê min şikand û rûmeta min birin, nema ez peran didim wan. Li ser wê me digel xardiyanan çû nava tiştê wî vello kir. Di nav mitêla wî de me 1000 lîre dît; lê hezarê din me nedît, çû bi avê de.

Bê şivîşk Zibêr dizanî ku kurrên Cemîl dev jê bernadin. Heye ku bikuştana, ji lewre rabû 500 lîre da zabitê jendirman û wî jî ez û herçar kurrên Cemîl di nişka ve ji zîndanê derxistin birin nezaretê. Piştî ku em çar rojan di nezaretê de hîştin, em şevekê dest kelepçe kirî birin tirênê û berê me dan cihên me. Li Afyon Qere Hesarê ez ji tirênê derxistim birim nezaretê. Bi rêve min ji jendirmekî zanî serdarê wan kî ye, gelekî dostê apê min bû. Sibetirê min jêre reşbelekek nivîsî, zûka ez ji nezaretê derxistim birim nik xwe, wê êvarê jendirmeyek da min tevî tewsiyekê ji serdarê jendirmeyên Dinizliyê re ez şandim. Dema min xarir jê xwest gote jendirmeyê ku digel min tê:

-Tu ne ji bo parastinê, lê ji bo xizmeta wî digel xort diçî. Eger ji te ne xweş be, gazinan ji xwe bike.

Piştî tehliya çar rojan di nezareta Qonyê de û roj û şevekê bi rêve destgirêdayî, ez bi serbestî û xweşî gîham Denizliyê.

Sal û nîvek li zîndana Denizliyê

Dema ez gîham Denizliyê min tewsiya digel xwe anî da serdarê jendirman. Camêr gelekî rûmeta min girt û zabitek digel min şande nik midîrê zîndanê da ku cihekî baş bide min. Midîrê zîndanê mirovekî jîr û têgeheştî bû. Di jimar 2 ku ji hemî jimaran biçûtir û çaktir bû de cî da min. Jimar 4an hemî Kurd bûn, xwestin ez herim nav wan; lê min dil nekir. Bêtifaqiya di nav Kurdan de nahêle ku mirov di rex wan de rihetiyê bibîne.

Di nava çend rojan de min gelek tişt li ser vê zîndanê hîn kirin. Zorbazî û talankeriya mezin di nav vê zîndanê de dibûn. Kesê ku ew zîndan ne dîtiye nikare tiştên ez dinivîsim bawer bike. Çend me'mûrên ku zîndana di bin çavdariya wan de bû tifaqa xwe kiribûn yek û girtî dişêlandin. Ji bo vê şêlandina han rê û rêzik danîbûn û zîndan ji deh salan de li ser wê rêzana kirêt diçû.

Alîkarê naîb'am, alîkarê serdarê jendirman li wîlayetê, serekê qereqola zîndanê, midîrê zîndanê tev bûbûn şirîkê vê diziya han. Her odeyek zîndanê dabûn destê dizekî, an mêrkujekî. Her roj girtiyên dihatin li ser odan belav dikirin. Kijan girtiyê nuh bihata zîndanê xwîk jê distandin. Ev xwîk goreyî halê girtî ji deh lîreyên tirkî heya sed lîreyî bû. Girtiyê xwîk

nedana, di bin daran de diperritandin, ne dikarî gilî jî bike, ji ber ku rêya gilî li pêş wî digirtin. Na gava gilî bigihaşta derve, alîkarê naîb'am dihat, dipirsîn û dawî xweyî gilî derewîn derdixistin û didan mehkemê. Bi vî awayî kesî nedikarî giliyê wan bike.

Herçî kara ku ji wê koma dizan re dihat rojê di navbera 150-200lîre de bû, di nava hev de parve dikirin. Her roj di navbera 5-10girtiyan de dihatin zîndanê. Her yekî ji wan êvarê xwîka xwe dida, sibê serekên odan para xwe jê hiltanîn û yê mayî didan midîr û serekê qereqola zîndanê. Wan jî nivî ji xwe re digirt û nîvê mayî didan serekên xwe.

Ji vê pê ve girtî berdidan diçûn malên xwe û paşê vedigerrîn. Li ser vê jî gelekî pere distandin. Ereq, giya, afyon derbasî zîndanê dibûn û bi bihakî bilind dihate firotin. Bi ser van kiran hemiyan de eşkere bi cûz[41] dilîstin ku kara lîstikê digeha serekên odan. Ev tiştên han hin kirên bê rê bûn ku di zîndana Denizliyê de eşkere, bê perwa li pêş çavên me dibûn.

Min têkiliya xwe ji tiştekî netanî û digel kesî nedipeyivîm. Ji ber ku bînbaşiyê jendirman ez şandibûm nik midîr, kes têkilî min ne bûbû û min jî nedixwest têkilî kesî bibim.

Dirêjiya rojên xwe bi xwendin û gerrê derbas dikir. Heya di gerrê de jî ez digel kesî ne dimeşîm. Her kes, Kurd, Tirk, midîr, xardiyan hemî ji min xweş bûn û ji qenciya min xeber didan.

Di vê navê de min ji xwe re kirina tiştekî xweş dît û bê dudilî dest pê kir ku ew jî: di şixulê girtiyan xeber dan û bi çîrroka wan mijûl bûn. Kireke holê, dikarî zanîna min pirrtir bike û çavên min çêtir veke. Ma jîn hemî ne ji tevayiya tecribane? kesê bi derd û êşên xelkê re benddewar bibûya di nizîk ve ew dinasîn. Ma min çi dixwest ? Ji zanîn û nasîna xelkê pêve ne tiştek. Ji bo cara pêşîn, bi serê xwe min dikirî û têkilî derd û êşên xelkê bikim û jê hin tişt hîn bibim.

Piştî ku min qîma xwe bi kireke holê anî, kesî qîma xwe bi zanîna min netanîn ku doza xwe ji min re salixdin û çîrroka xwe ji bo min bêjin û pişta xwe bidin zanîn û alîkariya min. Li wir gelek mirov hebûn ku ji ber tinebûna peran, an bîr nebirinê, doza[42] xwe nedispartin abûkatan. Min dikarî di van celeb mirovan de kesên ku alîkariyê ji min bixwazin bibînin. Ji lewre, berê ji bo ez bikarim wan berve xwe bikişînim, min ji xwe re du-sê kitêbên qanûnê pêk anîn, wek:qanûn ceza, usul mihakimat cezaiye, qanûn medenî. Paşê min di nava girtiyan de da zanîn ku kî îstîd'akê linik min binivîse ezê heqê pûl ji kîsê xwe bidim.

[41]Cûz: Qumar.
[42]Doz: Dawa, qeziye.

Vê yekê di nava du sê rojan de gelek xuyî derd li dora min gihandin hev. Bi şev min ji xwe re qanûn dixwend û bi roj îstî'da dinivîsîn û heqê pola ji kîsê xwe dida. Nivîsandina istîd'ayên belaş, raste gelek camêr li dora min civandin; lê baweriya wan bi min nedihat ku dê bikarim bi kêrî wan bêm. Di nava meha pêşîn bi çend îstîd'ayên ku min ji bo dozine biçûk nivîsî bûn bi kêr hatin. Li ser vê baweriya xwedîdozan bi min xurt bû, û ji dil xwe sipartine min. Hînga min danîna pol ji kîsê xwe rakir, çi kesê bixwasta îstîd'ayê linik min binivîse polê xwe tanîn, tenê nivîsan belaş bû. Dema min heqê pol da ser xuyîdoza, çêtir baweriya wan bi min hat û li dora min civîn. Holê, bi vî awayî, ez bi kêrî gelek reben û belengazan dihatim û roj bi roj çêtir çavên min vedibûn. Bi ser van de eger rojekê ez hewce bibama bi bihayê îstîd'an min dikarî xwe baş bi xwedîkim.

Ji Kurdên ku surgûnê Denizliyê bûbûn, bi navê Seîdê Vartoyî xortek hebû ku li nik Walî û di nava mala wî de dixebitîn. Li ser destê Seîd Vartoyî Walî ez nasîbûm, her hal çû bû jêre salixa min dabû. Tevî ku Walî ez nedîtibûm, tenê li ser salixdana Seîd gelekî bendewarî ji min re rave kir. Gelek caran hin rojname digel Seîd ji min re dişandin. Gotibû Seîd:' Gava Osman hewceyî tiştekî dibe, bila zû haya min bike. Divê xwe ji tu gotin û daxwazan nede alî". Ev Walî bi navê Xalid beg Kurdek bû; lê nedixwest kesek kurditiya wî bizane. Nasîna di navbera min û Walî de gelekî pêşde çû. Heya hin caran rojname digel kurrê xwe Elî dişandin dergehê zîndanê.

A xweştir ev bû ez piştî hemî Kurdên surgûn çûbûm Denizliyê û tenê ji min re Kurd Osman digotin. Çi gava giliyekî reben heba, an dozek wan biçûya mehkemê dihatin cem min, bawer bûn ku dê bi kêrî wan bêm. Na gava min nikariba bi kêrî wan bêm, teqez min rû ji wan nediguhart û pişta xwe nedida wan. Ez di vî halî de bûm ku rojekê têlxirafek ji Hacî Bedir begê hat, dibêje:"Ji bo civandina te, Zeynel û Necmedîn li zîndana Mêrsînê wezaretê miwafeqet kir, xwe ji bona hatinê karke".

Tevî ku mala Hacî Bedir begê li Mêrsînê bû min dizanî li wir dê gelek bi rûmet bim, min nedixwest ji zîndana Denizliyê herrim. Ji alîkî, di nava şeş-heft mehan de min dora xwe nasîbû û xwe dabû naskirin. Eger biçûma zîndana Mêrsînê dê bi rûmeta Hacî Bedir begê bijiyama; lê li Denizliyê rûmeta ku min ji xwe re çar kiribû. Tevî vê min nedikarî bêjim ku ez naçi, tê de nankorî û qencînebîrî hebû. Lê Felekê hezkir ku ez bê hemdê xwe neçim zîndana Mêrsînê û li ya Denizliyê bimînim, û gelek west û tehliyan bibînim. Ma bê west û tehlî, derd û kul kînga em jînê dinasin û çawan têne pehtin.

jimar 2 an nav tirkan, qe ne ez û Kurd dê ji hev xweş bimana. Ma ne berê Kurdan gotiye:”Dûro bi nûro”. Min ev gotina hêja ji bîra kir û cezayê wê ji bîra kirinê zêde zêde da....

Min bi nameyekê sebebên ku pê ez neşandime Mêrsînê ji Hacî Bedir begê re nivîsî û di dawiyê de gotê:’Min ji hewa Denizliyê hez kir, ev bûn çend meh min dora xwe nasî, nemahezdikim jê dûrkevim. Ji min re xweş tê ku hepsa xwe li vir biborim”.

A rast, tiştê ku çûna zîndana Mêrsînê ji min re nexweş rave dikir ew bû ku min nedixwest digel pismamê xwe Necmedîn di zîndanekê de bimînim. Çend mehên ku me digel hev derbas kiribûn em herdu jî kiz kiribûn. Raman û baweriyên me gelekî dûrî hev bûn. Ji lewre em dawî bi xeyd ji hev dûr ketibûn. Ma hewce bû ku careke din xwe nîzîkî hevkin? Ji nûve xwe cerribandin ne kireke di cihê xwe de bû.

Du Bendî

Gava ez çûm ode jimar 4 ya ku Kurd tê de bûn, bê serek bû. Koma wan ku nîzîkî 60 peyayî bû ji êrdimên[43] Kurdistanê ên têvel[44] gihabûn hev; ku di navbera wan de bi tu awayî yekîtî tine bû, ji xeynî zimanê ku pê dipeyivîm. Ji wan nîzîka sî peyayî ji Mêrdînê bûn, du sê rîspiyên wan hebûn; lê Birahîmê Hacî Yaqûb pêşiya wan dihat. Zaza, pênc ji Hênê û sê- çar peya ji Pîranê bûn, di nav wan de Şêx Emînê kurrê Şêx Qasim pêşiya wan dihat zanîn. Reşkotan heft peya, Mela Edillayê Bişêriyê tev li pê Bihadînê kurrê Şêxê Zîlan diçûn. Emer axa lawê Hisam ji mala axayê Sor wekî min bi tenê bû, kes ji welatê wî pê re tine bû. Vê koma hana têvel ji xwe re mezinek nedinasîn û rihê êrdimî di canê wan de bi awakî ecêb cih girti bû. Çiqas ku bi dev digotin, ew Kurdin , mirov nikare bêje, di nava wan de girêkeke gelparêzî hebû.

Kurdên di zîndana Denizliyê de, bi vê rewşê bûn ku ez çûm nava wan, û min xwest digel wan bimînim. midîrê zîndanê jî çûna min a nav Kurdan baş dîtibû. Ew bawer bû ku, bi çûna min, ew koma serberdayî ji xwe re seriyekî dibîne. Heyhat ku wê komê tu serî nedixwestin, her gav bê serî û şerpeze mabûn, dixwestin her û her welê bimînin. Bi qasî du sê emhan me bi xweşî derbas kir. Tirkan nedikarîn bela xwe di me bidin. Di vê navberê de midîrê zîndanê jî hat guhartin. Li şûna mirovekî jîr, mirovekî

[43] Êrdim: menteqe.
[44] Têvel: mixtelîf, ne wek hev, cihê cihê.

Piştî gîhana têlxirafa Hacî Bedir begê bi du rojan ji min re gotin ku dê sibetirê berî birbangê min bi rêxin bişînin Mêrsînê û divê ez xwe pêk bînim. Gava Kurdên di zîndanê de dîtin ez diçim û ji min re şevek maye, hatin ji min xwestin ez şeva dawiyê digel wan biborim. A rast ez bi vê bendewariya han dilxweş bûm û min pirtalên xwe rakirin oda wan.

Wê şevê heya sibê em ranezan û her li ser rewşa wan dipeyivîn. Şêx Emînê kurrê Şêx Qasim di nav peyvê de got:

-Berî tu werî bi demekê du xort bi navên Necat û Kazim ji pisaxayên Merdînê li vir bûn. Heya ew di nav me de bûn, Tirkan nedikarîn bela xwe di me bidin. Piştî ew çûn hinekî em êşandin. Dema tu hatî, tevî tu ne li nav me bû, hinekî xwe li ser me dan alî. Ez ditirsim gava tu herrî, dîsa bela xwe di me bidin. Tu baş dizanî ku kesî ji me bikare wek camêran giliyekî bike, an têlxirafekê binivîse tine. Ma gava qewimî em çi dikarin li pêş wan bikin?.

Min bi dilpaqijî gotê:

-We çi divê? Eger hûn dixwazin ezê ji we re du sê têlxirafan binivîsim û tê de hemî kirên wan bidim ber çavan. Eger rojekê bela xwe di we dan, hûn dikarin wan têlxirafan bidin, ez bawerim ku serêwan pê bê şikênandin.

Gava min dît kêfa xwe ji gotinên min re anîn, min ji wan re çar sûretê têlxirafan û da wan. Di têlxirafan de, çawan serekên odan tevî alîkarên xwe girtiyên nuh dişêlînin û xwîkê ji wan distînin û çawan rêya gilî li pêş wan dadidin. Midîrê zîndanê, naîb’am, serekê qerxolê û zabitê jendirman çawa para xwe ji wan peran distînin û guhên xwe li giliyê sitembaran digirin bi ser û ber min nivîsîn û dan destê Şêx Emîn û Birahîmê Hacî Yaqûb ku linik xwe veşêrin heya roja wan tê.

Heya birbangê em rûniştin, jendirmeyê ku digel min bihata Mêrsînê nehat ez nebirim tirênê. Pirr neçû dengê tûtika tirênê hat û bi rê ket. Mana xwe ez wê rojê nediçûm, min jî serê xwe danî û nivistim. Paşê min ji serekê qerexolê zanî ku raporek derheqê min de li nik yuzbaşiyê jendirman bûye. Bi şev dema tê teftîşa qerexolê ewraqa min li ser masê dibîne û raporra ku li nik wî tê bîrê, dibêje serekê qerexolê vî mehkûmî meşînin derheqe wî de raporek heye. Ewraqên min jî digel xwe dibe û li ser raporra ku li nik wî ye ji wezaretê re dinivîse. Piştî çend rojan bersiv tê ku min neşînin Mêrsînê. Holê, li ser daxwaza zabitê ku girtî dişêlandin ez ji rêya xwe mam; lê min nedizanîn ka ev neçûn ji bo kara kê û xisara kê bû.

Gava sibetirê ez ne birim Mêrsînê, Kurdan nehişt ku ez vegerrim ode jimar 2, û digel wan li jimar 4an mam. Xwezî ez careke din vegerrîma

ehmeq û nezan rûnişt. midîrê nuh berê qumsêrê polîs bûye û ji pêşve çûna emir ji wezîfê derxistine, paşê çawan bûye, anîne kirine midîrê zîndanê. Ji ber ku midîrê nuh nezan û gêj bû zabitê jendirman destê xwe xisti bû nava zîndanê û her wekî dixwest pê dilîst.

Di vê demê de em Kurd di nava zîndanê de bûbûn qiwetekê ku girtiyên Tirk nediwêrîn bela xwe tê bidin. Lê vê yekê pirr dom nekir, Şêx Emîn dest avête benê gellaciyê û hejand. Edata wî, xwe nîzîkî tiştekî nedikir, ji dûrve av şêlû dikir, heval berra hev didan û ji alîkî ve lê temaşe dikir.

Bê ku di navbera min û kesî de dilmayîn hebe, hew min dît di nava oda me Kurdan de bêhna dubendiyê tê. Ji gelek devan bi hev re dihat bihîstin:"Ji bo çi mirovekî bi serê xwe were bibe serekê odê?". Gava ev gotin ketin guhên min, bê ku demê ji xwe biborim, min gazî Şêx Emîn û Birahîmê Hacî Yaqûb kir û gote wan:" Ez ji bo serekîtiya odê nehatime nava we. Eger midîrê zîndanê rûmeta min digire ne ji bo serekîtiyê; lê ji bo ku di girtina defteran de alîkariya wî dikim. Herçî serekîtiya odê, we xwest. Min jî qîma xwe pê anî; na gava hûn naxwazin, ez bi xwe jê ava me. Kî ji we dibe serek, ez qîma xwe pê tînim".

Şêx Emîn bi awakî ku rik jê dibare got:"Ji xwe em qebûl nakin tu serekê odê bî. Bi ser de em qebûl nakin tu herrî nik midîr jî".

Min bi zarekî nerm lê vegerand û got:" Şêxê delal! çûna cem midîr têkiliya we pê nîne. Ew dişîne pê min, ez diçim jê re defterên wî saz dikim".

Bê fihêt Şêx Emîn ser rûyê xwe vêvirand[45], her wekî hîn bûbû bê tevlokî ne dibûn. Her carê rika xwe dixiste yekî, bi zimandirêjî wî dikir û hemî xelkê odêli ser dihêvotin[46], heya hemî jê re dikirin dijmin, diçû jê re dibû dost û dirêjî yekî din dikir. Ji ber ku min ev sincî[47] tê de nasî bû min li gotina wî venegerrand.

Berî wê bi çend rojan, bê sebeb dirêjî Emer axayê Şernexî kiri bû. Min berê di nava xwe û wî de, paşê li pêş hemiyan gotê ku:"Ev kira wî ne raste". Gava min dît guh nade gotina min, min gotê:'Ez di vê kira te de ji gellaciyê pêve tiştekî nabînim. Ji peyakî wekte re ez vê yekê rast nabînim".

Raste hîngê dengê xwe nekir; lê qet ne dihat bîra min ku wê di bin ve şerrê min bike û bikare rihekî êrdimî têxe nava Kurdên girtî.

[45] Vêvirand: keşif kir, vêvirî: mekşûf.
[46] Hêvotin: Tehrîk, teşwîq.
[47] Sincî: Exlaq.

Çend roj neçû, her wekî me li jor gotiye pêşiyê xuya kir. Ji gotinên Şêx Emîn xuya bûn ku gelek tişt dane ber çavên xwe. Her tişt dihate bîra min, tenê nedihat bîra min ku Şêx Emîn sûretê têlxirafan bide destê midîr û serekên odan. Sibetirê gava midîr gazî min, ez çûm; Şêx Emîn ji Emer axayê Şernexî pêve hemî Kurd li serê xwe civandi bûn û goti bû wan:

-Osman mirovekî bi serê xwe ye ji welatê wî kesek digel nîne, tevî wê yekê dixwaze bi zor xwe li serê me bike mezin! Eger me mezinatiya her kesî qebûl bikira em ne dihatin vir. Tevî ku me jê re gotibû, bi navê me meçe cem midîr, vaye dîsa çû! ma hûn çi dibêjin?

Hemiyan bi devekî gotibû;

-Em naxwazin; lê em çi dikarin bikin? Midîr kêfa xwe jê re tîne û destê wî digire.

Şêx Emîn bi bawerî gotibû:

-Ez dizanim çawan bavêjim navbera wî û midîr, tenê dixwazim hûn kes xwe nedin aliyê wî.

Hemiyan bi hev re gotibû:

-Em kes xwe nadin aliyê wî,destê me bi te re ye.

Piştî ez li nik midîr vegerrîmEmer axayê Şernexî haya min ji kir û tevdîra Şêx Emîn kir. Min dît hemî bi pirrûzin, rik xeyd ji rûyê wan dibare.

Şêx Emîn û Birahîmê Hacî Yaqub hinekî digel hev peyivîn û paşê derketin der. Ji rewşa wan xuya bû ku dixwazin berve neyariyê gaveke xurt bavêjin. Min peyayê xwe Xikê Hesenî xiste pey wan, ka çi dikin, çi dibêjin û digel kê dipeyivin.

Piştî hinekî Xikê hat û bi guhê min de got:

-Herdu çûn pêşiya ode jimar 7 û digel serekê odê hinekî mijûl bûn. Paşê hemî serekên odan li wir gîhan ser hev, hin kaxiz di dest hev de digerrandin û dixwendin paşê dudiyan ji serekên odan ew kaxiz birin ber bi oda midîr çûn. ŞêxEmîn û Birahîm ev e tên vir.

Tu nema herdu hatin. Ji rûyê wan xuya bû ku gunehkariyek kirine. Nema dikarîn berve min binêrrin. Hînga min her tişt bîra bir, min zanî ku sûretê têlxirafan gîhandin destê midîr û serekên odan, heya hemiyan ji min re bikin neyar. Bîstek neçû, min dît serekê qerexolê hat gote min:

-Divê tu nivîna xwe bibî ode jimar 7 an, paşê emê binhêrrin, ka çi bi te bikin.

Gotin wek kufîna mar ji devê wî derdiket. Tiştekî mezin dabûn ber dilê xwe; Lê min nedizanîn ka ezê çi bikim. Bêdeng min nivîna xwe şand ode jimar 7an û bi xwe jî li pey nivînan çûm wir.

Hemiyan bi çavine neyar limin dinhêrrîn. Min dizanî ku wê bela xwe di min bidin; lê min nedizanî ka dê çawan ji destê wan bifilitim. Wê şevê

hemî serekên odan hatin ode jimar 7 û rû bi rû ev gotin yekî wan gote min:

-Tiştê ku te li ser me û midîr û yuzbaşî û naîb'am nivîsî ketin destê me. Ji îro de bizane ku emê te bi kêran perçe bikin. Te çar sed lîre li nik midîr hene, divê tu hercarê pêncî lîreyî bînî bidî me. Paşê heye ku bikarî bi dayîna perene pirr canê xwe bikirrî. Tenê divê bizanî ku ji îro bi şûnde tu di nava zîndanê de girtîyî. Bê haya me xwe tevdan mirinê ji te re tîne.

Ez tirsiya bûm, ku wê şevê bela xwe di min bidin. Mafir çavê wan ji sitandina perane, teqez dê kêsê bibînim û derba xwe bihingêvim. Ji lewre min got:

-Başe, her wekî hûn dixwazin.

Rabûm berîkên min û her du çenteyên min vello kirin.Çiqas pere, qelem, kaxiz û defter li nik min hebûn birin. Du nobedarên hişyar danîne ser min heya digel kesî nepeyivim.

Sibê zû dema ji xew rabûm, herdu nobedarên min hişyar û li ber serê min rûniştî bûn. Herdûyan ji min re dan zanîn ku divê ez digel kesî nepeyivim, na gava peyivîm heqê wan heye ku bi kêran li min xînin. Kûde diçûm herdu digel min dihatin, girtî jî hemî ji min bi dûr diketin, wek mirovekî ku nexweşî pê re çêbûbe, ditirsîn ku xwe nîzîkî min bikin. Herçî girtiyên Kurd, heye ku bi du sê peyan ev kir nexweş hati bû; lê herçiyên mayî ketina min a nav lepên tirkan ji xwe re serdestî dizanîn.

Xardiyanan jî ev hesara han didîtin û deng nedikirin. Heye ku bi vê ketina min dilxweş bûn. Bê şivîşk pereyên ku ji min bihatana sitandin wê tiştek bigehêşta destên wan jî. Berî nîvro ez şandim nik midîr ku ji pereyên xwe pêncî lîreyî ji wan re bînim. Gava çûm nik wî rûyê xwe tehl girtibû û li çavên min ne nihêrrî. Min pêncî lîre xwest bê gotin da min û vîtik ji min sitand, berî bi rêkevim min gotê:

-Tu dizanî rewşa ku ez ketimê, bê raman bi karanî tu li pey hin mehkûmên ehmeq diçî. Dawî tuyê berpirsiyariya hemî kirên wan bikêşî.

-Ez ne hewceyî şîretê te me. Yê ku şerrê eşqiyanbike, wê bikeve nav lepên wan. Te bi destê xwe gorra xwe kola û rêya giliyê me kirinê li pêş girtiyan vekir. Niha jî herre cezayê ehmeqiya xwe bide.

-Başe emê bibînin ka ehmeq kî bûye....

Min gotê, bê ku li bende dayîna bersiva wî bimînim ji îdarê derketim. Pereyên ku min ji midîr sitandin hemî ji min birin. Xwarin jî wan didane min, her wekî dixwestin min dixwar. Wê rojê kês neket min ku digel kesî bipeyivim. Nobedarên min gelekî hişyar bûn. Nedihîştin ku ez nîzîkî Kurdan bibim, an kes ji wan nîzîkî min bibe. Hercî xardiyar min dikarî digel wan serbest bipeyivim. Di nava xardiyanan de bi navê Ehmed yekî

bêkêr hebû ku midîr tiştek ji diravê şêlandina girtiyan nedidanê. Berî wê çend caran ji min re gotibû ku: Çar zarokên wî hene, mehiya wî hindike têra wan nake. Midîr ji diravê xwîkê û şêlandinê dide hevalên wî û nade wî. Nizane çi bike!...

Hîngê ez di dilê xwe de bi qelsî û pîsiya wî keniya bûm. Lê niha heye ku bikarim jê destkewtî[48] bibim.

Roja sisiyan ez leqayî Ehmed hatim, min di çavên wî de dilovanî didît. Nobedar hinekî ji min bi dûr ketin, ji ber ku ne bawer bûn xardiyanek alî min bike. Dema min kêsa peyvê dît, bê tirs min gotê:

-Va ye tu dibînî dora şêlandina min jî hat. Tu çawan dibînî ku ez 25 lîreyan bidim te, tu jî nivîseke biçûk bigehînî Walî Xalid begê.

Berê bi tirs li dora xwe nihêrrî, paşê herwekî tiştekî xwe li erdê bibîne bi rûyekî geş got:

-Tu dizanî ew çiqas neheqiyê li min dikin û tiştekî nadin min. Ma çi dibe gava ez nameyeke te bibim ji Walî re? Bila kes nizanibe, ezê bibim. Ez dizanim tu min ji bîra nakî.

Min dilê wî rihet kir ku ez nahêlim kes ya di navbera min û wî da bizane. Qelem û kaxit linik min tine bû, wî çû ji min re anî û bi dizî da min. Divya bû bi şev di avrêjê de binivîsim, heya nobedar nebînin. Wê şevê min kêsa nivîsîna nameyek kurt di avrêjê de dît û nivîsî. Ehmedê xardiyan hat û name bir ku bi destê xwe bide destê Walî.

Serêvarê nava zîndanê lihev ket. Midîr, xardiyan, jendirme, serekê odan tev wek darên ku bahoz pê bilîze, bêhemd radihêjîn. Tevgerreke ecêb hebû, serekê ode jimar 7 hat cem min. Bi îşaretekê herdu nobedar ji min bi dûr xistin. Bi dengekî nerm gotê min:

-Nivîna xwe bibe nav Kurdan ji bîra meke ku eger ne ji min ba wê tu bikuştana. Divê tu qenciya min jibîra nekî.

Gotin bi zor ji nava lêvên wî derdiketin. Tirseke mezin di çavên wî de diyar bû. Min zanî ku tîra min cihê xwe girtiye, ji lewre min lê vegerrand û gotê:

-Ji bo wê qenciya te, ez naxwazim ji vê odê herrim, divê nivîna min li vir be.

Hîn gotin ji devê me neqediya bû ku dergehê zîndanê vebû û 30-40-jendirme çek bi dest, li pey wan bînbaşî Fehmî û li pey wî naîb'amê mezin ketin hundur. Midîr piştî hemiyan hat, reng jê zer bûbû, durvê wî wek harê ku xaliyê bi ser de bêjing bikî. Hemiyan li nîveka hewşa

[48] Destkewtî: Mistefîd, yê ku xêrê jê dibîne.

zîndanê wek heleqekê cih girtin û gazî min kirin. Naîb'am holê dest bi pirsan kir:

-Kurd Osman! te ev name ji Walî beg re nivîsiye?

-Erê ezbenî, min nivîsî.

-Tu dibêjî, jîna te di xeterê de ye, ma ew gotin rast bû?

-Erê, di nava min û mirinê de tiştek nema bû. Her gav ne dûr bû ku ez bême kuştin.

-Kî ne yên ku dixwazin te bikujin?

-Hinek dixwazin min bidin kuştin û hinek jî dixwazin min bikujin, tu navê kîjan birrî ji nav dixwazî?

-Navê herdu birran.

-Ên ku xwestin min bidin kuştin ev in:Naîb'amê alîkar, yuzbaşîyê jendirman, serekê qerexolê û midîrê zîndanê. Yên ku xwestin min bikujin: serekên odan tev alîkarên xwe.

-Sebeb?

-Sebeb, berî du sê mehan, gava xwestin min li vê zîndanê rakin zîndana Mêrsînê min sûretê sê têlxirafan nivîsî da Şêx Emîn. Heya rojna xwestin wan biêşînin da wan têlxirafan bidin û gilî bikin. Paşê xeyd kete navbera min û Şêx Emîn, wî jî sûretê ku min jê re nivîsî bûn dane destê midîrê zîndanê û şirîkên wî. Naxwazin dizî û rezîliyên wan bêne der, ji lewre divê ez tine bim.

-Dizî û rezîliyên wan dikarî bi ser û ber bêjî min?

-Hergav dikarim bêjim û hemî gotinên xwe bi şahidan îsbat bikim; lê bi şertê ku tu niha ferman bikî bila serekên odan tevî alîkarên wan zencîrbend bikin û têxin oda binerd. Hînga dikarî her tiştî bizanî.

-Dikarî navê wan bidî min?.

Min jê re bîst û du nav dan. Hîn em li ser lingan rawestîbûn ku lingên wan xistin zincîran û daxistin oda bin'erd.

Paşê vegerrî ser midîr û gotê:

-Ji niha bi şûnde, heya pirsîn diqede, bê haya min destê xwe nikarî bidî girtiyekî. Gava bikî mala xwe xerab dikî, te bihîst?

Hînga bi rûyekî geş gote min:

-Goreyî dibînim gelekî tu westandine, îro vehêse, dê sibê bêne tehqîqatê. Dikarî bawer bî ku dê heqî derkeve derve û serê gunehkaran bişkê.

Piştî van gotinan digel bînbaşî û jendirman çû û zîndan di nav tirseke mezin de hişt.

Gava lingê serekên odan zencîr kirin, şêx Emîn tevî Birahîmê Hacî Yaqûb gelekî tirsiyan ku ez navên wan têxim nava navên serekên odan

û alîkarên wan. Dema dîtin min çêla wan nekir Şêx Emîn di ber xwe de bi dengekî nizim got:

-A rast me derheqê te de pîsî kir, çi bikî heqê te heye.

Min lê venegerrand, pişta xwe dayê û jê bi dûrketim. Mirovekî wek wî ji gotinê şerm nedikir.

Sibetirê naîb'am hat tehqîqatê. Pirrtirî bîst şahidan min anîn ber miheqiq. Gava rastî holê jê re eşkere bû, gote min:

-Tucaran min bîra nedibir ku di bin guhên me de gunehkariyên holê dibin. Ji bo em bikarin tiştekî hêja bikin, ez hewceyî selahiyeteke firehtir im. Du digel walî peyivîm, îro jî dê herim nik wî û li ser vê yekê mijûl bim. Ez bawerim ku dê tiştine baş bibin.

Sê çar roj bi ser de çûn, serekên odan zencîrbend, midîr û jendirme destgirêdayî nikarin xwe tevdin. Serêvarekê katibê midîr gazî min kir û got:

-Naîb'am ez jî xwestim tehqîqatê. Min her tişt jê re got. Tu dizanî destê min di van kiran de ne bû. Wan pere dixwarin, ji bo çi ezê wîcdana xwe qirêj bikim, Sibê dîsa naîb'am tê zîndanê, xuyaye dê tiştekî mezin bike.

Min guh neda gotina wî. Heye ku gava dît her tişt eşkere bû, dixwaze xwe jê dûrxe. Sibetirê naîb'am hat li pêş midîr gote min:

-Bê van kesên zencîrbend çiqas mirovên ne baş hene navên wan bide min. Em dixwazin zîndanê ji neqencan paqij bikin.

Min jê re şêst navî din da ew lîste da destê midîr û gotê:

-Niha dosya van û kesên zencîrbend hazir bikin. Sibê bi şefeqê re divê bi tirênê herin Aydîn û Izmîrê. Paşê vegerrî ser min û got:

-Divê tu alîkariya min bikî da em nehêlin li vê zîndanê kes bête şêlandin, cûz bête lîstin, giya û ereq bête vexwarin û girtî bêne lêdan. Çi gava tiştek ji van bû zûka haya min bike.

Bi vî awayî zîndan ji min re hate sipartin. Herçiya min bixwasta dibû, kesî ne dikarî bikeve pêşiya kir û gotinên min.

Bê şik Kurdên me yên ku xirabiya min kiribûn hêviya neqenciyê ji min dikirin; lê min hêviya wan a neqenciyê kuşt. Careke din, her wekî tiştek neketibe navbera me,min nivîna xwe bir nava Kurdan û digel wan rûniştim. Gava ez vegerrîm nava wan, hinekan xwestin kêmasiyên xwe bêjin; lê min rê neda wan û bi van du sê gotinan perda ji bîrakirinê bi ser wê rewşa kirêt û bêbav de berda:

-Divyabû ev tişt hemî nebin; lê şaşiya hinekan ji me ew xeyd çar kir. Ez bawerim ku dîsa tiştek nebûye. Min bi xwe ew rewşa kirêt ji bîra kir, divê kes çêla wê neke.

hevalên xwe re berda û çûm mêvanxanê. Berî her tiştî ji xanî re raxer[49] divya bû ku li nik min tine bû. Paşê min ne dixwest li taxa Ermeniyan rûnim.

Piştî ku neh-deh rojan li mêvanxanê mam, yekî diranker xaniyê xwe tevî raxer ji bo şeş mehan belaş da min. A rast xelkê Denizliyê gelekî xerîbdost bûn. Ev diranker ji du caran pêve ez nedîtibûm. Gava zanî ku ez li odeke raxistî digerim, wek dostekî kevin gote min:

-Min xaniyek li Aydîn heye. Hergav biharê diçim wir nîzîkî mala xezûrê xwe şeş mehan derbas dikim. Tu dibînî di vê de minetek nîne. Gava tu bixwazî tê de rûnî, bê şik qenciyê bi min dikî. Berî hatina min eger vedigerrî welatê xwe kilîtan bide filankes (navê berberekî da min).

Xanî du ode tevî raxer, nivîn û firaqên xwe bûn. Tevî sipasan min qenciya diranker qebûl kir û tê de rûniştim. Her roj berî roava bi çend deqîqan em tev li taxa Ermeniyan dicivîn ser hev. Ji alî daîreya polîs yek dihat navên me dixwendin ka kî ji me windaye. Ji hinekên ku desteng dibûn re me xebat çar dikir. Heya hinek ji wan bi haya midîrê polîs diçûn li gundan dixebitîn.

Rojekê li mala walî min midîrê polîs dît. Bi navê Şakir beg yekî Kurd bû. Wî jî wek walî bi Kurdî nedizanî;lê situxwarî li Kurdan dikir. Piştî min Şakir beg nasî, hemî karê me ku diket aliyê polîs bê west diqedîn.

Em Kurdên li bajêrr her roj diçûn civana polîs, çend yekên li gundan, li heftê carekê dihatin. Çawa deftera polîs hebû, min jî defterek bi navê Kurdên sirgûn girtibû. Min cih, xebat û tevgerrên wan tê de dinivîsîn. Gava ji kurdan yek xuya nebûya ji min dihate pirsîn. Ji lewre ez agahê hemîkir û tevgerra Kurdan bûm.

Bêbextî

Bi derketina ji zîndanê min bawer dikir, ya ku di navbera min û Şêx Emîn û Birahîmê Hacî Yaqûb de bi carekê mir û qediya. Dîsa ez bawer bûm ku rika di dilê wan herdu camêran de nava di warên zîndanê tijî dikir; lê dema derketin derve û erdê fireh û bê sînor, ew rik dê di firehiya derve de windabe. Paşê min şaşiya xwe nasî, sîngên ku rikê dihewînin çiqas erdê li xwe fireh dibînin, rika xwe ewçend mezin dikin û kêm caran ew rik bê gorî[50] diçin.

[49] Raxer:Tiştê ku li malan têtе raxistin.
[50] Gorî: Qurban, dehiye.

Herwekî min dixwest ya bûyî ji bîra bikim, ne bi dilê Şêx Emîn bû. Çiqas ku li pêş min qellaşî dikirin, li piştmin digot:

-Camêr hesabê me û pîvazekê nake, em avêtin piştguhên xwe. Bi çav min ev ji lêdanê girantire.

Ji vê gotinê xuya bû ku Şêx Emîn ya di dilê xwe ne avêtiye. Jê re kêsek divê ku careke din bi min ve de; nema min ew kês didayê.

Ji me'mûrên ku girtî şêlandibûn tenê midîr û serekê qerexolê dan mehkemê Naîb'amê biçûk û yzbaşî di tehqîqatê de xwe ji berpirsiyariyêxilas kirin. Min nedikarî îsbat bikim ku ew herdu di xwarina peran de şirîkê midîr û serekê qerexolê bûne. Piştî hinde lêhatin ji min re, ne rastbû ku rika xwe ewçend pêşve bibin. Ji xwe hergav memûrên biçûk dikevin gorra xwe û mezinên xwe, vêcarê jî welê bû.

Zîndan ji diz û zorbazan paqij bû, nema kesî dikarî dere rê biçe. Her mehê carê naîb'amê mezin dihat gazî min dikir û li pêş hemiyan digot:

-De bêje begê Kurd, ka tiştekî hewceyî gilî di nav zîndanê de heye? Selahiyetên ku Anqerê dabûn min hê di destê min de ne. Kirina gelek tiştan ji destê min tê.

-Van çend gotinana pişta girtiyan dişkand, kesî nediwêrî serê xwe hilde. Şêx Emîn û Birahîmê Hacî Yaqûb jî di nav xêrnexwazan de serên xwe nizim girtibûn û nedikarîn xwe tevdin. Dikarim bi dilekî rihet bêjim ku di nava sala ku bi ser vê guhartinê de borî, heya bi qanûna Efwê em ji zîndanê biderketin tiştekî dererê çê nebû.Girtiyekî ji halê xwe gazin nedikir. Dema neheqiyeke biçûk li yekî wan dibûn, zûka min xwe digihandê û ew neheqî li ser wî radikir.

Saleke me holê bi xweşî borî. Heye ku ji bo yên wekî Şêx Emîn ewçend nexweş bû, çima ku nedikarî xwe tev bide. Ne ji sinçiyê wî bû ku wek qencan raweste. Carcaran dihat giliyê hin hevalên xwe yên duh dikir û bi her awayî ez li ser wan dihêvotim. Ji ber ku min sinçiyê wî baş nasî bû bi xweşî min lê vedigerrand û digot:

-Ezê bi pirsim, gava rast be ezê şîretan lê bikim.

Vê gotinê hêviya wî ya tevlokiyê dibin de dibirrî û bê deng dima.

Gava 'efû hat herçî mehkûmên siyasî tev berdan; lê mehkûmên edlî kirin du birran.Yên ku cirma wan berî şûreşa Şêx Seîd bûn berdan; lê yên ku cirma wan piştî şûreşê bû bernedan. Li ser vê yekê Birahîmê Hacî Yaqûb tevî heşt kesan ji xelkên Mêrdînê di zîndanê de girtî man.

Em ên ku berdan, nehiştin ku em vegerrin welêt. Li nav bajêrr xaniyên Ermeniyan vala bûn, her sê çar peya jî me xistin xaniyekî. Midîrê îskan qedra min girt xaniyekî baş da min û got:"Heye ku pêşdetir we li vir dihêlin, bila ev xanî diyariya min be ji te re". Min jê re sipas kir û xanî ji

Di nava girtiyên Kurd de li cem me ji xelkê Xarpitê yekî tenê hebû, navê wî Hemîd bû. Hemîd piştî gîhana min a Denizliyê bi pênc şeş mehan gîhabû wir. Ji ber tine bûna perê rê gelekî li zîndan û qerexolên ser rê mabû û pirr tengî, belengazî êş û westîn dîtibû. Dema hat gîha zîndana Denizliyê bi navê cilan hin xirpal li ser bûn ku gincî tê de dihatin xarê. Mitêla[51] wî ji potên ser milan ne nuhtir û çaktir bû. Gava hatinê min pot û mitêla wî şewitandin û jê re hineke nuh dan. A rast gelekan ji girtiyên Kurd dilên xwe bi Hemdî êşandin û alîkariya wî kirin. Ji wê rojê de carcaran min ji halê wî dipirsîn û destê alîkariyê dirêjê dikir. Ew bi xwe jî ne xortekî çavpehn bû, çi karbûna dikir û destgirêdayî rûnedinişt. Ji her tiştî pirrtir xurtiya zend û bendên wî hîn jê pirrtir xurtiya di çavên wî de diket ber çavên mirov.

Piştî em ji zîndanê derketin Hemîd di rewşeke baş de xuya dikir. Tevî ku tu xebat ne dikir, cilên wî, reng û rûyê wî çak bûn û durvê têran pê diket.

Rojekê ez di kolanekê re diborîm, min Hemdî dît, gûnê wî zer û mada wî ne baş bû. Min xwest bizanim ka çi bela wî ye. Bi xweşî min jê pirsî:

-Hemdî! dibînim tu ne li serhevî, çi bela te ye? eger destengî dikarim alîkariya te bikim.

Bê ku di cihê xwe de tev bigerre serê xwe hilda û li min nihêrrî. Heya ez xweş bim ne mikûne ku wê nêhrrînê ji bîra bikim. Tê de ji şopên neyarî û dostaniyê, rik û hezkirinê, qencîbûrî û nankoriyê hemî bi hev re dixewinîn. Bi dengekî hezok gote min:

-Hemdî, bêbav û kurreder e. Hemdî bê şeref û wîcdan e. Hemberê qenciyên te dixwaze xirabiya te bike, hê dixwazî alîkariya wî bikî?

Berê ez tê negihêştim ka çi dibêje. Hat bîra min ku ji halê xwe ne xweş e xeyidiye ji lewre holê dibêje. Bi zarekî xweş min gotê:

-Kes nikare li ser şerefa te tiştekî bêje. Ez tu caran bawer nakim ku tu neqenciya min bikî, eger hinekan welê gotibe derewan dikin.

Vê gotina min wek qirbacekê ew veciniqand. Da xwe rabû ser lingan û bi dengekî hişk got:

-Ez dibêjim Hemdî bê şeref e, kes bêbextiyan li xwe nake. Hemdî ne Kurd e, bêbav e.

-Kurro çi li te qewimiye heya hinde çêrr û bêbextiyan li xwe dikî?

-Ez rastiyê dibêjim. Ez mirovekî bêbav im, hemberê qenciya te, ez bi xirabiya te fikirîme. Ma jê meztir bêşerefî dibe?

-Ez dihemî gotinên te negihêştim nizanim tu çi dibêjî!...

[51] Mitêl: Lihêf, yarxan, bi Kurdî jê re "gelt" jî dibêjin.

-Raste tu tê naghê, ji ber ku dilê te paqij e. Tu nizanî em bêbav li ser te çi û çi difikirin!...

-Tu û kê?

-Ez, Şêx Emîn û Birahîmê Hacî Yaqûb û hin dûvikên wan.

-Birahîm di zîndanê de ye, ma çi dikare bike?.

-Guh bide min, ezê çîrrokê di serî de ji te re bêjim:"Piştî em ji zîndanê derketin bi pênc-şeş rojan Hacî Birahîm birayê xwe Yûsif şand pey min, ez çûm zîndanê nik wî ji min re got:-Osman Sebrî mirovek bû, kesek ji welatê wî digel tine bû, di zîndanê de serdestî li me kir, ev e li der ve jî bûye mezinê Kurdên surgûn. Em dixwazin jê re belayekê çarkin heya dîsa vegerrînin zîndanê, da bizane mezinatî çawa ye.(Paşê dest avêt berîka xwe pêncî lîre dan min û got):

-Li derve sesareke bi lox kirrîne, ewê bidin te. Fîşekeke kevin têxe ber lûlê û pêde biçerpîne, paşê şevekê li ser rêya Osmên raweste, tu ji wî xurttirî, dema tê şeşarê bavêje ber lingê wî, bi herdu destên wî bigire û bike gazî. Hînga polîsek heye, me ew dîtiye û pere danê, wê di gaziya te were. Dema polîs dibînî bêje: Osmên şeşar bi min de çerpand, xwest min bikuje,fişek qelp derketin. Hînga dê wî bigirin û bînin zîndanê. Wê gavê were cem min, ezê pêncî lîreyê din jî bidim te". Ev bûn bîst roj ez her roj diçim zîndanê û du tayînan didin min. Şeşar li cem min e û polîs bi min dane nasîn, ya ku maye tenê kirine.

-Niha şeşar li cem te ye?

-Nîzîkî mala te min di xirbekî de veşartiye.

-Çima heya niha we nekir?

-Heya niha em hewceyî polîs bûn. Berî du rojan polîs dîtin û duh ez birim nik wî û pê dane naskirin. Civana me îşev bi roava re bû ku li bende vegerra te ya malê bimînin û her wekî me daye çav xwe bikin. Lê niha Xwedê çavên min vekirin û min kirêtiya dilê xwe nasî.

-Tu dikarî şeşarê raveyî min bikî?

-Were ezê niha bidim te.

Bêdeng em di rex hev re meşîn. Hemdî wek zarokên gunehkar di ber xwe de dinêrrîn, nedikarî serê xwe hilde û li çavên min binhêrre. Dema em gîhan kolana ku tê de rûdinim, Hemdî di nava xirbekî de şeşar bi derxist da destê min. Çar fîşekên qelp tê de bûn.

-Hemdî! gotina te rast e, lê tu dikarî li pêş polîs van gotinan bêjî?.

-Li pêş Xwedêjî dikarim bêjim.

-Başe, ji kesî re mebêje. Êvarê dema em diçin civana polîs ezê te hevrûyê[52] Şêx Emîn bikim, ma tu qîma xwe bi vê kirê tînî?

-Erê eger ez qîma xwe pê nînim, mana xwe ez derewan dikim. Min şeşar digel xwe bir ku serêvarê li civana polîs em hev bibînin. Serêvarê ez hinekî berî wextê çûm, Hemdî berî min hatibû. Di çavên wî de şopa girreke xurt xuya dikir. Kurdên me yeka yek, didu didu dihatin.

Gava min şeşar bi da destê hikûmetê û Hemdî zanîna xwe bigota, Şêx Emîn tevî pênc-şeş peyan ji xelkên Mardînê dihatin girtin, ku Yûsivê birayê Birahîmê Hacî Yaqûb yek ji wan bû. Ez gelekî diramîm, Şêx Emîn û Birahîmê Hecî Yaqûb hêjayî hercezakî bûn; lê gelo her şeş peyayên din ku bi koranî di destên wan de bûbûn alet, hêjayî cezayekî holê bûn? Bersiva vê pirsê serê min diçelqand.

Di nava me û vegerra welêt de gelek nema bû; ma rast bû ku ez bibim sebebê vegerra hinekan?! Min li pêş xwe, li welêt, hin hêviyên xoşewîst hebûn, ma gelo, ên ku bihatana girtin jêre ew celeb hêvî tine bûn? Eger bihatana girtin, hêviyên wan nedimirin? Dema di ramana xwe de gîhane vî warî, tiştek hat bîra min û pê re cendekê min lerizî!...

Evên ku bihatana girtin her yekî wek min dê, jin, xwîşk û zarok hebûn. Gava hevalên wan biçûna ji xelkên wan re bigotana ku ji ber çi sebebê careke din hatine girtin, heye ku wan xelkên çav li rê bigota: " Xwedê ji sebeban re nehêle", bê ju zanibin peyayên wan gunehkar in. Ji xwe mirov gunehê xelkê xwe nabîne. Ma gelo, nifirrek ji koza dil dana ber çavan rast bû? paşê, gava ez di gunehê wan neborim, camêrî li jû diman?

Ev bûn tiştên ku wê bîstê di bala min re borîn û dil û cendek ji min rahêjandin. Gava ez çûm civana polîs, di ramana xwe de gihabûn vî warî. Ji lewre min kirina gilî ji dilê xwe avêt, tenê divya bû ez Şêx Emîn û hevalên wî fedîkar bikim û bitirsînim, heya dev ji kirên holê berdin.

Dema hemî gîhan ser hev û min îmza hemiyan girte ser defterê û da polîs, berî ku ji hev belav bin min bi dengekî bilind gote wan:

-Du sê gotinên min hene, ez hêvî dikim hûn guhdariya min bikin, heya rastiyê bizanin.

Piştî ku hemî wek govendekê li dora min rawestîn, min şeşar ji berîka xwe derxist raveyî hemiyan kir û di pê re ev gotin kirin:

"Gelê biran! hinek ji we vê şeşara han dinasin, ji ber ku wan ew bi destê xwe kirî ye. Dîsa ew kes dizanin ku ji bo çi hatibû kirrîn. Eger min bixwasta wê bidim destê polîs û Hemdî jî herçiya dizane bêje, ez

[52] Hevrû: yek rûbarî ê dî kirin.

bawerim ku çendek ji we ji rêya malê diman. Tevî ku ez baş dizanim, ew mirov hêjayî cezakî holê ne jî, dilê min negirt ku xirabiya wan bikim. Min xwest wan bihêlim ji wîcdana wan re, heye ku li xwe vegerrin. Xwedê me hemiyan li ser xêrê bigehîne welêt û careke din çavên min û wan bi hev nexe[53]. Divê zanibin ku çi gavê bû, dikarim giliyê wan bikim, şeşar di destê min de û Hemdî li pêş we dibêje. Piştî vê hûn nikarin xwe ji şahidiyê re bi şûnde bidin. Hemdî tu dikarî her tiştî bêjî".

Hînga Hemdî devê xwe vekir û çîrrok ser û bin ji wan re got. Çîrrokê şopeke xurt di nav guhdaran de hişt. Şêx Emîn çîrrok ser û bin înkar kir û got: Hemdî derewan dike. Eger Birahîmê Hacî Yaqûb birayê xwe tevî hin xelkê Mêrdînê xistine nava tiştekî holê jî, ê min bi xwe haya min jê nîne.

Hemdî hemberê vê gotina Şêx Emîn got:"Bila Yûsivê Hacî Yaqûb bi telaqan sond bixwe ku ev şeşar bi destê xwe ne daye min û şeva din ez bi polîs ne dame nasîn.

Yûsiv bê ku sond bixwe got:"Hemdî bêbaveke, derewan dike" Bê ku bersiva Hemdî bibhîze terka me da û çû. Li wir Kurdên me bûn du birran. Hinekan digotin, raste û hinekan digot, derewe. Bi vî awayî em ji civana polîs vegerrîn, van herdu birran yekî nedikarî yê din serwextî gotina xwe bike. Sibetirê Şêx Emîn hat mala min û xwest dilê min ji xwe safî bike. Piştî silavê ji min pirsî:

-Ma tu gotina Hemdî bawer dikî û dilê te ji min xirab dibe?

-Çiqas der têkiliya te bi vê bêbextiyê reheye nizanim. Lê rastiya ku jê şik nebe, Yûsivê Hacî Yaqûb şeşar daye Hemdî. Ma te duh nedî Yûsiv nedikarî li me binhêrre, paşê ji ber sondê revî.

-Raste Yûsiv bi wê revê xwe xist ber şikê.

-Rast be, derew be, divê em ji bîra bikin. Di berê de Kurdan gotiye:"Çê kiro bixwe kiro, xirab kiro bixwe kiro".

Gava Şêx Emîn linik min çû durvê gunehkaran pê diket. Tiştên di wîcdana wî re diborîn, li rûyê wî diyar bûn. Nêhrrînekê mirov agahî halê wî dikir. Piştî du rojan Birahîm şande pê min, ez çûm zîndanê nik wî. Bi dengekî qels ji min re got:

-Hinek xeyd ketibû navbera Yûsivê me û Hemdî. Wî jî rabûye derewek li me kiriye. Di vê tu bizanî em ne xwediyê wê kirê ne.

-Birahîm! min ji Şêx Emîn re jî gotibû; rast be derew be divê em ji bîra bikin.

-Siheta te xweş, giliyê kesî meke, bihêle ji Xwedê re.

[53] Xuyaye Xwedê dia min qebûl nekir ku di sala 1943an de Birahîmê Hacî Yaqûb hat çû hec. Li Şamê bihîstibû ku ez li Şamê me, hat cem min, em li ser rojên borî peyivîn, bê ku çêla wê bêbextiyê bikin.

Xwiya bû Birahîm ji Xwedê pirrtir ji gilî ditirsîn. Ji lewre min gotê:

-Ez ne gilî dikim û ne jî kesî dispêrim Xwedê. Ez bawerim ku bi carekê tê borîn çaktire, ne welê ye?

-Belê. Ev bûn du car bi qencî tu çavên me dişkenî.

Holê, li dilxweşî ez û Birahîm ji hev qetîn. Lê Yûsiv, nedikarî serê xwe li ber min hilde, çiqas ez didîtim şopa gunehkariyê ji rûyê wî diyar bû.

Vegera Welêt

Sê mehan me holê, surgûn derî zîndanê, li Denizliyê borîn. Ro bi roj yekîtî û biratî di navbera Kurdên me de çaktir dibûn. Piştî me sê mehên xwe derî zîndanê temam kirin, rojekê midîrê polîs şande pê min û got:

-Destûra vegerra we hemiyan hat, ji îro bi şûnde hûn dikarin vegerrin welatê xwe. Yê ku heqê rêya wî tine be divê bimîne heya daîra îskan li Anqerê jê re alîkarî dişîne.

-Yê ku heqê rêya wî tine be, çiqas divê bimîne heya alîkariya îskanê ji Anqerê bê?

-Du meh- sê meh, pirrtirî wê najo. Dikarî navê wan bidî min da ji bo wan hinivîsim Anqerê.

Piştî min jê re sipas kir, ez vegerrîm mal. Di nava surgûnên me de pirrtirî deh belengazn hebûn ku ne dikarîn heqê rêya xwe bidin. Ji sibê heya êvarê xebata ku dikirin têra nan û danê wan nedikir. Ji bo van belengazan çarek divyabû ku li erdê nemînin û nekevin bin rehmeta îskanê.

Serêvarê min berê xwe da cihê civana polîs. Piştî hemî gîhan ser hev min mizgîna vegerrê holê da wan:

-Gelê hevalan! destûra vegerra welêt hat. Kî ji we dikare heqê rêya xwe bide bila navê xwe bide min, heya jê re îzna vegerrê ji midîrê polîs bistînim.

Gava min hemî nav nivîsîn, diwazde kes li erdê man ku heqê rêya wan tine bû. Ji van çar heban nîvê heqê rê hebû; lê heştan bi carekê tiştek tine bû. Hînga bi çend gotinan min alîkarî ji bo hevalên belengaz xwest û got: “Ji me Kurdên li Denizliyê 48dikarine heqê rêya xwe bidin û 12kes ji belengazî dê li bende alîkariya îskanê bimînin. Ez bawerim ku terka van kirin û çûn me ji rûmetê ye. Kesî dewlemend di nav me tine; lê tiştek heye gava hûn bikin emê bikarin pê hevalên belengaz bigehînin welêt.

Pirrtirî bîst peyan ji me wê bi dereca pêşîn û dudiyan li tirênê siwar bin. Eger ev camêrana tev ji kerema xwe li dereca sisiyan siwar bin û wê ferqê bidin hevalên belangaz, wê têra wan bike û zêde; hûn çi dibêjin”.

Hemiyan bi dengekî gotin:

-Gotina te raste, emê bikin.

Berî her kesî min ferqa navbera dereca pêşîn û ya sisiyan da, paşê herçî halê wan xweş ferq dan, têra belengazn kir û teştek jî zêde bû. Ji ber ku berî du mehan Hacî Bedir beg çû bû rehma Xwedê, divyabû li ser rêya xwe herrim Mêrsînê mala wî û serxweşiyê bidim Xatûna wî. Ji lewre min xatir li hevalan xwest û sibetirê çûm Mersînê serxweşiya Xarûna rehmetî. Piştî ku du rojan li Mêrsînê mam, hatim Edenê ku bi tirênê bêm Rihayê.

Di tirênê de min birrek ji hevalên Denizliyê tevî Şêx Emîn dîtin, hemî herwekî me tifaq kirî li dereca sisiyan siwar bibûn, ez jî ketim nava wan. Min pirsa birrê mayî kir, gotin,wê piştî du rojan li Denizliyê bi rê kevin.

Gava tirên gîha dûsa Gawir Daxê, Şêx Emîn gote min:

-Qedrî beg kurrê Cemîl paşa tevî xanima xwe di vê tirênê de vedigerre welêt. Min jê re got ku tu digel meyî, hez dike te binase. Eger te divê were ez te bibim cem wî.

Ez û Şêx Emîn çûn dîtina wî, piştî silavê, pirsa pêşin ku li min kir ev bû:

-Piştî Tirkan herdu apên te kuştin, ma tu netirsiyayî?

Berî Qedrî begê bibînim, min gelek begên bajarrî dîtibûn û ramanên wan dinasîm, ji lewre ez ji pirsa Qedrî begê ya çepel kiz[54] nebûm. Ji pisaxayekî eşîrî re ev gotin zor giran bû. Di nava eşîran de ji bo camêran vê gotinê mînin ser zimanê xwe. Pirsên holê bi bersivine hişk li xwediyan vedigerrin. Lê ji ber ku mentiqa bajarriyan ne wek ya eşîran bû, dikarîn pirsên holê xav bikin. Ji lewre min bi nermî gotê:

-Na ezbenî.Bi kuştina apan nikarin me bitirsînin.

-Mana xwe, dilê te heye ji bo welatê xwe bixebitî?

-Erê, ji koza dil ji her kesî pirrtir dikarim bixebitim.

Kêfa wî ji sergermiya min re hat. Serekî dirêj li ser Kurdên sirgûn peyivî, nemaze li ser Masûmê kurrê Hezret. Paşê em ji hev qetîn bi şertê ku careka din piştî Helebê em hevdî bibînin.

Piştî tirên ji Helebê derbas bû, ez careke din çûm nik Qedrî beg û em li ser awayê xebatê di nava welêt de peyivîn. Me tifaq kir, piştî ku em her yek di cihê xwe de hin hevalên xebatê çarkin divê em destên xwe bidin

[54] Kiz: Aciz, Xeyidî.

hev û xebata xwe bikin yek. Li ser vê me hin parola dan hev, heya her yek ji me şandiyên ê din binase. Dema tirên giha Kaniya Ereban me xatir ji hev xwest û ji hev qetiyan.

Ez bi nasîna Qedrî begê gelekî dilxweş bûm. Ji roja min Husên Hilmî Atîk berda bû heya Qedrî beg raste min hatî, kesî digel wî li ser welat û welatîniyê bipeyivîma raste min nehatibû. Paşê Qedrî beg ji kurdên sere û ji xortên ku berê li Istanbolê di cem'iyeta HÊVÎ de xebitî bû. Min dikarî ji tecribeyên wî gelekî destkewtî bibim, an welê dihat bîra min.....

Li Kaniya Ereban min otomobêl girt çûm Rihayê. Kesî ku ji tirsa hikûmetê bihata pêrgîna min tinebû. Ji xwe min vegerra xwe ji kesî re nedabû zanîn. Li Rihayê min hespekî xwe girt û pê çûm welêt.

Rewşa Malbatê û Êrdimê

Di jîna eşîrî de, çawan ku serekê eşîrê her tişte, bi çûna wî jî her tişt diçe. Rewşa malbata me jî, bi darvekirina apê min Şukrî, bi carekê pîs bûbû. Eger yekî ji me bixwesta çavên xwe deyne mezinatiyê, divyabû ji nûve bixebite û ji xwe re dost û hevalan çar bike; tevî ku piştmêriya hikûmetê ji xwe re pêk bîne. Ji ber ku bê alîkariya hikûmetê mezinatî ne mikûn bû.

Ji xwe malbata me di berê de ne yekdest bû. Ji roja min çavên xwe vekirî de, di nava malbatê de, ji bo serekîtiya eşîrê du bendî hebû û şerrê hevdî dikirin. Dema herdu apên min hatin bi darvekirin û ez jî du salan ji welêt bi dûrketim, berberên me ên di nava malbatê de ji nûve serî hildan û di nava eşîrê de ji xwe re heval çar kirin. Lê ji bo bikarin mezinatiyê bikin, ew hewceyî piştmêriya hikûmetê bûn, ku ew jî ne mikûn bû. Me'mûrên hikûmetê ku alîkariya mezin bikirana, ew bi xwe bûbûn mezinê êrdimê û welat li ser rêzana eşîrî digerrandin. Ji lewre kama berberên me di nav malbatê de neçûbû serî.

Piştî derketina me ji welêt, ji mal û milk me gelek tişt bi şûn xwe de hiştibû. Me'mûrên hikûmetê ku di êrdima me de bi cih bûbûn, bi alîkariya mezinên xwe û gelekî bi gengazî[55] şûna me girtibûn û ji mal û milkê me destkewtî dibûn. Bi vî awayî dema ez vegerrîm welêt, ji xwe re neyarine xurt dîtin. Her wekî neyariya neyarên eşîrî têr nekiribe, neyariya me'mûran jî bi ser ve zêde dibû.

[55] Gengazî: hêsan, rihet.

Berî ez vegerrim welêt van me'mûran ji hemî gundî û mixtaran re dabûn zanîn ku, di vegerra min a sirgûnê de, çi kesê were dîtina min, dê neyarê dewletê bête nasîn. Ji lewre gava ez vegerrîm welêt, kesek ji eşîrê ne hat dîtina min. Dema li rêyan çavên hinekan bi min diket, bi sernizmî û şermisarî silav li min dikirin û nedikarîn serê xwe hildin û li min binhêrrin.

Rewşa axayên mayî ku li sirgûnê vegerrîbûn ji rewşa min ne çaktir bû. Hikûmetê gundî û xulamên wan berda bûn gewriyê û li ser wan mehkeme vekiribûn. Hemiyan dest bi ber xwe de berdabûn û wek rebenan hêviya xelasiyê ji tiştekî nediyar dikirin. Axayekî bi rûmet di welêt de nema bû, nemaze malbata me û ya Hacî Bedir begê serekê Reşûyan. Ji ber ku berê ev herdu malbatên han di êrdimê de gelekî xurt bûn, hikûmetê ji dil şerrê van herdu malbatan dikir û ro bi serê wan ne dixist.

Çiqas min dixwest dilê xwe xweş bikim, ku rewş holê namîne û wê çaktir bibe, min di serê xwe de ji ramaneke holê re cih nedidît. Her gav rastiyeke tehl dihate ber çavên min ku: di welêt de ji bo axan cih nema û namîne. Li dera han tiştek hebû ku sitûyê min bi ser rêzana axatiyê de xwar dihişt, ew jî ramana xebata welêt. Hîngê min ji axan pêve kesî bikare ji bo welêt bixebite nedidît. Bi vê ramana şaş, min xwe berve axan didan, ji bo demekê be jî, min mayîn û xurtbûna axan dixwest.

Piştî vegerra welêt bi çend rojan ez ji bo hin karên xwe çûm qezayê. Li wir min hevalbendê xwe Zeynel beg dît. Ji ber ku ev camêr wekî birayê xwe Hacî Bedir begê mêr û dilgirs bû, ji rewşa welêt û malbata xwe bêhêvî mabû. Ji roja ku Hacî Bedir beg çû bû rehmetê, hemî eşîra wan wek eşîrên mayî, nemaze xulamên wan ên nav malê li ber wan rabûbûn, şerr û berberiya wan dikirin. Di hevdîtinê de ez digel wî peyivîm û min rewşa êrdimê, xasma halê herdu malbatên me dûr û dirêj jê re salix da û di dawiyê de gotê:

-Holê bi çavpehnî û guhdanînê tiştek nakeve destê me. Li ser vî halî rawestîn wê roj bi roj me bi şûnde bide. Eger tu bi ya min bikî, bi çi awayî be, divê wek berê malbatên me destên xwe bidin hev û serê van me'mûran bişkênin û êrdimê di nava lepên wan de xilas kin. Hîn di nav eşîran de kesên ku hêviya camêriyê ji me dikin gelekin, bila em hêviya wan di xwe de nekujin.

Zeynel begê, serî di berde û guh li min bû. Kesereke kûr rana û bi dilekî şikestî gote min:

-Ma em çi dikarin bikin? Îro hikûmet bûye dijminê me û xelkên me neyariya me dikin! Hacî Bedir û Şukrî jî mirin, ma çi ji destê me tê?

-Zeynel beg!(min bi zaravakî hişk gotê) te divê Hacî Bedir û Şukrî her gav ji te re xweş bin heya bikarî di welêt de rûmeta xwe biparêzî!... We çûn, îro ez û te hene. Eger tu bi rastî destê xwe têxî destê min, her wekî Hacî Bedir û şukrî destên xwe dabûn hev, em dê bikarin tevgerra welêt wek berê têxin dsetê xwe û serê van me'mûran bê dijwarî bişkênin.

-Osman! ev e hikûmet bûye neyarê me, ma em çi dikarin bikin? Ma tu bîra nabî ku neyarên me gelek in! Çi gava em û hikûmet li hevkevin, ew neyar wê xwe bidin aliyê hikûmetê û wê me perîşan bikin.

-Zeynel beg! dibînim çavên te bê şerr û tevgerr şikestine û te qîma xwe bi bindestiyê aniye. Raste, îro hikûmet neyariya me dike; lê em niha naxwazin şerrê wê bikin. Tenê me divê bi yekîtî û destê hikûmetê serê van me'mûran bişkênin. Dema me xwe di êrdimê de xurt kir, wê hikûmet bi çavekî din li me binhêrre.

-Çawan em dikarin xwe xurt bikin?.

-Ne ewçend dijwar e. Malê min nema, tevî yê apanê min ket destê hikûmetê; lê ji ber ku dest navêtin malê te, hê gelek e. Eger tu mesrefê rê û gerra min bi comerdî bidî, ez dê herim Anqerê, li wir hê gelek dostên Hacî Bedir beg hene, dê bikarim bi destê wan dostan serê van me'mûrên diz û talanker bişkênim. Îro di vê êrdimê de waliyek, du qaymeqam, şeş midîrên nahyan û çend zabitên jendirman şerrê me dikin. Eger me ev hemî bi carekê di welêt de avêtin, nema kes dikare li pêş me serê xwe hilde. Hîngê em wê di nava eşîran de ji xwe re gelek dost û heval çar bikin.

Gava min çêla peran û mesref kir, canê Zeynel begê bi der ket. Bi qasî ku Hacî Bedir mêr û comerd bû, Zeynel ewçend tirsok û çikos bû. Ji lewre bersiva min holê da:

-Ez ne bawerim ku em bikarin evqas me'mûr bi carekê ji vir bavêjin. Em binhêrin ka rojên pêş me di nav xwe de çi raveyî me dike.

-Eger em bikarin hinekan bavêjin dîsa hêja ye. Lê gava em çîrrokê bihêlin ji rojên pêş me re, teqez em wê tê de xewnine ne baş bibînin, ne tiştekî din.

Zeynel beg ne dixwest bi gotina min bawer be. Tirsê çavên wî şikandibûn, nema dikarî di rewşa welêt û fêda hikûmetê baş bighê, got:

-Hele em binihêrrin ka çi dibe?

Wî ez sergerm û serhişk didîtim, min ew tirsok û reben didît, ji lewre ne mikûn bû ramanên me her duyan bibûna yek. Lê ji bo parastina giyanê herdu malbatan ji yek destiya me pêve tiştek li pêş me nema bû. Berê jî serekên malbatên me, ew êrdim, bi yekdestiyê xistibûn dest xwe. Lê di vê rê de bi qasî ku ji xwe re yar û heval çar kiribûn, ewçend jî neyar

peyda kiribûn. Ji bo me bikariya baweriya dostan bi xwe baniya, divya bû em yekdest û xurt bin. Herçî Zeynel begê ji dil yekdestî dixwest; lê baweriya wî xurtiyê tine bû, an dixwest ku xurtî bê west û xebat, jê re were ber destan!. Lê heyhat ku bê west, û dana bihayê wê du ta, xurtî nedihat ber dest û lingên me. Çawan ez û Zeynel beg civîn, welê jî em ji hev qetîn. Ji ber ku wî di xwe de xurtî û bawerî ne didît. Dixwest raweste heya berê neyar derba xwe li wî dixe; piştî ku neyar derba xwe lêda, mirov çi dikare bike?

Gava ez ji qezayê bi rêketim, me'mûran hin peyayên xwe, ku şerrê Zeynel begê dikirin, şandin cem min û serekî bi min re meşîn, Ji min hêvî kirin ku ji Zeynel begê bi dûrkevim. Min bersiveke hişk da wan mirovan û çîrrok ji Zeynel begê re nivîsî û dîsa jê hêvî kir ku were ser gotina min. Lê kînga tirsok bi dildanê û dîtina rastiyê dikirin xurt bibin. Bersiva ku Zeynel begê dabû min ev bû:"Kî bela xwe di min bide, ezê wî bispêrim Xwedê".

Piştî çend rojan dîsa ez çûm qezayê. Dema ez û Zeynel beg rûbarî hev bûn, min jê re çîrroka ku qaymeqam neyarên wî şandine cem min û ji min hêvî kirin ku ez xwe têkilî navbera û Zeynel nekim bi ser û ber jê re got. Dîsa ji min re jî got:"Kî bela xwe di min bide ezê wî bispêrim Xwedê". Hînga min bi zaravakî tehl gotê:

-Gava tu xurt bûyî Xwedê nedihat bîra te, herçiya te dikarî te bi neyarên xwe dikir. Hîngê jî wan ji rebeniya xwe tu dispartin Xwedê. Îro jî te daye ser rêya qelsan mafir tu dest nabî xwe Xwedê alî te nake.

Ma kînga bi gotinan dilê Zeynel begê xurt dibûn. Dîsa bê ku em bigehên dawiyeke rast, em ji hev qetîn û ez vegerrîm mala xwe. Du roj bi ser de neçûn, hew min dît peyeyekî Zeynel begê hat û ev xeber anî:"Şeva dî depoyê çekan vekirine û têde bîst tifing dizîne. Sibetirê qaymeqam da ser şopa dizan çû tifing di nava xirbekî de veşartî dîdin. Ji bo vê Zeynel beg tevî du biraziyên wî girtîne, û biraziyên wî xistine bin daran û lêdidin. Zeynel begê ez şandim cem te ku tu di gaziya wî herrî û dibêje herçiya Osman bike ezê destê xwe bidimê. Herçî ji bo mal, bila xeman nexwe, hemî di ber destê wî daye". Hîngê bi min re bawerî çê bû ku Zeynel begê rastî nasî û bi dilxweşî ez wê êvarê, tevî ku baran bû, çûm qezayê. Min çîrrok ser û bin hîn kir. Yê ku depo vekirî û tê de tifing dizî qaymeqam bi xwe bû. Kama wî di vê kirê de ku ji hikûmeta Anqerê re bide zanîn ku Zeynel begê ev tifingên han ji bo sazkirina şûrekê dane dizîn. Piştî ku me tehqîqata jendirman derew da ravekirin, min du têlxirafên xurt dan Anqerê û her tişt bi zaravayekî hişk da zanîn. Piştî du

rojan Zeynel tevî herdu biraziyên xwe hatin berdan û holê di navbera me û me'mûran de şerrekî xurt dest pê kir.

Min ji Zeynel begê re got:

-Divê em nehêlin ku neyarên me bêhna xwe bigirin û çavên xwe vekin, gereke derbek li pê yekê li serê wan keve heya bi carekê dikevin.

Lê gava Zeynel begê xwe li derve dît dîsa rehên qelsiyê hatinê û sist bû. Ji xwe çikosî û rebeniya wî rêya xebatê li ber me girt, hîşt ku em li mal rûnin, heya me'mûran û rêya sehpayê li pêş me vekirin.

Xinizî

Piştî Zeynel beg tevî biraziyê xwe hatin berdan, rihet li mala xwe rûniştt, ez jî vegerrîm mala xwe. Lê me'mûrên ku di min li pêş xwe neyarekî xurt didîtin, rihet rûneniştin. Berê xwesti bûn me di ber hev de bêxin, ji lewre dirêjî Zeynel begê tenê kirin, heye ku em li mala xwe rûniştana û me temaşa wan bikirana. Çi gava Zeynel beg şerpeze kirin, dikarîn vegerrin ser yekî din ji me. Lê min rêya vê yekê ne da wan û bê dudilî min xwe da ser Zeynel begê û şerrê wan kir. Ji lewre wan jî dest avêtin min û Zeynel begê û hemî axayên mayî.

Ji bo vê yekê digel Bedir axa kurrê Osman paşayê Gevezî tifaq kiri bûn ku yekdest derbeke mezin li mexin. Bedir axa, ew kesê ku berî du salan bi bêbextiya xwe bûbû sebebê darvekirina du apên min. Îro dixwest min, Zeynel begê û hemî axayên mayî jî têxe pê wan.

Bêbextiyê di bin ve dest pê kiri bû, lê haya me jê tine bû. Eger ez ne çûbûma Melatiyê ji bo giliyê walî û me'mûran, heye ku min bêbextî di koçên pêşîn de bibihîsta û pêşiya wê bigirta. Li ser giliyê min mifetîşê milkiyê hatibû Melatiyê ez xwestim wir, ji lewre min êrdim berda û çûm Melatiyê. Zeynel begê ku ji bêkêriya xwe dixwest dijmin bispêre Xwedê li mala xwe rûniştibû û haya xwe ji tiştekî netanîn. Herwekî ji bîra kiribe ku bi sedan neyarên wî hene û li bende ketina wî ne, dixwest dawiya emrê xwe bi xweşî bibore.

Dema ez li Melatiyê herûyî mifetîşê milkiyê bûm, min ew mirovekî rast û têgihêştî dît. Di rûniştina pêşîn de min ew serwextî her tiştî kir. Mifetiş peyakî qenc xuya bû û şerrê neqenciyê dikir. Nêhrîna wî derheqê kurdan de ne ewçend kirêt bû, ferq ne dixist navbera Kurdan û Tirkan.

Rastiyên ku min yekayek dan ber çavên mifetiş nedihatin veşartin. Dema dît gotinên min hemî rastin û şik jê nabe, ji aliyê din kirên me'mûran, nemaze yên walî ji hikûmetê re rûreşî ye, hêstir bi çavên wî ketin û got:

-Heya niha min nedizanîn ku di nav welatê min de bi destên peyayên hikûmetê ev gunehkarî dibin, an di vî celebî de mirov hene û hikûmetê temsîl dikin. Ez ji te venaşêrim ku ez nikarim berî kirina tehqîqatê van kirana, her wekî bûne, ji Anqerê re binivîsim. Gava ez binivîsim ne dûre ku min bi alîkariya axan îtîham bikin. Ez bawer dikim ku tu bi xwe vê yekê ji min re naxwazî. Li pêş min rêyek heye ku divê ez li ser wê rê bimeşim, ew jî rêya rastiyê. Eger hikûmeta Anqerê destê min da min, ezê herwekî wîcdana min hildigre tehqîqatê bikim. Na dema destê min nede min, dê hîngê dev ji tehqîqatê berdim herim mala xwe, dikare yekî din bişîne şûna min.

Bi van gotinan ez û mifetişê milkiyê ji hev qetîn. Di rûniştina pêşîn de min ew serwext kiribû, hinekî dilê min geş bûbû. Hêviya serdestiyê li pêş min xuya dikir. Serê çend rojan çarekê min rêya xwe bi cihê mifetiş dixist û jê dipirsî ka bersiva wî ji Anqerê hat an na. Hergav digote min:

-Bêhna xwe bigire ez hê negihame dawiyeke çak. Baş bizane ku ez ji te pirrtir dilezînim, lê tiştek ji destê min nayê.

Holê ez meh û nîvekê li Melatiyê rûniştim. Gava walî dît ku mifetîş bi dûşa ku ew dixwaze demaçe, xwest derbeke mezin li me xîne. Li ser destên qaymeqam û me'mûrên mayî bêbextiyeke mezin pêkanî ku bi carekê ji me hemiyan bifilite. Bê bextiya ku li em kiribûn bi kurtî ev bû:

"Xwedê giravî gava ez ji sirgûnê vegerrîme, min hemî axayên êrdimê dîtine û ji wan re li ser sitemkariya hikûmeta Tirk peyivîme. Paşê dema Arpecî Hacî Mihemed efendî hatiye dîtina zavayê xwe Zeynel begê serekê eşîra Reşûyan, ez û hemî axayên êrdimê çûne dîtina wî û me partiyeke siyasî aniye pê û gelek xelk derbasî vê partiyê kirine. Armanca wê: Bi alîkariya Xoybûnê di nava welêt de înqîlabek çêkirin û hikûmeteke Kurdî danîn bûye. Serekê wê partiyê Arpecî Hacî Mihemed efendî û sekretêrê wî jî ez bûme!...".

Bê şik ev tiştên han serî û binî tev virr bûn. Ne min kes ji axayên êrdimê piştî vegerra xwe ji sirgûnê dîtibû, ne jî heya ji bo giliyê me'mûran çûm Melatiyê min Arpecî dinasî. Lê hikûmeta ji ûştekê digerrî ku pê serê axan bişkêne.

Piştî ku meh û nîvekê ez li bajarrê Melatiyê mam, rojekê mifetîşê milkiyê gazî min kir û bi dilekî şikestî gote min:

-Hikûmeta Anqerê ez bi tehqîqateke mezintir teklîf kirime, divê ez bi lez herrim Anqerê. Di nava van çend rojên pêş me de ji bo giliyê te wê mifetîşekî din bişîne vir. Ew mifetîş bêguman berî hatinê dê min bibîne, hîngê dê jê re derheqê te û me'mûran de gelek tişt bêjim.

Ji gotina wî xuya bû ku hikûmeta Anqerê hêviya wî qebûl nekir, ji lewre camêr dev ji şixul berda û çû. Heya mifetişê din bihata divya bû ez li Melatiyê bimînim, ji ber ku vegerra malê ne tiştekî hêsanî bû.

Zivistan nîzîk bûbû, gava ez biçûma malê heya biharê min nedikarî ji berfê vegerim Melatiyê. Li ser rêya min çiyan 110 kîlometir berf digirt, û tê re borîn gelekî dijwar bû. Heye ku rêwî di bagerr û bandefan de canê xwe winda bikirana.

Piştî çûna mifetîşê nuh nehat. Berf barî û di çiyan re borîn bû dijwariyeke mezin. Di demeke holê de haya min bû ku me'mûran derheqê min û hemî axayên êrdimê de bêbextiyeek mezin pêk anîne. Eger bi mirina min bûye divyabû ez li lez xwe bigehînim Kextê, heye ku min bikariya tiştek bikira. Lê min nedizanîn ku her tişt qediyaye û çûna min nema bi kêr tê.

Dema Walî bihîst ku ez diiçm Kextê, şand pê min, da nehêle ku ez herrim. Gava em rûbarî hev bûn wek agir û barûtê em berrizîn hev, gotinên gelekî tehil me dan rûyên hev. Li ser wê pevçûnê min berê xwe da Kextê û bi rê ketim. Tevî bagerr û bandefên çiyê di nava pênc rojan de ez gîham malê.

Ez dereng, piştî wextê vegerriyabûm, her tişt qediya bû. Ewraqa ku me'mûran derheqê me de çêkiribûn pêk hatibû û 64 şahidan li ser îfade dabûn ku me ji wan xwestiye têkevin partiya me û şerrê hikûmetê bikin.

Holê hikûmeta Anqerê giliyê me da sekinandin, heya me'mûran derheqê me de ev bêbextî pêkanîn.

Sibetira roja ku gîham malê tevî bîst û şeş axan û pisaxan ez hatim girtin. Dixwestin wî çillê zivistanê berê me bidin Melatiyê. Ji ber ku di çiyê re çûm ne mikûn bû, xwestin me di hêla Semsûrê û di ber ava reş re bişînin, ku herdu rexên vî çemî berf nedigirtin.

Bêbextiya ku li me bûyî gelekî mezin bû. Dîsa îxbar li ser destê Bedir kurrê Osman paşa hatibû dayîn. Çawan berê ji du apên min xelas bûbû, vê carê jî dixwest ji me hemiyan bi carekê xelas be. Ji lewre min da çav xwe ku neçim Melatiyê û bi rêve birrevim.

Bê gûman dema ez birreviyama nema min dikarî li welêt rawestim, divya bû ez ji welêt derkevim. Lê ma gelo rast bû ku ez bi gengazî welêt ji ne rindan re berdim û birrevim?.

Bedir axa, yê ku bi bêbextiya xwe berî du sal û nîvan bûbû sebebê kuştina herdu apên min; îro jî dixwest min, Zeynel begê tevî axayên mayî bide kuştin!...

A xweştir ev bû ku di nava axayên girtî de du pismamên Bedir axa jî hebûn. Çiqas ku Bedir axa ne dixwest pismamên xwe bide girtin, dema

me'mûran gotê navên pismamên xwe jî têxe îxbariyê, bê dudilî kir. Ma gelo! xweş hîştina mirovekî holê rast bû? Ev yek bû ku nehîşt dirêjiya şevê ez razêm.

Heya berve sibê ez ne razam. Dawî ramana min li ser van hersê tiştan rawestî:

1-Divê ez ji rêya xebata welêt nemînim.

2-Divê Bedir axa bê kuştin.

3-Ji bo bikarim van her du tiştan pêk bînim divê ez birrevim.

Piştî ku di ramana xwe de ez gîham vî warî, min serê xwe danî ser balgihê û rihet nivistim. Sibetirê gava ji malê bi rê ketim û digel du jendirman çûm qezayê, min kara xwe û revê kiribû. Hespekî xurt, bi qasî ku wê şevê ji min re pêkhat pere, tevî du şeşarên ku min digel seyîsê hespê xwe veşartin ji kara min a revê bûn.

Gava gîham qezayê, min dît hemî axa û pisaxa berî min anîbûn. Lê gelek guh ne didan parastina wan, û gelekî serbest hiştibûn. Kê bixwasta birreve, bê dijwarî dikarî herre. Kama me'mûran di dayîna vê serbestiyê de ew bû ku em birrevin heya ew bêbextî li ser me îsbat bibe. Ji lewre kesî ji hevalên min rev ne tanîn bîra xwe. Lê herçî ji min re, mafir min çav dabû revê, ev serbestî gelekî hêja bû.

Piştî gîhana min a qezayê bi du saetan Bedir axa jî anîn; lê ne girtî bû. Wê digel me bihata Melatiyê ku li pêş walî û miheqiqê leşkerî îfada xwe bide. Xuya bû felekê dixwest alîkariya min bike. Min dixwest birrevim heya bikarim Bedir axa bikujim. Ev e Bedir axa dihat ku rêya şeş-heft rojan digel min biçe û du şeşarên hêja digel seyîsê min bûn û hespekî çak di bin min de . Min dikarî bê dijwarî wî bikujim û herrim Sûriyê.

Rêya ku dixwest me tê re bibin Melatiyê gelekî ez nêzîkî armancê dikirim. Dema bigihama ava reş min dikarî Bedir axa bikujim di nava 10-15 saetan de, di tala Killisê re xwe bighînim sînorê Sûriyê. Vê rasthatina han gelekî dilê min xweş dikir û bi min re baweriyek çar dikir ku Xwedê pişta xwe dide neqenc û sitemkaran.

Piştî gihana min a qezayê bi rojekê em bi rê xistin. Em bîst û şeş kes bûn, digel me her yekî seyîsek an xulamek hebû, şanzde jendirme tevî başçawîşekî digel me şandin. Dema em bi rê diketin, dirêjiya kîlometrekê me rê tije dikir. Kî ji me pêşde biçûya an bi şûnde bimana; jendirman têkiliya xwe jê netanîn, her wekî em herrin dawetê, ne zîndanê.

Bi rê ve çavê min bi Bedir axa ket, rûyê me herdûyan jî kenî. Ew bi derba ku li min da bû kêfxweş bû, ez jî bi derba ku min dikirî roja din lêdim. Roja din em dê bigehana ava Reş, wê êvarê min dikarî hesabê xwe digel wî safî kim û berê xwe bidim Sûriyê. Gava ev raman di serê

xwe bide alî. Gunehê ku xistibûn derê me pêkanîna şûreşekê bû ku cezayê wê darvekirin bû.

Ji bextê çak ê ku digel me tehqîqat kir bi navê Husên Husnî kolonêlekî Kurd bû, gelekî keyfa xwe ji min ra anî, di nava tehqîqatê da gote min:

-"Ez jî wekî te Kurd im, lê mixabin ku min ji miletê xwe re tu xebat ne kiriye, xebata min tev ji Tirkan re bû.

Bawerim ku tu yê bi kêrî miletê min bêyî, heke serê min tê biçe ez dê te û hevalên te berdim, lê nebî li vî welatî dimînî, Turk wê te bidin kuştin". Tevî ku serekê hikûmetê wê hingê Îsmet Inunu dixwest me zor bi êşîne, piştî heft mehan di zîndanê da man, wî camêrî em bi dijwariyeke mezin berdan.

Berve xebata welêt

Piştî em bi kefalet ji zîndanê bi derketin, sibetirê ez çûm dîtin û xatirxwaziya serheng Husên Husnî begê. Serheng, wek mirovê ku mişwarekî dûr bazde û di demê de xwe bigehîne armancê, gelekî dilgeş bû. Lê şopa westeke xurt di ser û çavên wî de dihate dîtin. Piştî min jê re sipasên xwe berpê kirin, min gotê:

-Sibe dê herim mal, ma gelo daxwazek cenabê serheng heye ku bînim cih?

-Bêguman ji zîndanê derketin tiştekî xweş e, çûna malê jî kes ji me nikare te ji rê vegerrîne; lê herçî daxwaz min yek heye, divê tu wê pêk bînî.

-Fermû bêje , dê pêk bê.

-Holê tête bîra min ku di nav peyvê de te gotibû:" tu nema li vî welatî rûdinî û te çav lê ye ku ji welêt derkevî û li derve bixebitî.

-Belê ezbenî, min welê goti bû.

-Ramana ku dixwazî ji welêt derkevî gelekî di cihê xwe de ye. Eger bi dernekevî hikûmet wê te bide kuştin. Bi çi awayî be dixwazim ji te xilasbin, te bihîst?.

-Belê min bihîst û dê biçim.

-Herre, Xwedê bi te re be.

Piştî ez li nik serheng çûm, bi derketina ji welêt ji berê pirrtir di serê min de cih girti bû. Êdî awayê ku pê li welêt bi derketama û ji bo welêt û azadiyê bixebitiyama dihate ber çavên min.

min re diborîn, bê guman Bedir axa cendekê min bi sehpayê ve darvekirî didît.

Piştî nîvro em gihan ber çemekî. Çem ne ewçend kûr; lê hinekî fireh bû, di hin cihan de avê xwe didan ber mûyê heram. Ji lewre peyayên digel me tenê şal û derpê derdixistin û lê radiperrîn. Seyîsê min herdu şeşar di bin benê piştê de bi qayîşekê girêdabûn. Gava xwesti bû eba xwe hilde jor, heya şil nebe, pozê şeşarekê di bin benê piştê re xuya kiri bû û jendirmeyekî dîti bû. Gava ji çem raperrî bûn, jenderme seyîsê min vello kiri bû û herdu şeşar pê re girti bûn.

Hîngê ez li taliya siwaran digel Zeynel begê dipeyivîm, dema min dît qafîleyê me li hev dicive û dengê qirrênekê tê. Min Zeynel berda û bi xar çûm cihê qirrênê, min dît herdu şeşarên min di destê jendirme de ne û ji her devekî gotinek tê. Pirraniya axan dizanîn ku herdu şeşar yê herdu apên min in û hemiyan dizanî ji bo tola wan hatine. Yekî ji axayên ku dostê Bedir axa bû digot:

-Me dizanî em diçin zîndanê, eger me bizaniya berê me li qada şerr e, me her kesî dikarî çekên xwe bîne.

Min gotê:

-Gelek xweş bû cihê ku bipeyivî tiştekî bikî... Lewelew ne karê mêran e.

Wê demê hinek axa tevî başçawîş ketin nava me û em ji hev bi dûr xistin. Bedir axa ne çê ne xerab deng pê neket; lê hêviya min û kuştina wî jî nema. Ji lewre min ramana revê ji bala xwe avêt. Çi biba divya bû ez xwe ragirim, heya ji zîndanê dertêm. Gava min Bedir axa bikuşta hînga min dikarî tiştine din birramim. Ji vê pêve ji min re ramaneke din nema bû.

Wê rojê êvarê em gîhan Semsûrê. Bedir axa derheqê min de gilî kir, ku min ji ber kuştina wî du şeşar anîbûn. Wê şevê digel min tehqîqateke dûr û dirêj çê bû. Min ji miheqiq re got:

"Ev herdu şeşar min ji bo firotinê anî bûn. Eger di dilê min de tiştekî holê heba, berî girtinê min dê bikira; lê ne li tehqîqatê jî xistin nav ewraqa mezin û sibetirê berê me dan Ava Reş û di ber wê avê re em şeş rojan çûn Melatiyê.

Piştî gihana me zîndana Melatiyê bi sê rojan em birin îfadê. Mistentîq ne mirovekî xirab bû, wî çav ji derxistina rastiyê bû. Gava min holê dît, jê re çîrrok bi ser û ber got û jê re hin milaheze berpêş kirin, da ku li ser wan hin pirs ji şahidan bike. Bi vî awayî me şahidên ku li ser me şehadetî dabûn tev de kerrixandin û gotinên wan ne bûn yek û şehadeta wan pûç derket. Ji ber ku me tiştek ne kiribû; lê hikûmetê dixwest me ji ber çavên

Derketina me ji zindanê ji bo me'mûran bindestî dihate zanîn, ji lewre pirrtirî berê; lê bi bîrewerî şerrê me kirin. Berê ew bawer bûn ku bi bêbextiyeke biçûk dikarin me ji rûyê xwe bavêjin. Lê paşê dîtin ku di vê ramana han de şaşin, kesên ku bi çavekî biçûk lêdinêrrîn dizanine xweş dest bibin xwe. Nemaze piştî ku me dudu ji wan ji nav wîlayeta xwe bi dûrxistin.

Hêviya min ji Zeynel begê roj bi roj qels dibû. Çiqas rojek diçû wî pirrtirî xwe nîzîkî neyaran dikir û ji min bidûr diket. Ji min re xweş xuya kir ku ne mêrê ku di rojên teng de dest bibe xwe, an bikare li ser lingên xwe raweste. Ew û hemî peyayên malbata wî, piştî mirina Hacî Bedir begê ji bo parastina mal û rihetiya canê xwe dikarîn hertişt bikin. Rewşa Zeynel begê a qels dihişt ku berî rojekê ez ji welêt bi derkevim. Berê neyarên min pirr bûbûn û mirina min dixwestin. Gava alîkariyek ji hikûmetê bidîtana nema dihîştin ez bêhna xwe bigirim.Ji lewre min zûka kara xwe û ji welêt bi derketinê kir.

Em nuh ji sirgûnê vegerriya bûn û rewşa min a malê gelekî di hevdeketî û bi şûnde bû. Dema ji welêt bi derketama, bi şûn min de du mal bê xwedî diman ku ji wan re rêyeke debarê sazkirin dixwest. Ji van herdu malan di yekê de: diya min, du xûşk û birayek ji apê min Şukrî ma bûn. Di mala din de: maliya min a bi halekî tevî kurrê me û du xûşk ji bavê min rûdiniştin. Berî derketina ji welêt, diviya bû ez rêyekê li ber wan rast bikim, da ku piştî derketina min şerpeze nebin.

Çiqas ku hikûmeta Tirk berî du salan dest da bû ser milkê me û sitandi bû jî, ji wî milkê mezin û fireh hîn tiştek di destê me de mabû ku têra herdu malan dikir. Ji vî milkê mayî du gund liêrdima Rihayê bûn ku çaryekeke wan ya min bû. Min her du xûşkên ku digel min rûdiniştin sipartine diya xwe û her du mal kirin yek. Herçî maliya xwe tevî lawik min şande mala bavê da ku piştî ji welêt bi derketinêwan bigehînim xwe.

Di paşiya meha êlûna 1926an de ez çûm êrdima Rihayê ser milkê herdu gundan (Istaxulla û Qorcik). Piştî min şalê xwe li van herdu gundan saz bikira, bi dilekî rihet min dikarî ji welêt bi derkevim. Herçî kuştina Bedir axa, min rêya kurttir da bû ber xwe. Ezê biçûma ber qesra wî û li pêş qesrê min dê lêda.

Min ji bîra kir ku li jor bêjim, di berê de, di navbera malbatên me û mala Osman paşa de kirêvanî û mirovatiyek jî li ser rêya jinan hebû. Wek:apê min Emîn xwarziyê Osman paşa bû, kurê Emîn Weysî jî keça Osman paşa biri bû ku xasiya min bû. Her wekî tête zanîn min dikirî xalê jina xwe bikujim û ji welêt derkevim.

Ji bo ku kesk ji kir û tevgerrên min şik neke, di roja pêşîn de min gotibû ku ez dê mala xwe bibim Rihayê. Ji lewre her kesî dizanî ku piştî vegerra ji sirgûnê çavên min ji neyariya hikûmetê tirsîn û dev ji warê bav û kalan berdidim. Vê ramana han bi qasî ku neyar dilxweş dikirin, yar jî ewçend sinix dikirin. Di mehên çirriya pêşîn û paşîn de min xwe ji bo derketina Rihayê û çekên xwe tikûz kirin. Tenê li pêş min mabû ku her wekî apê min wesiyet kirê wî bikujim û ji welêt bi derkevim.

Rojekê ez bi lez di çarşiyeke Rihayê re diborîm ku herrim civanekê. Min dît Bedir axa li ser dikanekê rûnişti bû bi dengekî bilind dipeyivîn. Di vegerrê de min li wir nedît, min ji hinekên ku digel wî rûnişti bûn zanî ku ji bo guhên xwe hatiye ser bijîşk û wê demekê bimîne. Di wê gavê de min da çav xwe ku derheqê wî de her tiştî bizanim.

Li Rihayê ez li mala apê xwe Emîn mêvan bûm. Eger wê rojê min Bedir axa nedîtiba dê sibetirê ji bajêrr bi derketama û berê xwe bida qesra wî. Heye ku bi derketina ji bajêrr min gelek west bidîta bê ku kêsa wî di min keta. Ji nû ve min ji xwe re xebatine biçûk çarkirin û xwe pê mijûl kir, heya kesek ya di dilê min bîra nebe; nemaze apê min Emîn û jina wî. Min dixwest herrim bakurrê Ferêt, nav eşîra Gevozan û li ber qesra wî lêdim û careke din vegerrim welatê Sûriyê. Wa ev e camêr bi lingên xwe sed kîlometir ber ve Sûriyê hati bû; diviya bû ez nehêlim ku bi xweşî vegerre mala xwe.

Berî her tiştî diviya bû bizanim ka dê çiqasî li Rihayê bimîne, kês nekete min ku zanîna vê yekê bispêrim kesî. Roja din bi şev hat mala apê min Emîn, ji bo ser têdana wî û jinê. Me berê goti bû ku ev ap hin xwarziyê Osman paşa û hin jî zavayê wan bû. Çiqas ku neyarî di navbera mêrê eşîr de hebe jî, di deverrên holê de, dema hevrûyî hev dibin, rûyê xwe ji hev banadin, herwekî tiştek di navbera wan de tine be digel hev dipeyivin. Gava Bedir axa hat mala apê min her wekî divê ez digel wî rûniştim peyivîm û me serekî dirêj henek jî kirin.

Ji ber ku tu caran dilê wî ji min rihet ne dibûn, hergav dixwest ya dilê min bizane. Ji lewre di nava peyvê de ji min pirsî:

-Kirîv! min bihîst ku te dil heye mala xwe bînî Rihayê?.

-Raste, min dil heye.

-Ma nayê bîra te ku bêjin: Osmên rû li ber neyaran bada?

-Na ez ne bawerim kes wê qelsiyê têxe sitûyê min, ji ber ku piştî derketina min ji êrdimê neyar xweşiyê nabînin.

-Gava tu ji êrdimê derkevî wê xweşiyê bibînin. Pirsek heye dibêje: yê çûyî venagerre. Dema bixwazî êrdimê berdî, yên tê de ji bîra xwe bavêje.

-Kirîv! eger ez wê êrdimê tevî xelkê wî ji bîra xwe bavêm jî, divê ew jî bîra nekin ku xeyda min dikare wî wî erdî bihejîne.

Dema apê min dît peyv di navbera min û kurrxalê wî de germ bû, ji bo gotina me bade warekî din bi derket derve û gazîmin kir û got:

-Ne raste ku di mala me de ji Bedir axa re holê bêjî. Diviya bû bêhna te pirrtirî vê fireh be. Xuyaye germa odê liserê te daye. Hinekî derkeve ber bê, heye ku vegerrî ser halê xwe.

Min dît gotina apê min ji her alî ve rast bû. Serekî ez li derve rawestîm, dema vegerrîm li ser hespan dipeyivîn. Apê min got:

-Ev e Osman hat, ew hergav pesna hespê xwe dide, Henîfiyê Osman Key jî pesna mehîna xwe dide. Divê em şertekî têxin nava wan, hespê Kê li paş ma wê pezekî bigure û bi civatê bide xwarin.

Dema min dît di vê kirê de kêsa kuştina Bedir axa heye, min got:

-Eger Henîfî dike, min qebûle.

Henîfî got:

-Min jî qebûle, we çi gavê divê ez hazirim.

Min got:

-Eger apê min û Bedir axa bên temaşê, sibe li cirît meydaniyê emê hespan bibezînin.

Tevan ev gotin minasib dît û ji bo bezê sibetira wê şevê, saet 8 piştî rohelatdane zanîn. Hemiyan bi şeref pirs dan ku werin cirît meydaniyê hazir bin. Apê min û Bediraxa wê di nava min û Henîfî de bibûna hekem. Kî ji me bi şûnde bimana wê bihayê mihîyeke qelew sê zêr li wir bidana hekeman.

Piştî ku şevbuhêrk xilas bû, her kes çû mala xwe tenê ez û Henîfî man {ew jî mêvanê apê min bû} got:

-Te dît, çawan serê me herduyan germ kirin û em berdane hev?

-Ne xeme, hergav te pesna mehîna xwe û min pesna hespê xwe dida. Diviya bû rojekê em xwe bicerribîn ib, ji lewre ez ji sibe çaktir nabînim. Gava Henîfî dît, hê serê min germe, bi dilsarî got:

-Başe, herwekî te divê.

Eger Henîfî bizaniya kama min ji vî şertî çiye, heye ku çêtir qîma xwe pê baniya. Lê min nedixwest ya dilê xwe bêjim kesî. Henîfî yek ji rîsipiyên Mirdêsan yên derî êrdimê bû. Gelekî ji malbata me hez dikir û min qedrek çak jê re digirt. Wî jî bi qasî min, an pirrtir rika Bedir axa dikir, ne ji bo tu tiştî, tenê ji bona tola apê min Şukrî.

Piştî ku Henîfî raza, serekî dirêj ez bi tevgerra sibê ramiyam. Her tişt wekî dilê min dixwest dibû, tenê tifinga min li gund {Istaxullê} mabû. Lê digel min şeşareke barabello tevî şeş şeyên dagirtî û sed fîşekî hebû.

Wê şevê min ne dikarîtu tifingan çarkim; lê ji bo kuştina Bedir axa şeşara min têr dikir. Sibetirê gava Bedir axa digel apê min Emîn bihata cîrît meydaniyê, min dikarî herwekî apê min Şukrî xwestî ez bêjimê:"Bedir axa! bêbextî di kira min nîne, wek mêran dest bibe xwe, dixwazim tola xwe bistînim".Hînga min dikarî şeşara xwe di sînga wî de vala kim û bi lez berê xwe bidim gund û tifinga xwe hildim. Herrim Sûriyê.

Ji çend mehan de min çav da bû çûna Sûriyê; ji lewre rê û deverr, kêl bi kêl min nasî bûn. Gava min Bedir axa bikuşta kesî nedikarî pêşiya min û derbas bûna Sûriyê bigirta. Dema min kes çak û rêya ji welêt bi derketinê li hev hatî dît, ji kêfan xewa min revî. Heya ber ve sibê ez di nav nivînan de rûniştî mam, bi tu awayî xew neket çavên min.

Heye ku bête bîra hinekan, ma gelo rast bû ku ez Bedir axa di himbêza apê xwe Emîn de bikujim? Ew apê ku ne dixwest xwîna du birayên xwe bi destê kurrxalê xwe ve bibîne, diviya bû cendekê wî li ber xwe bibîne. Min di vê kira han de tiştekî bê rê ne didît; îro jî nabînim. Qey ku Xwedê ne dixwest Bedir axa wê rojê li cirît meydaniya Rihayê bimire! .. Berî baraneke şên û xurt dest pê kir barî. Çiqas min berê xwe dida Xwedê, hêvî dikir ku baran bisekine, pirrtirdibarî. Di saet heftan de gihaşte celebekî welê ku mirov nedikarî serê xwe ji bin ban bi derxe, herre mala cîranan. Wê rojê û wê şevê baran ji hev qut nebû, roja diduyan jî heya êvarê barî. Derî bajêrr tev bû herrî. Gava yekî bixwesta hespa xwe derxe cirît meydaniyê diviya bû çend rojan xwe ragire, heya erd çîçkekî ziha bibe. Piştî ku baran sekinî nema Henîfî xwest li Rihayê bimîne, bi vî awayî ew kêsa hêja ji destê min çû.

Eger kêsa cirît meydaniyê ji min çû, diviya bû ez kêsa rê ji destê xwe dernexim. Berî ku bigeheşta Ferêt, min dikarî xwe berdim pêşiya û negihînim malê. Ji bo vê yekê min pilana xwe danî . Diviya bû berî derketina wî bi çend rojan ez herrim Cirnê Reş û li bende hatina wî bimînim. Ji ber ku digel wî hesp tine bûn, dê bi otomobîlê bihata Cirnê Reş û li wir bi hespan bi çûna mal.

Berî derketina Bedir axa ji Rihayê bi çend rojan ez bi siwarî çûm Cirnê Reş, digel min siwarek hebû ku ew jî seyîsê hespê min bû. Ji ber ku li vê qezayê mêvanxane tine bû ez çûm mêvaniya camêrekî. Du roj, çar roj, hefteyek çû, Bedir axa ne hat!.. Bê sebeb mayîna min li Cirnê Reş ez dixistim bin şibhan. Bi ser vê yekê de kurrê mêvandarê min gelekî nexweş bû, li mala wî rawestîn şermisariyeke mezin bû. Lê çi bikim ku ji dest xwe berdana wê kêsê xisareke mezintir bû; heye ku careke din ne diket destê min.

Roja nehan kurrê mêvandarê min mir. Nava malêtev bû şîn û girî. Bêntengî bi min re gîha bû warekî welê ku, min nedikarî saetekê li cihekî rihet rawestim. Wê rojê ez di wî halê bênteng de, piştî nîvro Bedir axa digel du hevalên xwe hatin Cirnê Reş û bi navê Sîno çûn mala camêrekî.

Sîno mirovekî Gevozî, ango ji eşîra Bedir axa bû, li Cirnê Reş rûdinişt. Demroj serêvar bû nema Bedir axa dikarî wê rojê herre mal. Dê wê şevê li mala Sîno raza û sibetirê berê xwe bida mal. Êdî ji bo min li Cirnê Reş mayîn şaşî bû. Ji bo kêsê ji xwe ne borim, diviya bû herrim gundekî ser rê, heya sibê zû bikarim derkevim ser rê bê ku kes şikekê ji min bike.

Zûka min xatir ji mêvandarê xwe xwest ji qezayê bi rê ketim. Li ser rê bi navê Xuşxuşkê gundek hebû, ev gund li ser sînorrê eşîra Gevozan bû û xelkê gund xwe Gevozî dizanîn. Herçî xwediyê gund Xelîl, ji dostên bavê min bû û gelekî hej henekan dikir. Dema ji bo cara pêşîn ez ji mala xwe dîtim, nema dizanî çi bike. Ji ber ku sibetirê dê gelekî biwestiya me û rêyeke dirêj li ber min bû (rêya Sûriyê) bi nîvşev min zor Xelîl ji nivîna xwe bi dûr xist û nivistim. Ji ber ku rêya min li ber min rast bû, dema min serê xwe danî ser balgihê ez ketim xew û heya sibê hişyar nebûm.

Kuştina Bedirê Paşê û Çûna Sûriyê

Sibetirê zû ez ji xew rabûm û min xatir ji mêvandarê xwe xwest û ketim ser rêya Cirnê Reş. Pirr mikûn bû ku ew jî sibê zû bi rê keve û em di nîvê rê de raste hev bên. Tevî ku em gelekî hêdî dimeşîn, di saet 7,30 de em gîhan pişt malên Cirnê Reş, me kesek li ser rê nedît. Careke din ez bi şûn de vegerrîm ber Ferêt gundê Helîsê. Bi navê Şêxê Xanimê xarziyekî Bedir axa li vî gundî rûdinişt. Berî demekê wê tifingeke min di gemiya Helîsê re bihata û heya hîngê ne hatibû. Bi vê hicetê min dikarî herim gund û li pirsim, bê ku kes bîra tiştekî bibe. Heya ez biçûma Helîsê û careke din vegerriyama Cirnê Reş dê nîvro bibûya, bê guman ezê raste Bedir axa bihatama.

Ez çûm Helîsê min pirsa tifinga xwe kir, Şêxê Xanimê got: hê ne hatiye, dema bê ezê ji te re derbas kim. Şêxê pirr xwest ez peya bim û şevekê li nik wî bimînim; lê min xwe bi hincetekê jê xilas kir. Eger wê rojê

min çav nedaba kuştina xalê wî, ezê li nik Şêxê peya bibûma, pirrî ku mirovekî çak bû. Ji ber ku min ne dikarî peya bim, bê rawestîn ji nûve min berê hesp da rêya Cirnê Reş. Hîn me nîvê kaşê Helîsê birrî bû ku me dît çar siwar di jor de têne xarê. Ji rewşa siwaran min bîra bir ku wê Bedir axa be. Kaşê Helîsê tirrangekî gelekî kirêt e, derî rê bi siwarî tê de çûn gelekî dijwar e. Hespê min ku hînî rê û tirrangên çiyan bûbû, di tirranhekî holê de bi gengazî dimeşîn.

Çawan ku paşê hevalê Bedir axa gotibûn, dema çavên wan li min dikeve, dibêje Bedir axa:"Ev e Sebrî bi rê de tê, serê wî hişk û destên wî çepelin. Ji rêya wî derkeve, bila berê we nekeve hev". Berê wî xwesti bû hinekî serhişkiyê bike; lê paşê dilê hevalên xwe nahêle û bi gotina wan dike.

Bi qasî 40-50gazî em ji hev dûr bûn ku Bedir axa ji rê derket, li qasî5-6gazan bi rohelatî rê de dadiket- Dinê sar û sirra bayê kurr hebû. Siwar bê ser û pêç bi rêyan de ne diçûn. Bedir axa jî serê xwe bi kefiyeke rîsnî pêça bû û ji çavan pêve tiştek nedixewinîn. Heke ne ji mehîna Sîno ya ku lê siwar bûbû, heye ku ji dûrve min nenasîna. Dema em bi qasî deh gazan nîzîkî hev bûn, min kirbaca di destê xwe de êxist paş sitûyê xwe û destê xwe yê rastê ji kurk kişand û şeşara xwe derxist. Tevgerra min ji kesî ve ne xuya bû, destê min di bin kurk de ne dixewinîn hînga min hespê xwe ji rê derxist û berê wî da Bedir axa. Bê şik wî şopa tolvaniyê di çavên min de dît; lê nema zanî çi bike. Serê hespan gîha ber hev, hînga bi dengekî qels û mat silav li min da. Hînga min bi dengekî xurt lê vegerrand û gotê:

-Silav di nava me de nîne, wek mêran dest bibe xwe, ev e ez te dikujim.

Bi gotinê re min destê xwe ji bin kurk derxist, şeşara barabello di nav de dipirrijî. Wî jî destê xwe dirêjî şeşarê kir; lê nema kêsa kişandinê dît. Li pê hev min sê berrik berra sînga wî dan. Bi her berrikekê re carekê destê wî ji şeşarê bi dûr diket û dîsa diçû ser ku bikişîne[56]. Ji ber ku peyakî li ser xwe bû zû neket, ji lewre berrika çaran min berda şîlikê eniya wî. Hînga wek termekî di ser pişta mehînê de hat xarê û li ser serî li erdê ket.

Piştî ketina Bedir axa ez vegerrîm ser hevalên wî, ew tevî siwarê min ji tirsan tertilî bûn. Eger kesên tertilî dikarin tê bighên, min gote wan:

[56] A xweş ev e ku hevalên Bedir axa gotibûn: dema hat kuştin destvala bû û digel wî çek tine bûn! Heya îro jî ez nizanime kama wan di kirina vê derewê de çi bû?.

Ev e min tola xwe sitand; lê nebî kesekî we li pê min were. Kesê li pê min were dê bimire.

Hînga min siwarê xwe yê tertilî da ber xwe û em gîhan gazê, me li pêş xwe bi du sed gazî bi qasî sî jendirme tevî xelkê du gundan dîtin. Ew digel qaymeqamê Cirnê Reş hati bûn ku sînorrê navbera du gundan rast bikin. Bêgûman dengê şeşarê çû bû wan; lê ne dizanîn kê û ji bo çi avêtin. Piştî em ji wan borîn me hespên xwe bi xar ajotin çûn Istaxullayê. Li wir me tifingên xwe hildan û berê xwe da rêya Sûriyê.

Piştî em ji erdê wîlayeta Sêwerekê[57] derketin, êdî tirsa ku jendirme li pey me bên nema. Hînga ez derketim ser girekî bilind û berê xwe da Diyarbekirê (Herwekî apê min wesiyet kiri bû) bankir û got apê xwe:

"Îro min dest bi sitandina tola te kir, pêşî lê hat, dawî jî li Xwedê".

Berî roava bi saetekê em gîhan Çixreşiyê, gundê Henîfî. Wî dikarî rêberekî ehya sînorrê deşta Berazan, kûna qirrêc digel min bişîne. Bê rêber mikûn bû em rêya xwe şaş bikin. Dema zanî ku min Bedir axa kuştiye gelekî kêfa xwe anî. Lê gava min gotê:"Eger me ji baranê ba wê li cirît meydaniyê bihata kuştin". Hînga got:"Çê ku baran barî, an na Gevozan dê ez bikirama şirîkê te".

Piştî roava bi hinekî em bi rê ketin. Rêberê me ne ewçend jêhatî bû, rê şaş dikir. Dawî berî şefeqê em gîhan gundê ku me dixwest. Li wir bi navê Misê Hemê camêrek hebû î Mirdêsî bû, em li mala wî bûn mêvan. Wê rojê nîzîka bîst saetan em li ser pişta hespan mabûn, ji westan nema me dikarî xwe tev bide. Berî her tiştî me ji xwediyê malê xwest nivînan ji me re deyne da em xewa xwe bişkênin. Çawan min serê xwe danî ez di xew ve çûm. Di xewnê de min apê xwe Şukrî dît. Bi ken û rûgeşî berve min bezî, hat ez xistim himbêza xwe û kêfa xwe ji min re anî. Dema ez ji xew hişyar bûm, min bi dilxweşiya apê xwe, xwe bextiyar dît. Heye ku ji wê pirrtir nema min dixwest.

Wê rojê êvarê, şeva26ê berçille 1929an bû. Misê Hemê peyakî xwe xist pêşiya min, em di tala Kaniya Ereban re gihandin Sûriyê.

[57] Hingê Sêwerek wîlayet bû; lê piştî du sê salan kirin qeza, heye ku careke din bibe wîlayet.

Beşê diduyan

Li Sûriyê
Ji sala 1930 heya dawiya sala 1936an

Berve rastîne tehil

Roja ku min berê xwe da Sûriyê ez bawer bûm ku dê li wir Kurdine welatparêz û xebateke welatî bibînim. Herwekî ku min ji pismamekî xwe, ku berî min Sûriye dîtibû, bihîstibû “bi navê Xoybûn partiyeke kurdan a siyasî li Sûriye hebû û armanca wê partiyê serxwebûna kurdistanê bû. Di nava vê partiyê de ji malên Bedirxan paşa, Cemîl paşa, Ibrahîm paşa, herdu lawên Şahîn begê, Hacoyê Haco û hîn Kurdine din hebûn. Xwedê giravî ev hemî ji bo hişyar kirin û azadiya gelê Kurd dixebitin...”.

Gotinek me Kurdan heye dibêje:”Dengê defê ji dûr ve xweş tê”. Xwezî bi wê bihîstinê; lê ne bi wê dîtinê. Berî ku min ew koma Xoybûnê bidîta çiqas di çav min de mezin û bi rûmet bû, piştî min dît, peyayên wê yek bi yek, li ser dirêjiya rojan di çav min de ewçend biçûk bûm. Heya gîha

warekî welê ku, bi qasî min ji wan hez kiribû, deh qat rik û neyariya wan di dilê min de cih girti bû. Eger durvê wan ê pêşîn bi gotinên pismamê min ketibû serê min; durvê paşîn eastiya ku li ser dirêjiya rojan ez gîhamê anî bû pê. Eger wan bi xwe bizaniya durvê wan ê paşîn çiqas î kirêt e, heke cihê fedîkirinê di dil û serê wan de hebûya teqez xwe xweş nedihîştin.

Ji her tiştî pirrtir a ku li Sûriyê bi ber çavên min ket, dilê min êşand hebûna Firansizan di nav welêt de bû. Ew kolîsarên ku di ser gelek welatan re derbas bûbûn û hatibûn li Sûriyê hikim dikirin ji min re gelekî kirêt dixewinîn. Nizam ji bo çi min ew ji zorbazên Turk jî kirêttir didîtin?! Heye ku çavên min hînî dîtina wan nebûbû.

Şeva ku ez gîham Kaniya Ereban, sibetirê ez çûm mala herdu kurrên Şahîn begê û min xwe bi wan da naskirin, sebebê ku ez pê derbasî Sûriyê bûbûm min yeka yek ji wan re got. Bozan begê gote min:”Bi tena xwe meçe cem misteşarê Firansîz. Ez hez dikim digel te bêm, heya te pê bidim nasîn”. Heftekê ez mam bê ku herrim cem Firansîzan, paşê dema min dît wê hatina Bozan begêbi derengî keve, ez bi xwe çûm û rûbarî wî bûm.

Di 4ê meha çille 1930 de ez çûm rûbarî misteşarê Firansîz bûm. Bendewariyeke ecêb digel min rave kir. Berî her tiştî ji min pirsî:

-Ji çend rojan de tu li virî, ji bo çi dereng hatî nik min?

-Min xwesti bû digel Bozan begê werim dîtina te, lê dema min dît ew bi derengî dikeve ez bi xwe hatim.

-Ma neyariya Ismet paşa digel malbata te heye?

-Na, lê neyarên min li nik wî bi rûmetin.

-Raste. Derî adetên dîplomasî bi xwe ew te ji hikûmeta Firanse dixweze. Dibêje te mêrek kuştiye, divê em te teslîmî wan bikin. Di navbera hikûmetên Firanse û Tirk de peyman heye ku micrimên adî(diz û mêrkuj) teslîmî hev bikin. Kama wî ew e ku te micrimekî adî bide nasîn. Ji bo me tenê ew bendewariya bi dilgermî têr dike ku tu ji bo ramaneke siyasî hatiye Sûriyê. Delege yê Helebê ji min re destûr daye ku bi çavê xwesiparekî[58] siyasî li te binihêrrim.

Ji xwe berî ku misteşar bêje min kuştina Bedirê paşê ser û bin jê re gotibû. Heya misteşar bi xwe ji min re got:

-Heya niha gelek Kurd hatin Sûriyê; lê Ismet paşa rojekê ev bendewarî ji bo girtin û vegerrandina yekî din rave nekir. Ev tenê ji me re dide zanîn

[58] Xwesipar: miletecî. Ji xwe sipartinê tê.

wek min xwespar bikare bibe Kurd, an ji bo Kurdan û kurdîtiyê bixebite. Ew bi xwe dixebitîn, an digotin ku dixebitin; ma hewce bû ku yekî wek min, bê mal û bê mêr were digel wan bixebite?!

Na eger bixwesta, ma dikarî?

Du sê caran ez digel Celadet rûniştim û em peyivîn. Min jê re da zanîn ku, ez ji bo xebata welêt hatim Sûriyê. Min jê xwest, ku min têxin nav partiya Xoybûn. Wî bi dilxweşî daxwaza min hewand û got:

-Ji îro bi şûnde dikarî xwe lebatekî Xoybûnê bizanî.

Dema min ji Celadet dixwest min têxe partiya Xoybûnê, ma gelo li ser partiyan û tevgerrên wan; rêzan û armancên wan, dûşên siyasî di cîhanê û Kurdistanê, şûreşên Kurdan û sebebên ku ji ber ne çûne serî min tiştek dizanî? Dikarim bi bêjeyekê bersiva van pirsan hemiyan bidim: Na, min tiştek ji van nedizanî. Tenê min tişek hebû ku ew jî: Daxwazeke xurt ji bo xebata welêt... Jê pêve min sermiyanek zanînê nebû; lê min dixwest her tiştî ji peyayên Xoybûnê ên sere hîn bibim. Sed mixabin, hin nîrên di ser min re borîn ji peyayên Xoybûnê ên ku min ew sere û serwext dizanîn, di warên partîzanî û siyasî de ji min gelekî nezantir bûn. Bi tu awayî ji bo têkoşînekê ne pêkhatî bûn.

Paşê ji min pirsî:

-Ma dikarî di nava welêt de bixebitî?

-Belê dikarim, ez jî bona vê yekê hatime.

-Wek çi xebatê dikarî bikî?

-Çi xebat be. Çi xebata ku yekî din nikaribe bike bispêrin min. Ji bo xebatê, min divê para min ji ya her kesî pirrtir û girantir be.

-Eger em bixwazin te bişînin Dêrsim, ma dikarî herî û vegerrî.

-Erê diçim, bê du dilî. Hûn dikarin heya dergehê mirinê min bişînin. Tenê dixwazim bê xebat nemînim.

Celadet begê gelekî kêfa xwe ji sergermiya min re anî. Hînga sebebê ku divê ez pê herrim Dêrsim ji min re got:

"Ji salekê de em hewceyî peyakî serwextin ku ji bona karekî hêja bişînin Dêrsim. Îro pirrtirî herdemê em hewceyî şandina peyakî ne. Ev e Xwedê tu ji me re şandî.

"Heye ku tu nizanî, li Emerîka caliyeke Kurdan ê çak heye. Xelkên vê caliyê bi pirranî ji Dêrsim in. Ev Kurdên han hemî xwe bi hikûmeta Turkiyê digirin û di nav wan de mirovine gelekî dewlemend hene. Partiyeke weke Xoybûn siyasî hergav hewceyî alîkariya madî ye. Eger em bikaribin Kurdên li Emerîka ji xwe re bikine dost û bi armanca Xoybûnê bawer bibin, dê gelekî alîkarî ji me re bikin. Em bawerin ku li ser destê Seyîd Riza mirov dikare wan serwext bike. Berî du salan

ku tu bi ramaneke siyasî ji wî welatî bi derketî û Bedir axa jî di wê rê de te kuşt.

Paşê di nava peyvê de ji min re got:

-ez dibînim pêş de emê digel hev bibin dost. Dikarim ji te re bêjim ku Firanse bi çavekî dost li têkoşîna gelê Kurd dinhêrre. Îro em bi hin peyman digel hikûmeta Tirk girêdayî ne. Roj dê were ku Firanse bi destê we Kurdan bigire ji we re di rêya azadiyê de bibe alîkar. Tevê tiştê ku îro dikarim bêjim ev e ku:"Bê haya me tiştekî meke, dê dostanî û bendewariyeke çak ji Firanse bibînî".

Paşê bi ser ve got:

-Her gav dikarî bê destûr û bê alîkariya Bozan begê werî cem min. Eger ji xelkê eşîra te jî hinek bên em dikarin cih bidin wan û alîkariya wan bikin.

Bi vî awayî ez û misteşar ji hev qetîn. Lê tiştê ku hîngê dilê min pê êşiya ew bû ku piştî Bozan begê dît misteşarê Firansîz ji min re bendewariyeke çak nîşan da, hîngê ew jî bi min re çêtirî berê bendewar bû. Ma gelo! em dê her gav rûmeta hev ji biyaniyan binasin? Bi ser vê çîrrokê de sî û yek sal çûn, hîn ez dibînim îro jî em Kurd peyayên xwe dixwazin bi çavên biyaniyan binasin!... Herwekî baweriya me bi zanîn û ramanên me tine be- Ji wê rojê de rûmeta min li nik zarrokên şehîn begê, mezin biçûk, zêde bû û qedra min girtin.

Sî-çil roj di nav re çûn, rojekê min dît peyayekî girs, şapo li serî, digel herdu kurrên Şahîn begê di nava sûkê de dimeşîn. Min ji katibê Bozan begê pirsî, got:"Kurrê Bedirxan begê Celadet beg e. Piştî ew vegerrîn Mektebê (gundê mala Şahîn begê) ez çûm mala Mistefa Şahîn hevrûyî Celadet begê bûm. Ji ber ku pirraniya bajarriyên Kurd zimanê bav û kalan jibîra kiribûn, û Celadet li sitanbolê mezin bûbû, ez ne bawer bûm ku bi Kurmancî dizane. Ji lewre gava min xwe pê da nasîn ez bi Tirkî digel wî peyivîm[59]. Di dest de ji min pirsî:"Ma tu bi Kurmancî nizanî"? Min gotê:"Belê dizanim lê min digot heye ku tu nizanibî". Vêkenî û got:"Kê ji te re gotiye ku ez bi Kurmancî nizanim?". Hînga em dûr û dirêj li ser welêt û welatîniyê peyivîn.

Eger bi rasthatê min Celadet nedîta, tevî ku min ji herdu biran(Mistefa û Bozan) re gotibû ez dixwazim hemî hevalên we ên Xoybûnê bibînim, bê guman ne dihat bîra wan ku haya min ji hatina Celadet bikin. Ez bawerim ku tûya xirab di dilê wan de tine bû; lê hewce ne didîtin ku yekî

[59] Heya vê paşiyê rehmetî carcaran çêla wê hevdîtinê dikir û digot:"Osman bawer bû ku ez bi Kurdî nizanim, ji lewre digel min bi Tirkî peyivî.

Xoybûnê birayê min Sureya şand Emerîka da ku wan Kurdan bi partiyê ve girêde. Me jê re mesrefekî mezin jî da, cihê ku herre bi wan Kurdan re bide bistînê, çû li mêvanxaneyeke mezin peya bû û şande pey hinekan ji wan. Ji ber ku ne dinasîn neçûn cem wî, Qonsolên Tirkan jî zû peyayên xwe xistin nav caliyan û derheqê Xoybûnê de fikrine ne baş dane wan. Wek: "Xoybûn partiyeke Ermenî ye, bi hêvotina Îngilîzan ji bo perçe kirina welatê me dixebite". Li ber vê yekê birayê min nikarî tiştekî bike, tenê li (. . . .) malikeke Xoybûnê vekir û vegerrî hat Sûriyê. Ji wê rojê de em dixwazin hevalekî bişînin Dêrsim da ku bi destê Seyid Riza Kurdên Emerîka serwext bikin; lê mene dikarî".

"Paşê ji vê pêve Xoybûn dixwaze bi tevgerreke tevayî rabe û li her alî welêt şûreşê bike. Îro Dêrsim ji çaviyên şûreşa Kurdan tête zanîn. Me divê em bizanin ka Seyid Riza wê digel me rabe an na?.."

"Karên ku pê rabî ev in. Eger te ji wan yek, an herdu pêk anîn divê bizanî ku te xebateke çak û hêja di rêya welêt de kiriye.".

Xebat hêja û goreyî daxwaza min bû. Min gotê:

-Başe, ezê herrim û reşbelekên Xoybûnê bigehînim cih. Li nik xwe û li ser destê hin dostên malbatê jî bixebitim. Bawerim ku wekî Sureya begê destvala venegerrim.

Hînga Celadet ji min pirsî:

-Ma ji bo hevaliya rê kesek peya li nik te hene?

-Belê niha pênc-şeş peya li nik min hene.

Heya hîngê ji xelkê welêt çend peyan xwe da bûn dora min. Bi van çend peyan min dikarî bi her alî welêt de herrim û gelek tiştan bikim.

Careke din Celadet herrî Dêrsim û vegerrî, ji te re çiqas tifing û pere divên?

-Ji bo vê rê em ne hewceyî peran in. Tifingên me jî hene. Tenê eger hûn dikarin ji me re hezar fîşekî bidin.

-Fîşek gelekî rihetin. Piştî ezherrim dê ji te re fîşek peran digel reşbelekên partiyê verêkim. Ez hêvîkarim ku ji me re bersiveke çak bînî. Fîşek, pere û reşbelek dê li ser destê Bozan begê bigehên te. Tu jî bersivên ku digel xwe tînî tevî raporekê li ser çûn û hatina xwe û rewşa welêt û welatiyan bide wî. Karbidestê Xoybûnê li vir ew e.

Piştî vê bi du rojan Celadet li kaniya Ereban çû. Heya du mehan pêjna Celadet nehat. Di dehê adarê de rojekê Bozan begê gazî min kir û got:

-Ev in tiştên ku Celadet ji min re şandine ku bidim te. Tu kînga dikarî herrî?

Tiştê ku Celadet şandî, sê reşbelek û nîzîka du hezar belavok bûn. Hînga min ji Bozan begê pirsî:

-Wê ji me re fîşek û pere bişandana!...

-Çêla tiştekî ji wan nekiriye. Hîngê min da bala xwe, eger ez neçim, Celadet wê bêje: nedikarî here tine bûna fîşekan kir bêhane. Ji lewre bê ku tiştekî bêjim di panzdehê adarê de tevî pênc peyan min berê xwe da welêt û bi rê ketim.

Berî çûna xwe divya bû ez zabitê Firansîzan bi awakî bixapênim heya bikarim destûra ji derketina Sûriyê jê bistînim. Ji bo vê yekê piştî ku min û Celadet ji bo çûna Dêrsim tifaq kir, ez çûm cem zabitê firansiz ku çavdariya hemî kirên me dikir û min gotê:

-Ez hêvî dikim hûn destûra min bidin da herrim jina xwe bînim.

Piştî ku li ser vê yekê gelekî pê re mijûl bûm qîma xwe anî ku ji min re destûrê ji Cerablîsê bixwaze. Zabitê Cerablîsê destûr da ku herrim; lê bi hînceta baranê hîşt biharê. Ji lewre dema reşbelek ji Celadet hatin, tenê min çûna xwe ji zabitê Firansiz re da zanîn.

Belavokên ku dabûn min kurd vedixwendin şûreşê, Ji min re hate gotin ku divê ji sînorrê Sûriyê heya bi Dêrsim bêne belav kirin. Ez bi xwe heya hîngê di xebatên partîzanî de nezan bûn; lê ew kesên ku partiyek anîbûn pê çawan rêyeke welê çepel xistin ber min? Gava min belavok li ser rêyan û li nava gundan bavêtana, ma şopa min ji tirkan re xuya ne dibûn? Tevî ku ev yeka hat bîra min jî, mafir ku partiyê holê xwestibû, diviya bû ez daxwaza wê bînim cih.

Ji ber ku peyayên Xoybûn ên berpirsiyar ne dikarîn tiştekî veşêrin û gelek guhbelên tirkan û firansizan xwe dabûn dora wan, berî ku ez li Sşriyê bi rêkevim haya hikûmeta Tirk ji çûna min bûbû. Dizanî ji bo çi diçim nava welêt, berê min bi kû de ye û çend peya digel min in. Ji lewre erdê ku tê re derbas bibûna bi jendirman dagirtî bû. Ez kû de diçûm, min birrek jendirme li pêş xwe didît.

Heya ez ji alî roava de gîham nîzîka Melatiyê min belavok li ser rêyan û nava gundan davêtin. Ji lewre jendirme tim li ser şopa min bûn; kîjan gundê biçûnayê, tê de, anli gundên darê wê jendirme hebûna. Gava min dît bi vî awayî şopa min nayête veşartin, careke din ez bi şunde vegerrîm çiyayên Kextê. Li wir min hevalên xwe hemî berdan û bi tenê berê xwe ji alî rohelat ve da Melatiyê ku ji wir herrim Dêrsim.

Di nîrekî holê dijwar de ku hikûmeta Tirk rêya min bi jendirmeyan dagirtî de, dev ji hevalên xwe berdan, bi tenê mayîn heye ku şaşî bû. Lê ji ber ku di rê de çavên min li veşirînê û ne li lêxistinê bû, ji bona çi bi tena xwe neçûyama?!... Cihê ku pênc peya tê de veşiriyana peyayek tê de xweş vedişirîn; lê cihê peyakî têra pênc peyan ne dikir. Ji lewre bi tenê çûn çiqas ku bi tirs bû jî, gelekî gengaz û hêsan bû. Li ser vê

de dan û sitandin çê bû, heye ku ji bo Kurdistana pêşende jî gelekî peyivîn.

Wê gavê, dema waliyê Xarpitê Elî Xalib digel miteserifê Meletiyê Xelîl Ramî serên xwe li pêş Mistefa Kemal hildan û mêldariya Xelîfê Istenbolê kirin , Silo beg li wîlayeta Xarpitê zabit bû û xwe da aliyê walî û miteserif. Dema bi hevalbendên Xelîfe re ne qedî û li ber Mistefa Kemal revîn çûn Sûriyê, Silo beg digel wan neçû, di çiyayên Îzolan de veşirî.

Piştî ku Mistefa Kemal di welêt de lingê xwe bi cih kir di her alî welêt de şerrê hevalbendên Xelîfe kir û pirraniya wan bi îdamê hikim kirin. Silo beg jî di nav wan de li îdamê mehkûm bû. Gava Mistefa Kemal şerê xwe vala dît, da ser pişta neyarên xwe ên hundurr û cih li wan teng kir. Hînga Silo begê nav Îzolan berda û hate nava me Mirdêsan.

Wê çaxê rewşa me a eşîrî gelekî xurt bû û zora hikûmeta Anqerê li me ne dibû. Jê pêve wê hikûmetê ji bo tu tiştî bê diliya me ne dikir û çi daxwazek me hebûya bê dudilî tanîn cih. Dema Silo beg hat nava me Mirdêsan, apê min Şukrî ku mezinê me bû, begê Îzolî, lawê Xan begê Cûcê şand mala min, li nik min mêvan mabû. Tevî ku Silo beg di emrê bavê min de bû, ji ber ku mirovekî nerm bû, min gelekî kêfa xwe jê re tanî. Lê mêvaniya wî pirrtirî mehekê-çil rojî dom nekir. Li ser xebata apê min û Hacî Bedir begê hikûmeta Anqerê efa wî da, li nik me bi serbilindî vegerrî cihê xwe, lê ji leşkeriyê hate avêtin.

Dema Celadet begê bi navê Xoybûnê ez şandim Dêrsim ji bo Silo begê jî reşbelekek da min. Li wîlayeta Melatiyê ji bo du kesan reşbelek hebû: Arpecî zade Hacî Mihemd efendî û Silo beg. Gava ez cara pêşîn di roavayê Melatiyê re çûm, min dixwest herrim nav bajarrê Melatiyê û rûbarî Arpecî bibim û reşbeleka Silo begê bidim wî. Lê dema welê ji min re ne qedî û vegerrîm çiyayên Kextê û ji nû ve di rohelatê Melatiyê re çûm, Îzolê Bendê diket devê rêya min diviyabû ez reşbeleka Arpecî li ser destê Silo begê bişînim û herrim Dêrsim. Di vegerrê de min dikarî rêya xwe bi Arpecî xim û bersiva wî bistînim, heya westa min duta nebe.

Şevekê ji şevên bihar bi ewr ber ve sibê, ez digel rêberê xwe hatim ber derê Silo begê. Rêberê min ji xelkê Îzolê Bendê û yek ji peyayên Silo begê ku di çiyê de rûdinin. Ew kurr ewçend rêberekî serwext û hişyar bû ku heya bi segê malê em nedîtin. Bê deng û gotin em derbasî nav qesra Silo begê bûn.

Dema Silo beg ji xew hişyar kirin û gotinê:"nasekî te hatiye dixwaze niha te bibîne", gelekî tertilî hat, şopa tirsê ji çav û dengên wî xweş diyar bûn. Gava ez naskirim, hinekî kêfa xwe ji min re anî, lê ne dikarî şopa

ramana han, rojeke biharê geş, cî çiyayên Mirdês ez ji hevalên xwe veqetîm, ew dê vegerriyana Sûriyê, û ez dê biçûma Dêrsim.

Heye ku sê çar rojên pêşîn bi tenê çûn hinekî ji min re dijwar dihat; lê paşê ez hîn bûm, gelekî xweş û gengaz bû. Ez kû de biçûma bê deng bi hêsanî dihatim veşartn. Pirr caran ez diçim gundine ku jendirme tê de bûn, bê ku gundî bitirsin ez dihewandim û keyfa xwe ji min re tanîn. Ji ber ku ez di vê êrdimê de hatibûm nasîn, û nav û dengekî mezin bi pey min ketibû. Xelkê, jin û mêr hez dikirin min binasîn, gava ez didîtim ne dizanîn ji min re çi bikin. Ew navê mezin ku bi mêranî neyarê xwe lawê Osman paşa kuşt û tola xwe hilanî.

Çiqas ku bi tenê çûnê xweşî û gengaziya wê hebû, ewçend jî tirsa wê hebû. Di gava nivistinê de ez diketim bin rehmeta felekê; nemaze giraniya xewa min!... Di dema razanê de eger jendirman bi ser min de bigirtana, de wek kewroşkekî ez destgepirr bikirama. Bi vî awayî, li ser destê dostan gund bi gund ez çûm nava Îzolê Bendê mala Silo beg lawê Xan begê Cûce.

Silo beg kî ye?

Silo beg, lawê Xan begê Cûce ji malmezinên Îzolê Bendê ye. Bavê wî serekê eşîrekê eşîra Îzolê Bendê bû, piştî mirina Xan begê serekîtî ket destê biraziyên wî. Sebebê vê yekê, Silo beg ji biçûkî ji nava eşîrê bi derket, şandin dibistana eşîretan. Ew dibistana ku Sultan Hemîd ji bo zarrokên serekeşîran vekiribû. Ji wê dibistanê derbasî dibistana cengê bû, di leşkerê Tirkan de ma heya bû bênbaşî. Di nîrê ku Silo beg bi dibistan û wezîfên leşkerî mijûl bû, pismamên wî di nava eşîrê de rêya serekîtiyê ji xwe re pêktanîn. Dema Xan beg mir, biraziyê wî bû serekê eşîrê. Silo begê bi xwe di vê yekê de tûya dererê ne didît. Ji ber ku nedixwest dev ji wezîfa xwe berde.

Hemberê vê, Silo begê jî, dema li Îstenbolê bû, bi têkiliya xwe ya welatparêzên Kurd, xwe ji wan dinasîn; an welê dixwest bide zanîn. Heye ku Silo beg di nav refên welatparêzên Kurdan de qelsitê hemiyan bû. Ya ku jê şik nedibûn ew bû ku Silo beg nema bi kêrî jîna eşîrîtî dihat.

Di sala 19.. an de gava Mistefa Kemal derbasî Anadol û Kurdistanê bû û ew welatên han ji hikûmeta Istenbolê veqetandin, hîngê Xelîl Ramî Bedirxan miteserrifê Melatiyê bû. Li wir di navbera Xelîl Ramî û Silobegê

tirsa ku giha bûyê ji rûyê xwe birrevîne. Berî her tiştî ji rêberê min pirsî, ka kesekî dît ku em derbasî qesrê bûn?

Min bi zaravekî tinazgîr gotê:

-Heya bi segê ber derê te em nedîtin, ne hewceyî evçend tirs e.

Hînga Silo begê bi şermisarî li min vegerrand û got:

-Ez hêvî dikim tu dilê xwe nehêlî. Berî her tiştî rewşa min ne wek ya we ye ku ji hikûmetê kuşiman nekim. Jê pêve navbera min û pismamên min gelekî ne baş e. Eger bizanin tu hatiye mala min, dê zûka haya hikûmetê bikin, tu dizanî hikûmet niha çi dike. Bi dilekî rihet min lê vegerrand û gotê:

-Ne pismamên te, ne jî kes ji eşîra te dizane ku ez hatime vir. Ne hewceye xwe holê bê sebeb bitirsînî. Ez gelekî westiya me, bila nivînekê ji min redeynin, divê ez hinekî vehêsim û xewa xwe bişkênim.

Ji min re nivînek danîn û rêberê ku digel min hatî di wê gavê de vegerrand gundê wî heya kesek bîra hatina kesî nebe. Min reşbeleka Silo begê dayê, paşê ya ku ji bo Arpecî jî min dayê, da ku sibetirê digel kurrê xwe bişîne Melatiyê jê re . Ez jî diviya bû şeva din berê xwe bidim Dêrsim.

Digel reşbeleka Xoybûnê min jî reşbelakeke kurt ji Arpecî re şand û tê de nivîsî:"Berî vegerra Sûriyê min divê te bibînim. Çi gavê û li kîderê we divê ev dîtin bibe?". Sibetirê Silo begê herdu reşbelek, (ya Xoybûn û ya min) digel kurrê xwe Zekî şandin Melatiyê, min jî serê xwe danî û nivistim.

Dema Silo begê ji bo xurîniyê ez hişyar kirim saet heşt bûn. Bi qasî ku dilê min bi xewê ve bû, ne bi xwarinê ve.. Lê pirraniya mêvandaran ji rihetiya mêvan pirrtir bi zikê wî difikirin. Heye ku ev yeka han di rohelata me de bûye ramaneke tevayî. Gelekî bi cangiranî ez rabûm û min xuriniya xwe kir. Silo begê firaq bi destê xwe birin malê, di vegerrê de min dît rengê wî wek yê miriyan bûbû. Çawan ku destên wî dihejiyan, dengê wî jî hejînek rûsar û bextereş jê dihat. Bi lavayî gote min:

-Va ye leşker bi ser me de girt, mala min şeitî. Bê şik bi şevê, dema hatinê hinekan tu dîtine û haya leşker kirine.

Ez qenc bawer bûm ku bi şev dema hatinê kesî ez ne dîtim. Digel begê tirsok derketim pêşiya eywana qesrê û me tev li dûşa ku salix da nihêrrî. Nîzîka sî jendirme û çend gundî li pêş wan, di çiyê de dadiketin nava gund, di wê rêya ku ez bi şev tê re hati bûm de dihatin. Raste li ser rêya ku pê de diçûm de du alayî jendirme hatibûn belavkirin, hawêr pirsa min dikirin û li şopa min digerrîn. Ev tişt li hemî aliyên wilayeta Melatiyê hebû, nemaze dûşên rêya Dêrsim. Bi rê ve ez raste gelek birrên

jendirman hatim û me xwe li ser rêya wan dida alî, hemî li ser şopa min bûn û pirsa min ji gundiyan dikarin. Ji roja ku min dev ji belavkirina belavokan berdayî şopa min ji jendirmeyên Tirkan ve ne diyar bû, lê her dem û gavê li ser û dor aliyên rêya min dihatin dîtin; herwekî dizanîn berê min bi kû de ye!... Heke min zanibûya ku li Sûriyê îxbara min hatiye dayîn û hikûmeta Tirk haydarê çûna min a Dêrsim bûye û ev rastiya han ji katibê Bozan begê Hebeş hîn kiriye, bê şik min dê dev ji çûna Dêrsim berdana. Lê ji ber ku min ev rastiya han nedizanî, min hemî bûyer rasthatineke ne çak dizanîn û pê dilê xwe xweş dikir, ji lewre bi dilekî bawermed min gote Silo begê:

-Malava ne hewceye ku xwe hinde bitirsînî. kesekî di hatinê de ez ne dîtim. Dilê xwe xurt bigire tiştek nabe.

-Çawan tiştek nabe?!..

Ma tu zanî dema te di mala min de bigirin wê çi bi serê min bikin?

Ji ber ku min başdizanî haya jendirman ji cihê min nîne, min xwest bi çi awayî be hinekî dilê wî xurt bikim, heye ku tirsa wî hinekî sivik bibe. Bi vê ramanê min gotê:

-Em nizanin jendirme ji bo çi tên gund; lê a rast ew e ku ne ji bo min e- Eger ji bo min be jî, kesek ji wan min nas nake. Dema min navê xwe guhart, kî dizane ez kî me?

Bi vê gotinê re min dît rengê Silo begê hinekî geş bû. Li min vegerrand:

-Raste, kes li vî welatî (êrdimê) te nas nake. Lê tifinga te û reşbelekên digel te em dê çi bikin?

Bi çi awayî be min dixwest dil bîdinê û tirsa wî birrevînim. Bê du dilî min aliyê malê û di cihekî çak de veşêrî.

-Ramaneke çak, niha dilê min rihet bû. Gava ji te pirsîn navê xwe biguhêrre kes te nanase. Zûka tifingê û reşbelekan bide min. Li ser vê tifaqê min tifing, rext û reşbeleka Dêrsim tev de dan destê wî û birin aliyê malê û ji min re kaskêtek anî min da serê xwe.

Birrê jendirman jî ketibû nava gund ku Silo begê ji min pirsî:

-Ji bo çi tu şeşarê di bin çakêt de nabînin.

-Eger xwestin te vello bikin, û digel te şeşar dîtin, tu çi dikî?

Xuyaye li vir min xwe şaş kir, herçiya di dilê xwe de got; ne her wekî diviya bû ji Silo begê re bê gotin:

-Bi hêsanî nikarin min vello bikin.

-Çi...çi ? dixwazî dest bibî xwe?! di mala min de?

Li vir ji nû ve rengê Silo begê bi carekê hate guhertin. Herwekî bêjingek ax bi ser serê wî de kî. Destên wî hejîn û bi dengekî lerzok gote min:

-Ha te divê mala min xirab bikî?... Rabe ji mala min derkeve.

Li vir nema min karî xwe ragirim; Bê raman û bîrbirî min gotê:

-Tifing û reşbeleka min bîne wê niha ji mala te derkevim. Ma kînga ez di bin banê teresan de rawestîme ku di bin banê te de bimînim!..

Bi lez û bez çû aliyê malê tifing û rextên min bi xulamê xwe re şand, reşbelek ne digel bû. Min gote xulam:

-Herre bêje Silo begê ez bê reşbelek ji malê dernakevim. Bila reşbelekê biûîne dê biçim, an na, lingê min ji qesrê dernakeve.

Xulam çû û bi lez li min vegerrî û got:

-Reşbelek berdane nava tanê[60], ne mikûne vê gavê derkeve. Silo beg dibêje ji bona Xwedê bila derkeve derî gund êvarê em dê reşbelekê bigehînînê.

Ew çend ez kiz bûbûm ku min ne dixwest bîstekê di bin banê begê teres de bimînim.. Qesra wî ji aliyê bakurr-roava yê gund bû. Berve bakurr neh-deh xanî piştî qesrê hebûn. Min da xwe û ji qesrê derketim, saet neh û tiştek bû, tevî wê kesî ji gundiyan nedît ku ez tifing bi dest ji qesra Silo begê derketim. Her neh-deh malên li ser rêya min kesek li pêş tine bû, min bi lez xwe gihand nivgirê bakurrê gund. Çend latên di serê gir de ji min dibûn çeperek hêja- Eger hinekan ez bidîtama, min dikarî di nav wan latan de heya êvarê xwe qorrîkim. Diviyabû heya êvarê ez li wîr rawestim, dema bû êvar reşbeleka xwe ji mala Silo begê bistînim û berê xwe bidim Dêrsim..

Dora nîvro dinê germ bû û li nik min av tine bû û cigare jî ne têr bû. Di cihekî welê teng de ji kêşana cigarê pê ve tiştek ji destê min nedihat. Gava qelisî û bêrûmetiya Silo begê dihat ber çavên min, nema min dizanî çi bikim. Heya hîngê ez ne bawer bûm ku mirovek dikare ewqas tirsok û bê rûmet be. Lê paşê, di nav rûpelên jînê û war û deverrên dijwar de min ji Silo begê qelstir û terestir dîtin.

Heya ro çû ava û dinê tarî bû ez di nav wan latan de mam. Piştî ku dinê tarî bû peyakî Silo begê hat û ji min re av û xwarin anî. Min pirsa Silo begê kir, Gote min:"Piştî tu ji qesrê derketî ew jî siwar bû çû Melatiyê". Min pirsa reşbelekê kir, got: "Xanimê ji tirsa şewitand".

[60] Tan: Dîwarê du ta ku ji depan an çirpiyan dixin nava mezelên xanîkî-Nava wan dîwaran vala ye.

Destên min bi ber min de hatin berdan, rehên min sist bûn, gewriya min ziwa bû. Eger Silo begê ez bikuştama gelekî ji vê yekê çaktir bû. Bûbû nîzîka çil rojî ez ji Sûriyê derketi bûm, ew west û fedakarî tev ji bo ku wê reşbelekê bigehînim Dêrsim destê Seyid Riza. Dema reşbelek çû, ew westa min tev de diçû, piştî ku gîham pêşberî çiyayên Dêrsim. Di nava min û Dêrsim de, çûna şevekê û derbasbûna ji Ferêt mabû, nema min dizanî çi bikim. Xwîna xortaniyê rehên min dihejand, tenê min diviya bû ez Silo begê bibînim û zûtirr zûtirrî bikim. Ma wî bi vê kira xwe ez ne kuştim?.

Bi çi rûyî ezê li partiya Xoybûn vegerrîma? Min dê ji Celadet re çi bigota? .. Bigota ku piştî çil rojî west û dijwarî Silo begê, an jina wî reşbeleka partiyê şewitand !. Paşê, çawan min reşbelek da Silo begê heya ji tirsan bişewitîne? Ji qehra agir bi dilê min ketibû, min dixwest bigirîm ew jî bi min ne dibû. Eger min bikariya bigiriyama, heye ku hinekî bêhna min derketa. Bê deng cendekê min wek pelkên daran li ber bayê payîzê dilerizî, bêhna min çikiya bû, nema min pêş xwe didît. Dengê peyayê Silo begê ez ji wî halî hişyar kirim û got:

-Di sibê de tu bê nan û dan, bê av û vexarin mayî. Ma tu naxwazî tiştekî bixwî an vexwî?.

Hînga ez ji xwe hişyar bûm û min li çavên wî nêhrî. Tê de qencî dilovanî û camêrî xuya bû. Dilê wî bi halê min diêşiya, bi qasî ku Silo beg ters bû, peyayê wî ewçend camêr dixewinî. Herwekî di ber kira begê xwe ve şermisar be, piştî ku min li çavên wî nêhrrî, careke din bi dengekî nizim got:

-Ma tu naxwazî tiştekî bixwî an vexwî?

-Piştî vê kira Silo begê, ma tu bawerî ku nan û danê wî teresî bi gewriya min de diçe?

-Qe ne firrek av vexw!..

-Ne ji ava wî bêbavî..

Min pirsa jendirman jê kir ka ji kû hati bûn û kû de diçûn, ew jendirmeyên ku çavên Silo begê rirsandin û ev pîsî pê de anîn. Camêr bi zanîn û bîrbirî li min vegerrand û got:

-Silo beg bê sebeb tirsî. Jendirme li çiyê dihatin û diçûn Melatiyê. Li ser revandina keçekê xelkê du gundan li hev da bûn, bi hişke daran çend heb ji hev birîndar kiri bûn. Jendirman jî ji herdu aliyan çend peya girtin û birin Melatiyê. Eger welê nekirana heye ku mêr bimirana.

Wê gavê hat bîra min, eger ev xortê ku bûye xulamê Silo begê li şûna begê xwe bûya bêguman ez holê şerpeze ne dibûm. Ji begê xwe tirs ne

dixewinî û kira begê xwe gelekî kirêt didît. Lê heyf ku yê tirsok û teres bûbû beg, û yê xurt û camêr jîbûbû xulam!.

Piştî ku serekî gêj û mat mam, hêdî hêdî min hişên xwe civandin û ji xwe hişyar bûm. Bê reşbelek min nedikarî herim Dêrsim û li nav Îzolê Bendê jî tu karê min nema!... Min tifinga xwe hilgirt û da xwe rabûm, cendekê min ji hev ketibû û hêlên min nema bûn. Peyayê Silo begê dizanî ku ez diçim. Bi dengekî nerm got:

-Ma tu pariyek nan naxwî?

-Nanê mirovê bêbav bi gewriya min de naçe. Bila Silo beg ji bîra neke ku ez bi vê kira xwe kuştim; lê....

Bê deng min da rê û bi şopa xwe de vegerrîm çiyayên Mirdêsan. Hikûmetê gelekî xelk êşandi bû. Nemaze Mirdêsan, eşîra ku ez jê.. Her roj bi dehan xelk digirtin û lêdidan û dixistin zîndanê. Min dixwest serekî li nav Mirdêsan bimînim heya jina min a bi halekî zarrokê xwe tîne. Di serê hizêranê de wê zarok bianiya. Piştî zayînê bi mehekê min dikarî dê û zarrokan bigehînim xwe û bibim Sûriyê.Em di dawiya gulanê de bûn, eger ez du mehên din di çiyayên Mirdêsan de bimama teqez dê bibûma sebebê girtin û lêdana gelek camêr. Tevî ku xelkê me ji min hezdikirin, hindikan jê bi rûyê li ken ez dihewandim. Ên mayî dema çav bi min diketin serî diketin ber û nema dizanîn çi bêjin. Li ber rewşeke holê ne rast bû ku ez ji bo birina jina xwe du mehan xwe bi şûn de bidim. Li ber vê rastiya han a tehl min berê xwe da Sûriye û terka welatê Mirdês kir. Di vegerra Sûriyê de min dijwariyeke mezin ne dît. Tevî ku hin dewriye xistibûn ber Ferêt ez bi gengazî lê raperîm. Kesê ku avjeniyê bizane mineta Ferêt û gemiyan nakişîne. Piştî ku ji Ferêt raperrîm bi hêsanî ez gîham Sûriyê.

Hemî dijwariyên ku min di çûnê de dîtibûn bi zêdeyî li Sûriyê ji devê qaçaxciyan hatibû bihîstin. Misteşarê Firansizan Liyutman La Kirwa, pirsa awayê ku hikûmeta Tirk pê dabû pey min û çawan xelk digirtin û li wan didan ji qaçaxciyan kiribû. Wan jî goreyî ji xelkê bihîsti bûn bi zêdeyî goti bûn. Hinekan ji wan qaçaxciyan goti bû ku firqeyek leşker daye pey min û newêrin xwe bidin ser min, an cihê ku ez tê de. Bi virr û derewan pesneke ecêb ji min re kiri bûn.

Dema ez gîham Sûriyê rûbarî kurrên Şehîn begê bûm. Mistefa û Bozan began gelekî keyfa xwe bi xweşî ji vegerra min re anîn. Awayê ku bihîsti bûn hikûmeta Tirk li pey min digerrî ne bawer bûn ku ji destê wan bifilitim. Bi ser ve gotin ku misteşarê Firansiz gelekî bi nûçeyên te re bendewar dibûn. Tenê ya ne rast ew bû ku di nava vexwarina ereqê de Bozan begê ji misteşarê Firansiz re gotibû ku :" Osman Sebrî ne ji bo

anîna jina xwe, lê ji bo xebateke welatî çûye Dêrsim. Ji xwe misteşar ji casûsê xwe, katibê Bozan begê Hebeş Îsmaîl bihîsti bû ku ez ji bo xebateke welatî çûme Tirkiyê. Lê nedizanî ku ew xebat çi ye. Bozan begê ji kerema xwe jê re her tişt goti bû. Hînga misteşar bawer kiribû ku min sebebê çûna xwe jê re rast ne gotiye.

Dema ez rûbarî misteşar bûm ji ber pirrtir kêfa xwe ji min re anî û pirsî ka min jina xwe anî an na. Min jê re da zanîn ku "ez di hesabê xwe de şaşbûm, hê zarrok ne bûbû. Hikûmeta Tirk ji bo min gelek xelk girtin û êşandin, ji lewre min dev jê berda û hatim heya careke din herrim". Ji nişka ve ji min pirsî:

-Tu gihayî Dêrsim? Te kî ji mezinên wan dît?.

Ez li ber vê pirsê mat mam.

Min gotê:

-Dêrsim dûrê me ye, çûna wir gelekî dijwar e.

-Ma partiya Xoybûn tu ne şandî Dêrsim.

-Na, tiştekî welê nebû!..

-Heqê te ye ku welê bêjî; lê ez bawerim ku tu çûyî lê ne gihîştî Dêrsim.

-Ne welê ye. Kê ji te re gotiye tu şaş serwext kiriye.

-Li vir tiştek ji me mayê veşartin. Lê xwezî te ji min veneşartiba derheqê te de gelekî baş dibû. Dîsa ezê bixebitim ku digel te baş bim...

Min tiştek ji gotina paşin fehm nekir. Dema min ji Mistefa begê re got, li min vegerrand:

-Bozên di nava vexwarinê de ji misteşar re goti bû ku tu ji alî partiya Xoybûn ve çûyî Dêrsim.

-Çawan jê re got?

-Em serxweş bûn, misteşar gelekî kêfa xwe ji te re anî û çêla çûna te û dijwariya ku te bi rê ve dîtî û leşkerê ku Tirkan berra pê te dayî kir. Bozan begê ji dilpakî bi dest ve berda û gotê ku tu hatiye şandin.

-Ma holê raste?

-Diviya bû negota; lê ne xeme. Misteşar doste û pirr ji te hez kiriye, tiştek nabe.

Min dît hevalên min tiştekî ji wacibê xwe nizanin. Her tiştê wan eşîriye, ew û partîzanî gelekî ji hev dûrin. Piştî du-sê rojan min raporra xwe nivîsî û li ser destê Bozan begê şand ji partiya Xoybûn re. Sûretekî raporra min bi destê katibê Bozan begê Hebeş Îsmaîl gîha bû misteşarê Feransiz. Paşê min ji hin camêr zanî ku Hebeş Îsmaîl guhbelê Firansizane û bi haya wan digel Tirkan jî dide û distîne. Çawan ku Tirk ji çûna min a Dêrsim agah kiribûn, haya misteşarê Feransiz jî jê kiribû. Heye ku hin tiştên kêm û zêde jî bi serve goti bûn.

Gotinên wî hemî nerm û xweş bûn, bêhna dostaniyê jê dihatin. Ma gelo Firansizan hêviya çi ji mirovekî wek min bêkes dikir? Hîngê min Firansiz ne dinasîn û rê û rêzanên wan jî bîra ne dibirin.

Sibetirê ez çûm Reqayê. A rast herdu kurrên Şehîn begê Mistefa û Bozan began gelekî dilên xwe êşandin û bendewariyeke hêja ji min re rave kirin. Remezanê Xelîl ne dizanî çi bike, dema otomobîl bi rê ket xwe avête nava wê ku digel min bê. Min gotê:

-Çi dikî Remezan?.

-Ezê digel te bêm Reqayê.

-Tê çi bikî? ma zarrokên xwe ji kê re dihêlî?

-Qet bila zarrokên min tine bin. Ma çawan ez dikarim te berdim. Heya tu sirgûn bî divê ez digel te û xizameta te bikim.

Bi rast rewşa remezan û ew nêhrek gelekî bi şewat bû. Gava min dixwest Remezanê Xelîl ji otomobîlê peya kim min dît hêstir bi çavên Mistefa begê de dadiketin.

Wê rojê ez gîham Reqayê û min reşbeleka digel xwe da misteşar. Gelekî rûmeta min girt û kêfa xwe ji min re anî. Xuya bû li ser min gelek tişt jê re hati bûn nivîsandin. Bi rûyekî geş gote min:

-Ev e Lakiraw derheqê te de çak dinivîse. Jê pê ve Delege yê Helebê jî baş nivîsî ye. Ez dilxweş dibim çi gava hewceyî tiştekî bûyî werî nik min. Divê bizanî ku her gav dikarî werî rûbarî min bibî û bi hatina te dilgeş dibim. Ez bawerim eger ji îro bi şûn de bê haya me tiştekî nekî dê ji me rûmeteke mezin bibînî.

Piştî min ji rûmetgîriya wî re sipas kir, ez çûm nav bajêrr da ji xwe re cihekî çar kim. Bi alîkariya berberekî Suryanî ji xelkê Rihayê min di malekê de odek peyda kir û tê de rûniştim.

Tiştê ku ez pirr jê teng dibûm, Reqa bajarrekî Ereb bû û min bi erebî ne dizanî. Ji ber vê yekê min di têkiliya xwe ya bixelkê bajêrr de dijwarî didît, û nezaniya min a ziman ez ji gelek kêsên hêja bê par dihiştim. Çê ku hîngê hemî tercimanên Firansizan bi Tirkî dizanîn, an na min ne dikarî digel Firansizan jî her wekî divê bipeyivim.

Ji ber nizanîna min bi erebî girtin û dayîna min a pirranî digel filleyên ku li serxetê daketi bûn Reqayê. Dirêjiya rojên xwe min li qehwexanan derbas dikir, ji lew re rojên min gelekî giran diborîn. Xortekî wek min xwîngerm û dil bi agir bi surgûneke holê pirr diêşîn. Paşê rewşa min a malî ne ewçend çak bû, ji her tiştî pirrtir destengiyê çavên min ditirsand. Heyîna min wek berê tine bû ku pere li pê min bihatana, bi ser de min kar û xebatek jî ne dizanîn heya li surgûnê pê debara xwe bikira.. nizam dê halê min çawan bimeşiya û debara min çar bibûya!.

Gava misteşar dît ez bê haya wî çûm Dêrsim, an min xwest herrim û ya dilê xwe jê re nabêjim, nema bi gotinên min bawer bû. Piştî vegerra min bi panzde rojan ez ji sînorr bidûr xistim û surgûnî reqayê kirim. Ev hemî ji ber nezanîna Bozan begê ya wacibê wî bû. Eger guhbelekî wek Hebeş ji xwe re nekira katib û dema serxoş bû ya dilê xwe negota misteşar kesî ne dizanîn ku ez ji bo çi çûme Tirkiyê. Dema min zanî ku Hebeş Îsmaîl guhbeliyeke du bêrî dike min haya Bozan begê kir; lê ne dixwest bawer bike. Ji ber ku hefsarê xwe xistibû destê Hebeş û ne dikarî dev jê berde. Sebebê vê yekê Bozan beg serekê beladiya Kaniya Ereban bû û Hebeş jî katibê belediyê bû. Bi haya Hebeş gelek dizî ji belediyê kiribû û dikirin, ji ber vê ne dikarî rûyê xwe li Hebeş bade. Ev gotin birayê Bozan Mistefa begê gote min û ji şerman hêstir bi çavên wî diketin.

Çûna Reqayê û Tevgera 1930

Piştî vegerra min a Sûriyê bi panzde rojan misteşarê Firansiz şande pey min û got:

-Herwekî te ji min re pirs dabû ku bê haya min tu tevgerrên siyasî nekî, te pirsa xwe şikand û bê haya min çûyî Dêrsim. Vê çûna te li Tirkiyê dengekî mezin da, û gelek west ji hikûmeta Tirkan re û serêşî ji me re çar kir. Ji ber ku di navbera me û Tirkan de roj bi roj rehên dostaniyê xurtir dibin, em naxwazin ku tevgerrên mirovekî vê dostaniya han hilweşînin. Li ser giliyê Tirkan Ho Komisêr ferman kiriye ku gureyî tifaqa di navbera me û Tirkan de tu ji sînor bi dûrkevî. Li ser vê Delegê Helebê ji bo rûniştina te Reqa minasib dît. Tevî şaşiya te, min gelek xwest te li vir bihêlim; Lê ji destê min nehat. Tenê dikarim bêjim ku eger tu nekevî şaşîne din, hikûmeta firanse wê destê te bigire. Here Reqayê, vê carê divê gelekî serwext lingên xwe bavêjî. Eger şîreta min bigirî ez bawerim ku rojekê dê bikevî nava dostên me.

Bi derxist di nav kaxezên ser masê de reşbelek da min û bi ser ve got:

-Fermana sirgûna te duh çû Reqayê. Ev e min ji misteşarê Reqayê re nivîsiye wê digel te baş be. Eger tu hewceyî tiştekî bûyî dikarî wek dostekî ji min re binivîsî.

Bi qasî bîst rojan welê di ser min re borî; lê bi raman.. Çend qirûşên di dest min de roj bi roj kêm dibûn. A rast min jî ne dizanî herwekî divê destê xwe bigirim. Heye ku ji ber tunebûnê min ne dikarî pêşendeyeke tarî bînim ber çavên xwe.

Berî ku destê min bi carekê vala bibe û li erdê bimînim diviya bû ez ji xwe re rêyekê çar bikim. Min kesek li Reqayê ne dinasîn. Li Sûriyê gişkî nasên min tine bûn. Ji herdu kurên Şahîn begê pê ve min Celadet Bedirxan li Kaniya Ereban dîti bû û Qedrî Cemîl paşa jî berî du salan li vegerra surgûnê, di tirênê de nasî bû. Qedrî beg berî min bi salekê hati bû Sûriyê. Gava ez gîham Reqayê min jê re reşbelekek nivîsî. Bersiva ku da bû, Ev bû sînorê zanîn û nasîna min li Sûriyê.. nizam bi vê nasîna teng min dikarî çi bikim...

Heye ku hinek ji xwendevanan nasîna çar mirovan, an bi salixdaneke din, çar hevalan ku her yek ji wan kurrê malmezineke kurdane, tiştekî biçûk ne bînin. Lê di demeke hindik de qelsiya ku min ji wan dît ji min re da zanîn ku heyîna wan ji tine bûna wan ne çaktir bû. Ji bo ku ev gotina min bê rê neyê dîtin divê ez ûşta bê hêvîbûna xwe serpilkî li vir bêjim:

Herdu kurrên Şahîn begê: herwekî me li jor gotiye ez li ser destên wan çûbûm Dêrsim, û yekî ji wan {Bozan beg}li pêş misteşarê Firansiz ji devê xwe filitandibû ku Xoybûnê ez şandime Dêrsim. Eger ne ji gotina wî bûya, katibê wî Hebeş Îsmaîl ne dizanîn ku ez ji bo çi çûme Tirkiyê. Eger ne gotina Bozan begê bûya Firansizan ne dizanîn ku ez bi xebateke siyasî çûme welêt û ez surgûnî Reqayê ne dikirim. Li ber sînorr tiştê ku ji welêt dihat têra min dikir û ez desteng ne dibûm. Tevî ku herdu bira li ser surgûna min berpirsiyar bûn, dema ez çûm Reqayê ne hat bîra wan ku destê alîkariyê dirêjî min bikin. Tenêdema ez bi rê ketim, gelekî dilê xwe êşandin; lê mixabin ku dilêşandinê berîka min a vala danedigirt!..

Celadet Bedirxan: Ew bû ku rêya Dêrsim xistber min. Tevî ku ji bo rê fîşek û pere dê bişandana, gotina xwe kir derew, tenê reşbelek û belavok şandin. Paşê min zanî pere û bihayê fîşekan ji Xoybûnê sitand, cihê ku ji min re bişîne, xwar. Hîngê mesrefê ku li rê bû min hemî ji kîsê xwe da[61].

Qedrî Cemîl paşa: Min li Reqayê jê re reşbelekek nivîsî û herçiya li min qewimî tev jê re nivîsî. Di bersiva xwe de ji min re gelek qencî hêvî

[61] Xwezî xisara ku min di wî mişwarî de kirî mesrefê rê tenê bûya!.. Lê mixabin ku eşîra min, malbata min û diya min bi hezaran xisara wê çûna min danîn. Bi dehan mirov ketin zîndanê û bi hezaran û hezaran pere hatin rijandin. Têr dike ku bêjim du sed jendirme nîzîka çar mehan di ser dilê eşîr û malbatê de rûniştin. Tiştê ku mikûn bû heya salekê an pirrtir diya min ji min re bişanda, tev bi jendirman û girtiyan da xwarin.

kiribû. Nizam ku hêvî tenê destên vala germ dikin?!... Çi zanim, heye ku...

Piştî ku bîst rojên min li Reqayê borîn,(hîngê ev bîst roj di çav min de bi qasî çend emhan dirêj xewinî bûn) ez çûm nik misteşarê Firansiz. Li ser rewşa xwe dûr û dirêj digel wî peyivîm. Gelekî bi xweşî û rûmetgîrî digel min peyivî. Min her tîşt li ser rewşa xwe jê re vekirî got. Piştî ku bi bendewariyeke çak axaftinên min bihîstin gote min:

-Ji roja ku tu hatiye vir em bi rewşa te mijûl dibin û me her tişt li ser te zaniye. Delegesiyona Helebê destûra min dide ku bêjim te:"Bi şertê ku bê haya me tiştekî nekî, piştî sê mehan hikûmeta Firanse alîkariya te ji xwe re deynekî edebî dizane. Her wekî ji hemî serekên eşîran re mehiyek tête dayîn, dê ji te re jî tiştekî hêja bête dayîn. Jê pê ve li ber ava Ferêt gundên emlak dewlê hene ku ji bo îsal wê du gundan bide te. Eger di nava du salan de te ava kirin, dê sê gundên din jî bide te".

Piştî ku hinekî rawestî û li navçava min baş nihêrrî ku şopa gotinên xwe tê de bibîne, bi ser ve got:

-Heya berî sê mehan eger tu hewceyî tiştekî bûyî dikarî werî bêjî min. Dê bibînî ku ezê bendewariyeke baş digel te rave bikim. Tenê ji bîra meke ku, divê careke din bê haya me tiştekî nekî.

Ez bi dilekî geş û hêviyeke çak linik misteşar bi derketim. Tenê ji gotinên wî tiştek ji min re xweş nehat ku ew jî daxwaza wî ya ku (bê haya wan tiştekî nekin). Ma qey bêbav dixwest ji bo dostanî û alîkariya wan ez dev ji dûş û armanca xwe berdim?!...

Bîst û neh rojên min li Reqayê borîn. Rojekê piştî roava ez li qehwexanê bûm, peyayekî hat gazî min kir. Piştî ku digel wî ji qehwexanê derketim gote min:

-Bozan beg Şahîn hiha hat Reqayê, bi lez dixwaze te bibîne.

Digel wî peyayî çûm nik Bozan begê. Piştî silav û pirsa halê hev kirinê got:

Partiya Xoybûn qerar da ku bi tevgerreke tevayî rabe. Roja yekê tîrmehê li ser pehnayiya sînorr we pênc cihan re dirêjî nava welêt bike.

Birrek di bin fermandariya Celadet de wê di Cizîra Botan re derbasî jor be. Birrê dudiyan di bin fermandariya Haco de derbasî nava Hevêrikan bibe. Cihê birrê sisiyan di bin fermandariya Ekrem Cemîl paşa de derbasî çiyayên Dêrikê bibe. Birrê çaran di bin fermandariya Mehmo lawê Ibrahîm paşayê Millî de derbasî Wêranşarê bibe. Birrê pêncan fermandariya me ye ku emê berê xwe bidin vegirtina Rihayê.

Hikûmeta Tirk hemî leşkerê xwe şandiye ser Araratê. Eger em bikarin Kurdan rakin şûreşê û paşpirriyê bidin leşkerê Mistefa Kemal, emê wan

şerpeze bikin û Kurdistan dê serxwe bibe. Partiyê tu dane eniya me û tê digel me derbasî nava welêt bibî. Çi dema em Rihayê vekin, li wir dê bikarî ji me biqetî û ji bo xwe eniyeke xweser vekî û pê berve Melatiyê herrî. Îro bîst û şeşê cehzerdan in (hezîran), ma dê bikarî piştî çar rojên din werî nik me?.

-Mafir ku partiyê gotiye dê bêm, dikarî pişta xwe bidî gotine min.

Bê ku bipirse ka heqê rêya min heye an na, xatir ji min xwest û çû Kaniya Ereban. Ji bo ku bi rê ve nekevim nav lepên Firansizan, roja 29ê mehê min otomobîlek xisûsî girt û pê çûm qirracê Berazan mala Emerê Qirêt û li wir bi siwarî çûm Mektelê mala Bozan begê.

Roja siyê cehzerdan(hizêran) ez gîham Bozan beg û Mistefa begê. Cihê ku ez li nik wan pêkhatineke xurt bibînim, min ji xwe pê ve tiştek ne dît!.. Piştî rojekê diviya bû em dirêjî nava welêt bikin. Çiqas ku di nava welêt de leşker nema bû jî, me dixwest şerrê hikûmeta Tirk bikin. Ma ji bo şerrekî holê xwe pêkanîn ne dixwest?...

Êvarê ez digel Mistefa beg û Bozan begê rûniştim ku li ser tevgerrê bipeyivin. Digel me du camêrên din jî rûniştin, min ji began zanî ku ew herdu peyayên partiya Taşnak in. Ew jî wê digel me bihatana serxetê. Min dît began kara xwe û tiştekî ne kiri bûn, her wekî li bende gazî, alîkariyek ne diyar bûn. Dixwestin bê kar û bar bi kireke mezin rabin. Piştî dan sitandin û peyivîneke dûr û dirêj Bozan begê got:

- Me hê xwe pêk neanî ye, îşev tu digel bîst û pênc peyan derbasî serxetê be û li qereqolên dora Ordiyê(Sirûc-navê qezakê li serxetê di nîveka eşîra Berazan de ye) xe, şevê tê emê bi ser Ordiyê de bigirin. Li wir dikarî bigehêyî me ku digel hev herin ser Rihayê. Min jî kir, gotin û tevgerrên wan baş nasî bû ku naxwazin derbasî ser xetê bin. Bi van gotinan xwe jî û min jî dixapînin; lê ji bo çI?.. paşê di birrê li pê vê de ezê bêjim. Dema min du dilî di gotinên Bozan begê de dît, min gotê:

-Di Ordiyê de leşker tine, ser û bin sî-çil jendirme di nava bajêrr de ne. Eger hûn sed peyayî bidin min ez dê îşev Ordiyê vekim. Bêguman dê hinek çek û posat jî di depoyê jendirman de bikeve destê me. Hînga hûnê bikarin bi gengazî derbasî serxetê bibin.

Gotina min ji Bozan begê re giran hat. Ne dixwest ku bê wî yekî din bajarrê pêşîn li welêt veke. Wî bi xwe jî ne dikarî bê dilxweziya Berazan derbasîserxetê bibûya. Mafir ku berê kara xwe û vê yekê ne kiribûn, hîngê di nava rojekê, du rojan û deh rojan de ne dikarîn pêkbînin. Ne mikûn bû ku Beraziyên serxetê bi hêsanî qîma xwe bi tiştekî holê bînin. Berê haya wan ji vê yekê tine bû, kara xwe û tevgerreke holê nekiribûn. Îro bi şandina reşbelekekê, Bozan begê ne dikarî wan razî bike ku

bêjin:"werin, em digel we ne". Ya ku li pêş me kirin diviya bû, bê dudilî derbasî serxetê bûn bû. Dema Berazê jor em serdestî hikûmetê bidîtana dê alîkariya me bikirana.

Lê Mistefa beg û Bozan begê ne berê haya Beraziyên serxetê li tevgerreke holê kiribûn û ne jî dikarîn wê gavê bê haya wan herin. Ji xwe di nava du-sê rojan de razî kirina wan li ser kireke holê qet ne mikûn bû. Herçiya bûyî, dema xeber dan axayên Berazê serxetê ku dikin di yekê tîrmehê de bi tevgerreke tevayî rabin, hinekan ji wan axan haya hikûmeta Tirk ji tevgerrê kirin. Wê çaxê li Rihayê tenê sed leşkerê siwarî hebû, ew jî bi lez û bez şandin Ordiyê. Bi vî awayî herdu kurrên Şahîn begê li bende bersiva Beraziyên serxetê mabûn. Ji lewre digotin min :'Tu herre qereqolên dora Ordiyê rake, heya em tên ser Ordiyê". Hêviya wan hebû ku di nava rojekê, du rojan de bersiva Beraziyên serxetê were!... Ew nehat û ne dihatin. Li bende hatina bersiveke welê mayîn ne karê eqilmandan bû. Cihê ku bersivê bidin hinekan ji wan haya Tirkan ji tevgerrê kirin...

Roja yekê tîrmehê bi êvarê re bîst û sê peya dane min ku pê derbasî serxetê bibim. Pirrtirî deh- diwanzde peya ji wan xortên ku di emrê xwe de şerr ne dîtibûn. Ên mayî çê û xerab dizanîn ku şerr û lêdan çiye. Dirêjiya emrê wan di dizî, talan û qaçaxiyê de borî bû. Nemaze ji wan herdu kurrên Xilfo Mistefa û mihêdîn du şerrevaniyên hêja bûn. Di şeva pêşîn de min pişta xwe da bû wan herdu camêran. Sê şevên ku em digel hev man, herduyan jî hêviya min di xwe de ne kuştin.

Di saet dehê şevê de tevî peyayên xwe li sînorr raperrîm. Herkes ji wan bi çek û posatên xwe hati bû. Fîşekên kesî ji wan têra şerrekî biçûk ne dikir. Di nava hemiyan de tifinga min tenê têrfîşek bû, jê pêve du bombeyên Elmanî ên bi destik jî dane min. Gava min ji bo tine bûna fîşekên peyayên xwe ji Bozan begê re got, bersiveke ecêb da min:

-Ji xwe sibe êvarê em dê bi ser Ordiyê de bigirin û li wir em dê hemî kêmiyên we saz kin.

Çi bersiveke hêja! Ma gelo ev mirov dê bi vî eqlî karibin gelê Kurd ji bindestiyê bi der xin?!. Piştî ku min ew bersiv ji Bozan begê bihîst, min tiştek da çav xwe.. Divê em çek û posatên neyar jê bistînin û pê şerrê wan bikin. Ji wê rojê de her û her ramana min ev e:"Divê em bi çekên neyar şerrê wî bikin".

Piştî ku em li sînor raperrîn û serekî dirêj bi nav erdê welêt de çûn, min hevalên xwe dane rawestandin da digel wan bipeyivim. Ew hevalên ku min kes ji wan nedinasîn û heya navê kesî ne dizanî. Bi dengekî nerm û germ min got:

-”Gelê biran! çiqas ku di navbera min û we de nasîneke kevin nîne jî, kurdîtî me bi girêkek xurt digehîne hev. Îşev ji bo rûmeta gelê Kurd û azadiya wî em diçin şerr. Neyarê me hikûmeta Tirk e û çekên me ne ewçend tikûz in. Lê gava em mêraniya di dilê xwe têxin ser çekên xwe ên qels, em û Tirk di her tiştî de dibin berberên hev. Gelê Kurd li her alî welêt hêvîne mezin ji we dike. Şehîdên Kurdan doza tola xwe sipartine mêrxasên welêt. Mêr bin da ku têkevin qorrê wan camêran. Ê bextiyar ji me ew e ku bi comerdî xwîna xwe bi ser axa welêt de birrijîne. Bimeşin Xwedê bi we re be”.

Van gotinan şengî û geşiyek xist cendekê hevalên min. Berî birbangê me xwe gîhand qereqola ku Bozan begê ji me re salix dabû. Peyamlî nahye bû. Midîrê nahyê tevî serekê qereqolê di rex gund de komek vegirti bûn û tê de razabûn. Qereqol bi qasî du kîlometran di roavayê gund de li gazekê ava kiri bûn. Tê de çar jendirme dinivistin. Me yekî gundî ji xew hişyar kir û ev tişt jê hîn kir. Ji ber ku di navamin û hevalên min de nasî tine bû min ne diwêrî wan bikim du ciyan û ji cihekî bi dûrkevim. Ji lewre li pêş min rêyek tenê hebû: an diviya bû ez bi ser qereqolê de bigirim, an jî bi ser midîrê nahyê û serekê qereqolê de. Cihê ku serî hebû min ne xwest berê xwe bidim lingan. Bê du dilî me bi ser kom de girt. Piştî şerrekî kurt me herdu jî destgepirr kirin û ji çek kirin. Bi dengê tifingên me re gund û qereqol hişyar bûn, tifing teqandin, lê kes bi ser me de nehat. Ji ber ku em hewceyî cihekî baş bûn ku tê de bikarin li ber xwe bidin, diviya bû em berî sibê ji gund derekvin..Midîr û serekê qereqolê kurd bûn û ji xelkê Sêwerekê bûn. Piştî me ew ji çek kirin, me hîştin û ji gund bi derketin. Bi rohilat re me xwe gîhand gazeke bi kevir. Eger li me biqewimiya me dikarî tê de li ber xwe bide.

Cihê me xwe gihandê bê nan û av bû; lê heya êvarê me dikarî xwe tê de biparêze. Ji bo şeva ku bê me qereqola(...) da bû ber çavên xwe, heye ku piştî rojekê her du kurrên Şahîn begê jî bi ser Ordiyê de bigirtana. Şeva din me bi ser qereqola de girt. Piştî şerrekî xurt û kurt yek jî bi birîn bû û yên mayî xwe sipartin me. Goreyî fermana ku Xoybûn dabû me her pênc jendirmeyên dîl hatin kuştin. Li wir em çûn gundê (....)ê tê de kelehek biçûk û kevin hebû, me dikarî xwe tê de biparêze.

Wê rojê min raporek li ser tevgerra xwe ya li ser her du rojên borî nivîsî û şand ji Bozan begê re û tê de qelsiya hikûmeta Tirk û meyla alîkariya şûreşê li nik Kurdan jê re bi ser û ber nivîsî. Paşê ji xelkê gund min du peya bi bergeha leşkerê Tirk de şand. Diviya bû heya berî roava ji min re herçiya hîn dikin bînin da ku bikarim pêş xwe bibînim. Berî êvarê

bi saetekê yek ji xelkê gund ku min bi bergeha leşkerê Tirk de şandî, hat û raporeke devpeyv[62] holê da min:

-”Tenê li Rihayê sed leşkerê siwarî mabû. Dema hikûmetê bihîst me li qereqola Peyamliyê daye, ew sed siwar bi rê xistin şandin Peyamliyê. Şeva çûyî we li qereqola (...)ê da, îro leşker hatiye gundê (...) di avahiya qereqolê de li bende tevgerra we ye”.

Hînga min jê pirsî:

-Navbera gundê ku em lê û qereqola ku leşker hatiyê çiqas heye?.

-Deh-diwazde kîlometir.

-Haya wan li cihê me heye?.

-Erê, Îro li deşta Berêz kes tine ku cihê we nizane. Hûn ne bi dizî, lê eşkere li vir dimînin.

-Ma geko dilxurtiya leşkerê Tirk çawa ye.

-Bi Xwedê kesek ji wan ne bawere ku heya sibê serê wî li ser cendek bimîne. Tirsê ew şerpeze kirine.

Piştî vê rapora devpeyv min hevalên xwe civandin serhev û digel wan peyivîm. Di nava van du rojan de hinekî nasî di navbera min û wan de çê bûbû. Jê pirrtir, baweriya me bi hev xurt bûbû, nemaze herdu şevên borî û serdestiya ku ketî destê me hevalên min sergerm kiribûn. Ji lewre bi baweriyeke xurt min gote wan:

-”Birayên delal! nûçeya ku ji me re hatî di Rihayê de tenê sed siwarî hebû, ew jî hikûmetê bi bergeha me de şandine û li qereqola(...) ê ne. Cihê qereqolê dûrî gund li gazekê ye. Avahî têra pêncî mirovî nake, ên mayî tevî hespan wê li der bimînin. Eger em bi ser wan de bigirin, nikarin xwe gorrî bikin. Herwekî ez bixwazim eger hûn xwe biêşînin, ez qenc bawerim ku emê îşev gelekan ji wan bikujin û yên mayî dîl bikin. Hînga rêya Rihayê li ber me vekirî dimîne. Ez bawerim ku hûn xwe ji vê rîsiya paniyê bi şûn de ne din. Hûn çi dibêjin”.

Hemiyan bi hev re got:

-Cihê tu herrî emê digel te bên, begên me welê gotibûn.

Min dît hevalên min ji bo kireke holê nefsiyên pêkhatî bûn. Mafir kurrên. Şahîn begê li pişt wan bûn, tirsa wan ji kesî tine bû. Bi êvarê re me xwe pêk anî ku li gund bi rêkevin herrin ser qereqola ku sed siwarî tê de. Li pêş me şerrekî xurt hebû û şevên havînê kin bûn divya bû em deqîqekê jê winda nekin û em zû herrin. Berî her tiştî xeta telefûnê bibirrin û paşê di her alî ve dirêjî ser qereqolê bikin. Derî avahiyê ne dikarîn xwe li ber me bigirin. Ji bo nava qereqolê, du bombeyên Elmanî

[62] Devpeyv: Bi dev gotin, şefehî.

ên dirêj digel min hebûn. Me dikarî bi teqandina wan di nav qereqolê de hemiyan şerpeze bike. Bi vê hêviya mezin em li gund bi rê ketin. Hê em kîlometrekê ne çû bûn ku peyayê min şandî cem Bozan begê vegerrî û xwe gîhande me. Bi gotinekê raporra xwe da:

-"Berî ez xwe bigehînim ser began, Firansizan her du jî girtibûn û şandibûn Helebê".

Wek bombeyek di nava mêjûyê min de biteqe. Gava herdu beg hatin nava xwe eniya ku ez tê de dixebitîm ket mir. Bê heyîna began Berazan şerr ne dikirin. Ên digel min jî dê terka min bikirana. Min xwest, herwekî min nebihîstiye, an ne ewqas bi ehmiyete, heya hevalên min sist nebin;lê ev yeka han li ser wan nemeşî û lingê xwe dan erdê rawestîn. Hemiyan bi dengekî gote min:

-Began em digel te şandin, îro ew hatin girtin, nema em digel te dimînin. Eger ne beg bin kî me ji şerrê Firansizan biparêze?

Hêlekê heq di destê wan de hebû kesek ji wan bi ramaneke welatî digel min nehati bû. Began ew şandi bûn, dema beg hatin girtin nema digel min diman. Eger hevaliya wan digel min mehekê dom kiriba, ez bawerim ku terka min ne dikirin. Hevaliya du rojan mirovin nezan bi min ve girê ne didan. Ji lewre hemiyan xwe ragirtin û gotin naxwazin digel min biçin, nekirin. Tenê her du kurrên Xilfo Mistefa û Mihyedîn digel min man. Piştî ku hemî hevalên me berê xwe dane Sûriyê û ez li ser pişta mehînê mat û bê mefer guhdariya dengê ku ji lingê çûyiyan tê dikim, Mistefayê Xilfo gote min:

-Em herdu bira dest ji te nakin. Te kî der divê em digel te tên.

Bi du peyan min çi dikarî bikim, nemaze piştî ku her du kurrên Şahîn begê hatin girtin... Paş ji tirsa Firansizan min ne dikarî vegerrim Sûriyê jî. Bê gûman vê carê eger ez biketama destê Firansizan, dê gelek ez biêşandama. Ji lewre min ji kurrên Xilfo re sipas kir û berê xwe da bakurr û bi nav welêt de çûm.

Min rê ne dinasin, tenê eger ez heftê kîlometir ber ve bakurr û roava biçûma min dê xwe bigehanda erdê Bozhewayê ku çiyayê Qorçik di nav de ye, û di nav û kûntarra wî de du gundên me hene. Jê pê ve li dora Qorçik min çend gund dinasîn ku di hinekan de min dikarî veşirim.

Berî ku ji herdu kurrên Xilfo veqetim, ji min re nîvê rê yê pêşîn salix dan. Paşê di kûna Qirrêc de girekî mezin hebû, ji bo koça rê ya pêşîn ew ji min re kirin armanc. Gotin ku ji gir wê de qereqolek Tirkan heye divê ez xwe li ser bidim alî. Saet şeşên êvarê bûn ku min xatir ji Mistefa û Mihyedîn xwest û berê xwe da bakurr. Piştî ku serekî dirêj çûm, di dora saet nehan de ez nîzikî gir bûbûm ku rêya min di ber gendekî re diborî.

Gund li alî rastêyî rê bû, li alî çepê li pêş gund konekî vegirtî bû û tê de roniya agir dixewinî. Ez gelekî tî bûbûm û cigare jî digel min nema bû. Eger min li wir av vexwara heye ku heya sibê avneketa destê min, ji lewre min berê hespê dagerand ser kon. Bi dengê çeq-reqa lingê hespê re seyên gund reyiyan û xwediyê kon derket derve da siwarê ku tê ber malê bibîne. Ser û pêça min tiştekî têvel bû, cilên li min yê leşker û çefî eqal li serê min bû ku qet bi hev nediket!... Hîngê li nava Tirkan çi kesê şebqe ne li serî ba, ew biyanî dihat nasîn.

Min silav da xwediyê kon û tasek av jê xwest. Camêr av ji min re anî, hê tasa avê di destê min de bû ku dengê du mirovan ji hêla gund ve tûj hat û dipirsîn:

-Ev kî ye law? zû xwe bide nasîn...

Ji zaravayê wan xuya bû ku ew dest bi tifingin û xêr di rûyê wan de nîne. Qelsiyek biçûk dikarî ji min re gelek west çar bike, nemaze min rêya xwe jî ne dizanîn. Bi dengekî xurt; lê bi zimanê Tirkî min qîrrek da wan:

-Kurro vir de werin!

Qîrra min şopeke kûr di canê wan de hişt. Dema bihîstin ez bi Tirkî peyivîm dest ji ber xwe berdan û bi sernizmî hatine nik min. Du peyayên tifing li dest, yek keyayê gund û yê dî pandî bû. Careke din min bi Tirkî ji wan pirsî:

-We çi divê?

Xuya bû bi Tirkî ne dizanîn, bi kurdmancî li min vegerrandin û gotin:

-Hikûmetê çek li me belav kirin û emir da me ji bo em şerrê Osman Sebrî bikin.

Hînga min bi kurmancî ji wan pirsî:

-Ma hûn Osman Sebrî nas dikin?

-Em wî nas nakin; lê hikûmet dibêje mirovekî eşqiya ye, divê bête girtin, an bête kuştin.

Çiqas rebenî û nezanî! Hînga min bi zaravakî xêrxwaz gote wan:

-Law hûn şaş in. Osman Sebrî ne eşqiya ye, ew jî wekî min û we Kurd e û doza heqê me Kurdan dike. Ez li vê qereqolê jendirme me. Çi roja bibhîsim ku we dest avêtiye Kurdekî hûn ji destê min nafilitin. De zû yek bidin pêş min em herrin qereqolê.

Ez baş dizanim ku mêrê kurmanc ji çûna qereqolê kiz dibe û ditirse. Wan bawer kiri bû ku ez ji qereqolê me. Bi dengekî tirsok û lavekar gotine min:

-Efendî me tu nas nekirî û li qusûra me ne nihêre. Paşê em jî Kurdin; lê ji tirsa xwe van tiştan dibêjin.

-Ma kî we re dibêje dakevin ser rê û pirsa ji rêwiyan bikin? Xuyaye hinek teresî di we de heye. Zûka yek bidin pêş min û rêya qereqolê pêş min kin.

Pandî ket pêşiya min û em bi rê ketin. Birina yekî digel xwe ez ji şikê bi dûr dixistim. Bi rê ve ez digel wî peyivîm û min baş pê da bawer kirin ku ez yek ji jendirmeyên qereqolê me, çi dema ne qenciya kurdekî bikin ezê wan biêşînim. Piştî ku em nîzîkî qereqolê bûn min pandî berda vegerrî gundê xwe ez jî ji rêya qereqolê derketim û min berê xwe da bakurr û rohelat.

Serekî dirêj ez çûm, nizanîna rê gelekî ez diwestandim. Hin newal û gelî diketin ber min ku bi saetan min ne dikarî jê derkevim. Tevî xurtiya hespê û leza ku pê diçûm, sibe nîzîk dibûn û hîn ez negihabûm erdekî nas. Piştî ku dinê ronî bû min erd nasî, ez nîzîkî gundê çixreşiyê bûbûm. Berî rohelat bi hinekî ez gîhame nava gund û di mala Henîfî de bi cih bûm. Wê rojê min rihetiya xwe li wir dît û êvarê min berê xwe da çiyayê Qorçik, gundê me ku di navçava çiyê de.

Mehên tîrmeh, tebax û êlûnê min li Bozhewayê derbas kirin, pirraniya van hersê mehan ez li gundên Îstaxulla û Qorçik bûm. Xuya bû di nava van her sê mehan de leşkerê Turk Ararat safî kiri bû ku lek bi lek ji rohelat vedigerrî. Çi cihê ku seriyekî hişk tê de mabû bi ser de digirt û dipelaxt. Di meha çirriya pêşîn de bi ser eşîra Qeregêçiyan de digirt û serekê wê Evdilqadirê kurrê Dirê'î tevî birrekî eşîrê ber ve Sûriyê dirrevand. Berî ku dor were min divya bû ez ji Bozhewayê derkevim. Haya hikûmeta Tirk bûbû ku ez li Bozhewayê me, bi jendirman nedikarî bide pey min û leşker tev li rohelat bû. Piştî vegerra leşker dikarî êrdima Bozhewayê tev bide ber xwe û gund bi gund vello bike. Ji bo derketina min ji vê êrdimê min ji hevalên Rihayê re nivîsî û şêwra wan xwest. Piştî çend rojan Cewherî zade Hacî Emer bersiva min da, digot:

"Reş ne baş e, di welêt de mikûna veşirînê teng û dijwar dibiye. Berî rojekê divê tu vegerrî Sûriyê; lê ne di rêya ku tê re hatî re, ji ber ku ew êrdim gelekî hatiye êşandin. Li ser rêya Dûgerîna here mala Mihemed axa ew dikare te bigehîne cihê ku dixwazî. Gava diçî Sûriyê dikarî Elî efendîyê Sêwrekî li Til-ebyed bibînî û ew dikare rê li pêş te rast bike".

Mihemd axayê Dûgerînê ji eşîra me Mirdêsan bû û di çend bavan de li nava Dûgerînan bi cih bûbûn. Min gelek dixwest ku li ser destê wî herrim. Jê pêve Elî efendî ji hevalên me ên pêşdetir bû û min nedinasîn. Bi ser de tiştekî malbatî keti bû navbera me diviya bû nemîne. Dawiya meha çirriya pêşîn digel siwarekî ez çûm nav Dûgerînan mala Mihemed axa. Mala wî di gundekî biçûk de digel du biraziyên xwe tê de rûniştî bû.

Dema ez gîham gund ji Mihemed axa pê ve kesek ji siwaran di gund de ne ma bû, hikûmetê hemî digel leşker şandi bûn ser lawê Dirê'î. Mihemed axa jî tevî ku pîr bû gelek kûnêr jî li ranê wî derketi bûn nema dikarî li ser xwe rûne, her deverû vezeliyayî bû. Bi dilekî geş ez hewandim û gelekî kêfa xwe ji min re anî; lê di wî halî de nedizanî yê çawan alîkariya min bike. Dema min jê re da zanîn ku dixwazim di Til-ebyed re derbasî Sûriyê bibim, got:

-Herdu biraziyên min digel siwarên gund tevî leşker çûne ser lawê Dirê'î. Tevî em yarên wî ne, nikarin li pêş hikûmetê bêjin: em naçin ser". Ez jî di vî halî de me û nikarim siwar bim. Ya çaktir ew e ku tu li nik me rawestî heya siwarên me li nav Qeregêçiyan vedigerrin. Evdilqadir ji welêt derket çû Sûriyê, ne dûre ku siwarên me di van du rojan de vegerrin werin mal. Dema bên ez dê biraziyê xwe Elî digel te bişînim, ew dizane çawa te bigehîne cihê ku dixwazî.

Me ne dizanîn ka siwarên wan çi gavê tên. Min baş dizanîn ku Elî efendiyê Sêwrekî li Til-ebyed li bende çûna min e, ji lewre min ji çûnê kir lez. Ji ber leza min Mihemed axa milêbayekî xwe digel min şand nav Gêzan gundê Xoriz nik Cibirî Kurrê kurrê Hebeş, û ew jî min bigehîne mala Şêx Casim ser sînorrê Sûriyê. Li wir min bi gengazî dikarî herrim cihê ku dixwazim. Cibirî kurrê dostekî Mihemed axa bû, bawer dikir ku dê gelek tişt ji bo min bike.

Roja din êvarê ez digel milêbayê Mihemed axa çûm gundê Xoriz mala Cibirî. Dema xatirxaziyê Mihemd axa got:"Eger Elî sibe were dê li pey te bişînin. Wê şevê piştî nîvşev em gîhan Xoriz. Cibirî bi xweşî ez hewandim. Roja din bi nîvro biraziyê Mihemed axa Elî jî xwe gîhande ser me û careke din temiya min li Cibirî kir. Bi ser ve gotê:

-Eger tuyê nikaribî digel wî herrî ev e ez hatime ku wî bigehînim mala Şêx Casim.

Piştî ku Cibirî bi dil û can xwe da ber min Elî taştê digel me xwar û çû. Wê sibê berî birbangê li nav Qeregêçiyan hati bû mal. Mihemed axa ne hîşti bû ku vehêse û li pey min şandi bû heya Cibirî qedra min çêtir bigire.

Herwekî min û Cibirî me di navbera xwe da tifaq kiri bû berî roava bi saetekê em dê bi rêketana. Serêvarê min xist bîra wî ku kara xwe û çûnê bike, min dît ku Cibirî sist bûye, got:

-Hespa min nîne ku lê siwar bim. Eger hespekê ji bo min kirê bikî dê digel te bêm.

-Dema ez hatim siwarek digel min hebû û min ew vegerrand. Paşê Elî hat û çû, te çêla tine bûna hespê nekir. Niha dema çûnê bû tu dibê hesp tine!.. Tevî wê tu dikarî li ser hesabê min hespekê kirê bikî.

Panzde lîreyên Turk xwest min danê û çû ku hespê bîne da em bi rêkevin. Êvar bû, ro çû ber ava, hê Cibirî nehati bû. Min yek şande pê, nehat û yekî din li şûna xwe şandi bû cem min gotibû ez nikarim herrim. Hat bîra min ku dixwaze bi vî awayî peran ji min bixwe. Li ber vê ramanê nema min karî xwe ragirim. Paşê rextek fîşekê zêde digel min hebû, goti bû ku ew ê di ber min ve rake. Gava çû hespê kirê ke rext xist ustiyê xwe û çû. Min rextê xwe jê re ne dihişt. Ez li hespê siwar bûm çûm ber derê mala ku Cibirî lê ye. Bi zaravayekî tehl min gotê:

-Min ne dizanîn ku tu evqas tirsok û derewînî. Zûka rextê min bide ez diçim.

Rext ji ustiyê xwe derxist û tevî panzde lîreyên Tirk da destê xortekî ku bide min. Min rext sitand û pere hişt û gotê:

-Ev heqê nanê te ye. Ez naxwazim mineta mirovekî tirsok li ser min bimîne. ? min pê bi hespê da na û berê xwe da dûşa Herranê. Ez di deşta Heranê de bûm, bajarrê Herranê bîst k.m di nîvroyê min de û çiyayê Sûmeterê bîst û pênc k.m. di bakurrê min de bû. Ji du mehan de leşkerê Tirk ew ji xwe re kiri bûn leşkergeh. Çiya tijî leşker bû, taqim derdiketin gundên dora çiyê û velo dikirin. Ji çekan û fîraran digerrîn, nemaze yekî ji êrdimê biyanî bidîtana ber nedidan.

Piştî ku rêberê min Cibirî teresî bi xwe de anî, min da çav xwe ku wê şevê bi tena Herranê dip dûz û gundên wê ewçend nîzîkî hevin ku ji gundekî bankî dengê mirov digehê sê-çar gundên dorê. Ji bo ku rê şaş nekim min berê xwe da çirayên Herranê û bi rê ketim. Piştî ku bigehîştana Herranê min dê pişta xwe bida çirayên bajêrr. Welê min dikarî bê dijwarî xwe bigehînim Sûriyê.

Piştî ku ez bi rê ketim bi saetekê baraneke hûr berdayê, dinê tingitarî bû, ji çirayên bajêrr pêve tiştek ne dixewinî. Çiqas ku baran ne şên bû jî hê cilên havînê li ser min bûn ne dikarîn min ji sermayê biparêzin.

Hesp xurt û rehwan bû, min bê dilovanî dajot, da berî saetekê bigehêm cih. Nemaze ez bê şîv û hespa min danê êvarê tiştek nexwari bû. Bi wê lezê di nava du saet û nîvan de ez gîham bajarrê Herranê. Dûrî bajarr bi du k.m an min da rohelatê bajêrr û berê xwe da nîvro, holê çiyayên bajêrr ketin pişta min. Navbera min û sînor sî k.m. mabû û li pêş min deh saet şev hebû. Min dikarî bi wê lezê di nava çar- pênc saetan de xwe bigehînim sînorr, ji lewre ez bê şayîş diçûm.

Dirêjiya şevê baran wek xunavê hûr hûr dibarî. Şev ewçend reş û tarî bû ku serê hespê yê gewr di min ve ne dixewinî. Serekî dirêj ez welê çûm. saet deh, diwazde, yek, du piştî nîvşev bû hîn ez ne giha bûm sînorê Sûriyê. Bi wê leza ku ez pê diçûm min di wan deh saetan de dikarî sed kîlometir bibirre. Bê gûman ez pirrtirî sed k.m. çûbûm, dîsa jî negîha bûm sînor. Hîn serekî din çûm, berî birbangê saet çar bûn ku min dît hesp di hevrazekî de dimeşe; hînga min bîra bir ku rêya min şaşe. Zûka ez ji hespê peya bûm, heya dinê ron be û dora xwe bibînim.

Ji saet pêncên êvarê haya çarên sibê ez bi lez çûbûm. Di nava van yanzde saetan de ez û hesp bi hev re westiya bûn, nemaze hesp di xûydanê de bûbû av. Min dixwest berî ku ro derkeve hinekî xewa xwe bişkênim, heya bikarim bi ro bimeşim. Baran hîn welê sivik dibarî û ba jî sivik sivik dihat. Min heqîba xwe li ser pişta hespê danî, aliyek da bin xwe û aliyê din sa ser sînga xwe û rûniştkanî, nivistim. Ez gelek westiya bûm ku zûka di xew ve çûm. Gava min çavên xwe vekirin dinê ron bûbû. Bi nêhrînekê li dor aliyên xwe min rewşa xwe ya pîs nasî. Ez bi şûn de vegerriya bûm çiya Sîmeterê, leşkergaha Tirkan. Kurd dibêjin:”Dema ecelê yekî tê, bi lingên xwe ber ve goristanê diçe”. Xuya bû ecelê min hati bû ku ez bi lingên xwe çûbûm rex leşkergaha neyar.

Ji serman diranên min dirikrikîn, xuya bû ji serma ez hişyar bûbûm. Diviya bû berî rohilat ez çareke serê xwe bibînim. Min da xwe û rabûm, cendekê min wek yê marê tevizî tev ne digerrî, xuya bû sermayê ez hingavti bûm. Min heqîb da ser pişta hespê û serê wê kişand ku bi rê kevim. Çiqas min hefsar kişand hespa min di cihê xwe de tev negerrî. Min li ber da, bê fêde bû, ne dikarî lingê xwe bilebitîne, hînga min zanî ku hespa xudayî li ber sermayê li hev gerriye.

Li kûntarra wî çiyayê ji dar û keviran rût, di ber de li wê berriya dirêj û fireh ji wê hespê pê ve di destê min de tiştek tine bû ku pê ji leşkergaha dijmin bi dûr kevim, ew jî welê li hev gerriya!.. Ma gelo di wê rewşê de min dikarî çi bikim?.. Hêdîka ez di ber bêvila hespê de rûniştim û min cigarek vêxist; heye ku hinekî hişên min ên belav bicivandana ser hev. Piştî ku dûyê cigarê xew ji çavên min bi dûr xist, tiştê ku kirin mikûn bû min kir. Hêdî hêdî min dest û pîlên hespê mist dan, heye ku hinekî vebûya.

Heya piştî rohelat min xwe bi mist dana dest û pîlên mihînê mijûl kir. Hinekî ez germ bûm û mihîn jî piçekî ji hev ve bû. Êdî dikarî bi dijwarî hêdî hêdî bimeşe. Min serê wê kişand û berve rohelat derketim gazekê heya baş doraliyên xwe bibînim. Ez di rohelat û nîvroyê Sîmeterê de

bûm, ew çiyayê bê zinar û kelem û dar û ber ku kêwroşkekî ne dikarî tê de xwe veşêre.

Di rohelatê min de bi qasî şeş- heşt gundan li pêş min hebûn. Heke min bikariya bi selametî ji wan gundan derbas bibûma, di erdê berriyê de heye ku heya êvarê ez bigihêştama sînorrê Sûriyê. Heya ez di çiyê de daketim min serê hespê girt û li pey xwe kişand, gelekî hêdî dimeşîm. Dema gihaştim deştê ez siwar bûm û di navbera wan gundan re derbas dibûm. Baran sekinî bû û ro ji bin ewran derketi bû. Hin bi hin mehîna min li meşê ve dibûn.

Du gundên dawiyê ma bûn ku ji êrdima leşker derkevim û bigehêm erdê berriyê. Li berriyê ji ereban pê ve kes ne dihat dîtin û min hesabê wan ne dikir û dê bi rihetî ji sînorrê Sûriyê derbas bibûma. Gund gelekî nîzîkî hev bûn û çarmedorî malan jî komê reş vegirti bûn, dema ez di navbera wan re derbas dibûm seyên herdu gundan tev bi min de dirreyîn. Dema ez di navbera herdu gundên paşîn re derbas bûm min dît çar siwar ji aliyê berriyê ve dihatin gund. Yek ji wan veqetî û hat silav li min kir, pirsî ka berê min kû de ye. Min jê re bi erebiyeke şikestî da zanîn ku berê min li mala şêx Casim e. Hînga bi zimanekî nerm got:

-Ez dibînim hespa te gelekî westiya ye, dixwazî keremke were malan rihetiya xwe bibîne, bila hesp vehêse, êvarê dikarî herrî. Hîngê heye ku yek ji me digel te bê û te bigehîne mala Şêx.

Min jê re sipas kir û gotê:

-Mala te ava, ez bi lez im divê zû herrim.

Lê a rast hespa min ne dikarî zû herre. Westa şeva borî ji rûyê min û mehînê xweş diyar bûn. Paşê kesî ne dîti bû ku yek li ser navê mala Şêx Casim herre û mêrê Ereb bi ne qencî lê binhêrre. Careke din got:

-Tu bi dilê xwe yî; lê eger bi ya min bikî dê peya bî, tu û mehîn vehêsin, paşê dikarî herrî.

Ji gotinên wî ez ne ketim şikê. Gava min dît bi zêdeyî nakeve pey min dilê min lê rûnişt û min berê hespê bada ser konan û digel wî çûm peya bûm. Yên ku westên direj û bê xew mayîn dîtine dizanin çi west digehê mirov. Piştî em peya bûn wî got:

-Leşker pê de li nava van gundan digerre. Ne dûre ku vê gavê jî hinek bên nav konên me. Ji lewre tu derbasî aliyê jinan be û razê da kes te nebîne. Dema bû êvar ez dikarim te bigehînim mala Şêx Casim.

Vê gotinê hîn pirrtir dilê min rihet kir. Ez derbasî aliyê jinan kirim, bi destê xwe ji min re nivînek danî û ez nivistim. Min heqîba xwe danî bin serê xwe û tifing xist hinbêza xwe. Heya piştî nîvro ez di xew de mam. Gava mêvandarê min ez ji bo xwarina taştê hişyar kirim, cendekê min ji

westa pirr xilas bûbû. Ji bo xwarinê em çûn aliyê mêran. Peyakî rîtilxir, cilpak tevî çend ereban rûnişti bû. Ji min re da nasîn û got:"Ev şêxê me ye". Min silav lê kir û rûniştim. Piştî hinekî xwarin anî, pezek gura bû, xwarin baş û têr bû. Me taştê xwar, ew digel hev bi erebî dipeyivîn. Nemaze zaravayê bedewiyan, min tiştek jê fehim ne dikir. Digel me bi qasî diwazde peyan nan xwarin. Piştî ku sifre rakirin yekî ji wan xwest tifinga min bibîne. Nedihat bîra min ku ew di mala xwe de bêbextiyê bi min re bikin. Dema bixwestana gava ez di xew de bûm dikarî bikin. Ji lewre bê dudilî min tifing da dest. Tifing nuh û gelekî xweşik bû, serekî di dest hev de gerrandin. Piştî ku ji min bi dûr ket, yekî ji wan pirsî:

-Ma tu ne ji Qeregêçiyanî?

Min dizanî ku di navbera wan û Qeregêçiyan de neyariyeke mezin heye. Min lê vegerrand:

-Na, ez ji Bozhewayê me.

-Belê tu ji wan î û dijminê me yî, ji lewre em tifinga te nadin û dê te bişlînin.

-Çawan hûnê di mala xwe de min bişêlînin û ez mêvanê we me?

Bi vê gotinê re yekî ji hember got:

-Şeşar digel wî ye, jê bistînin.

Bi gotina wî re herduyên di rex min de, her yekî ji alîkî bi milên min girtin û ez velo kirim. Digel min şeşareke barabello nuh he bû. Sed fîşek û heşt şeh digel bûn, tev ji min sitandin. Bê ku li ber xwe bidim min şeşar bi dest wan ve berda, paşê kîsê peran jî vala kirin û kîs li min vegerrandin. Di nava diwanzde peyayên çekhilgir de min dikarî çi bike? Ji gotinê pê ve tiştek ji destê min ne dihat, ew jî min bê kêmanî kirin.

Min bi erebî ne dizanî, tenê di wê meha ku li Reqayê mabûm de min çend gotin hîn kiri bûn; lê min ne dikarî pê bipeyivim. Di nava wan de yekî xweş bi kurmanc dizanî, çûn ew anîn ku di navbera min û wan de bibe terciman, hemî gotinên min bê kêmanî ji Şêx re digotin. Ew gotinên ku hîngê min ji koza dil kirin hemî nayên bîra min. Tenê gotinên ku heya îro di bîra min de mane ev in:' Li nik me Kurdan hatibû nasîn ku bextê ereban baş e; lê ez dibînim bextê we tine, hûn di mala xwe de mêvanan dişelînin. Min li welatê xwe gelekî qencî bi ereban dikir, gava ez ketim nav wan, hemberê qenciya xwe kêmanî û bê şerefiyê ji we dibînim. Her yek ji me di ber xwe ve fedî dike û xwe camêr dizane. Şerme ku hûn min di mala xwe de dişêlînin. Çekên min bidin destê min, ezê ji nav konan derkevim, werin pêşiya min, eger we karibû min ji çek bikin, hîngê kes kêmiyê naxe derê derê we. Lê holê bi bêbextî, di nava zav û zêç de mêvan şêlandin ne karê mirovê bi rûmet e...".

Yekî ji erebên rûniştî got:

-Nebî hûn çekên wî didinê. Bi xwedê ev jî yekî wek Husênê Qenco ye. Gava tifing di destê wî keve hemî Gêsan pê nikarin.

Hînga min gotê:

-Ma ev e mêraniya we Gêsan ku mêvanên xwe di mala xwe de bişêlînin?!... Ez ecêb dimînim gava hûn ev pîs bin, çawan jinên we qîma xwe tînin ku di cem we de razên?

Di navbera aliyên mêran û jinan de perdeyek hebû. Gotinên min bi temamî dighan guhên jinan. Hîn gotin di devê min de bû ku dengek ji aliyê jinan hat; lê min tiştek nezanî. Tu neçû, min dît jina xwediyê malê tifinga mêrê wê di dest de û doxhefsarê mehînê kişand û hat pêş aliyê mêran û got:

-Were birayê kurd ev e ji te re hesp û tifing, siwar be ez bibînim, ka ev segên han dikarin te bişêlînin?. Ev ne camêr hîn bûne xelkê di mala xwe de bişêlînin.

Min da xwe û rabûm ku tifingê ji destê jinikê bistînim Xûn ketibû çavên min, eger destê min bigihêşta tifingê bê raman min dê li wan dana. Lê zûka sê çar kes ji wan rabûn ez girtim û şêx jî rabû ku jinikê aş bike. Jinik gelekî tehl bûbû, wek mirêdê ku bi cezbê dikeve di serî de heya bi lingan dilerizîn, bi zaravakî jehrîn gote şêx:

-Min bawer ne dikir ku bê şerefî bi we re gîhabe vî warî! Min gelek caran dibihîst ku hûn biyaniyan dişelînin. Lê min ne dizanî ku hûn bi fena û bêbextî holê camêran ji çek dikin. Eger hûn mêrin bihêlin bila çekên xwe hilgire û li nava konan derkeve, gava we karibû jê bistîne hînga ezê bêjim hûn mêrin...".

Ew Erebê ku bi kurmancî dizanî li ser min xeyidî bû hemî gotinên jinikê ji min re bi Kurdmancî digotin. Rengê şêx zer bûbû û ji şerman û xeydan dest dilerizîn, rabû pêşiya jinikê û gotê:

-Hêdî hêdî bipeyive û selewatan li pêximber bîne. Her tişt gava xera bû, dikare çêbe.

Paşê berve jinikê çû û ji me bi dûrket, nema dengê wî dihat me. Xuya bû dilê jinikê xweş kir ku hesp û tifing vegerrandin û çû aliyê jinan.

Erebê ku bi Kurdmancî dizanî gote min:

-Ev bêbav in , eger ne ji jinikê bûya heye ku cilên te jî ji te bikirana. Lê niha şêx gote jinikê nema mehînê ji te distînin.

Gava şêx dilê jinikê xweş kir û vegerrand, hate cem me û bi rûyekî geş got:

- Em mehînê ji te re nastînin, dê îşev digel te mirovekî bişînim wê te ji sînor derbas ke. Ev e dê ji pereyên te xerciyekê jî bidim te da dilê te xweş bibe.

Bi derxist sê zêrr û çend mecîdî dane min û yên mayî tevî tifing û şeşarê digel xwe hîşt. Bê çek çawan ezê ji sînor derbas bibûma?... Digel min hingulîskek zêrr, qaşê wê yaqût mabû ku bi min re ne dîbûn ku bistînin. Min ew bi derxist û tevî hersê zêrran dayê û gotê:

-Ez bê çek nikarim ji sînorr derbas bim. Ev hingulîsk hêjayî du-sê tifinga ne. Bila tevî peran ji te re be û ji tifing û şeşarê yekê bide min.

Dema çav bi hingulîskê ket rûyê wî geş bû, ji dest min girt û xist tiliya xwe, careke din her sê zêrr li min vegerrandin; lê çek nedane min. Hînga min zanî ku gustîr jî belaş li ser çekan de çû. Ji min re gotin wê êvarê min bi rê kin. Min navê şêx pirsî gotin :(Mistefa Xelef)e ; lê paşê min zanî ku navê wî Mistefa Salih e.

Ber êvarê siwarek digel min şandin ku min bigehîne sînorrê Sûriyê. Şev ron û ezman ji ewran vala bû. Eger şeva berî wê holê safî bûna, min rêya xwe şaş ne dikir û ne diketim destê van bêbavan.

Erebê ku digel min şand bê çek bû, lê bi dest û lepê ji min gelekî xurtir bû, bêhna bêbextiyê ji her tiştî wî dihat. Piştî ku serekî em çûn got:"were em livir razên, berve sibê emê herrin". Min dît ew jî dixwaze mehîn û cilan ji min bistîne. Ji darekî pêve digel wî çek tine bû; lê bi min re kêreke hêja hebû. Gava bixwasta bela xwe di min bide min dikarî bi wê kêrê li ber xwe bidim. Li nik wî razan xwe kuştin bû. Ji lewre min gote:"vegerre mala xwe, ez digel te naçim.

Erebê bêbav serekî rawestî û li min nihêrrî. Min dizanî ew çl di ber dilê xwe re dibe û tîne. Min kêr di berîka xwe de derxist û raveyê kir û gotê:

-Tu bê çekî û digel min ev kêr heye, ji lewre bi min nikarî. Yalla vegerre herre mala xwe, ez ne hewceyî te me.

Min berê hespa xwe da berriyê û ajot. Min rê baş nasî bû. Çiqas ku mehîna min ne dikarî baş bimeşe jî, hinekî ji hev ve bûbû. Holê min terka rêberê xwe da û wekî ez dizanim ez çûm.. Eger mehîn baş ji hev vebûbûna wê şevê min berî ku birbang bibe dikarî bigehim sînorrê Sûriyê. Bi wê meşê ez dirîjiya wê şevê çûm, roja dî bi nîvro ez gîham sînorr.

Wê çaxê wek îro ser sînorr ne ewqend parastî bû. Di hêla beriyê ve ne dewriye û ne jî qereqol he bûn. Roja din bi nîvro gava ez ji sînorr derbas bûm kesekî ez ne dîtim. Min berê xwe da roava û di ber rêhesinê re heya ser êvarê hatim Til-ebyedê.

li Eynarûzê bi navê Migirdîc yekî fille hebû wekîlê Elî efendîyê Sêwrekî bû. Diviyabû ez herrim cem wî ku min bibe nik Elî efendî. Dema ez çûm Reqayê min Migirdîc nasî bû, berî roava bi saetekê min xwe gihandê. Ji westan û birçînan ez û mehîn di hal de keti bûn, min rewşa xwe bi çend gotinan jê re salix da. Zûka ji min re xwarin anî, min têr xwar, paşê ez birim gundekî ereban di bin Eynapûzê de heya ez Elî efendî bibînim. Li Til-ebyed û leşkerê Firansiz gelek bûn û ez jî ji aliyê Firansizan ve dihatim xwestin, ji ber vê yekê Migirdîc ez birim gundê ereban. Wê şevê û roja din heya piştî nîvro min û hespê li wî gundê ereban westa xwe revand. Piştî nîvro Migirdîc hat ez birim nik Elî efendî. Serekî ez digel wî peyivîm, û çawan Gêsan ez şelandibûm, min jê re salix da. Paşê gote min:"Divê tu herrî nav eşîra 'Inizan mala Michim kurrê Mihêd cem Evdilqadir kurrê Dirê'î, heya ka çi dibe".

Rewşa min gelekî dijwar bû. Firansizan hemî hevalên min ku bi tevgerrê rabûbûn surgûnî Şamê kiri bûn û bi germî li min digerrin. Hîngê eger ez biketama destê Firansizan mikûn bû ez bi êşandana. Ji lewre gerrên min di nava Sûriyê de gelekî veşartî û çavekirî bûn. Wê êvarê çareke din ez digel Migirdîc çûm wî gundê ereban ku navê wî ne di bîra min de ye. Sibetirê digel rêberekî ez çûm gundê Hemamê nava eşîra Tirkmanan û li wir roja dî çûm mala michim.

Mala Michim li berriyê bû û ew bi xwe ne li mal bû, çû bû Helebê ku çavê xwe derman ke Evdilqadirê kurrê Dirê'î jî ne li wir bû, ew jî çû bû Tirkiyê ku jin û zarrokên xwe bîne. Lê çend siwarên wî li mala Michim bûn, min ji wan pirsî, gotin:"Ev bûye sê ro ku Evdilqadir çûye welêt ku jin û zarrokên xwe bîne, wê di nava heftekê de vegere.

Piştî sê-çar rojan şevekê ber ve sibê Evdilqadir tevî jin û zarrokên xwe û yên peyayê xwe hatin erdê Sûriyê. Digel wî sî mal tevî kon û dewar û hêştirên xwe hebûn. Tenê pezê wan di destê leşkerê Tirk de mabû û nema karîn xilas kin.

Gava mala Evdilqadir hat, ez çûm mala wî û digel wî rûniştim. Camêr gelekî qedra min digirt; lê ramanên me gelekî dûrî hev bûn û ne mikûn bû ku rojekê ji rojan di warekî debigehên hev. Tevî vê yekê min kêsa tiştekî ji xwe derbas ne dikir û her gav dixwest berê wî bidim xebata welat. Lê tewş bû, hemî westa min vala diçû, gotinekê ji gotinên min di serê wî de cih ne digirt.

Evdilqadir bi destê xwe mêrekî xurt bû. Hemiyan bi çavê lehengekî lê dinhêrtin. Bi rast di şerran de lehengek bû; lê şerrên eşîran, ji bo cerd û talankeriyê bes.

Piştî ku Evdilqadir mala xwe anî bi çend rojan Michim kurrê Mihêd jî vegerrî mala xwe. Michim, mîrê 'Inizan mirovekî mêr û camêr bû. Jîr bûna wî jî ji camêriya wî ne kêmtir bû. Xuya bû di navbera wî û Evdilqadir de dostanî gelekî mezin bû. Çi gotina lawê Dirê'î bikira; mezin, biçûk, di çav Michim de biha bû. Piştî vegerra Evdilqadir ji Tirkiyê bi mehekê, careke din xwest here nav eşîra xwe ji bo bin mal, pez û dewarê ku di revê de li nik dostan hişti bû. Ji min pirsî ka ez dil dikim digel wî herrim an na. Min qîma xwe bi çûna digel wî anî. Berê min gelek tişt li ser mêraniya wî û birayê wî Fethî bihîsti bû. Çiqas dilê min dixwest ku min herdu bira di şerrekî de bidîtana. Jê pêve gava ez digel wî bûma min ne dihîşt bela xwe di eşîran bide. Ma gava ez digel wî neçûma, heya vegerrînê çawa dê tevî jinan bimama?...

Rojekê em sî û heşt siwar ji sînorrê Tirkan û me berê xwe da qirracê Qeregêçiyan. Berî em bigehên qûna qirrêc keriyek xezal ket ber me, heye ku keriyekî welê mezin carna nehatibe dîtin. Me bi siwarî dirêjî nav wan kir ji alîkî em gîhan kerî; lê heyf ku ji dudiyan pêve me nikarî bikuştana.

Roja din em gîhan nava Qeregêçiyan û di nava du rojan de Evdilqadir karê xwe pêk anî û em bê şerr û lêdan vegerrîn nav koçên 'Inizan.

Di vê dema biçûk de tiştên ku min derheqê Evdilqadir dezanîn gelekî bi şewat bûn. Raste mêrekî baş bû; lê yekcar ji rê derketî bû. Ji talan, lêdan û kuştinê pêve tiştek ne dizanî. Rojekê em di bin kon de rûnişti bûn û dipeyivîn. Peyv hat ser rewşa wan a Sûriyê, min gote:

-Ez dibînim tu ji îro bi şûn de nikarî herrî nava Qeregêçiyan mezinatiyê bikî û talanên xelkê bînî. Çi roja tu herrî wir hikûmeta Tirk wê te bide kuştin. Li vir jî bê kar û xebat mayîn zikê we têr nake. Ez dibînim li nik te bi qasî şêst mehîn û çar sed hêstir heye. Eger tu pêncî mehîn û hemî hêştiran bifiroşî, ku deh mehîn têra te dikin, dê bi bihayê wan pênc-şeş gundan bikirrî û van malên xwe tê de bi cih bikî. Hînga tu ne hewceyî ku herrî ker û gulikên xelkê bînî. Ma ne heyfe ku mîrê Qeregêçiyan li ser talan û malê xelkê bête kuştin?

Min şopa gotina xwe di serçavên wî de dît. Rûdênê wî rengê ramaneke kûr girt. Peyayên wî ên hazir dîtin ku gotina min di canê Evdilqadir de cih girt. Hînga yekî gote min:

-Kuştin û talankerî bi te nabe ji lewre vê rêya çepel didiye ber Evdilqadir.

Hinga ez keniyam, Evdilqadir serê xwe hilda û li zilamê xwe vegerrand û got:

-Law ev gotin bi mêrên mala Heyder axa re nayête gotin. Eger tu bizanî ew çi mêrin te yê zimanê xwe jêkira. Gava ew talanan nayinin ji ber ku xwe ji vê kira han bilindtir dibînin.

Paşê vegerrî ser min got:

-Ez hêvî dikim pismam tu dilê xwe ji gotina vî ehmeqî negirî. Xelkê me Qeregêçiyan dirêjiya emrê xwe wek guran pezên xelkê direvînin. Nizanim ku di rêlan de şêr û piling hene. Tenê di nav van ereban de xwe mêr dîtine û haya wan li dinê tine.

Min jê re da zanîn ku ez ji gotinên wî zilamî ne êşiyam. Paşê gote min:

-Pismam! em di nava ereban de hov mezin bûn, nema dikarin wek camêran rihet rûnin. Ji lewre her wekî tu dixwazî em nikarin bibin dermanê tiştekî.

Ji vê gotina han min zanî ku Evdilqadir ne bê aqile, lê nikare dûş û sinçiyê xwe biguharre. Êdî ji wê rojê de min hêviya xwe jê birrî û nema di vî warî de digel wî peyivîm.

Piştî ku Evdilqadir mala xwe anî bi sê mehan Firansizan xwest wî surgûnî Dêrzorê bikin. Evdilqadir li ser sînorr rihet rûnedinişt û Firansizan jî ew ser berdayî ne dihiştin. Rojekê zabitê îstixbarata Reqayê hat ew digel xwe bir û Michim jî bi wan re çû . Serekî piştî çûna Evdilqadir ez li mala wî mam; lê tewş bû!.. Birayên wî, Qeregêçiyan tiştek ji min bi ser nedixistin, û ne min ji wan. Evdilqadir çê û xerab tiştek ji Dinyayê zanîbû; lê van hovan, ne tiştek....

Dawiya bihara 1931an, piştî ku ji vegerra Evdilqadir bê hêvî man, rojekê min xatir ji birayên Evdilqadir xwest û berê xwe da rohelat. Hîngê koçên ‘Inizan nîzîkî koçên mala Birahîm paşa bûbûn. Ez çûm koçên Mehmoyê paşê. Ew jî yek ji lebatên encimena Xoybûn bû. Min xwe pê da nasîn, her wekî ez ne nasî bim bendewariyek biçûk digel min neda xuya kirin. Ez ji rewşa peyayên Xoybûn ecêb dimam! Ma gelo peyayên Xoybûn hemî ev celeb bûn? Wan celeb peyan ji bo gelê Kurd ê bindest û reben çi dikarî bike? Diviya bû ez hemiyan bibînim û binasim, da hêviya xwe ji wan bibirrim.

Roja din ez ji konê Mehmo çûm Serê Kaniyê, pereyên min êdî ji xilas bûnê bûn, heye ku digel min mecîdî û nîvek mabû. Min dikarî li serê Kaniyê hespa xwe bifiroşim û çend quruş pere têxim berîka xwe. Hesp bi heqî bihata firotin pirrtirî bîst zêrrên zer hêja bû, Bîst zêrran dikarî min bigehîne cihekî.

Hîngê li Serê Kaniyê xan û mêvanxane tine bûn, ji lewre ez çûm mala Xelîl begê birahîm paşa, ku ew jî yek ji lebatên Xoybûnê ên sere bû.

Dema min xwe pê da nasîn hinekî rûyê xwe geş kir; lê pirr ne ajot min zanî ew çi bêbav e.

Êvarê piştî kes li odê nema digel min peyivî. Berê çend pirs ji min kirin ka ez vê dema han li ku mabûm û min çawan xwe gîhandi bû cem wî. Piştî ku min çîrroka xwe ser û bin jê re got, Xelîl begê bi zaravakî zana û gûrr gote min:

-Ji min pêve hemî lebatên Xoybûnê ehmeq derketin. Min dizanî ku ev tevgerr naçe serî ji lew re dema ji me re beyan, al û belavok dan; roja dûtirê min hemî şandin ji waliyê Mêrdînê (Tewîq Hadî) re. Ji alîkî min dostaniya Tirkan kar kir û ji aliyê din ez sirgûn ne bûm.

Çi kirek bêbav û gotinek bê rûmet!.. Bê ku şerm bike xiniziya xwe dibêje û pê dilgir jî dibe!... Nizam çi li min qewimî, serê min doş bû û guhên min çîngiyan. Dema hinekan ji me hemî hêviya xwe xisti bû vê tevgerra han, bêbavekî jî bi xinizî haya waliyê Mêrdînê kiri bû. Wek şelpe li min xîne laşa min tev tevizî û hemî lebatên min xilxilî bûn, yekî alî yê din ne dikir. Gava min jî nema xweş dihate bihîstin, wek dengê ku ji gorrekî bê, min gotê:

-Ma ru bîra nabî ku bi vê kira han tu bûye xinizê welêt? Paşê bê fedî bi devê xwe jî bi dilfere dibêjî min wa kir!... Ne heyfe ku tu lawê Birahîm paşa bî? gelek mixabin.

Xelîl begê dît gotina wî çiqas ez êşandim, vêcar dixwest dilê min xweş bike; lê ne dizanî bi çi awayî. Ma vî bêbavî gava xiniziya xwe got ma hiviya çi ji min dikir? Ma bawer bû ku bêjinê afeîn!.. Hêdî hêdî çavên min li ser rastiyê ve bûn û ew kira ku min berê ecêb dît, paşê wek tiştekî adî xuya kir. Ma Xelîl beg lawê kê bû?... Lawê Birahîm paşa, yê ku diz û talankerê gel bû. Qet ne ecêbe ku kurrê dizekî bibe xiniz.

Xelîl begê xweş bîra bir ku bi wê gotinê di çavên min de gelekî biçûk bû. Vêcarêdixwest bê baviya xwe di çav min de biçûk bike, digot:

-Heye ku tu vê kira min xinizî an bêbavî bizanî, lê a rast tiştekî kirêt tê de nîne. Ji xwe Xoybûn di kira xwe de şaş bû û ne digîha daxwaza xwe. Ji min pêve hemî lebatên mayî sirgûnî Şamê bûn. Ma hewce bû ez jî wekî wan sirgûn bibûma?

-Ne sirgûn, xwezî tu biçûya dûjehê û bila te ev xinizî ne kira.

Dema Xelîl begê dît nikare min razî bike û şev jî gelek çû bû, rabû ser xwe çû malê û ez li odê hêştim.

Min dixwest di wê bîstê de ez li mala wî xinizî herrim; lê destê min girêdayî bû. Berî her tiştî Firansiz li min digerrîn, paşê di berîka min de pere nema bûn. Diviya bû ez hespa xwe bifiroşim heya bikarim bi bihayê wê ji mala Xelîl beg bi dûrkevim. Bi vê ramanê min serê xwe danî ser

balgih û razam. Wek kevirê ku bavêjî binê bîrê, ez di xew ve çûm û heya sibê hişyar ne bûm. Sibetirê min delal anî û mehîna xwe raveyê kir. Got, mehîn hêjayî panzde- bîst zêrran e. Lê gava avête mezadê ji heşt zêrran pêve ne anî. Bi çi bûya min dê bifirota, ji ber ku ez bê pere bûm. Ya ecêb ew bû ku yê mehîn kirrî Xelîl beg bû, wî ne hîşti bû ku kes li ser zêde bike. Piştî me firot careke din anîn hewşa begê xiniz.

Berî ez li Serê Kaniyê derêm min Îlyasê Dêrikî dît. Gelek tişt ji min re gotin.. A rast Îlyas çavên min li ser gelek rastiyan vekirin.

Îlyas Dêrikî kî ye?

Îlyas kurrê Hacî Osman li Dêrika çiyayê Mazî yek ji peyayên Dêrikê yê pêşîn e. Îlyas ji mêj ve bi gelparêzî hati bû nasîn. Gava mala Cemîl paşa li Diyarbekirê doza gelpareziyê dikirin, Îlyas li Dêrikê yek ji yar û hevalên wan bû. Di sala 1929an de dema mala Cemîl paşa hatin Sûriyê girtin dayîna xwe bi Îlyas re ne birrîn. Ji lewre gava partiya Xoybûn bi tevgerra tevayî rabû û Qedrî Cemîl paşa tevî pismamê xwe Ekrem bi serxetê ketin derbasî welêt bûn Ilyasê Dêrikî gîha wan û bi wan re daket binxetê. Her wekî çû bin ku mala Ilyas li Dêrikê bînin Sûriyê. Ji wê pêve tiştekî din nekirin.

Ilyas ji efendiyên kurdan di bajarran de, peyakî jîr û jêhatî bû. Dema em dibêjin jîr û jêhatî, goreyî rê û ramana ku ew li ser, ne goreyî daxwaza me gelparêzan. Ilyas ji kurdîtiya xwe hez dikir; lê ne pirtirî kar û debara xwe. Eger ji gelê xwe hez dikir, di pişt wê hezkirinê de ji xwe re hezkirina han de mala Cemîl paşa ji xwe re kiribû mîsal, ne dikarî pirrtirî vê bîra bibe.

Ilyas ku li Dêrikê piştî mala Hec Necîm mala dudiyan dihat nasîn, ne dikarî li Sûriyê bi rebenî û belengazî bibore. Jê re malekî pirr tine bû ku xwe pê bi xwedî ke. Ji lewre zûka xwe bi destê Firansizan ve berda heya wî li ser sînorr bihêlin ku bikare debara xwe bike. Di vê yekê de Ilyas tu kêmanî ne didît. Hîngê hemî malbatên mezin li ser sînorr bûbûn dest û guhên Firansizan wek mala Birahîm paşayê Millî û Haco axa yê Hevêrikî. Van her du malan û Mihemedê Cemîl paşa diz û keleş dişandin serxetê malê Kurdên jor tanîn bi tercimanên Firansizan re li hev par ve dikirin. Ilyas jî dixwest bide ser vê rê. Ji bo ku yek li ser sînorr bima diviya bû ji îstixbarata Firansizan re guhbeliyê bike. Ev bû rêya ku keti bû ber Ilyasê

Dêrikî- Rehmetî ev rewşa han bi vê gotina han ji min re salixda û hêstir bi çavan ketin, got:

-Me mala xwe xirab kir û welatê xwe berda ku em werin li vir zarrokên xwe bi nanê dizî û talanên xelkê bi xwedî kin. Firansizan em ji sînorr bi dûrxistine, gava em wek daxwaza wan nekin nahêlin em xwe tev bidin. Me hin xwe kuşt û hin jî xirabiya gelê xwe dikin. Xwedê mala sebeban xira bike.

Paşê ji min re çîrroka xwe ser û bin got. Gava çêla partiya Xoybûn hat, keserek kişand pê re dûman ji gewriyê hat, digot:

-Kesê ku peyayên Xoybûn nemaze, wê bawer be ku mirovin gelparêzin, herwekî me dizanî. Lê gava nîzîkê bibin û wan binasin, dê bizanin ku van mirovana dijminê gelê Kurd in.

Hînga min jê re çîrroka Xelîl beg ku al û ewraqên Xoybûnê ji Tirkan re şandine gote. Ilyas li min vegerrand û got;

-Ji min re jî ev tişt goti bû. Ji ber vê yekê wek yên mayî sirgûnî Şamê ne bû. Eger Xelîl beg peyayê Tirkan e, Haco jî peyayê Firansizan e.

Min jê pirsî:

-Lê mala Bedirxan?

-Ew jî peyayên Taşnakan in.

-Lê mala Cemîl paşa?

-Mihemed ji xwe re diziyê dike, xwe pê bi xwedî dike. Herçî Bedrî beg ji xwarinê pêve bi kêrî tiştekî nayê. Qedrî beg û Ekrem beg hinekî başin û bendewariyeke biçûk digel mirov nîşan didin; lê ne bi qasî ku divê. Heya niha çend quruş di destê wan de hene ji lewre hê xwe ne firotine, gava dsetvala bimînin nizam wê çiqas ber paqijiyê xwe biparêzin.

-Dibînim tu hêviya qenciyê ji kesî wan nekiye!...

-Ne kes...

Paşê ji min re li ser tevgerra tevayî peyivî. Hînga min zanî ku Celadet, Haco, mala Cemîl paşa, tevî ku çûn serxetê tifing ne teqandin!... Herçî mala Birahîm paşa herwekî Xelîl begê bi devê xwe goti bû haya hikûmeta Tirk ji tevgerrê kirin û her du kurrên Şehîn begê neçûn serxetê û ji aliyê Firansizan ve hatin girtin. Xuya dikir yê ku tifing teqandi bû ez tenê bûm û bes! Ji partiyeke dûr û dirêj lebatekî tenê karê ku jê re hati bû sipartin bê kêmanî kiri bû, Xoybûnê di belavoka xwe de ew kir jî li ser Şêx Nûhê Şêxî nivîsî bû! Xwezî qene Şêx Nûh digel me hati bûna dîsa ne xem bû. Kar ji min re hati bû sipartin, û min ew kar bi camêrî kiri bû; lê li ser Şêx Nûh hati bû nivîsandin!.

Gava Ilyasê Dêrikî belavoka Xoybûnê raveyî min kir ez ecêb mam! Ma holê jî dibûn? ku yek bike û li ser yekî din bête nivîsandin!...

vir wan bîranînên bavê wî wek hatine nivîsandin -ne kêm ne zêde-didim belav kirin.

Ez bawerim wê ne li gora dilê hin kesan be. Lê ji bo emaneta dîrokî wek hatiye nivîsandin ez jî belav dikim.

Ev bîranîn bi destê min hatin wergerandin bo zimanê erebî û min da çapkirin û belavkirin li bajarê Şamê 2001ê.

Dilawerê Zengî
Şam

E-Pirtûk
www.kurdme.com
www.all-kurd.com
www.kurdefrin.com

Gava digel Ilyasê Dêrikî me kirên Xoybûnê di ber çavên xwe re birin anîn, hemî kirên wê holê belovacî û ne di rê de bûn. Paşê Ilyas ji min pirsî:

-Niha tuyê kû de herî?.

-Nizanim; lê divê ez xwe bigehînim Şamê û rûbarî van berpirsiyarên Xoybûnê ên camêr bibim. Me xwe siparti bû wan, xuyaye wan jî xwe sipartiye Taşnakan. Carê min ew bidîtana pêşiya xwe dîtin hêsanî dibûn.

-Tu şaşî Osman. Gavînin hîn ji wan bi hêviyî; lê hêviya te willo ye. Ev bûn bîst roj kurrê Evdilmecîd begê Cibirî Xalis beg hatiye Tehlikê gundê mala Cemîl paşa ji bo dîtina wan, heya niha ne xwestine Şamê.

-Divê zanibî ku Xalis beg ji Araratê hatiye. Gava ew ne xwestin, dê çawan te bixwazin.

Dema min bihîst ku yek ji şerrkerên Araratê li Tehlikê ye. min her tişt ji bîra kir û tenê meraqa dîtina wî ez girtim. Hînga min gote Ilyasê Dêrikî:

-Berî her tiştî ezê Xalis begê bibînim, paşê binêrrim ka berê min dikeve kû derê.

-Berê te bi kû ve dibe dilê teye. Lê rojna têyî Hesîçê wî werî mala min.

Piştî min pirs da Ilyas ku çi gava çûm Hesîçê ez herim mala wî, min berê xwe da Tehlikê û çûm. Tinê min berê xwe dayê bi gelkê ji min re ne nas bû. Min ji mala Cemîl paşa tenê Qedrî beg dinasîn, ew jî li Şamê bû. Birayê wî Bedrî li Tehlikê bû, me hev ne dinasî.

Wê rojê piştî nîvro ez gîham Qeremaniyê, li wir peya min berê xwe da Tehlikê. Serêvarê ez gîham Bedrî li mal bû, min xwe pê da nasîn. Min pirsa Xalis begê kir, got ew tevî xulamê xwe derketiye nava erdan gerrê. Pirr neçû Xalis beg hat û me hevdî nasî û digel wî mam.

Xalis ji şerrevaniyên me ên sere bû. Di Araratê de piştî Ihsan Nûrî, Zerzende û Birho peyayê çaran dihate nasîn. Min dikarî jê hemî rewşa Araratê hîn bibim. Ev yeka han ji bo min bextiyariyeke mezin bû ku ne bawer bûm ku di xewnê de bibînim.

Xalis mirovekî xweşpeyv bû û dostanî zûka di nava me de çê bû.

{Dawî hat}

Têbînî:

Ev Bîranînên Osman Sebrî di riya kurê wî Hoşeng re gihane destê min. Di pêşî de, ez pir sipasiya wî dikim ku ev bawerî daye min, û ez jî li